

K.T.

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ

ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ



BINYATA WESFÊ DI ROMANÊN JAN DOST DA

TEZA LÎSANS A BİLİND

AMADEKAR

SHAHO JANGI NOORI

ŞÊWIRMEND

Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

VAN- 2020

K.T.

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ

ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ



BINYATA WESFÊ DI ROMANÊN JAN DOST DA

TEZA LÎSANS A BİLİND

AMADEKAR

SHAHO JANGI NOORI

ŞÊWIRMEND

Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

VAN- 2020

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENİSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



JAN DOST'UN ROMANLARINDA BETİMLEME
SANATI

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN
SHAHO JANGI NOORI

DANIŞMAN
Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

VAN- 2020

ETİK BEYAN SAYFASI

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü **Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;**

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmada yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
 - Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
 - Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu

bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim. (14. 09. 2020)

.....
Shaho Jangi NOORI

BİLDİRİM

Hazırladığım tezin/raporun tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin/raporumun kâğıt ve elektronik kopyalarının Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü ABD arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım:

- ☐ Tezimin/Raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.
- ☐ Tezim/Raporum sadece Yüzüncü Yıl Üniversitesi yerleşkesinden erişime açılabilir.
- ☐ Tezimin / Raporumun yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

[Jüri Tarihi]

[İmza]

SHAHO JANGI NOORI

VAN-2020

NAVEROK	
KURTE	IX
ÖZET.....	X
ABSTRACT	XI
PÊŞGOTIN	XII
KURTEBÊJE	XIV
DESTPÊK.....	1
1. JIYAN Ê BERHEMÊN JAN DOST.....	4
1.1. Jîyana Wî.....	4
1.2. Bajara Kobanî.....	9
1.3. Berhemên Wî	11
1.3.1.Romanên Bi Zimanê Kurdî.....	11
1.3.2. Romanên Bi Zimanê ‘Erebî	23
1.3.3. Helbestên Wî	25
1.3.4. Werger û Lêkolînên Wî.....	26
1.3.5. Kovar, Rojname, Fîlim û Şanoyên Wî.....	28
2. WESF DI ROMANÊ DA	29
2.1. Têgeh û Pênaseya Wesfê	29
2.2. Girîngîya Wesfê Di Romanê Da	36
2.3. Pêkhateyên Wesfê Di Romanê Da.....	40
2.4. Erkên Wesfê Di Romanê Da	44
2.4.1. Erka Xemlandinê	46
2.4.2. Erka Raveyî.....	47
2.4.3.Erka Xapîner	48
2.4.4.Erka Rêkxistinê.....	48
2.5. Cûreyên Wesfê Di Romanê Da	48

2.5.1. Cûreyên Wesfê Li Gorî Kurtî û Dirêjîya Birgên Wesfî	49
2.5.2. Cûreyên Wesfê Li Gor Wesfkirîyan.....	50
2.5.3. Cûreyên Wesfê Li Gor Wesfker	51
2.5.4. Cûreyên Wesfê Li Gor Rîtmî Pêvajoya Vegêranê	52
2.5.5. Cûreyên Wesfê Li Gor Pêwendîya Wan Digel Vegêranê.....	54
2.5.6. Cûreyên Wesfê Li Gor “Gerard Genette”	56
2.5.7.Çend Cûreyên Giştî Yên Wesfê	57
2.6.Wesf Di Romanên Klasîk Da	58
2.7. Wesf Di Romanên “Pêla Hişî” Da	64
2.8. Wesf Di Romanên Nû Da	69
3. PÊWENDÎYA WESFÊ BI HÊMANÊN VEGÊRANÊ DI ROMANÊN JAN	
DOST DA	78
3.1. Pêwendîya Di Navbera Wesf û Vegêranê Da	78
3.2. Pêwendîya Di Navbera Wesf û Karakter Da	87
3.2.1.Rîya Ragihandinê.....	89
3.2.2. Rîya Nimayîşkirinê	90
3.2.3. Wesfa Mijarî.....	92
3.2.4. Wesfa Xweyî.....	95
3.2.5.Wesfa Rawestî	98
3.2.6.Wesfa Livdar	101
3.3. Pêwendîya Di Navbera Wesf û Şûndemê Da	111
3.3.1.Wesfa Rawestî	114
3.3.2.Wesfa Livdar	119
3.4. Erkên Wesfa Şûnê Di Romanan Da	125
3.4.1. Erka Xemlêner	125
3.4.2. Erka Raveyî.....	127

3.4.3. Erka Xapînerî.....	128
3.5. Pêwendîya Di Navbera Wesf û Bûyerê Da	131
3.5.1. Cûreyên Bûyerên Bi Dîtinên Cuda	133
3.5.2. Wesfa Bûyerê Bi Dîtina Kunenişîna Navekî.....	137
3.5.3. Wesfa Bûyerê Bi Dîtina Kunenişîna Derveyî	141
ENCAM.....	149
ÇAVKANÎ.....	151
JÎNENÎGARÎ.....	1



Teza Lîsansa Bilind

SHAHO JANGI NOORI

ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ

Îlon- 2020

BINYATA WESFÊ DI ROMANÊN JAN DOST DA

KURTE

Ev lêkolîna xebateke ji bo nasandin û şîroveya wesfê wek hunereke li ser vegêranê yê ku rola wê ya sereke di sistkirin û rawestandina vegêranê da heye. Bi vê jî bandorê li ser dirêjkirina nivîskar û dema vegêrana romanê çê dike. Ev bandor û bikaranîna wesfê jî li gor qonaxên dîrokî tên guhertin. Çimkî wesf bi arasteyên cuda ve bikar hatîye, paşê jî cîhanbînîya Jan Dost û şêwaza bikaranîna vê hunerê di nav nivîsên romanê da derketine holê.

Ev lêkolîna ji destpêk û sê beşan pêk tê. Di beşa yekem da behsa jîyan û naverokên berhemên Jan Dost hatîye kirin.

Di beşa duyem da jî têgeh û pênaseya wesfê û girîngî û pêkhateya wesfê di romanên da hatine nişandan. Dîsan jî li gor dîtîna û ramanên rexnegiran ve xebata destnîşankirina cûreyên wesfê hatîye dayîn. Paşê jî çawanîya danûsandina romannivîsan di derbarê bikaranîna hunera wesfê di rêbazên klasîk û pêla hişî û nû da hatine şîrovekirin û di xîşteyekê (tabloyekê) da berawirdîya wan hatîye kirin.

Di beşa sêyem da jî behsa pêwendîya wesfê bi hêmanên serekî yên romanê wek “vegêran, karakter, şûn û bûyer” di romanên wek Mijabad, Mîrname, 3 Gav û 3 Darek, Martînê Bextewer û Kobanî da hatîye kirin. Di dawîyê da jî ji bo her binbeşan wesfa karakter, şûn û bûyerê amara taybet bi wan hatiye kirin û ev vekolîna zengîntir kirîye.

Peyvên Sereke : Wesf, Vegêran, Kunenişîn, W. Karakter, W. Şûnê, W. Bûyerê, W. Rawestî, W. Livdar, Jan Dost, Mijabad, Mîrname, 3 Gav û 3 Darek, Martînê Bextewer û Kobanî.

Hejmara Rûpelan : 157+XIV

Şêwirmend : Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

Yüksek Lisans Tezi
SHAHO JANGI NOORI
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
Eylül -2020

JAN DOST'UN ROMANLARINDA BETİMLEME SANATI

ÖZET

Bu araştırma anlatıya dayanan nitelik sanatının tanımı ve analizi üzerine yapılan bir çalışmadır. Nitelik sanatının, anlatımı yavaşlatma ve durdurma gibi etkin bir rolü de vardır. Bundan dolayı romanın anlatı zamanı ve metnin uzaması üzerinde etki oluşturmaktadır. Nitelik sanatının bu etki ve kullanımı tarihsel dönemlere göre değişiklik göstermektedir. Çünkü bu sanat farklı yöntem ve yönlendirmeler ile edebî türler içinde kullanılmıştır. Devamında Jan Dost'un dünya görüşü ile bu sanatın roman metinlerinde nasıl kullanıldığı ele alınmıştır.

Bu araştırma başlangıç ve üç bölümden oluşmaktadır; ilk bölümde yazar ve Jan Dost'un hayatı ve eserlerinin içeriğine değinilmiştir.

İkinci bölümde de nitelik sanatının kavramı ve tanımı ile bu sanatın romanlarda ki önemi değerlendirilip eleştirmenlerin görüş ve düşüncelerine göre bu sanatın türlerini belirleme çalışmalarına yer verilmiştir. Daha sonra nitelik sanatı ile roman yazarlarının bu sanatın klasik, beyin dalgası (entelektüel) ile yeni edebî akımlarındaki kullanımı ile iletişim kurma biçimleri açıklanmış olup düzenli bir tabloda birbiriyle karşılaştırmaları yapılmıştır.

Üçüncü bölümde ise nitelik sanatının romanın ana öğeleri olan anlatı, karakter, yer ve olay ile ilişkisi anlatılmıştır. Ayrıca bu ilişkinin Mijabad, Mirname, Üç Adım ve Üç Ağaç, Mutlu Martin ile Kobani romanlarındaki etkisine değinilmiştir. Sonuç olarak ta nitelik sanatının karakter, yer ve olay türünün her biri için özel istatistikler hazırlanmış olup bu çalışma daha da zenginleştirilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Betimleme Sanatı, Anlatı, Bakış Açısı, Karakter Niteliği, Yer Niteliği, Olay Niteliği, Durgun Nitelik, Devimli Betimleme, Jan Dost, Mijabad, Mirname, Üç Adım ve Üç Ağaç, Mutlu Martin, Kobani

Sayfa Sayısı : 157+XIV

Danışman : Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

Master Thesis
SHAHO JANGI NOORI
YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES

September - 2020

THE BASIS OF DESCRIPTION IN JAN DOST “NOVELS”

ABSTRACT

This research is an attempt to introduce and explain description in narration which has a major role in interruption and slowing down the narration. That is why it has impact on prolonging the text and the narration time of the novel. The effect of description changes according to the historical ages as it has been used in different methods. Additionally, Jan Dost's view about life and different ways of using description in his novels have been shed light on.

The research consists three parts: In the first part, a brief biography of Jan Dost with his works are presented.

In the second part, in the concept of description, it is definition, and the importance of it have been illustrated. Moreover. Different types of description are presented according to critics. Furthermore, the content of description and how novelists used description in three different literary ages which are classic, stream of consciousness, and modern age are explained with a comparison among them which is illustrated in a table.

In the third part, the relation of description with the main elements of novel such as narration, character, place, and event in the Mijabad, Mirname, Three Steps And Three Trees, Martine Bakhtawar, Kobani is drawn. Finally, statistics have been carried out for character description, place description, and event description which enrich the research.

Key Words : Description, Narration, Point of View, Character Des, Place Des, Event Des, Stable Des, Dynamic Des, Jan Dost, Mijabad, Mirname, Three Steps And Three Trees, Happy Martin, Kobani.

Quantity Page : 157+XIV

Supervisor : Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

PÊŞGOTIN

Her çiqasî dîroka derketina cûreya romanê bi alîyê berawirdîyê ji cûreya helbestê kevntir û dûrtir nîne jî, ji gava derketina xwe ta ku niha beşek mezin ya cîhana wêjeyê pêkanîye û gelek xwendevan li dor xwe komkirîye. Ev jî ji ber wê yekê ye ku binyata romanê ji hêman û teknîkên cûrbicûr pêkhatîye û romannivîs dema nivîsandinê da peyrewa wan dike. Di vê navberê da jî wesf yek ji wan hunerên girîng yê romanê ye, ku nabe were jibîrkin. Çimkî xwezaya romanê bi awayekî hinek car pêwîstî bi bikaranîna hunera wesfê heye. Bi taybetî jî ji bo sistkirin û rawestandina dema vegêranê. Ev jî ji ber wesfê ye ku xwendevan baştir nasbike (aşîna bibe) bîr û bawerî û raborîya karakteran dike. Li alîyekî din wesfa şûnê wek derwazeyekê ji bo nîşandana alîyên “derûnî, aborî, rewşenbîrî... hwd” karakteran bikartê. Ev jî di nîşandana şîyanên zimanî yên romannivîs da rolê dilîze ku çêj û estetîkiya wêjeyî bide xwendevanan. Ev hemû jî beşdarî, girîngî û bandora wesfê di pêvajoya honandina romanê da nîşan didin.

Di vê vekolînê da me ji bo encamdana xebata xwe kêr (sûd) ji “Rêbaza Rexneyî ya Şîroveyî ya Kirdarî” wergirt. Herwiha me piştî xwe spart wê rêbaza ku em bi têgehên girîng yên girêdayîyê wesfê ve gîredan ku em wesfê binasînin û paşê jî bi mînakên nava romanên da kirdarîya wan bikin.

Di beşa yekem ya vê xebatê da behsa jîyan û naverokên berhemên romannivîs Jan Dost hatîye kirin. Herwiha di beşa duyem da jî bi şêweyekî teorî ve hunera wesfê li alîyê “Têgeh û Pênasîn û Girîngî, Erk, Cûre, Pêkhate û Xwezaya Bikaranîna Wesfê di Rêbazên Klasîk, Pêla Hişî û Nû da” hate şîrovekirin. Paşê jî di beşa sêyem da, bal kişandîye ser pêwendîya wesfê bi hêmanên romanê, dîsan bi mînakên romanên Jan Dost ve kirdarîya cûreyên wesfa karakter, şûn û bûyerê hatine kirin.

Ji ber vê yekê vekolînên rexneya kurdî bi piranî li ser cûreya helbestê bû. Bi vê jî di derbarê romana kurdî kêmtir xebat hatine kirin. Loma di qonaxên nivîsandina vekolîna xwe da ji bo berdewamîya xebata xwe em naçar bûn serî li çavkanî û jêderên ‘erebî û îngilîzî bixin. Li alîyekî din ev çavkanîyên kurdî ku di derbarê hunera wesfê da hatine nivîsandin û me kêr ji wan girtine ev in:

* Necim Xalîd Necmeddîn Elwenî, *Bînay Kat Le Sê Nimûney Romanî Kurdî Da*, Janî Gel, Şar, Raz, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2004.

* Necim Xalîd Necmeddîn Elwenî, *Teorî Komelnasîy Roman*, Weşanxaneyê Zanîngeha Selaheddîn, Çapa Yekem, Hewlêr, 2017.

* Dîyar Fayeç Mecîd, *Bunyatî Wesf Le Romanî Rêgay Mihemed Mewlud Mem Da*, Nameya Master, Kolêja Perwerdeya Îbn Ruşd, Zanîngeha Bexda.

* Beyan Mecîd Se'îd, *Bunyatî Wesf Le Romanî Şarî Husên 'Arîf Da*, Nameya Masterê, Kolêja Ziman, Zanîngeha Silêmanî, 2014.

* Karwan Mehdî Osman, *Teknîkî Wesf Le Romanekanî Bextîyar 'Elî Da*, Nameya Masterê, Kolêja Ziman, Zanîngeha Koyê, 2008.

Di vir da bi pêwîstî zanim spasîya mamostayên beşa kurdî ya Zanîngeha Yüzüncü Yıl bikim ku gelekî alîkarîya min kirin. Herwiha spasîya Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ dikim ku erka serperiştîya vekolînê girte ser milê xwe. Di heman demê da spasîya Dr. Necim Xalîd ELWENÎ dikim ku bi şîretên xwe ve vekolîna min gelekî dewlemend kir.

Herwiha spasîya Mamosta Merîwan HEMESÛR û Mamosta Reza Se'îd dikim ku di wergerana jêderên îngilîzî da hevkarîya min kirin. Herwiha spas ji bo hevalê min yê hêja Mamosta Soran MAMEND ku her gav û her demê hevkar û alîkarê min bû. Ji bo sererastkirin, plansazî û xwandina tezê ji birêz lêkolîner û wergervan Ehmed SERHEDÎ re sapsardarim. Di dawîyê da jî spasîyeke bêhejmar û bêpayanî li dayik û bavê xwe yê xweştivî dikim ku di hemû qonaxên xwendinê da palpiştê min yê serekî bûn.

SHAHO JANGI NOORI

VAN-2020

KURTEBÊJE

Peyvên ku di nav nameya me da wek kurte derbasdibin:

Kurte	Şîrove
amd.	: Amadekar
b.n.b	: Berhema navborî
b.z.	: Pêşîya zayendê
bnç.	: berhema neçapbûyî
bnr.	: Binêrin
c.	: cild
ç.	: çap
Des.	: Description
Dr.	: Doctor
g.	: gotar
hwd.	: Her weke din
J.	: Jimare
Km	: Kîlometre
K.T	: Komara Tirkîyê
P.	: Page (Rûpel)
r.	: Rûpel
s.x.l.	: slava Xwedê lêbe
USA	: United States of America
UK	: United Kingdom
Tv	: Televîzyon
W.	: Wesf
Wer.	: Wergêr
z.	: zayînî

DESTPÊK

Wesf ew têgeha berbilave ku bi direjayî ya dîroka mirovayetî ya mirovan wek pêwîstîyeke bingeîn û kanaleke têgehîştina hevdu û nasandina li hemberî hevdu bikar hatîye. Bi vê jî bûye wek navgîneke serekî ya destê mirovan ji bo perde rakirina li ser alîyên veşartîyên mirovan. Bi wateyeke din pêvajoya wesfkirinê, karkirine li ser nasandina mirovan û ew bîr û bawerîya wan ya ku hene. Lê wesf di cîhana wêjeyê da cuda ye ji wê wesfa ku mirov di jîyana rojane da bikar tînin. Çimkî romannivîs bergeke hunerî dide wesfê, paşê jî bi rîya zimanekî wêjeyî wesfan pêşkeş dike. Ev wesfana jî bi pê dîroka romanên cîhanî û dîtina romannivîsan ve bi arasteyên cuda hatine bikaranîn. Romanên kurdî jî di bin bandora romanên cîhanî, romanên gelên rojhilata navîn da ketine bin bandora ew guherkarîyên ku bi ser hêman û teknîkên romanên da hatine. Wesf jî yek ji ew hunerana bû ku kete bin guherkarîyan.

Herwiha Jan Dost jî yek ji ew romannivîsên hevçerx yê kurdê ku dîtina û ramanên wî yê taybet hene di derbarê çawanîya pêvajoya honandina roman û şewaza bikaranîna hunera wesfê di romanê da.

Ev vekolîna li ser destpêk û sê beşan ve hatîye dabeşkirin. Di beşa yekem da; behsa jîyana romannivîs û dîrok û ardnîgarîya bajara kobanî hatîye kirin, piştra jî tevahîya berhemn wî bi giştî hatîye nasandin. Herwiha naveroka mijara romanên û kurtasîya wan hatîye nivîsandin. Di beşa duyem da jî li alîyê teorîyê ve mijara wesfê hatîye şîrovekirin, ku bi ser çend teweran (binbeşan) ve hatîye dabeşkirin. Di destpêka vê beşe da têgeh û pênaseya wesfê bi pê ferhenga neteweyî û dîtina vekoler û rexnegirên cîhanî ve hatîye şîrovekirin. Paşê jî girîngî û beşdarîya wesfê di pêvajoya honandina romanê da hatîye ronîkirin. Dîsan pêkhate, erk û cûreyên wesfê bi pê ramanên rexnegiran ve derketîye holê. Di dawîyê da jî şewaza bikaranîna wesfê di her sê “rêbazên klasik”, “pêla hişî” û “pêla nû” da hatine ronîkirin û di xîşteyekê (tablo) da berawirdîya her sê rêbazan jî hatîye amaje kirin.

Di beşa sêyem da; pêwendîya wesfê bi hêmanên vegêranê ve û karakter, şûn û bûyer hatine şîrovekirin. Paşê jî di romanên da mînakên wesfa karakter, şûn û bûyeran hatine hîlbijartin û şîrove li ser wan hatinkirin. Herwiha di beşên dawîyê yê

vê binbeşê da jî pêwendîya wesfê digel karakter, şûn û bûyerê da amareke hûr ya wesfan di her pênc romanên Jan Dost da derketîye holê.

1. Armanca Xebatê

Armanca serekî di vê vekolînê da ew e ku rol, girîngî û bandora hunera wesfê di romanên Jan Dost da hatine destnîşan kirine. Paşê jî em ê dîtînin û ramanên romannivîs li hember şêwaza bikaranîna hunera wesfê eşkere bikin. Li alîyekî din ve jî vekolerên ewropî û ‘ereb bi awayekê berawirdî digel vekolerên kurd pirtir girîngî dane vekolînên ser romanan. Ji ber vê çendê jî ev xebata me jî ji alîyekî ve girîngî dayîna romanên kurdî ye û ji alîyekî din ve jî dîyarkirina ast û ramana romanên kurdî ye. Ta ku em bizanin romannivîs û romanên kurdî pî bi pîyê romannivîs û romanên cîhanî da ne û nûkirina romanan da jî pê bi pê digel guherkarîyan gava davêjin, yan jî bi guherkarîyên pêwîst agahdarê guherkarîyen ser romanan nînin.

2. Mijara Xebatê

Jan Dost romannivîs û helbestvanekî hevçerx yê kurd e û komek (gelek) roman bi hîzr û ramana kurdane honandîye, ku bi rastî şayanê helwest li ser kirine. Lê mixabin heta niha bi şêweyekî hûrgilî vekolîneke akademîk li ser romanên Jan Dost nehatine kirin, ji bilî çend xebatên biçûk ji alîyê hinek vekolerên kurd ve hatine kirin, ku bi şêweyê wek gotar di kovar û rojnameyên kurdî da li ser romanên wî hatine nivîsandin. Ji ber vê yekê jî nebûna vekolîneke akademîk li ser berhemên Jan Dost pêwîst bû. Me jî hewl da ku em vî karî bigrin ser milê xwe û bi şêweyekî akademîk penç romanên Jan Dost ji alîyê hunera wesfê ve şîrove bikin.

3. Sînorên Xebatê

Sînorê vê xebatê ji romanên Jan Dost yê bi navên “Mijabad, Mîrname, 3 Gav û 3 Darek, Martînê Bextewer û Kobanî” pêkhatîye. Bi wateyeke din tenê me ew roman wergirtine ku Jan Dost di bîngehê da bi zaravayê kurmancîya dîyalekta zimanê kurdî ve nivîsandîye. Çimkî ji bilî van romanan çend romanên wî yê din jî hene ku zimanê yekem yê romanan ‘erebî ye, paşê jî wergerana wan bi dîyalektên kurmancîya jêrîn û jorîn ve hatine çêkirin. Lê belê ev yek jî nakeve nav sînorê xebata me, çimkî bi alîyê berhemê ve wek romanên kurdî nayên jimartin.

4. Rêbazên Xebatê

Di vê vekolînê da kêr (sûd) ji rêbaza rexneyî ya şîroveyî ya kirdarî hatîye wergirtin. Ku di çaroveya rexneyî de hemû ev têgehên ku pêwendîya wan bi hunera wesfê re hene di beşa duyem da hatine nîşandan. Herwiha di beşa sêşîyan da jî bi şêwaza kirdarî (praktîk) û nîşandana mînakên wesfî yê di nav her penç romanên Jan Dost de derbas bune. Ji bilî wan me hewl daye di nav romanên Jan Dost de cureyên wesfê bi awayekî zanistî û akademîk derxine hole.

5. Dijwarîyên Xebatê

Kêmbûn û nebûna jêder û çavkanîyên pêwîst ji bo me di derbarê beşa duyem ya vê vekolînê dijwarîyeke herî mezin bû. Loma bi naçarî me ji bo berdewamîya vekolînê, xwe sipart (avêt) li ser jêder û çavkanîyên ‘Erebî û Îngilîzî. Dijwarîyeke din jî ji bo me ew bû ku alfabeya nivîsandina romanên alfabeya kurdîya latînî bû, lê digel wan astengîyan jî di dawîyê da di şîyana me da bû ku em hemû wan astengîyan derbas bin û xebata xwe bi dawî bînin.

1. JIYAN Û BERHEMÊN JAN DOST

1.1. Jîyana Wî

Jan Dost di 12ê adarê sala 1965an de li bajarê Kobanî hatiye dinyayê. Xwandina xwe heta lîseyê li kobanî berdewam kiriye. Navê Jan Dost ji kû hatîye. Jan Dost çîroka navê xwe di berhemeka xwe da wiha neqîl dike: *“Di panzdeh saliya xwe de min du helbest bi rêya postê ji bernameyekî radyoya Şamê re şandin. Navê bernameyê “Eqlam Wa`ide” ango pênuşên sozdar bû. Di bin wan helbestan de min navê xwe Can Qadir danîbû. Çiqasî kêfa min hat dema bernamevan got: Mêvanê me yê vê hefteyê Can Qadir e!! Min bang li diya xwe kir û me bi hev re li şiroveyên mamosteyê zanîngeha Şamê Dr. Ridwan El Daye guhdarî kir. Hîn tê bîra min wî digot: Zimanê te baş e, wêneyên te xweşik in, lê ewqase reşbînî ji bo ciwanekî mîna te çima! Min dixwest navekî wêjeyî sivik û nerm ji xwe re peyda bikim. Loma min helbestên xwe ên ku min şandin radyoya Şamê bi navê Can Qadir şandibûn. Nizanim ji ku helbestên Qedrî Can bi dest min ketibûn, min ji wan hez kir û ji navê wî jî. Min got ka ez navê xwe jî mîna yê wî bikim. Min ew nav pêş û paşî hev kir û Can Qadir bi min re derket. Lê ez pê hisiyam ku Qadir navekî ‘erebî ye û ez jî berê ji navê xwe ê ‘erebî direvim û ewê bo min ne minasib be. Min rabû piştî du salan navê Can Pak Dosto li xwe kir (qaşo ji bo ku bişibihe navê Jean Jaque Rousso!). Lê ez jê ne razî bûm, min ew hinekî giran dît. Min Pak jê avêt û ma Can Dosto. Ez nêzîkî du salan bi wî navî re mam, dawiyê min xwe ji (o) ya Dosto xelas kir û navê dî bû Can Dost.*

Navekî romantîk bû, kêfa min jêre dihat lê dema ku min imze dîkir, min ji tîpa (C) hez nedikir. Di imzeyê de nelihevhatî bû. Min dixwest tîpa yekem ber bi jêr de bibim û herim. Rabû min (C) avêt û (J) li şûnê danî û dît ku êdî nav kemmilî û bû Jan Dost. Durustkirina navê min heta ku gihişt vê formê nêzîkî du salan ajot! Û min berhema xwe ya yekem Kela Dimdimê di sala 1986an bi wî navî nivîsî û heta niha ma ew nav. Lê kurdên Rojava û Başûrê Kurdistanê navê min Can hildidin, yê Bakur jî Jan û ez jî ji herduyan hez dikim û dibînim ku ez him Jan im û him jî Can.”¹

Ji sala 1985an heta 1988an li zanîngeha Helebê fakulta zanistê beşa Biyolojiyê xwend, lê ev beşa temam nekir. Jan Dost di deh salîya xwe de dest bi nivîsîna helbestên bi zimanê ‘erebî kirîye feqet di panzde salîya xwe de vedigere li

¹ Jan Dost, *Dîwana Jan*, Weşanxaneya Avestayê, Çapa Duyemîn, Stenbol, 2012, r. 1- 4.

ser zimanê Kurdî. Çîroka wî ya yekem “Xewna Şewitî” li Sûriyê di sala 1993an de di pêşbirka kurteçîroka kurdî de xelata yekem distîne. Herwiha ev çîrok li welatê Tirkîyê jî li ser dikê tê lîstin. Ji bilî wê çîrokê, Jan Dost çend çîrokên din jî nivîsandine. Çîrokên wî “Mistek Axa” ku di sala 2007an de li welatê Almanyayê bû kurtefilm û “Rûyekî Şêrîn” û hinekên din jî çîrokên wî hene.

Jan Dost ji sala 2000 an vir ve li Almanyayê dijî û ji Adara 2009 an şînvatir bûye hemwelatîyê Almanyayê. Niha li bajara Bochumê a heman welatî dijî û karê nivîskarî û wergêrvaniyê didomîne. Zewiciye û bavê dû zarokane. Çend romanên wî li zimanê ‘Erebî, Tirkî, Farsî û Kurdîya Soranî re hatine wergerandin.

Piştî wan kurte agahîyan nivîskar Jan Dost kurte jiyana xwe û xêzanî û rewşenbîrîya malbat xwe wiha didomîne: *“Meha Adarê bû, 12ê mehê bû, sala 1965 an, di êvareke hinekî sar de ez li Kobaniyê, ku li ser sînore navbera Tirkîyê û Sûriyê dikeve ye, ji dayik bûm.² Diya min, a ku temenê wê çil û pênc sal derbas kiribû, hîn ez di zikê wê de bûm dixwest min ji ber xwe bike! Ew hem nexweş bû hem jî bi pîvanên wê demê û wê civakê êdî pîr bûbû û ne layiq bû zarokekê şîr bide! Êdî neviyên wê hebûn û bi gotina wê: Diranek di devê min de nemabû lawo!”³*

Dîsan nivîskar dayîka xwe û xwişka xwe jî ji bo sedema hatina dinyayê û xuyakirina wî wisa girîng dibîne: *“Ew diya heft keç û du kuran bû û pîrka heft heşt neviyan bû û bûbû pênc salên wê ku xwezayî ji zarokanînê hatibû birrîn. Ez zarokê wê yê dawî bûm. Ango yê dehan bûm û navê min li taxa me bûbû “lawkê pîrê”. Diya min a (pîr) ji ber êşên xwe nikaribû min xwedî bike, loma jî xweha min “Wehbiya” xwedîkirina min girte ser xwe û ez bi şîrê firencî yê kîkoz (Guigoz) xwedî kirim.”⁴*

Dîsan nivîskar bingehîya malbata xwe digêhîne bajara Amûdê, dibêje kalkê min ji Amûdê tê Kobaniyê û vê koçê jî wiha neqil dike: *“Bavê min melayê mizgefta Seydan bû. Ew mizgefta ku kalkê min şêx Salih (navê wî li min kirin, û ez bûme yekem Salihê di malbatê de) avakiribû.⁵ Şêx Salih wek xelîfeyekî şêx Ehmedê Xiznewî ji Amûdê berê xwe dabû Kobaniyê (Erebpînar) û li wir dest bi irşada xelkê û belavkirina terîqeta Neqşebendî kiribû û bi hezaran mirîd li dora tekiyeya xwe*

² Bnr.: Nivîskar, eger ne xweheke min ba, min ê nizanîba ez di kîjan rojê de jidayik bûme. Xweha min li ser kitêbekê ji kitêbên bavê min roj û meha jidayikbûna min nivîsibû.

³ Jan Dost, *Dîwana Jan*, r. 1-2.

⁴ Jan Dost, *Dîwana Jan*, r. 2-4.

⁵ Bnr.: Nivîskar, Mehan axayê pîjî parçeyek erd da kalkê min ku mizgeftê ava bike. Ew yek ji axayên navdar bû û berevaniya malbata Seydan kir.

civandibûn. Êdî bibû şêxê herêma berazan. Paşê zarokên wî jî dabûn pey wî (bavê min di nav de) û hemî ji Amûdê hatin û li Kobaniyê, li Kobaniyê bi cih bûn.

Bi hatinan kalkê min re civaka bajêr hate guhertin, dawet êdî qedexa bûn, def û dahol di dawetan de hatin qetandin û zirne hatin şikandin. Govendek li kû li dar biketa, mirîdekî du mirîdan berê xwe didanê û şahî xera dikirin. Civakeke weke ya Taliban hate avakirin. Lê li aliyekî jî zanîn, xwendin kitêb jî derbasî Kobaniyê bûn.

Ez her dibêjim malbata Seydan kitêb û tenûr jî anîne Kobanî, ne tenê ebayên reş. Piştî mirina kalkê min di eylûla sala 1966 an de, bavê min şûna wî girt û bû imam û xetîbê mizgeftê, lê şêxîti nekir. Şêxîti û irşada xelkê teslîmî apekî min bû ku ew jî xelîfê şêx Ehmedê Xeznewî bû.”⁶

Nivîskarê gewre oldarî, feqîrî û salên zarokatîya xwe jî wiha neqil dike: “Di wê mala oldar de ez mezin bûm. Hîn berî ku ez bikevim dibistanê, bavê min Qur’an û Hedîsên pêxember (s.x.l.) bi min didane jiberkirin. Ez pênc salî bûm gava ku bavê min bi destê min girt û ez bi xwe re birim mizgeftê û hişt ez li Mihrebê hedîseke pêxember, ku min jiber kiribû, li pêşîya komeke mêran bixwînim. Min çavên xwe li refîkên kitêban vekirin, di nav hibr û kaxezan de mezin bûm, li ber dengê qesîdeyan û mewlûdan û zîkrê neqşebendî yê bêdeng û di Xitme û Tewecih û Rabiteyan⁷ de zarotiya min ber bi xortaniyê ve hilkişîya. Vê perwerdeya dînî, oldarekî hişk ji min afirand. Ez hinekî ji zarotiya asayî jî bêpar kirim û derdê min tenê Qur’an û xwendina kitêban bû. Tê bîra min diya min tim bi min re dixeyidî û digot: “Lawo tu jî wek hevalên xwe here cadeyê bilîze. Te xêre tu bi ser van kaxetan de xwar bûyî? Te çavên xwe derxistin.”⁸

Li rex xwendina dibistanê bavê min deriyê zanîna olî jî li ber min vekir; eqîdeya Islamê, gramera erebî (Nehw û Serf), zimanê erebî, mêjûya Islamê, sîreta pêxember, ev hemî xwendina min pêkva û digel bûn. Xwendina min heta bekelorya (lîseyê) her li bajarê Kobaniyê bû. Rewşa bavê min a aborî nebaş bû. Wî bi malê zekatê idara mala xwe dikir. Bêparî û mehrûmiya salên zarotiyê ji bîra min naçin. Ez tê digihîştim ku ez di rewşeke nebaş de dijîm, di eynî demê de em heşt xweh û bira diçûne dibistanê. Kincên mezinan li me biçûkan dikirin. Bûyerek zarotiya min heye

⁶ Jan Dost, *Dîwana Jan*, r. 2-5.

⁷ Bnr.: Nivîskar, Xitme zîkrê rojane yê li pey nimêja esrê ye, rabite jî piştî nimêja mexribê ye û tewecih jî rojên duşeman dema ku şêx dihat û xelk didan tobekirin, li dar diket.

⁸ Jan Dost, *Dîwana Jan*, r. 4-5.

hîç ji bîra min naçe. Ez di pola) çaran de bûm, mamosteyê me deftera coxrafiyayê ji me xwestibû, divabû rûpelek wê defterê xêzikî ba ji bo nivîsandinê, yek jî sade ba ji bo kişandina nexşeyên welatan. Min ji diya xwe re gotibû lê wê bersiv min a hercar dabû min: *Ma banka Sûrî bi min re ye?* Min ji bêgavî deftera birayê xwe yê mezin, ku a sala par bû, bi xwe re biribû. Ew qetiyayî bû û pelên wê diweşiyên û têra xwe nivîsên berê li ser hebûn. Dema mamoste deftera min xwest da ku li karê minî malê spartek (meşq) binere, hêrs bû û ew defter bi kerb avête nav ç av û rûyê min. Wê demê xweziyeke tehl di gewriya min de herikî û hêsir di çavên min de biriqîn.

Sala min a yekemîn di zanîngehê de jî, 1984an bû, bi pantelonekî pînekirî derbas bû. Ji bilî van mînakên û gelekên din ên wekî wan, xweşiyên wê demê jî têne bîra min. Mamosteyê darsa diyanetê di pola pêncan de tim ez dibirim klasên şeşan û dihişt ez li pêşiya şagirtên wan klasan Qur'anê bixwînim û digote wan, binêrin ji we biçûktir e jî lê ji we baştir dixwîne.

Xelata yekem di jiyana min de sala 1975 an bû, pênuşeke hibrê û amîrên hendeseye di navenda çanda erebî ya Kobanîyê de pêşbaziya şagirtên Kobanîyê li dar ketibû û ez yê yekemîn bûm.”⁹

Malbata wî xwande û rewşenbîr bû û di mezinbûn û xwandina xwe da rola malbatê gelek girîng dibîne. Romannivîsê me vê serborîya xwe jî wiha rave dike: *“Birayên min yên ji min mestir, Melê Kurd û Ebdulbasit bi wêjeyê re mijûl bûn; dîwanên Cizîrî û Cegerxwîn li ba wan veşartî hebûn. Keşkûlên wan hebûn helbestên kurdî têde nivîsî bûn. Wan bi xwe jî helbest dinivîsîn û dixwendin. Hijmarek du hijmarên Hawarê jî peyda dibûn li ba wan. Min bêtî destûra wan ew keşkûl bi dizî dixwendin û ez bi ser cîhana wêjeyê vebûm. Di dehsaliya xwe de min yekemîn helbest nivîsî. A rast ew du helbest bûn lê bi zimanê erebî bûn. Niha kenê min bi min û wan helbestan tê. Min bawer kiribû ku tiştê min nivîsiye helbest in, loma bi fedî min ew li ber palgeha bin serê birayê xwe yê mezin Melê Kurd danîn. Min dilê xwe xweş dikir û digot wê ew sibe ji xew rabe û gelekî pesnê şarezayiya min bide. Lê sibe hat û tu deng jê nehat. Birayê min yek peyv jî, ne çê ne xirab li ser “helbestên” min negot. Hêviyên min têkçûn û xewnên min şikestin.”*¹⁰

⁹ Jan Dost, *Dîwana Jan*, r. 2-3.

¹⁰ Jan Dost, *Dîwana Jan*, r 3- 4.

Nivîskar ji bo çend malikên dîwana Cizîrî û helbestên Feqiyê Teyran jî dibêje: Diya min bi xwe gelek malikên Mela Ehmedê Cizîrî ji ber kiribûn û ji wan malikan bêtir ev malik dubare dikir ku di bîra min de heta niha mane:

*“Ê ji xeflet te bibînit, kû dimînit heyhat
Te bi çêhvên di belek kuştine mezlûm-i gelek”*¹¹

Wisa jî helbesta navdar a Feqiyê Teyran “Hey Av û Av” jî ji ber kiribû û carcarn dixwend. Ew Qur’anxwendî bû. Her êvar û rojên înan çîrokên Qur’anê ji min re digotin. Ji xwe dîmenê bavê min ji ber çavên min naçe. Ku zivistan bûya, li ber sobê rûdinişt û kitêba xwe li ser kabokên xwe datanî û dixwend. Gelek caran wisa di xew re diçû. Lê ku havîn bûya li ber siya dîwarekî hewşê rûdinişt û dixwend. Civata wî a mela û zanayan bû û tim nîqaşên dînî û li ser kitêban di odeya wî ya biçûk de yan li hucreya mizgeftê li dar diketin”.

Dîsan ji bo despêkirina xwandina xwe Romannivîsê me vê serborîya xwe jî wiha şîrove dike: *“Dema ku ez ji dibistana seretayî qediyam, bingehe min a zimanê erebî êdî xurt bûbû. Min dest bi nivîsîna helbestê kir. Min di deftereke xwe de kovarek çêkiribû û helbestên xwe, gotar û lêkolînên xwe, çîrokên xwe û ceribandîna xwe ku hemî jî bi ‘erebî bûn tê de diweşandin. Ez êdî balix bûbûm, min zarotî li pey xwe hêlabû û fediye ez rapêçabûm. Min hestên xwe vedişartin û helbestên xwe nîşanî birayên xwe nedikirin. Nizanim min ji kê re dinivîsî, lê divabû ew hestên derûnê min derbûbana. Derfeta ku di nava min de bimînin nebû, bêhemd mîna kanîkên biharê diteqiyân û li ser rûpelan diherikîn. Lê ku min dibistana navendî qedand êdî bawerîya min bi min xurt bû û ew kanîyên biçûk tev li hev bûn û bûne çemek. Êdî veşartin nedibû û min çî tiştê ku binivîsîna êdî nîşanî birayên xwe dikir.”*¹²

Digel gelek berhem û xebatên nivîskarîyê Jan Dost rewşenbîrekî piralî û çalake. Hencî romanên gelek mijarên din da jî xebatên ‘ilmî kirine. Her wisa Jan Dost bajara Brukselê jî wek nûçevan û bernamevan di salên 2001-2002 an digel Medya TV û di salên 2009-2010 an da jî digel Zenûbiya TV yê wek rewşenbîrekî kurd xebitiye.

¹¹ Mela Ehmedê Cizîrî, *Dîwana Cizîrî*, (Amadekar: Tehsîn Îbrahîm Doskî), Weşanxanaya Nûbîhar, 2012, r. 232.

¹² Jan Dost, *Dîwana Jan*, r. 3- 4.

1.2. Bajara Kobanî

Herêma Kobanî yek ji herêmên sereke ye li rojavayê Kurdistanê, weke tê zanîn dîrok û hebûna wê diherike hezaran sala. Herêma Rojava jî sê herêman pêk tê. Herêma Cizîrê, herêma Kobanî û herêma Efrînê. Sînorê Rojavayê Kurdistanê jî, ji Dêrîka Hemko, ku li ser sînorê bajara Cizîrê dest pê dike û bi Efrînê diqede. Xelkê Kobanî hemû Kurd in, serdemekê hinek Ermenî hebûn, hinek pîşesaziyên herêmê di destê wan de bû, piştî wana koçî welatê Ermenistanê kir, li bajara Êrîvanê û derdorê vê bi cih bûn. Niha hejmareke pir kêr ji Emenîyan li vê bajêrê mane.”¹³ Herêma Kobanî ji çar navçeyan pêk tê: Navçeya Kobaniyê bi xwe, Şêxên li rojava, Sîrrîn li başûr û Çelebî li rojhilatê başûr e.¹⁴

Piştî şerê cihanê danîna sînor di navbera Tirkîyê û Sûriyê di sala 1921 de, Kobanî bû parçek ji Sûriyê û bi ‘erebî jê re digotin ‘Eyn el-‘Ereb, bi tirkî jî jê re digotin Muşidpınar. Serdema dewleta Sûriyê da bajara Kobanî bi bajarê Helebê ve girêdayî bû. Heleb derdora 150 kîlometran ji bajarê Kobanî dûr bû. Lê belê hinek gundên li dorhêla Kobanî, girêdayî parêzgeha Reqayê bûn.¹⁵

Navê bajara Kobanî ji aliyê dewleta ‘Ereb ve hatiye guhertin û bûye: “Eyn el-‘Ereb” yanî “Kaniya ‘Ereban” an jî “Çavê ‘Ereban”. Lê li gorî hinek kesan navê “Kobanî” ji gotina Îngilîzî (Company) ango kompanî tê. Di salên 1910 – 1920 an de Kampaniya Elmanî ya ku riya hesin ya şimendîfer (trênê) di navbera Berlîn û Bexdadê de li vê heremê bi cî bûye. Ji çiyayê Miştenûrê gundê “Helincê” kevîrên reş ji bo rê derdixistin û dibirin. Piştî re jî, navê Kompanî dibe Kobanî û heta niha jî wisa tê gotin.”¹⁶

Îro bajara “Kobanê” li ser sînorê di navbera dewleta Sûriyê û Tirkîyê de ye. Li hemberî bajarê Sirûcê yê li aliyê Ruhayê ve û nezîkî 160 km li bakurê rojhilatê Helebê ye û 30 km. li rojhilatê çemê Firat e. Firehbûna xaka Kobanî 3000.23 km² ye û bajara Kobanî 100 km. dûrî bajarê Urfayê ye. Ji aliyê îdarî ve li ser parêzgeha

¹³ Dîroka Herêma Kobanî û Jiyana Li Wê Deverê, <https://www.rudaw.net/kurmanci>, Ragehandin:12.05.2020.

¹⁴ <https://ku.wikipedia.org/wiki/Kobanî>, Ragehandin:12.05.2020; Kadri Yıldırım, *Kürt Tarihi ve Coğrafyası I - Rojava* (Dîrok û Erdnîgarîya Kurda 1/Rojava), Stenbol, 2015, r.145-150.

¹⁵ <https://www.rudaw.net/kurmanci/onair/tv/episodes/episode/features>, Ragehandin:12.05.2020.

¹⁶ Ehmed Mustefa, “Rojavayê Kurdistan û Dîroka Wê <https://kurdysria.wordpress.com/> , Ragehandin:12.05.2020.

Helebê ve ye. Li bakurê wê sînore Rihayê ye û li başûrê wê sînore parêzgeha Reqqayê ye, li rojhilata wê sînore herêma Girê Spî (Tilebyed), li rojavayê wê sînore herêma Cerablusê û çemê Furatê ye.”¹⁷

Li gor serjimêriya 2006an de nifûsa bajara Kobanî tevî gund û nahiyên, 460 hezar bû. Her wiha 384 gundên wê hene. Lê bi destpêkirina şerê Sûriyê re, ji sala 2011 ve hejmara xelkê herêmê dibe ku nêzîkî 650 hezar kes be, ji ber ku gelek Kurdên Heleb, Şam, Humus û Hemayê reviyane Kobanî û niha li wir bi cih bûne.”¹⁸

Herwiha niştociyên Kobanî yê û gundên wê bi tevahî Kurd in, ji bilî malbatên mamûrên dewletê yê ji deverên din hatine. Heta salên heftêyan jî kêmi malên Ermeniyên lê hebûn lê yek bi yek bar kirin bajara Helebê an jî welatên din, Ermenistan jî di nav de.¹⁹

Kobanî bi eşîretên xwe navdar e. Hemû xelkê Kobanî ji eşîretan pêk tê. “Eşîreta herî mezin, Beraz in. Beraz bi xwe weke konfederasyona Eşîretan e, di nava wê eşîretên weke Mîran, Kêtikan, Şêxan, Oxî, Dinnan, Zîrwar, Îlêdînî, Şedadî, Mi'ef, Pîjan, Bêskan û gelek eşîretên din jî hene. Berazî heta bi Ruha, Mereş, Entab û Erzûmê belav bûne. Mezinê eşîreta Berazan, Bozan Beg û Hirço bûn. Bozan Beg di dema xwe de parlamenterê Rihayê bû, di meclisa millî ya mezin de li Enqereyê. Biraziyê Hirço, Şahîn Beg, di salên 50yan de li Şamê parlamenter bû. Hirço yek ji damezrênerên Komeleya Xuybûn bû.”²⁰

Piranî gelê Kobanî û piraniya xelkê gundên bi Kobanî yê ve girêdayî xwe bi çandiniyê ve mijûl dikin. Lê di van salên dawîn de li Kobanî yê pîşesazî jî berfireh bû ye. Wan salan jî gelê herêmê “bi çandinî û xwedîkrina ajelan re mijûl dibe. Wek pembû, genim, nîsk, nok, ceh, kuncî, garis (misir), kemûn û gelek tiştên din. Van salên dawiyê jî çandiniya darên “fistîq, mişmiş (qeysî), tirî, henar, hêjîr û tiştên din pêşkêtiye. Dîsan gelê Kobanî bi xebata kolandina bîrên avê bi makîneyên taybet

¹⁷ Dîroka Herêma Kobanî û Jiyana Li Wê Deverê, <https://www.rudaw.net/kurmanci/kurdistan/120720141>, Ragehandin:12.05.2020.

¹⁸ <https://ku.wikipedia.org/wiki/Koban>, Ragehandin:12.05.2020; Dîroka Herêma Kobanî û Jiyana Li Wê Deverê, <https://www.rudaw.net/kurmanci>, Ragehandin:12.05.2020.

¹⁹ Dîroka Herêma Kobanî û Jiyana Li Wê Deverê, <https://www.rudaw.net/kurmanci>, Ragehandin:12.05.2020.

²⁰ Ehmed Mustefa, “Rojavayê Kurdistan û Dîroka Wê, <https://kurdysyria.wordpress.com/>, Ragehandin:12.05.2020.

(Xeraze)naskirîye.”²¹

Li Kobanî gelek kevneşopên dîrokî jî hene weke şikeft, nexşên li ser keviran, hatine dîtin. Du şêrên kevîrîn ên mezin ji gundê Şêranê, ji bo bajarê Reqqayê hatine veguhestin. Di çiyayê Miştenûr de jî gelek şikeftên dîrokî hene, şikefta herî bi nav û bang jî, şikefta Qîzîkan (Keçkan) e.”²²

Ev bajarê kurdan, di 19 tîrmehê 2012’an de kurdan bi tememî dest danî ser hemû sazîyên wê yên rêveberî, leşkerî û sîyasî hemûyan û xweserîya xwe damezrandin. Ev roj, weke roja ku di dîroka Kobanê de û di dîroka kurdan de bi navê Kobanê rojeka dîrokî ya ku ket nav dîroka kurdan de.”²³

1.3. Berhemên Wî

Jan Dost romannivîs, helbestvan, wergêr û lêkolerê kurd e, komek berhemên wêjeyî wek roman û helbest bi zimanê kurdî weşandiye. Niha emê berhemên nivîskar û kurteyekê di derbarê naveroka mijara serekî ya berhemên wî têxine rû.

1.3.1. Romanên Bi Zimanê Kurdî

1. Mijabad

Mijabad berhemeke romannivîs Jan Dost e, bi hecma 239 rûpelî di sala 2004 an da, bi diyalekta kurmançîya jorîn yê zimanê kurdî di weşanxaneyê Belkî çapa wê ya yekem hatîye weşandin. Paşê jî di salên 2012 û 2015 a da çapa duyem û sêyem hatine weşandin. Romannivîs bi jêrnava “Çarçîra” ve dabeş kirîye ku destnîşane ji bo “Qada Çarçîra” ya bajarê Mahabad ku Pêşewa Qazî Mihemmed û hevalên wî lê hatine darvekirin. Ev romana bi pirranî romaneke dîrokî ye û balê dîkşîne ser beşek ji bûyerên dîrokî yên dîyarîkirî yê neteweya kurd ku ew jî qonaxa “Şoreşa Şêx Mehmûd” û “Damezrandina Komara Kurdistanê” ye li Mahabadê. Lê ev bûyerên dîrokî wek belgenameyên dîrokî û vêgerrana dîrokê nehatine pêşkeşkirin. Dibe ku Jan Dost di çarçoweyeke hunerî û wêjeyî da pêşkeşîya wan dike û bûyerên dîrokî yên

²¹ Dîroka Herêma Kobanî û Jiyana Li Wê Deverê, <https://www.rudaw.net/kurmanci>, Ragehandin:12.05.2020.

²² Dîroka Herêma Kobanî û Jiyana Li Wê Deverê, <https://www.rudaw.net/kurmanci>, Ragehandin:12.05.2020.

²³ <https://ku.wikipedia.org/wiki/Kobanî>, Ragehandin:12.05.2020.

wê serdemê tevlî bûyerên taybet yê karakterên serekî yen romana xwe dike. Bi vê jî bûyerên dîrokî mil bi mil digel bûyerên taybet gava davêjin ku di encamê da bergeke hunerî dide romana xwe. Ev jî ji bilî pisporî û jêhatîya Jan Dost bûye sedema wê ku “Gelekî bi hişyarî xebatê bike û zanyarîyên gelekî hûrgil di derbarê bûyerên vê serdemê da derxîne holê, ew ji Rojavayê Kurdistan e lê di vê romanê da ji Rojavayê Kurdistanê bêtir behsa parçeyên din yên Kurdistanê dike, bi taybetî gelekî behsa Başûr û Rojhilatê Kurdistanê dike.”²⁴ Ev jî pisporî û jêhatîya romannivîs bi taybetî di derbarê wesfêkirin û erdnîgarîya bajar û navçeyên Kurdistanê derdixê holê, ji alîyekî din ve jî Jan Dost beşek ji xebata neteweyî Kurda derdixîne ber çavan. Lê di heman demê da jî wêneyê kêmasî û rik û serhişkîya kurdan li hemberî hev nişan dide. Bi taybetî dema ku Badîn Amêdî çend salan li Silêmanîyê dijî, lê hinek ji gelê bajêr jê ra digotin “Badîno, Kurmanco” ku ev jî wê rê dide hevdu qebûlnekirina kurdane li hemberî hev. Herwiha vê rastîya dîrokî jî derdixîne ku kurda xwe dabûn benda şikandina hevdu û li hemberî wê da jî xizmet û pesna dujmin dikirin. Herwiha Jan Dost di vê romana xwe da hinekî behsa nenasîna dîrok û çand û kesayetîyên kurda di nav zaraveyên cuda da dike û vê rastîyê derdixê holê û rexneyê li dîtî û ramanên takekesên kurdên ji parçeyên cuda digre û dibêje: “Ma ne gunêhe ji Xwedê, ên weke Şêx Ehmedê Cezerî, Xalid Axayê Zêbarî û Şêx Nûreddînê Birîfkanî nê naskirin! Ê def û zirne tenê ji Salm û Herîq û ên dî re lêdikevin? Kes li van deveran wan helbestvanên me nas nake, me jî ên van deveran nas nedikarin. Ez nizanîm çima evqas bend û sînor hatine danîn û kê danîne?”²⁵ Ev dîtina Jan Dost wê rastîyê derdixîne ku civaka kurdî bi hemû zarava, ‘eşîret û berên xwe ve gelekî bêxem bûn ku xebata çand û dîrok û wêjeya xwe bikin û girîngîyê nadin van yekana. Bi taybetî jî nenasê kesayetîyên wêjeyî û hunerî yên her parçeyê Kurdistanê bûn ku di encamê da jî dîrok û wêjeya kurdî di çarçoveyekê da ma û sînorên xwe derbas nekirine.

Naveroka romanê behsa jîyana kurekî şoreşger yê navê wî Badîn Amêdî dike ku karakterê serekî yê romanê ye û pirranîya beşa bûyeran girêdayî jîyana Badîn e ku bi eslê xwe ji Amêdîyê ye û ji bavekî kurd û dayikeke ermenî ye. Bavê Badîn, Ênisê Amêdî pêşmerge bû û di dema Şoreşa Şêx Mehmûd da li Silêmanîyê li hemberî îngilîzan dicenge û şehîd dikeve. Paşê dema Badîn mezin dibe hest bi berpirsariya

²⁴ Senger Zîrarî, *Hunera Romanê*, Weşanxaneya Tefsîr, Çapa Yekem, Hewlêr, 2018, r. 216.

²⁵ Jan Dost, *Mijabad*, Weşanxaneya Avesta, Çapa Sêyem, Stenbol, 2015, r. 115.

dîroka ax û neteweya xwe dike. Loma rojekê biryarê dide ku ji Amêdîyê here Silêmanî û çend salan li wir bimîne û di wan salana da beşdarî Şoreşa Şêx Mehmed dibe. Herwiha germahîya şoreşê hebû li dijî îngilîzan, li alîyê din jî demekê Badîn keçeke bi navê Jale li “Navenda Ronakbîrî ya Gelawêj” nas dike û pêda pêda evîndarîya wî li hemberî Jale destpêdike û ta wiha lê tê ku heş û xeyalên Badîn dagîr dike û Badîn jîn û dilxweşîyên xwe bi Jale ve gire dide. Lê dilxweşîyên Badîn heta serî naçin, çimkî rojekê derdikeve holê ku Jale sîxurê îngilîzan e, her bi rîya wan ve jî fêrî kare laşfiroşîyê dibe, bi vê jî Badîn dikeve bêhêvîtiyeke gelekî mezin ta ku rojekê Jale ji nişkave biryarê dide ku ji bo xwendinê here Bexdayê, paşê jî bi rîya çend nameyan agahdarî hevdu dibin lê heta serî berdewam nabe. Bi vê jî dildarîya Badîn bêencam dibe û diqede, loma Badîn piştî wan bûyerana ji Silêmanîyê diçe û digel Mele Mistefa Barzanî, bi rêveberîya Qazî Mihemed li Mahabadê di sala 1946 a da beşdarî bûyerên damezrandina “Komara Kurdistanê” dibe. Paşê Badîn dibe pêşmergeyê Komara Kurdistanê û digel pêşmergeyên komarê li dijî hêrişên desthilatdariya Şahê Îranê dicengin ku şah dixwaze Komara Kurdistanê hilweşîne. Herwiha Badîn di ew çend salên li Rojhilatê Kurdistanê ma, gelekî êş û talî dî û hinek hêvîyên wî nehatine cî, dîsa bi taybetî dema ku evîndarê keçeke bi navê Mujde dibe, heş û xeyalên wî serûbin dibe. Lê di dawîyê da çîroka Mujdeyê jî bi zewaca digel kesekî bi navê Kerîmê Şikakî dawî lê tê û bi vê jî hemû xewnên Badîn dibin wek xeyalên wenda.

2. Mîrname

Ev romana ji 229 rûpelî pêkhatîye û di sala 2008 a da ji alîyê weşanxaneyê Avesta ve hatîye çap û belavkirin. Paşê jî di sala 2012 an da çapa duyem û di sala 2015 a da jî çapa sêyem hatîye belavkirin. Roman bi şeweyekî giştî “Li ser binemaya komek bûyerên dîrokî hatiye danîn û di cihekê erdnîgarîya diyarkirî da behsa qonaxeke dîrokî ya kurdan dike û bi hevdemî pêwendîyên kurdan bi tirk û ‘eceman ra nişan dide. Paşê jî pêwendîya Mîrê Serhedê û neyekser pêwendîya mîrên kurd bi tirk û ‘eceman ra derdixe holê”.²⁶ Nîşandana van pêwendîyana jî bi rîya tevger û bîrûbawerî û rexneyên Ehmedê Xanî ve ji bo xwendevanan ronî dibe. Bi taybetî jî demekê ku pêwendî û nakokîyên Ehmedê Xanî digel desthilat û mîrên Bazîdê

²⁶ ‘Eta Qeredaxî, *Gerran Le Nêwan Waqî’ û Xeyal da*, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2017, r. 327.

dighêje asta herî xerab. Bi vê jî romannivîs dîroka wêneyê hevrikîya rewşenbîr û desthilatîya mîrên kurd dixê ber çavê xwendevanan, her bi vê dîtînê ve dixwaze rexneyê li beşeke pirr ya mîrnişînên kurdan bike, bi wê ku ewqasî mijûlî perçiqandina neteweya xwe bûn e û qasî şûrên xwe li hember neteweya xwe bilind kirine li hemberî dijminên xwe bilind nekirine. Li alîyekî din ve jî romannivîs bi rîya nîşandana bîrûbawerîya Ehmedê Xanî ve, xwendevanan dibe 300-400 sal berî niha, ku dema kurd li deverên cuda cuda xwedî çend mîrnişînan bûn. Lê hevdu qebûl nedikirin û guhê xwe nedidan zana û hizirmendan (rewşenbîr) ev jî bû sedema hilweşandina mîrnişînan. Loma nîşandana wêneyê vê dîrokê li ba romannivîs gelekî tal e û dixwaze nevî û desthilatdarên kurd çewtîyên mîrnişînan dûbare nekin.

Romannivîs di hûnandina vê romanê da teknîk û arasteyeke cuda hîlbijartîye, ku romana xwe dabeşî çend beşan kirîye û ev beşana jî taybet kirîye bi karakterekê/î û di heman demê da karakter bi xwe pêvajoya vegêrrana romanê digre ser milê xwe. Bi wateyeke din erka vegêrrana romanê nespirtîye karakterekê/î, dibe ku rola vegêrrana romanê dabeşî ser hemû karakteran kirîye ku digel Ehmedê Xanî jîyabûn. Bi vê jî romannivîs teknîkeke nû ya vegêrranê bikaranîye ku “Li ser binemaya firevegêr (firedengî) hatîye danîn, ev jî wateya wesfkirina bûyeran e bi çavê vegêrrên cuda ve.”²⁷ Ku vê jî bandor li ser şewaza vegêr çêkirîye û wiha li wan kirîye ku bi alîyê vegêrrên kêmtiştzan ve vegêrrana bûyeran pêşkeş bikin. Li alîyekî din jî romannivîs di rêkxistina beşên bûyeran da ji beşa dawî destpêkirîye, wate pergala zincîreyî ya “sereta – naverast - dawî” têkşikandîye, ku ev jî teknîkeke nû ye romannivîs di romanê da bikaranîye.

Roman ji vê çirke gavê destpêdike ku camêrê rûpoş mijûlî kolandina gorêye ku termê Ehmedê Xanî veşêre, ku li ser milê komek kesane û bervî gorrê tînin û dispêrine axê. Paşê jî li ser rasiyê Mîr ‘Ebdulfettahê Bazîdî ve Şêx Seyfeddînê ‘Ebe Şîn telqînê li ser gorrê dixwîne. Her çiqasî Şêx Seyfeddîn rik ji Xanî digirt jî, çimkî Xanî berdewamî rexne li wan kesana dikir ku dardestî mîr bûn û fermanên xirap yê mîr dianîn cî. Lê tenê Mela Smaîl û Sofî ‘Heyder û Seladdînê Se’haf gelekî hevalên Xanî bûn û bi wefata wî jî pirr xemgîn bûn. Di dirêjîya vegêrrana bûyeran da romannivîs vedigere seretayê û serdema xortanîya Xanî û behsa wê yekê dike ku

²⁷ ‘Eta Qeredaxî, *b.n.b.*, r. 335.

Xanî di xortanîya xwe da dest bi xwendina Qur'anê kirîye û xwe şarezayê dîn û zanistê kirîye û gelek zanyarî xistîye destê xwe. Paşê destûra melatîyê digre û waneya Qur'anê dide Şengê ya keça Hecî Zuhdî, ku paşê jî dildarê Şengê dibe û dixwaze vê ra bizewice. Lê Hecî Zuhdî keça xwe dide zilamekî zengîn bi vê jî Xanî gelekî xembar dibe, ta lê wa tê ku ji hucreya xwe dernakeve derve û berdewamî mijûlî xwendin û nivîsandinê dibe û biryarê dide pirtûkeke bi navê “Mem û Zîn” binivîsîne ku di wê pirtûkê da gelek rexneyan li Mirê Bazîdê dike û wî wek dardestê (sixwer) tirk û farisan nişan dide. Loma dema ku dardestê mîr zane Xanî ev pirtûka nivîsandîye yekser saloxa didin mîr û mîr jî gelekî hêrs dibe. Paşê şevêkê ravêjkarê mîr Mîrza Sebrî digel camêrekî rûpoş û Mela Ferîd diçine ‘hucreya Xanî û dozê lê dikin ew were dîwana mîr ku ji bo ronkirina ew tiştên nivîsandîye. Lê Xanî bi jîrî û jêhatîya xwe ve dardestîya mîr serkut dike û her di vê şevê da camêrê rûpoş fersendekê dibîne û jehrê dixê nav çira Xanî ku bi rîya jehrîkirinê wî bikujin. Lê di rastîyê da ew nebû sedema kuştina Xanî, dibe ku nusxeyek “Şîrîn û Xusrew” ya Nîzamê Gencewî bi xibra (mirekeb) jehrî dinivîsîne û dibe ba Selaheddînê se’haf ta ku bifroşe û Xanî jî wê bikire.

Di dawîyê da jî wê xibra jehrî Xanî kuşt, ne ronkaya çiraya odeya wî, piştî bikaranîn û xwendina pirtûkê roj bi roj nexweşîya Xanî dîyar dibû û lê giran dibû ji ber wê gelekî bandor lê dikir. Her çiqasî Selehedînê pirtûkfiroş diçe Fileyê bijîşk tîne ser Xanî ji bo lê binêre çara wî heye, lê dema File wî dibîne zane jehr tevî xwîna wî bûye û nikare tu çareserîyekê lê bike. Li alîyê din jî dema ku Xanî hest bi rojên xwe yên dawî yên ber mirinê dike, dest bi nivîsandina nameyekê dike û dide destê Mela Smaîlê hevalê xwe ku bigîne Bengînê dergevanê mîr û ew jî bigîne destê Mîr ‘Ebdulfettahê Mîrê Bazîdê. Bengînê dergevan jî dixebitû ku nameyê bigîne destê mîr, lê dema xebera wefata Xanî belav bû Bengîn yekser çû xeberê bide mîr, lê wê gavê mîr xwe amade dikir ji bo biçe nêçîrê, loma mîr beşdarî veşartina Xanî nebû û ji seraya xwe ve dergevanê xwe dişine û dispêrê ku nameye jî digel xwe bibe û bide destê Mela Smaîlê hevalê Xanî, bi vê jî di dawîyê da mîr nameyê naxwîne û heta hetaye be bê soz dimîne.

Her çiqas jî li gor romana Mîrnameya Can Dost da behsa jehr dadana Ehmedê Xanî tê kirin jî lê jîbîlî vê agahîyê tu çavkanîyanda qala tişteki wisa nehatîye kirin. Hêjayî gotinê ye ku Ehmedê Xanî bi awayekî rasterast çûye ser dilovanîya xwe.

3. 3 Gav û 3 Darek

Ev romana ku ji 204 rûpelan pêkhatîye û di sala 2007 an da ji alîyê weşanxaneyê Avesta ve çapa yekem hatîye çap û belavkirin. Paşê jî di sala 2012 an da çapa duyem û di sala 2015 an da jî çapa sêyem ji alîyê heman çapxaneyê ve hatîye belavkirin.

Romannivîs romana xwe dabeşî çend gavan kirîye ku ji “Gava yekem û duyem û sêyem, Guldanka Sewrê, Kevirê Lozanê, gav ku naminin ji bo avêtinê, Sîya Dil ya Kesk, Gava Çarem”. Herwiha romannivîs bi heman awayî romana Mîrname, hêman û kesayetî û xebatkarekî kurd yê wek Şêx Se’îdê Kal dike mijara serekî ya romana xwe û bi rîya pîşandana gava darvekirin û şeva dawî ya jîyana Şêx Se’îd ve komek bûyerên dîrokî û xebat û têkoşînên Şêx Se’îd û hevalên wî derdixe holê. Ji alîyekî din ve jî zilm û zordarîya neteweyên din li ser neteweya xwe ji bo xwendevanan eşkere dike. Bi wateyeke din dema xwendevan romanê dixwînin dikevine kûrahîya dîroka neteweya xwe û zilm û tawanên dujminan li hemberî gelê xwe dibînin. Bi vê jî bi rîya berhemeke wêjeyî ve wêneyê dîrokê dibînin, lê ev nayê wê wateyê ku roman ji alîyê romannivîs ve ne bi tenê vegêrrana dîrokê be. Dibe ku bûyera dîrokî ji bergeke hunerî û bi piştspartina teknîkên romanê ve dixê nav rêzan. Ev jî pisporî û agahîya romannivîs li hemberê dîroka neteweya xwe nîşan dide, him jî wek peyameke neteweyî tê temaşekirin ku takekes, partî û alîyê ramyarî (sîyasî) yên kurda pend û şîretan ji raborîya neteweya xwe werbigrin. Bi taybetî jî dema ku romannivîs du bûyerê mezin yên dîrokî wek “Rêkeftnameya Lozan û Sewrê” dixê nav romana xwe wek mînakeke dîrokî nîşan dide.

Roman ji vê çirke gavê destpêdike ku du leşker digel Şêx Se’îd gavê davêjin û Şêx Se’îd bervî qada darvekirinê ve dibin. Lê digel her gavê da serpêhatî (bîrewerî) û yadgarî yên raborîya jîyana Şêx Se’îd dihate ber çavan ku beşek ji wan serpêhatîyan bidestanîna xewna neteweya wî bû. Beşeke din jî jîyan û serdema feqetîyê û ger û beşdarbûna kom û koz û civatên dinî bû. Ev şeva ji bo Şêx Se’îd şeveke tarî û bêdeng

bû, wek sûravkê di devê Şêx da çirke bi çirke (sanye bi sanye) av zêde dibû, tîbûnê qirrika wî ziwa dikir, di heman gavê da ev her du leşkerên li ba Şêx av berî ser qirika xwe didan û wek qerf ji Şêx ra digotin; “ Çî ye te heta niha av nedîye”, ji alîyekî ve jî serpêhatîyên serdema zaroktîya wî dihate ber çavên wî ku demekê dayik û bavê wî ji bo rojîya remezanê ew agahdar nedikirin û digotin: “Şêx Se’îd hîna zarok e”, ku Şêx her wê demê xwe fêrî tîbûnê kiribû û bê paşîv rojî digirt. Paşê jî dayika wî berdewam dibû li vegêrrana serdema zaroktîyê, bi taybetî jî dema Şêx gavê davêje û pêde pêde mezin dibe û ji bo her tiştî piştî dispêre xwe û êdî bêtirs gav davet, ta wê dema dibe sê salî û digel bavê xwe tevlî civat û kom û kozên mirîdên terîqeta neqşbendî dibû, ji wir nasberê zikir, ‘îbadet û mirîdîyê dibe. Paşê piştî çend salan Şêx Se’îd li Mûşê, li Mizgefta ‘Elaeddîn Beg dewrêşekî Botî bi navê Dewrêş Xidirê Botî nas dike û gelek raman û danûsandinan ji hev werdigrin, ta ku rojekê Şêx Se’îd laşê Derwêş Xidirê Botî li ser Çemê Mûradê dibîne û dema nêzik dibe, dibîne ku Dewrêş di nav çem da girêdayî ye û mirîye. Piştî derbasbûna van bûyeran Şêx biryarê dide ji Mûşê biçe malê, dema ku dighêje ber derîyê mala xwe û li derî dixê keçek bi navê Perîxan ku xizmetkare li mala Şêx derî vedike û Şêx Se’îd dibêje:“-Ez Se’îd im” lê keçik wî nas nake û Şêx jî li wê dinêre ta ku keçik dizvire hundur ba dayika Şêx û jê ra dibêje; - Kesekî bi navê Se’îd e”, îcar dayika Şêx dibêje; “-Ev kurê min e, bihêle bila were hundur”. Lê dema Şêx tê hundur ji ber bedewîya Perîxanê demeke kurt ji heş lê diçe. Paşê bi derbasbûna demekê Şêx dikeve kuranîya xeyalê Perîxanê, lê dilxweşîya wî berdewam nabe çimkî rojekê Perîxan li ber çavê Şêx têwerî bîra di hewşa wan da ye dibe û jîyana xwe jidest dide. Bi vê jî talî li xewn û evîndarîya Şêx tê, paşê Şêx li seborîyên xwe berdewam dibe û vedigere ser xeyalên xwe û bûyerên kuştina Yûsif Zîya û Xalid Beg tîne ber çavê xwe ku çawa hatine darvekirin û herwiha xebera kuştina Xalis Beg bi guleyan bi ber guhê wî dikeve, paşê hemû ew bûyerana Şêx gava xwe ya dawî bervî mirinê davêje û dawî li jîyana wî tê.

4. Martînê Bextewer

Ev romana ji 262 rûpelan pêkhatîye û di sala 2012 an da ji alîyê weşanxaneyê Avesta ve çapa yekem hatîye çap û belavkirin, paşê di heman salê da ji alîyê heman weşanxaneyê ve çapa duyem hatîye belavkirin.

Ev romana ji rêzeromanên Jan Dost da çaremîn romana kurdî ya romannivîse, di vê romanê da Jan Dost bi şewazeke cuda û bi berevajîya her sê romanên pêşî romana xwe hûnandîye. Çimkî mijara serekî ya vê romanê axaftine di derbarê hevrikîya bîrdozî ya dînî li rojhilat û rojava “ku ji ber sedema pevçûna dînî du cemser (qutub) têne holê, cemsera îslamî ku osmanîyan rabertîya wê dikirin û cemsera mesîhîyet (xirîstîyanî) xaçperestan rabertîya wê dikirin. Kûrtirîn ceng ku di vê romanê da hatibe wênekirin, ew cenga li xana Seferşah da ye, musulman û mesîhî cengeke xwînî dikin. Eve cihê têhizirbûnê ye romannivîs dixwaze wê nîşanî me bide ku ew tiştên rojhilat û rojava birêve dibin dîn û bîrdoze, ne cenga navbera du dujminan e. Wate ew cenga navbera dîn û bîrdozên cuda ne, ne rojhilat û rojava bi xwe ne.”²⁸ Bi vê jî Jan Dost di vê romanê da kêmtirîn balê dîkşîne ser mijarên neteweyî yên kurd, ku vê jî wiha kirîye roman di çarçove û rûberê erdnîgarîya kurdan da derbas bibe, ji bilî vê karakterên nav romanê karakterên kurd nîn in, dibe ku karakter helgirê nasnameya rojavayî (Ewropî) ne. Loma dema xwendevan romanê dixwînin wiha dizanin ku ev romana ji aliyê romannivîsekî ewropî hatiye nivîsandin. Çimkî Jan Dost gelekî bi hûrgilî û jêhatîyî ve beşek ji dîroka “Cenga Sî Salî” ya Ewropa û hevrikîyên osmanî û ewropîyan tevî romana xwe kirîye. Li aliyekî din jî jîyana taybet ya Martîn û xewn û hêvî gera Martîn ji bo bidestxistina pirtûka bextewerîyê dike mijara serekî ya romana xwe, loma divê em bibêjin vê romana Jan Dost sînore romana neteweyî derbas kirîye û sîfeteke navneteweyî wergirtîye. Herwiha ji bilî van yekan mijara romanê mijareke cuda ye, dibe ku romannivîs teknîkeke nû bikaranîye ji bo jiyan û wesfkirina karakteran û li jêr rûpelan da perawêzên taybet ji bo wan danîye, ku vê roman ji wesfkirina dirêj parastîye.

Roman behsa jîyana karakterekî bi navê Martîn dike, ku bi berdewamî li dû bextewerî da digere, ji bo vê mebestê jî dixwaze li dû pirtûka bextewerîyê da bigere. Her çiqas ji aliyê bavê xwe da pisporî dînê mesîhîyet dibe û serdana dêran (kilîsan) dike û mijûlî xwendina destnivîsan dibe. Herwiha li dû mirina bavê xwe jî mijûlî xwendina pirtûk û destnivîsên pirtûkxaneya bavê xwe dibe. Lê bi xwendina wan pirtûkana yekê jî nagêje bextewerîyê, loma biryarê dide li cîyên din li dû bextewerîyê da bigere, ta ku rojekê “Hansê pîr” şîretê lê dike û dibêje: “Martîn bervî rojhilata

²⁸ Heme Mentik, Gerran Be Diway Bextewerî Da, https://www.rudaw.net/kurmanci/authors/heme_mentik, Ragehandin:20.05.2020.

ruhanî (ronak) ve here, tu yê li wir bextewerîyê bidest bixî”. Martîn jî şîretê werdigre û bi hevalê xwe Gustav ra biryarê dide digel ew bazirganên diçin rojhilat geştê bikin.

Martîn di geştê xwe da Alberto Dî Silva û Fernando nas dike, paşê jî di derbareyê rojhilat da goft û goyê dikin ta ku digêjine ‘Helebê, lê berî ku bigêjin ‘Helebê karwanê wan rûbirûyê hêrişê koçerên ‘ereban dimîne û gelekî zîyanê dibînin. Paşê dîsa bi rê dikevin û digêjine ‘Helebê û li wir li xanekê dimînin ku li wê xanê bazirganên rojhilat û rojava hevdu dibînin û danûsandinên bazirganî bi hevdu ra dikirin. Piştî bêhnvedanê Martîn û Alberto li kuçe û kolanên ‘Helebê digerin, piştî çend deman Martîn keçeke kurd bi navê Kewser nas dike û dibe evîndarê wê, her Kewser Martîn fêrî ‘erebî dike. Li alîyekî din lênûskeke taybet ya Martîn hebû ku rojane jîyana xwe têda dinivîsîne, lê rojekê lênûska wî tê dizîn û Martîn jî ji ber vê bûyerê gelekî xembar dibe. Rojekê Martîn ji cem Kewserê vedigere dibîne li taxekê du kom pevdîçin, ew jî nizane ji ber çi pevdîçin û ji kalekî dipirse, kal jî bi nîvkenî dibêje vana şa’fî û ‘heneffî ne, li ser pîrsgirêkek dînî pevdîçin. Paşê dizvire malê, li dirêjîya bûyeran da parêzgarê Helebê dizane Martîn xirîstîyan e, îcar tirs dikeve dilê Martîn û loma biryarê dide ku bibe musulman û li koşka parêzgarê ‘Helebê musulmanîya xwe radigihîne, bi vê jî dardestê parêzgar ahengekê li dar dixê. Li alîyê din jî Martîn bi rîya nameyê fêr dibe ku hevalê wî Alberto çûye Bazîdê. Êdî Martîn jî dixwaze ji ‘Helebê here û bi alîkarîya kurdekî bi navê Dawid Yezdanyarê Namzêdî diçin Bazîda bajarê kurdan û demekê li wir dimîne paşê jî diçe Bedlîsê û li xanên wê dimîne ku di wan xanan da pirtirîn hevrikîya bîrdozî bi ber çavê wî dikevin. Heta rojekê Seferşa ji bo şikandina rojîyê hemûyan vedixwine xwarinê û ew jî ji bo şîvê li odeya mezin amade dibin, lê ji nişkave sê mucahîd tîndur û wan destbiser dikin. Îcar musulman û nemusulmanan ji hevdu cuda dikin. Paşê Albertoyê hevalê wî ku xirîstîyan bû li ber çavê hemûyan bi şûr li hember mucahîdan ra dibe û di pevçûnê da têkuştin û serê wî dibirin. Martîn bi vê bûyerê gelekî ditirse û yekser (rasterast) diçe odeya xwe bi şûr qunc kur dike û heta digêje sitûna daye pişt û hesîre û qamîşan wê da dike û xwe davêje jêr û ji destê mucahîdan rizgar dibe.

5. Kobanî

Ev romana ji 408 rûpelan pêkhatîye û di sala 2017 an da ji alîyê weşanxaneyê Dara ve çapa yekem hatîye çap û belavkirin, ev romana bi berawird ji her çar

romanên din li layê qebare ve ji hemûyan mezintir û dirêjtir e, bi heman şeweyê babeta romana Mijabad dîrok bûye naveroka romanê. Lê vê carê dîroka bûyera karesat li ser Kobanî bû û ev bûyera bûye mijara serekîya romanê, ji bilî vê jî romannivîs gelek zanyarî di derbarê hêriş û lêdanên DA'ÎŞ (Dewleta Îslamî ya li 'Îraq û Şamê) li ser Kobanî vedigêrîne. Di heman demê da jî zilm û tawan (te'da) û derbederbûna gel û rûxan û kavilkirina bajêr nîşanî civaka navneteweyî dike û peyamê dide kurdên parçeyên din ku di dîrokê da kurd xwedî dost nebû û nabe jî. Bi taybetî jî demekê ku gelên derdorê hewl didan erdnîgarîya kurdan dagîr bikin û nasnameya wan reş bikin, herwiha peyameke din ya romannivîs rexnekirine li neteweyên derdorê kurdan dijîn. Çimkî gelek car van netewana li ser navê dîn hewla dagîrkirina axa Kurdistanê kirine, çimkî li gorî wan kurd neteweyeke musulman nînin û li pêşerojê da ji bo wan dibe gef, lê romannivîs bi rîya nîşandana mazlûmîya kurdan ve xwest rûyê dîroka neteweyên din vala derxîne.

Ji alîyê teknîk û darijtinê ve roman bi heman şeweyê romana Mîrname bi ser çend beşan da hatîye dabeşkirin ku ji bo her yekê navnîşaneke taybet heye. Lê xala cuda ya vê romanê ji romana Mîrname ew e ku navnîşana beşên romana Mîrname heman navê wan karakterane ku erka vegêrrana bûyeran girtibûn stûyê xwe, lê di romana Kobanî da navnîşana beşan cuda ye. Ji bilî vê jî vegêrrên romanê ji 2-3 kesan zêdetir nîn e, ya/yê yekem vegêrra/rê nedîyar ya/yê romanê ye û yê din jî karakterekî bi navê Jan, ku têgînê li xweyî denge romannivîs dike. Bi wateyeke din tenê di vê romanê da Jan wek karakterekî vegêr û amadebû di nava romanê da erke vegêrrana bûyeran digre stûyê xwe.

Roman ji wê gavê destpêdike ku roja îne ye û Hecî Mislim Heme Zirav û kurê xwe bi hevdu ra destnimêjê digrin û bervî mizgeftê diçin beşdarî nimêja îne dibin, piştî temambûna nimêjê herdu jî vedigerin malê. Dema tîne malê dibîne ku Lewend û Baran ne li malê ne û bi vê jî Hecî Mislim gelekî hêrs dibe û ji jina xwe Xanê dipirse û ew jî dibêje: "Ez nizanim bi kuda çûne", ta ku ji nişkave xuya dibin û tîne hundur, îcar yekser Baran ji bavê xwe ra dibêje ku "Ez li pêy Lewend çûm ku bizanim bi kuda çû ye?", bavê wê jî bi hêrs dibêje: "Lewend bi kuda çû!?" Weke bersîvê Lewend dibêje: "Ez digel du sed sê sed xortî çûme xwepêşandana li dijî rejîmê", bi bihîstina vê axaftinê bavê wî gelekî hêrs bû û jê ra got: "Bila ev cara dawî be tu li dijî

hikumetê raweste, çimkî em baş dizanin ku em nikarin li hemberî hikumetê werin”. Îcar berê xwe da Baran û jê ra got: “Tu şerm nakî, kurê hecî yî nayê nimêja îne û her mijûlî lêdana tembûrê yî!?” Paşê ev denge deng hate birîn, di dirêjîya vegêrrana bûyeran da vegêr behsa Heme Ziravê bavê Hecî Mislim dike ku çawa hatîye Kobanî vedigêrrîne, ku dibêje: “Temenê Heme Zirav 16 sal bû û digel du xwişk û dayika xwe ji Qersê bervî El’ezîzê diçin, lê paşê ji ber cenga osmanî û rûsan, gel şerpeze û derbeder bû, loma ew jî biryarê didin ku ji El’ezîzê herin Kobanê ya li dûgela Surî. Piştî digêjjine Kobanî li wir bi cî dibin û Heme Zirav dikanekê digre û dikandarîyê dike, paşê jî dixwaze bizewice. Lê ji berku weke muhacîran dihate naskirin kesekî nedixwest keçên xwe bidinê. Lê Heme Zirav her di wê bawerîyê da bû ku keçekê ji gelê Sûrî bixwaze, keçek bi navê Xedîce ji xwe ra dî û pê ra zewicî, kurekî wan çê bû û nav lêkirin Salih. Lê ji ber nexweşîyê mir paşê lawekî wanê din bû û navê wî jî kirin Mislim. Herwiha heta Mislim nebibû 4 salî û bavê wî jîyana xwe ji dest da, loma bi şîret (soza) bavê mezin bû û erka xwedîkirin û mezinkirina wî kete stûyê dayika wî û ta ku dayika wî wî dişine dibistana Zer, lê dema dibe xort mijûlî dikandarîya bavê xwe dibe û bi vê jî ji xwendinê dûr dikeve.

Li alîyê din jî dayika wî dinêre ku temenê Mislim gehîşte 21 salî û pêwîste jê ra jinekê bixwaze. Selmaya keça xalê Mislim jê ra dixwaze, xalê wî jî wa zane ku Mislim him zengîn û him jî kurê xwişka wî ye û razî dibe keça xwe dide û di şeveka pêncşemîyê da zewicîn. Lê qedera Selmayê wiha bû ku nikarî bû zaroka bîne, her çiqasî li ser ziyaret û gorên şêx û kesên qenc jî gerîyan lê bêencam bû, loma Selmayê ji Mislim ra digot: Here ji xwe ra jineke din bîne ku tu bibî xwedî zarok. Îcar Mislim jineke bi navê Zergê dixwaze, lê wê jî nikarî bû zarokan bîne û wê jî dev ji Mislim berneda û jê ra got: Here ji xwe ra jineke din bîne. Lê Mislim dibêje: Ka carekê herim zîyareta ‘heccê, dema ez vegeirîyam ezê biryara vê pirsgirêkê bidim. Hecî Mislim piştî jî ‘hecê vedigere Kobanê, îcar dixwaze jina sêyem bîne û ji bo vî karî serdanê li Bajarê Çewligê (Bîngol) dike û li wir jineke bi navê Elîf dixwaze, lê ew jî nikare zarokan bîne îcar bi hevkarîya Îslim û Zergê ve Hecî Mislim jina çaran tîne ku navê wê Xanê bû, Xanê çend kur û keç anî ku navê wan “Heme, Lewend, Baran, Mistefa, Metîn, Rewşen, Xedîce, Bihar” bûn.

Her çiqas Hecî Mislim bû xwedî malbateke mezin ku piştî çend salan malbata wî ji pert û belav bû û rûbirûyê pêşerojeke xirap hatin, bi taybetî jî ku Şoreşa Sûrî li dijî rejîmê serîhilda û gel xwepêşandan dikirin û doza rûxana (guhertina) rejîmê dikirin. Di encamê da gelek xwepêşander hatine kuştin û di berdewamîya rewşê da rêxistina terorîst ya bi navê DA'ÎŞ derket holê ku yek ji armancên wan yê serekî hêriş û dagîrkirina Bajarê Kobanî bû. Lê hêzên kurda li dijî wan rawestîyan, Rewşena 'Hecî Mislim jî dibe şervan û li dijî DA'ÎŞ parastina Bajarê Kobanî dike, lê bi destê Da'îşîyan tê kuştin û serî tê jêkirîn. Baran jî ji ber lêdana tembûrê ji alîyê Da'îşîyan têkuştin, pêşeroja zarokên din jî ji ya Rewşen û Baran û Lewend baştir nebû. Di dirêjîya vegêrrana bûyeran da gelê Kobanî ji tirs top û rûxana malen xwe ji bajêr derdikevin û bervî dûgelên derdorê direvin. 'Hecî Mislim û Xanê û 'Heme û jina wî 'Eyşê û her du zarokên wî Siyamend û Zozan bi pîqaba 'Heme ve berve sînore Tirkîyê diçin. Lê ji ber qerebalixî û girtina sînor ji alîyê tirkan ve li ser sînor radiwestin û ta ku ji nişkave sînor vebû û 'Hecî Mislim û 'Eyşê û du zarokên wê derbasî wî alîyê sînor dibin, lê dayika 'Heme (Xanê) ji ber êşa çongên xwe digel 'Heme biryarê didin ku vegerin malê û sibê zû herin ser sînor û derbasî alîyê Tirkîyê bibin û li wir bibin penaber. Lê dema ku li malê ne bombek li ber mala wan dikeve û banê (seqf) xaniyê wan dirûxe, dayika 'Heme di bin asrêx (banê) da dimîne û jiyana xwe ji dest dide, herweha piştî van bûyerana 'Hecî Mislim û bûk û nevîyên xwe digêjin axa Tirkîyê û li wir di wargehekê da (kemp) bi cî dibin, lê di wargehê da rastî gelek derd û xerîbîyê tên, bi taybetî jî ji ber malbata wî li Kobanê mane û zarokên wî bûne şervanên dijî DA'ÎŞ ê, 'Hecî rojane diçe ser sînor û dixwaze rewşa Kobanê û malbata xwe zanibe.

Li alîyê din jî rewşa 'Eyşêya jina 'Heme Zirav gelekî xirap dibe, bi taybetî dema Mamosta Ehmed Erzaq li wargehê destdirêjîyê lê dike, bi vê jî gelekî ditirse û dixwaze vegere Kobanî, piştî çend mehan şervanên kurd li hemberî DA'ÎŞ ê bi serketin û bajar ji destê wan rizgar kirin, êdî gel jî pêda pêda vedigerîyan bajêr. Di wê demê da 'Hecî Mislim û bûk û nevîyên xwe jî vegerîyan Kobanê û ketin xaniyê xwe, îcar xebitîn ku laşê Xanê ji bin kavi û dar û berê xênî derxin. Herwiha 'Eyşê jî ketibû ber xema mêrê xwe 'Heme ku ka bizane çi bi serî da hatiye, li kuderê ye, mirî ye an zindî ye? Lê negihîşt tû encamê û di dawîyê da jî sibeakê zû çend terorîstên DA'ÎŞ ê digrine ser mala wan û 'Hecî Mislim û 'Eyşê û zarokên wê dikuji.

6. Efrîn

Ev romana Jan Dost jî di sala 2019 a da ji alîyê weşanxaneyê Awestayê ve çapa wê ya yekem hate çapkirin. Roman behsa cenga li ‘Efrînê ya di navbera dûgela Tîrkiye û çekdarên kurda dike, ku di encamê da karesateka (buyereka) mezin hate holê û ji gel gelek kes hatine kuştin û koçber bûn. Di vê romanê da romannivîs rewşa derûnî ya zarokên me vedigêrrîne ku ji ber cengê laş û canê wan di nav azar û êşeke kûr da bûn. Herwiha romannivîs li ser zarê karakterekî bi navê Kamîran bûyeran vedigêrrîne. Di romanê da romannivîs hesta rik jê girtina li dijî cengê li ba xwendevanan çêdike û dixwaze bêje: “Ez li dijî şer im û aştîyê di navbera neteweyan da dixwazim”.

1.3.2. Romanên Bi Zimanê ‘Erebî

1. Pîre Wergêr (Naqosên Romayê)

Ev romana bi zimanê ‘erebî hatîye nivîsandin, paşê wergêranên wê li ser diyalektên kurmançîya jorîn û kurmançîya jêrîn (soranî) yê zimanê kurdî hatîye amade kirin. Roman ji du bergan pêk hatîye û berga yekem bi jêrnave “Pîrewergêr” û bi hecma 141 rûpelî di sala 2018 a da ji alîyê weşanxaneyê Dara ve çapa wê ya yekem hatîye çapkirin. Berga duyem jî bi jêrnave “Naqosên Romayê” û bi hecma 176 rûpelî û li heman weşanxaneyê di sala 2019 a da hatîye çapkirin. Ango her du berg di yek demê da nehatine çapkirin. Romannivîs di her du bergan da jî behsa komek mijarên girîng dike ku bi dirêjîya dîrokê ve pîrsgirêkên serekî bûn ji bo mirovayetîyê, wek: Hevrikîya bîrdozî ya di navbera dînan û şikandina kesayetîyên mirovan. Bi taybetî jî ew kesên bîr û bawerîya wan cuda ne û li derdora wan dijîn, herwiha romannivîs rexneyê li hizra wan kesan dike ku ast û pêgeha civakî û aborî dikin sedemek ji bo keç û kur nagêjin hev. Bi wateyeke din romannivîs li dijî hizra aristokratîyê ye û dixwaze wê peyamê bide ku her sê çînên (tebeqên) civakê “aristokrat, bûrjuwa, proleter” mirov in û bê cudahiya civakî û aborî û siyasî şayenê (layîqê) jiyanê bextewerin.

Li alîyekî din jî romannivîs di vê romanê da karakterekî bi navê “Eşîqê Wergêr” tîne û rola serekîya romana xwe dide. Herwiha girîngtirîn bûyera jîyana ‘Eşîq jî geştîkirina wî ya ji bo dûgela xaçilgiran “Îtalya” ye. Wate di vê romanê da

bûyer bi berevajîya romana Martînê Bextewer in. Çimkî Martîn karakterekî mesîhî ye û ji Ewropa bervî rojhilat “Sûrîyê” diçe û bi heman şeweya ‘Eşîq di geşta xwe da li ser bîr û bawerî û nasnameya dînî ve rûbirûyê komek astengîyan dibe.

Roman ji vê gavê destpêdike ku kesekî bi navê Mihemmed ‘Eşîqê Entakî wek ‘Eşîqê Wergêr yan Pîrewergêr tê nasîn, ku li gundê Meydan ya girêdayî sencana Entaqya ya ‘Helebê dijîya. ‘Eşîqê Wergêr di 13 salîya xwe da evîndarê keçeke bi navê Îster dibe ku ji alîyê Îshaqê misgerê (paqircî, qelaçî) ermenî ve hatîye xwedîkirin û wek keça xwe lê xwedî derdiket. Paşê bavê ‘Eşîq ji bo xwendin û fêrbûna zimanê latînî û îtalî ‘Eşîq dişine Romayê û jê ra dibêje: “Dixwazim tu fêrî her du zimanan bibî û paşê vegere û bibe wergêr û li vir bixebite”. Lê belê ‘Eşîq gelekî dixwaze bavê xwe razî bike ku dev ji vê geştê berde, çimkî dilê wî li ba Îster bû. Loma diçe cem dayika xwe û behsa mijarê dike, lê tu kêrê jê nabîne û dayika wî dibêje ; “-Ji ber cudahîya dînê we hûn ji hevdu re nabin”, êdî ‘Eşîq bêhêvî dibe û biryarê dide vê geştê bike. Şevêkê bêrî geşta wî bavê wî li ba wî rûdine û jê ra dibêje: “Ez zanim tu ji Îsterê hez dikî, lê ji ber cudahîya asta civakî û aborî hûn ji hevdu re nabin”. Çimkî bavê ‘Eşîq bazirganîya kaxezan dikir, lê Îster û bavê xwe karê sipîkirina qap û qaçax dikir.

Di dirêjîya bûyeran da ‘Eşîq bi keştîyekê bervî dûgela xaçhilgiran ve diçe û digêje Îtalya, êdî li wir bi alîkarîya keşe Pols li xwendgeha Marronî dest bi fêrbûna ziman dike. Di destpêka xwendina xwe da rûbirûyê pîrsgirêka bîrdozî ya dînî dibe, çimkî ‘Eşîqê bi eslê xwe musulman e lê bi derbasbûna demê ev pîrsgirêka namîne. Êdî dibe xirîstîyan û li wir dimîne, li Romayê keçeke bi navê “Ebîllîna Donna” nas dike û pê ra dizewice. Lê heta hevsera wî dimire jî nabe xwedî zarok, piştî van bûyerana ‘Eşîq bi berdewamî li mala xwe dimîne û mijûlî wergêranê dibe, ta ku di 70 salîya xwe da biryarê dide vegere wargeha zaroktîyê xwe ku gundê Meydane bû. Paşê ‘Eşîq xweşnivîsekî bi navê Ênisê kurê Êpiş dibîne ku li Bexda rûdinişt, ‘Eşîq dozê lê dike ku heta demekê li ba wî bimîne û li jêr navê “Geşta Xortan Bervî Dûgela Xaçperestan” ve jîyannameya xwe ji bo wî binivîsîne, ji ber rewşa tilîyên ‘Eşîq birîndar bû nikarî bû ev kara bikira. Herwiha dema ku Îster dibihîze ku piştî 54 salan ‘Eşîq vegeryaye gundê xwe, yekser diçe ba wî û çîroka li bende mayîn ya xwe jê re vedigêrrîne, ‘Eşîq jî tenê guhdar dike û tu bersîvekê nadê.

2. Xwînek Li Ser Minarê (Dem ‘Ala Medana)

Ev romana di sala 2014 an da li Qahîreya paytextê Misirê hatîye çapkirin. Romannivîs di vê romanê da beşek ji dîroka kurd û nîştîmanperwerî û wêneyê tepeserkirina vî gelî bi destê rejîma Sûrî li piştî dabeşkirina Kurdistanê nîşan dide. Li alîyekî din rexneyê li partî û alîyê sîyasîyên kurdan dike ku bi berdewamî dijayetîya hevdu kirine û li hemberî hevdu di cengê da bûn.

Di romanê da kesekî bi navê Salihê romannivîs ku wek “romannivîsê bêhêvîyan” nav lê dikir, dest bi nivîsandina romana xwe dike û behsa minareya mizgefta mezin ya bajarê Amûdê dike ku ji çar alîyê çar asayîşa rejîmê ve wek “keftar” nav lê dikirin. Destdirêjî dikirin ser minarê û bi telîzan (lulikan) xwîn ji minarê dirijandin, ku gel bi balkêşî li minareye dinêrîn û wek karesateke mezin dizanîn. Di dirêjîya bûyeran da Salih behsa xwepêşandana gel dike bi armanca azadkirina girtîyan ji girtîgeha birayan, ku di encamê da çend xort di vê xwepêşandanê da şehîd bûn. Piştî berdewambûna vegêrrana bûyeran da Salih behsa dabeşbûna sînorê navbera bakur û rojavayê Kurdistanê dike, di beşa dawî da jî romannivîs Jan Dost bi xwe tê nava behsê û bûyeran temam dike.

3. Otobosa Kesk

Ev romana di sala 2019 an da ji alîyê weşanxaneyê el-Muntessit li bajarê Mîlano ya Îtalya yê hatîye çapkirin. Paşê di sala 2020 a da ji alîyê Tarîq Karêzî ve wergêraye li ser diyalekta kurdîya soranî. Mijara serekîya romanê behsa cenga çend salan ya navbera opozîsyon û rejîma Sûrî û serhildana komên çekdar yê wê DA’ÎŞ û Cephetu’l Nusra dike. Karakterê serekî yê romanê kesekî sivîl e û navê wî ‘Ebûd e û di nav gel da wek Ebû Leyla tê bangkirin. Dema ceng di navbera opozîsyon û desthilata rejîma Sûrî li ‘Helebê destpêdike, ‘Ebûd dixwaze ji ber cengê ji bajêr bireve û diçe nav ew otobosên kesk yê ku ji bajarê ‘Helebê koçber vediguhestin derveyê bajêr. Wê demê Ebû Leyla li otobosê siwar dibe û bi rêve behsa jîyana xwe ya taybet û malbat û zarok û nevîyên xwe dike, ku her yek bi sedemekê dimrin û di dawîyê da ew jî di nav otobosê da jîyana xwe ji dest dide.

1.3.3. Helbestên Wî

1. Qela Dimdimê

Çapa yekem ya vê berhema wêjeyî di sala 1991an da li bajara Bon ya Almanya yê hatîye çapkirin. Paşê di heman salê da çapa duyem a vê berhemê li Stenbolê û çapa sêyem jî di sala 1996 a da li Şamê bi qaçaxî hatîye çapkirin. Çapa çarem jî di sala 2011 an da, herwiha çapa dawî jî ji alîyê weşanxaneyê Avestayê ve di sala 2015 an da hatîye çapkirin.

Ev berhema bi şêweyê cote serwa (qafîye) ve hatîye nivîsandin. Naveroka vê berhemê di derbareyê çîrok û destana Qela Dimdimê ye û rol û qahremanîya ew kesên beşdarê vê destanê bûne nîşan dide. Li alîyekî din jî Dimdim wek kela xweragirtina (xweparastina) kurdan li hember neteweyên din nîşan dide.

2. Sazek Ji Çavên Kurdistan Re

Ev pirtûk ku bi zimanê ‘erebî û kurdîya kurmancîya jorîn li Sûrîyeyê di sala 1994 an da çapbûye. Orjînalê ew bi kurdî ye û bi ‘erebî jî hatîye wergerandin. Helbestên di vê pirtûkê da di navbera salên 1989 û 1992 an da hatine nivîsandin, ew helbest bi temamiya xwe helbestên neteweyî û welatperwerî ne.

3. Dîwana Jan

Ev dîwan ji alîyê weşanxaneyê Semakurd ve di sala 2010 an da hatîye çapkirin, ku navenda wê li welatê Dubaîyê ye. Paşê jî ji alîyê weşanxaneyê Avesta ve çapa duyem di sala 2012 an da hatîye amadekirin. Hecma dîwana ku ji sed û pêncî rûpelî pêk tê gelek helbestên klasîk di xwe de dihevwîne, ew helbest di navbera salên 1987 û 1995 an de hatine nivîsîn û di pêşgotina vê dîwana klasîk de, Jan Dost balê dikşîne ser perwerdeya xwe ya wêjeyî ya li malê û bandora klasîkên kurdî li ser wî û helbestên wî û herwiha devjêberdana xwe ya helbestê jî destnîşan dike.

1.3.4. Werger û Lêkolînên Wî

1. Mem û Zîna ‘Erebî: Çapa Yekem, Şam, 1995, Çapa Duyem, Beyrût, 1998, Çapa Sêyem, Dihok, 2006, Çapa Çarem, Şam, 2008, Çapa Pêncem, Qahîre / Misir, 2014.

2. Şî’ir û Şu’era (Muxtarat Min el-Şî’ir el-Kurdî el-Qedîm û el- Mu’esir): Pirtûkek Biblografî Li Ser Helbestvanên Kurd yên Kevn û Nû. 1991, Sûrî

3. **Mehabad Ber Bi Olîmpîyata Xwedê:** Stenbol, 1996, Helbesta Selîm Berekat, Wergerandina Bi Kurdî, Weşanxaneya Avesta.
4. **Beda' el- Luxe, Ferheng Kurdî -‘Erebî:** Wergerandin ji Farisî, 1997, Sûrî, Çapa Qedexe.
5. **El- ‘Hedîqe el- Nasiriyye Fî Tarîx û Coxrafya Kurdistan:** Wergerandin ji zimanê Farisî, bi ‘Erebî, Weşanxaneya Aras, Hewlêr, 2002
6. **Sirûda Baranê:** Helbestên Bedir el-Seyyab, Wergerandin ji ‘erebî, Stenbol, Avesta, 1995
7. **El-Durr el-Semîn Fî Şer’hû Mem û Zîn:** Werger û Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî Bi Zimanê ‘Erebî, Dihok, Weşanxaneya Spîrêz, 2006.
8. **Adatu’l Ekrad, Rîsale fî’l ‘Adat el-Ekrad ve-Teqalîduhum:** Pirtûka Mele Mehmûdê Bazîdî: Adat û Risûmatname Ekradiye, Abû Dabî, 2010.
9. **Adat û Risûmatname Ekradiye:** Pirtûka Mele Mehmûdê Bazîdî, Wergerandina ji bo tîpên latînî û ravekirin, Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol, 2010.
10. **Mem û Zîn:** Şîroveya bi kurdiya îro, Avesta, Stenbol, 2010.
11. **Ferhenga Kurdistanî (Kurdî-Kurdî):** Nûbihar, Stenbol, 2010.
12. **Mitahe el-Cin:** Wergera romana Hesenê Metê ya Labîrenta Cinan ji bo zimanê ‘Erebî, Kalima, Abû Dabî, 2013.
13. **Rimad el-Nicum (Ariya Stêrkan):** Kurteçîrokên Hilbijartî, Belavkirina Meqam, Qahire, Misir, 2014.
14. **Weten Min Tebab:** Mijabad, Bi ‘Erebî, Qahîre, Misir, Belavkirina Meqam, 2014.
15. **Perik:** Romana Selîm Berekat ji ‘Erebî, Weşanxaneya Ayrinti, Stenbol, 2015.
16. **Şer’ha Dîwana Cizîrî:** Wergerandina Jan Dost, Weşanxaneya Dara, Diyarbekir, 2018.

17. Xanî û Cizîrî: Du Stûnên Wêjeya Kurdî: Weşanxaneya Dara, Diyarbekir, 2018.

1.3.5. Kovar, Rojname, Fîlim û Şanoyên Wî

Kovarên Wî:

1. Torevan: Edîtor, Sûrî, 1986-1987

2. Welat, Welatê Me û Azadiya Welat: Nûner û Nivîskar, 1992-2002

3. Avesta: Edîtor, Almanyay, 2000-2002

4. Pêl: Edîtor, Almanyay, 2003

5. Diyarname: Qunciknivîs, 2007-2012

6. ‘Hecelname (‘Hicilname): Edîtor, Swêd, 2003-2005

Fîlmên Wî:

1. Mistek Ax: Ev çîroka Jan Dost ji hêla derhênerê kurd Şiyar Ebdî li bajara Hewlêre bû kurte fîlim.

Şanoyên Wî:

1. Çîroka Xewna Şewitî: Vê çîrokê xelata yekemîn di pêşbirka çîroka kurdî li Sûrîyê di sala 1993 an da wergirt. Dîsan li welatê Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê bû şano û li ser sekoyê hate pêşkeşkirin.

2. WESF DI ROMANÊ DA

2.1. Têgeh û Pênaseya Wesfê

Peyva wesfê di bingeha xwe da peyveke ‘erebî ye. Bi sedema bandora zimanê ‘erebî bi ser zimanên din yên herêmê heman şêweya peyvê weke xwe di gengeşî û axaftina axivbêjên rojane yên van zimanan da bikar tê. Herwiha di nav warên lêkokînan rexneyî yên wêjeya kurdî, farisî û tirkî da jî gelek caran bi heman şêweyê wek biwêjêke wêjeyî tê bikaranîn. Di ferhengên zimanê kurdî da bi vê şêweyê wate û armanca wesfê hatiye kirin. Di ferhenga “Henbane Borîne” da bi wateya “wesf, pesn”²⁹ hatiye bikaranîn ku bi piranî armanca “sitayîşkirin, pesinkirin, ciwankirin û berhevdanê” dide. Herwiha di ferhenga “Kurdistan Mukrîyanî” da jî bi heman wateya wesf “pesndan”³⁰ hatiye. Wate di zimanê Kurdî da peyva wesfê bi piranî bi armanca “pesndan, halan û ciwankirin û berhevdanê” hatiye bikaranîn. Di zimanê ‘erebî da jî peyva wesfê li gor ferhenga “el-Lîsan el ‘Ereb” da bi wê wateyê hatiye ku “ji pesindana tiştan pêk tê ji bo ciwankirin û bedewkirin, berçavkirin, derxistin û eşkerekirin.”³¹ Herwiha di ferhenga “Mu’cemu’l Wasît” da jî bi wateya “wesf el-şey wesfa”³² hatiye bikaranîn ku wateya pesna tiştan kir, pesinî, behsa alîyên baş kir. Li gorî wateya her du ferhengan wesf di çarçoveya gelek tiştan da maye ku armanca wan nişandana, wêneyekî zîhnî ye yan jî pesndan li oxira berçavkirina tiştên pesnê wan tene dayîn û nişandaneke eşkere ji bo kesên hember ku bi asanî ew tiştên pesna wan tenekirin bixwînin. Herwiha di zimanê Îngilîzî da jî ji bo têgeha wesfê peyva “description” tê bikaranîn, li gor ferhenga “Oksford” wesf wiha tê watekirin: “Her perçe nivîsek behsa tiştêkî yan kesekî/ê bike yan bixwaze tiştêkî ji bo me di derbarê wî/wê kesî/ê da derxe jê re dibêjin wesf.”³³ Wate li gorî vê ferhengê her nivîsek di derbarê tişt û kesan da be dikeve nav çarçoveya hunera wesfê û pêvajoya wesfêkirinê bi rêya wesfker û wesflêkirî ve bi rêve diçe.

²⁹ Hejar Mukiryani, *Henbane Borîne, Ferhenga Kurdî-Kurdî- Farisî*, Weşanxaneya Siruş, Çapa Heştam, Tehran, 1369 Hetawî, r. 923.

³⁰ Gîw Mukiryani, *Ferhengî Kurdistan*, Weşanxaneya Rojhilat, Çapa Duyem, Hewlêr, 2017, r. 1279.

³¹ El- 'Alame İbn Menzur, *Lîsan el- E'reb el- Muhît, el- Mucelîd el- Tasîh*, Dar el- Hedîs,, Qahîre, 2003 r. 319.

³² Mecme el- Luxe el- ‘Erebiye, *Mu'cem el Wasît*, Teb’ el- Xamîs, Mektebe el- Şîruq el- Dewliye, Qahîre, 2011, r.1080.

³³ A.S. Hornby, *Oxford Advanced Learners Dictionary*, Intisharat, Ziban Beyn Milal, Tehran, 2000, r.339.

Ji ber ku mirov weke rûhberek (mexluq) civakî di jîngeh û rewşên cuda da jîyaye ev jîngeh û rewş jî mirov neçar dike ku xwe bavêje dextlê wesfê, ji bo wê wek xelekekê pêwendîya di navbera xwe û tişt û cîhên li derdora xwe da bikar bînin. Di serda jî wesf wek têgeheke girîng bi hatin û peydabûna mirovan li ser erdê derketîye û girîngî standîye. Ji ber vê yekê dîroka wesfê digel yeke wê şeweya ku dema mirov ji bo nîşandana rewşa xwe û derdorê û herwiha ji bo rewşa kes û tiştan jî xwe davêjin dextlê wesfê ku ev jî bo guftugo û nîşandan hemû rûyên jîyanê ye. Kewate wesf di jîyana rojane ya mirovan da roleke xurt lîstîye bi wateyeke din wesf wek qanaleke pêwendîyê alîyên wesifkirî ji bo tişt û kesên wesf ji bo wan hatine kirin derdixe holê. Ev wesf jî hemû bi rêya materyaleke girîng bi rêve diçe ku ew jî ziman e ji ber ku “wesf kurê ziman e û herwiha derbirîna îfade ciwan jî keça wesfê ye û berhemeke bêhempa ye xeyal û ziman e.”³⁴ Ev jî tê wê wateyê ku wesf ji hinava ziman ji dayik dibin û bi rêya ziman jî wesfan rê didin. Çimkî ziman ji peyvan pêk tê û peyv jî ji çavkanîyên hişyarî ji bo têgeyiştina hemû ew tiştên di jîyana rojane ya mirovan da rû didin. Lê ew ziman û wesf jî bi pê qonax serdeman guherîn bi ser da hatîye û li gor rexnegir û lêkolerên warê wejêyê pênasîyên cuda cuda ji bo wan hatine kirin. Ev jî ji bilî hatina biwêja wesf ji bo nav wêjeyê jî wek biwêjeke wêjeyî di navbera form û cûreyên wêjeyê bi şewazên cuda cuda derketîye û bandora xwe li ser cûreyên wêjeyê hîştîye.

Dema ku em bala xwe didin hunera wesfê di cûreya helbestê da em dibînin ku bi şewazên cihê derketîye, mohlet û qada bikaranîna wê di nav nivîsên têkistê helbestê da sînordar bûye. Ev jî pêwendîya wê bi xwezaya siruştê vê cûreya wêjeyî ve heye. Çimkî pêvajoya wesfê bi rêya ziman bi rêve diçe, ziman jî wek yeke û hêmaneke girîng ya wêje û helbestî bi piranî di çarçoveyeke sînordar da dixebite. Herwiha xweza û xebata ziman di nav nivîsên helbestî da gelekî û nerastewrast in. Her demê bi şeweyekê yekser wate û eşkerebûna xwe diyar nake. Di vir da derdikeve holê ku wesf jî di helbestan da pir û tijî ne û bi çend peyvan xwe rê didin yan jî ji bilî helbestên destanî wesf di helbestan da zêde kurtin û weke sînorê çend rêzan di xwe da digrin. Mecîd Seîd; “Ji ber ku di destanan da helbestvan ji bo rêdana hinek alîyên kesayetîya pêlwan û kesên din û herwiha ji bo nîşandana hûrgilîyên rûdawa serekî di

³⁴ ‘Ebdulmelîk Murtaz, *Fî Nezerîye el- Rîwâîye Be’hs Fî Teqnîyet el- Serd*, Dar el- Me’rîfe ‘Alem, Kuwêt, 1988, r.255.

nav destana xwe da dîsa têkilî hunera wesfê dibin, yan jî hinek alîyên wesfê bikar tînin.”³⁵ Kewate wesf bi şêweyekî berfireh û dirêj da tenê di forma cûreya destanê da derdikeve û heta pîvanekê di formen helbestên lîrîkî, dramayî û hînkarî da jî derdikevin. Çimkî di van formên helbestan da pêvajoyê û sînora kême ku heta wesf bi daxwaza xwe di pêşkêşkirina cûreyan da hemû armancên xwe pêktîne.

Wek ku me jî got wesf di cûreya helbestê da di çarçoveya çend peyv û rêzan da dizîvire. Herwiha ev hunera di forma çîrokên kurt jî xwedî pêvajoyê û qadek bêsînora nîne û di wesfkirina bedewkirin û ciwankirinê da serbest nîne ji bo tekstan. “Ji ber vê yekê wesf bi berfirehî giringî nedanê. Çimkî pêwîstî bi wesfkirinê heye bi taybetî wesfek wiha be ku bandorê li fezaya dem û çîrokê bike. Dibe ku wesf bi tenê di xebata nasandin û pêdana wêneyekî berçavkirî li ser kesayetîya/ê wesfeke gelekî dûr û dirêj di xwe da nagire. Ev jî ji ber hûrgilîya rûdawê ye ku tenê bi hevokekê yan jî bi peyvekê tê destnîşankirin.”³⁶ Lê wesf di cûreya romanê da bi şêweyekî yekcar cuda derdikeve ku pêwendîya wê bi xweza û forma vê janrê ve heye. Çimkî pêvajoyê û sînora romanê bi awayekî berfireh çêşnên wesfê di xwe da digire û bi qonax û deman guherîn bi ser van wesfana da hatine. Herwiha rol û giringîya dayîna wesfan di dîtina romannivîsan da cuda cuda bûye. Wate her romannivîsekî ji alîyê xwe da bi awayekî cuda temaşeyî hunera wesfê kirîye. Weke mînak romannivîsên serdemên kevn ku bi “romannivîsîya zarlêkirî” tê navkirin. Bi şewaza armanca ciwankarî û xemilandina gotaran bikaranîne û rehendeke (alî) rewanbêjî pê bexşîye. Ev jî wê derdixê holê ku wesf di wê qonaxa romanê da him wek wesfeke mijarî û him jî di xebat û xizmeta rêya pêşketina ziman û ciwankariyê da bûn wek li cem nivîskar, rexnegir û lêkolînerên kevn yê ‘ereban da armanca wan ji bo wesfê “nîşandan wêneyê derveyî rewşekê yan şêweyek ji şêweyên ku ji wêneya materyalî ya cihana derveyî ku diguhere bervî wêneyekî wêjeyî bi armanca honandina ziman û pêkhatina ciwanîya şewaza wê.”³⁷ Wesf di vê qonaxê da bi taybetî di romanê da wêneyekî dîmenî yê kes û cîh û bûyeran bû, ew wêneyê jî hemû têgîna asta rûyê derveyî kesayetîyan bû. Çimkî

³⁵ Beyan Mecîd Se’îd, *Bunyadî Wesf Le Romanî “Şar”î Husên ‘Arif*, Nameya Masterê, Kolêja Ziman, Zanîngeha Silêmanî, 2014, r.15.

³⁶ Azad Mihemed Se’îd, *Kurtîle Çîrokî Kurdî Le Başurî Kurdistan 1970 - 1979*, Weşanxaneya Şehab, Çapa Yekem, Hewlêr, 2013, r. 149.

³⁷ ‘Ebdulmelîk Murtaz, *Fî Nezerîye el- Rîwaye, Be’hs Fî Teqniyet el- Serd*, r. 289.

“wesf nûçeyeke ku bi devê xuyanî ya wesfkirî dipeyive û digîne wergir.”³⁸ Di vir da wergir jî “xwendevan” e ku romannivîs bi rêya vê wesfê ve erka rêdana agahîyên rûyê derveyî kesayetîyên nav romanên pêşkeş dike.

Weke mînak: Di sedsala hîjdeyan da dema ku romannivîsan wesfên xwe di nava berhemên xwe da bikardianîn armanca wan bi piranî ew bû ku “bi rêya derxistina pirtirîn taybetmendî û pêkhateyên bi şeweyekî bibin sedema derxistîneka zindî û çalak.”³⁹ Ev dîtina kûr û dûr ya nivîskaran di vê qonaxê da ji bo wesfê kirine wê derdixê holê ku armanca wan ew bû ku “ji dîtina bîr wêneyekî hizrî û wêneyekî dîtbar û tevgerî pêşkeşê me biken.”⁴⁰ Ji ber vê yekê ye ku nivîskar û romannivîsên qonaxa piştî sedsala 18’an, li ser heman rîtmên wesfên ji bo wesfkirîyan berdewam bûn, heman dîtî û ramanên wan ji bo nivîskarên pêş xwe hebûn di qada wesfê da. Herwiha bi şeweyekî zêdetir bi pêdagirî li wesfa dîtbarî kirine. Her wek di çîrok û romanên nivîskarên sedsala 19’an di wêjeya firensî da dihat dîtî bi taybetî jî li alîyê Balzac ev cûreya wesfê zêdetir dihat dîtî ku bi piranî “wesfa mal û tişt û miştên nav mal û salon û ode û cih bi giştî dûr û dirêj bûn.”⁴¹ Ev wesfana jî hemû ji bo xemilandî û diyarkirina dekora derveyî tiştan bû, ta ku bikaribin wêneyekî dîtbar pêşkeşî xwendevanan bikin. Bi vê yeke jî wesf di vê qonaxê da xwedî erka xemilandî û qîm pênanê bû. Lê di qonaxên paş sedsala 19’an xwendî û raman û têgehîştina romannivîsan ji bo wesfê guherî û giringîya wesfê kete ber çerxa guherînê û bû beşeke serekî ya binyata hunera romanê. Herwiha wek huner û teknîkek serekî li teorîya romanê dihat temaşekirin.

Piştî serhildana rêbaza pêla hişî (hişyarî) di serê sedsala 20’an da ku romannivîsên wek James Joyce, Marcel Proust û Virginia Woolf rabêrên vê rêbazê bûn. Bi taybetî di pêşkeşkirina wesfên kesayetîyan û şewaza birgên wesfê li alîyê kurtî û dirêjî gelek guherîn hatin holê ku ev jî bû sedema wê yekê ku bi temamî guherîn bi ser araste û şewaza wesfê da were. Çimkî bi piranî armanca romannivîsên

³⁸ Perî Salih Muftî, *Gêranewe Le Çîrokekanî Ehmed Mihemed Îsmail Da*, Weşanxaneya Hacî Haşim, Hewlêr, 2013, r.172.

³⁹ Philipe Hamon, *Fî El- Wesfî*, Wer.: Se'd El- Tirîkî, Matebe'e Sutîba, Çapa Yekem, Tûnis, 2003, r. 23.

⁴⁰ Karwan Mehdî 'Usman, *Teknîkî Wesf Le Romanekani Bextîyar 'Elî Da*, Nameya Master, Kolêja Ziman, Zanîngeha Koyê, 2008, r. 17.

⁴¹ Alan Robbe Grillet, *Çîrokî Niwê, Însanî Rêbazî Niwê, Tîyorî Roman*, Wer.: Husên Şêrbegî, Weşanxaneya Rojhilat, Çapa Yekem, 2011, Hewlêr, r. 67.

ser vê rêbazê ew bû “kesayetîyên di nav romanên xwe da bi rêya wesfkirina alîyên hizrîya kesayetî ve bi xwendevanan bide nasîn.”⁴² Di vir da jî hem pêvajoya vegêranê bervî têkçûnê diçe hem jî wesf bi piranî bi rêya arasteya jihevçûnê bervî hinav û derûnîya kesayetîyan gava davêjin. Ji alîyekî din ve jî ev jihevçûn û guherîna di pêşkeşkirina wesfan da rû dide dibin sedema wê ku romannivîs xwe jî wesfên dûr û dirêj biparêzin û nakevin pêy wê yekê ku romanên xwe li alîyê rûpelên wesfîrî û bi berdewamî li alîyê hecma romanê berfireh û mezin bin. Çimkî alîgirên vê rêbazê hana (teşwîq) li romannivîsan dide ku wesfên xwe bi awayekî di nav teknîka vegêranê da nîşan bidin ku sistî û xavîya vegêranan bandorê li xwendevanan neke û wan bêzar neke. Ev jî wêrekîya romannivîsan di hilbijartina şewaza wesfan da dibire û divê romannivîs çavdêrîya rewşa kesayetî, cî û bûyerên nav romanên xwe bikin û bi piranî bi rêya nîşanîya wesfên xwe pêşkeş bikin. Wate divê hevahengî di navbera romannivîs û xwendevanan da hebe bi taybetî di beşdarîbûna xwendevanan di wê çarçove û kîteyên wesfên ku pêşkeş kirine, awayekî azadî ji bo xwendevanan hiştîne. Ji ber wê yekê xwendevanan jî di vê qonaxa wesfê da hest bi awayekî azadîyanê kirine ku ew hizirîn û ramînên di ew kîteyên wesfane yên ku ji alîyê romannivîsan ve xistine rû. Çimkî eger di raborî da xwezaya wesfê bi wê awayê be ku “xwazyara wênehilgirtinê di rasteqîneyê da be”⁴³ û bixwaze xwendevanan bi kîteyên wesfên xwe ve gire bidin. Wek ku bixwaze wêneyekî rasteqîne yê kes û cîh di hizra xwendevanan da bipeyitîne. Ew di wesfa nû û pêla hişî da bi wê şeweyê nîne. Dibe ku xwendevan heta radeyekê azadin bawerîyê bi ew kîteyên wesfî yên kes û cîh bînin. Ev jî tê wê wateyê ku pêdagirî di dirêjîyê da nîne. Herwiha hevahengîya xwendevan û nivîskar di vê cûreyên wesfan da bi piranî diyar dibe.

Ji ber vê yekê bi qonaxan wesf wek huner û teknîkeke vegêrana romanê guherînên mezin bi ser wesfê da hatîye. Xuyaye ku pêwendîya van guherînan bi xweza û pêşketina guherîna wêjeyê ve heye. Ev jî dibe sedema wê yekê ku dîtîna û ramanên rexnegir û lêkolerên ji bo nasandina biwêja romanê ji hev cuda bin. Çimkî hinek ji wan wesfê bi tene di çarçoveya wêneyekî zimanî da dibînin ku bi rêya peyvan ve tê diyarkirin.

⁴² Diyar Faîq Mecîd, *Bunyatî Wesf Le Romanî Rêgay Mihemed Mewlud Mem Da*, Nameya Master, Kolêja Perwerdey Îbn Ruşd, Zanîngeha Bexda, 2007, r.16.

⁴³ Alan Robbe Grillet, *Çîrokî Niwê, Însanî Rêbazî Niwê, Tîyorî Roman*, Wer.: Husên Şêrbegî, r. 70.

Roland Barthes'ê rexnegirê firensî di pirtûka xwe ya bi navê “Çêja Nivîskarê” da bi vê şeweyî li wesfê dinêre û tê da dibêje: “Wesf lîstikeke ji hêmbêza nivîskar e û diguhere ji bo çêja nivîsandinê.”⁴⁴ Armanc di vê pênaseya Barthes da ewe ku hemû wesf çavkanîya serhildana xwe bi rêya ziman bidestxistine. Herwiha bi rêya vî zimanî jî wesf çêjbexş dibin. Bi wateyeke din jî Roland Barthes dixwaze bibêje ku wesf li oxira ciwankarî û alîyên xemla nivîsandinê jidayik bûne û xebata pêdana çêja nivîsandinê didin.

Andre Breton, bi vî awayî di “Manîfestoya Suryalîzm” da pênaseya wesfê dike û dibêje: “Wesf wek ew wêneyên di nav katalogan da li tenişt hev hatine danîn û nivîskar bi daxwaza xwe wan bikar tîne.”⁴⁵ Armanc di vê pênaseyê da bi piranî nîşandana wesfê ye wek nîgarkêşan û wêneyekî dîtbarî yê realistî ye. Bi wateyeke din li gor ramana Andre Breton wesf qalibekî diyarkirî ye ku divê xwendevan ji çarçoveya wan wesfana derneçin û digel gavên romannivîsan gavan bavêjin.

Nicolas Boileau⁴⁶ di derbarê wesfê da dibêje: “Wesf wek beşek pûç ya pile yan jî astekî ye.”⁴⁷ Çiqas jî ev ramana Boileau wê derdixe ku di nav romanên da li dijî wesfê pir radiweste lê li alîyekî din jî ramanekê wî ya din jî heye ku şîretan li nivîskaran dike û dibêje: “Ji bo zengînkirin û mezinahîya asta nivîsên xwe wesfê di nav berhem û nivîsên xwe yê wêneyî da bikar bînin.”⁴⁸ Wate ev ramanên dijî hevdu yê Boileau ku li alîyekî bangewazîya bikaranîna wesfê û olana wê di nav berhemên wêneyî da dike û li alîyekî din jî behsa pûçî û bêwateyî ya wesfê dike. Ev hemû wê derdixe ku tev hikmetek bi pîrbêjî di felsefeya wesfî da tune ye yan jî wesfa pîrbêjîyê di pêgeh û pileya hunera wesfê da kêmtir dike. Xuyaye armanca di vê pajebûnê ya wesfê li ba Boileau bi piranî wesfa destan û romanên zarlêkirî bûn ku ne wek bi rêjeyeke sedî sed li dijî wesfê bû belkî bi xwe hana nivîskaran daye ji bo bikaranîna hunera wesfê di helbest û cûreyên din yê wêneyê da.

⁴⁴ Roland Barthes, *Çêji Deq*, Wer: Îsmail Zarihi, Weşanxaneya Minare, Ç. Yekem, Hewlêr, 2007, r. 53.

⁴⁵ Muhsîn Ehmed 'Umer, *Ferhengî Edebî*, Weşanxaneya Rexneya Çawdêr, Silêmanî, 2012, r.300.

⁴⁶ Nicolas Boileau: Rexnegirê Frensî ye û xwedîyê pirtûka "Hunera Helbestê" ye, di sala 1636 li bajarê Parîsê ji dayik bûye û di sala 1711ê de koça dawî kirîye.

⁴⁷ Philipe Hamon, *Fî El- Wesfî*, Wer.: Se'd El- Tirîkî, r.137.

⁴⁸ Selah Fazil, *Nezerîye Bînaîye Fî El- Neqd El- Edebî*, Dar El- Şu'un El- Seqafiye El- 'Ame, El- Teb'e Salîs, Bexda, 1987, r.440.

Di vê mijarê da Pierre Larousse. Bi nêrîna hinek helbestvanên hevçerx dibêje: “Wesf ji wêneyekî kopîkirî yan jî ji fotografekî ew tiştên ku em dinivîsînin pêk tê.”⁴⁹ Di vir da jî wesf bi rêya amûra navgîna ziman dibe sedema ew tiştên di hizr û ramana romannivîs û helbestvanan da heye û bi rêya wesfê ve dûbare dadirêje.

Sîza Qasim, jî dibêje: “Şêwazeke darijtin himbêze ji bo behskirina tiştan û dîmenên hestpêkirî di xwe da digrin û dixine ber berçavan”.⁵⁰ Armanc li dîmen û tiştan ev in ku nivîskar di jîyan û jîngeha derdora xwe da dibînin, paşê jî vediguhezînin nav xeyalên xwe û di çarçoveya birgên wesfan dixine ber çavê xwendevanan. Herwiha rêz bi rêz birgên wesfê wêneyên dîtbar û wêneyên hizrî dixine ber dîtî û çavê xwendevanan.

Di pirtûka “Zahak Kalbaka” da bi vî şêweyî pênaseya wesfê hatîye kirin: “Wesf yasa û pergaleke ji hêma bo nimandin, nîşandan û rêdana kesayetîyan bikartê. Bi taybetî wan pêvajoyana rê dide ku nivîskar yan romannivîs ji bo binyatdanîna nêrî û têgehîştina hunera xwe bikar tînin.”⁵¹ Di vê pênaseyê da jî wesf wek huner û teknîkekê bandorê çê dike, ta ku alîyên veşartî yê kesayetîyan derxîne. Wate di hemû rewşan da wesf erka nîşandana rûyê derve û nava kesayetîyan e û berdewamî birgên wesfê dixebitin peyker û binyada kesayetîyên nav çirok û romanên çê bikin.

Di pirtûka “Têgînên Wêjeyî Di Ziman û Wêjeyê” da bi vî şêweyî pênaseya wesfê hatîye kirin: “Ji bexşîn û pêdana wêneyekî hizrî li ser dîmen, kes, hest yan tiştêkî pêk tê... hwd.”⁵² Di vê pênaseyê da jî bilî wê bi tenê wesf ji dîmenekî, kesekî û tiştêkî pêk hatibe. Dibe ku hinek car wesf li gor derûn û hestên kesan dipeyivin bi vê jî divê em bibêjin ev pênaseya ji alîyê rêbazên wesfî yê wek zarlêkirî û rêbaza nû nehatîye jibîrkin.

Dîsan di pirtûka xwe ya bi navê “Vegotina Gotarên Helbestî” da Mihemmed ‘Ezam bi vî şêweyî pênaseya wesfê kirîye; “Wesf wênegirtina zimanekî watedar e.”⁵³ Ev pênase û ramana bi piranî ji alîyê rexnegirên klasîkî ve di hate dîtî bi taybetî jî di

⁴⁹ Muhsîn Ehmed 'Umer, *Ferhengî Edebî*, r. 303.

⁵⁰ Sîza Qasim, *Bîna el- Rîwaye*, Dîrasat Muqarene Fî Selasiye Necîb Me'hfûz, Dar El- Tenwîr El- Teb'e Wel- Neşir, Beyrut, 1985, r. 79.

⁵¹ Îdrîs el-Naqurî, *Zehak Kelbûka*, Dar El- Şu'ûn El- seqafiye El- 'Ame, Bexda, 1986, r. 217.

⁵² Mecdî Wehbe, Kamil El- Muhendis, *Mu'cim El- Estilahet El- Edebîye Fî El- Luxe Wel- Edeb*, Mektebe Libnan, Beyrut, 1979, r. 433.

⁵³ Mihemmed 'Ezam, *Şî'rîye El- Xîtab El- Serdî*, Ette'hed El- Katib el- 'Ereb, Dîmeşq, 2005, r. 542.

wesfên zarlêkirî yên di nav romanên da ku bi piranî armanca wan ji vê wênegirtinê ewe ku ziman di wê xebatê da be wêneyên di nav rasteqîneyê da bi şêwazekî hûrgilî veguzîne ji bo me û rola navgîneke veguheztina wêneyên jîyanê bibîne. Digel wê da jî ew wêne tenê nav hizr û xeyalên me, heman ew wêne nîne ku di rasteqîneyê da hene belkî dixwaze ev wêneya hem wêneyekî hizrî û hem jî wêneyekî rastî be.

Philippe Hamon jî dibêje: “Wesf binyad danîneke hevsengî ya berdewam e ji nivîskareke nav nivîsan da di navbera firekirineke danepîştê û hûrgilîkirineke nîşaneyî yan jî destnîşankirinê da ye.”⁵⁴ Ev pênasîya Hamon jî bi piranî wesfê di çarçoveya birgên dirêj û kurt da nîşan dide ku xwedî wate û nîşanên piçûkin.

Necim Xalîd Elwenî,⁵⁵ di teza xwe ya diktora ya bi navê “Bînay Kat Le Sê Nimûney Romanî Kurdî Da” bi vî şêweyî pênasîya wesfê dike: “Wesf ew birgên dirêj û kurt li xwe digrin ku di nav roman da hebûna wan erkeke serekî werdigire di rawestan û xavkirina tevgerên pêşîya bûyeran da.”⁵⁶ Di vê pênasîyê da pêdagirî li alîyê parçe û birgên dirêj û kurt yên wesfê hatîye kirin ku bandorê li rawestanê da li teknîka vegêranê dike ku ev jî bûyera nav romanên da rastî tevgerê xav û rawestana rêjeyî dema vegêranê tîne.

Di vir da bi berçavgirtina raman û hizrên rexnegir û lêkolerên teorîya roman em dikarin bibêjin: Wesf ji ew parçe paragraf û birg û wesfî yên ku di nav nivîsên romanên da bi şêweyên kurt û dirêj derdikevin ji bo nîşandana rûyê derve û nava kesayet û cîh şûnan. Bi armanca sazkirina zemînesazî ji bo derketina hemû ew bûyerên ku romannivîs dixwaze bi rêya ew parçe wesfana li ser textê şano, bûyerên nav romanên bi xwendevanan bide nasîn.

2.2. Girîngîya Wesfê Di Romanê Da

Wesf ku teknîkeke vegêranê ye, cîhekî gelekî fire di nav tekstên romanê da girtîye. Ev jî ji ber wê yekê ye ku hêz û bandora wesfê di nava romanên da heye ku romannivîs nikare ji bîr bike. Çimkî “Wesf tiştan bi başî nîşan dide û diçe nava hûrgilîya tiştan ku bi çendîn koşeyên cuda ve wek kamerayekê wêneyên wan ji bo

⁵⁴ Philippe Hamon, *Fî el- Wesfî*, Wer.: Se'd El- Tirîkî, r.144.

⁵⁵ Necim Elwenî: Di beşa kurdî ya kolêja ziman li zanîngeha Selahedînê mamoste ye, berhemên wî di mijarên rexneyî wêjayî kurdî ne, bi taybetî jî gelek lêkolîn derbarê romana kurdî kirine.

⁵⁶ Necim Elwenî, *Bînay Kat Le Sê Nimûney Romanî Kurdî Da, Janî Gel, Şar, Raz, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2004, r. 303.*

me digire.”⁵⁷ Bi vê jî wesf dibe sedemek ji bo wergirtina zanyarî û wêneyên rasteqîneya jîyanê. Herwiha dîtin û cîhanbînîya xwendevanan li hemberê tekstê berfireh dike. Herwiha wesf ji bilî wê ku li ser binemaya bexşîna zanyarî di nav nivîsan da tînin dîtin, li alîyekî din ve jî dibe sedema ku “xwendevan çêjeke pir ji çîrok û romanên werbigre bi taybetî wesfên hûrgilî ku mêjîyê xwendevanan li ser xalekê kom dike û nahêle ji hev bela bibe.”⁵⁸ Lê ev nayê wê wateyê ku girîngî û amadebûna wesfê di nav nivîsandinê romanê da tenê ji bo çêjbexşînê nîne. Belkî gelek caran “armanca rastîne li wesfkirin peyitandina wan dîmena ne di bîr û heşê xwendevanan da ku bi girîngîya xwe di çîrokan da heye, wek wesfkirina ev cîhên dibin şanoya karesat û bûyerên çîrokê.”⁵⁹ Wate gelek caran wesf erk û zemînesaz û rê xweşkir dibe ji bo serhildana û afrandina rûdanê.

Weke me got wesf di pêwendîya xwe ya digel teknîka vegêranê da derdikeve. Çimkî ron û eşkere ye wesf wek yek ji hunerên vegêranê tê jimartin. Wate bi wê pêwendîya wê ya tund û tûj ya ku digel teknîka vegêranê da heye. Herwiha bi berdewamî bi şêweyekî hevbeş û wek du tiştên ji hev neqetyayî di piranîya demê da bi hevdû ra tînin ku gelek caran bi wêneyê wesfî û wêneyê vegêranî tê binavkirin. Armanca li wêneyê wesfî jî hemû ew birgên wesfî li xwe digire ku rola wan dibe di sistkirina vegêrana bûyeran de. Çimkî “Wesf bi piranî digel wan tiştana digunce ku liv û lebat tê da tunebe vegêran jî digel tevgerê digunce lê bi hebûna tiştan.”⁶⁰ Wate ser û karê wesf bi piranî digel wêneyê rawestî yê wesfî ne ku bi hemû şêweyî bandorê li birha lezî û sistîya vegêranan dike. Ev jî gelek caran girîngîya wesfê derdixin di binyata romanê da ku yekcaran wêneyekî vegêranê bê wesf di nava romanê da berçav dikeve. Wek Gerard Genette⁶¹ dibêje: “Wesf pêwîstîyeke serekî ya vegêranê ye, gelekî zehmete ku em karibin bê wesf vebêjin lê karekî hêsane em bê

⁵⁷ Perî Salih Muftî, *Gêranewê Le Çîrokekanî Ehmed Mihemmed Îsmail Da*, r. 171.

⁵⁸ Perî Salih Muftî, *b.n.b.*, r. 171.

⁵⁹ Husên ‘Arif, *Nusînekanî Le Biwarî Rexne û Lêkolînewê Da*, Weşanxaneya Aras, Çapa Yekem, Hewlêr, 2011, r. 20.

⁶⁰ ‘Ebdelmalik Murtaz, *Elf El- Leyle Wel- Leyle*, Dîrasedîrasedî Sînema ye Tefkîkiye El- Hîkaye El- ‘Hemal Bexdad, Dîwan El- Metbu’et El- Cema’îye, Bexda, 1993, r. 109.

⁶¹ Gerard Genette. *Lêkolereka wêjeya firansî ye, kovareka bi navê “Poétique Magazine” derxistî ye.* Di sala 1930yê li bajarê Parîsê ji dayik bûye û di sala 2018ê de koça dawî kirîye.

vegêranê wesfê bikin.”⁶² Di vir da ji bo me derdikeve ku pêwîstiya vegêranê herdemê bi wesfê heye gelek caran jî birgên wesfê beşdarîyê di vegêranê da dikin.

Li alîyekî din jî bi wê sedemê ye ku wesf materyaleke serekîye ji bo vegêranê û herdem pêwendî û mu'ameleya wê bi piranî digel şûn û kesayetîyên nav çîrok û romanên da heye. Ji ber wê gelek caranan tê gotin wesf binyeta kes û şûn temem dike. Ev gotina jî çavkanîyê ji wê digire ku dema wesfa kesên nav romanê tê kirin ta ku *“li oxira perwerdekirin û pêşxistina qahremanên nav çîrokê da bin, dîmen û vetîre bandorê li amadebûna kesayetîyan bikin. Herwiha tişt û kinc û nava malan ku derxerên kesayetîyanin divê bi hûrgilî wesfa wan bête kirin.”*⁶³ Ev wesfkirina jî li ba rêbazên klasîk û nû da cuda ne, lê ya giring ew e ku bi sedema wesfê ve karakterên nav romanên amade tên kirin ji bo ew bûyerên ku bi rêya wan ve li şûnên cuda cuda da encamê didin.

Di behskirin û giringîya wesfê di nav romanê da romannivîs dikare gelek alîyê veşartî yên jîyana karakteran ji bo me eşkere bike. Weke mînak: “Bi rêya wesfê ve wêneyê bi dehan vetîreyan ji bo me bîxşîne wek wêneyê hejarî, dewlemendî, bextewerî û diltengî. Bi vê sedemê jî wateyên kûrahîya jîyanê di xwe da digire û dibin nivîsên mezin û jibîrnekirî.”⁶⁴ Nîşandana ev hemû wêneyên cûr bi cûr û veşartî yên jîyana mirovan bi rêya hunera wesfê ve ji bo me wê derdixe holê ku wesf sedemeke ji bo xwendevan bikarîbin wêneyên nedîyar yên rasteqîneya civakan bibînin. Çimkî ew erka romannivîse bi rêya romanê wek cûreyeke wêjeyî wêneyên nedîbar û cuda li çarçoveya karê fotografekî dixê ber çav û hizir û ramana xwendevanan.

Her çiqas wesf di nav romanê da wek hunereke ser bi teknîka vegêranê ye yan jî hemû ew erkên ku di hunera wesfê da heye. Bi piranî di çarçoveya teknîka vegêranê da encamê didin. Ev jî kêr yan zêde bandora xwe li ser qebare, cûre û şêwaza wesfan da çê dike û herwiha li ser pêvajoya vegêranê ji heman bandorê çê dike. Weke mînak ku dema em bala xwe didin ser romanên sedsala hîjde û nozdehem

⁶² Tanya Es'ed, *Bînay Şiwên Le Dû Nimûney Romanî Kurdî Da*, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2011, r. 212.

⁶³ Sîrus Pirham û Dîktor Mîtra, *Karektersaziy Riyaîstî Le Roman û Çîrokê Kurdî Da*, Wer.: Heme Kerîm 'Arif, Kovara Raman, J. 44, Hewlêr, 2000, r. 158.

⁶⁴ Necim Elwenî, *Tîyorî Komel Nasîy Roman*, Weşanxaneya Zanîngeha Selaheddîn, Çapa Yekem, Hewlêr, 2017, r. 187.

em dibînin ku piranîya wesfan di cûrê wesfên dirêj û kurt û pêvajoya vegêranê da radiwestînin ku ev jî bandorê li ser binyata nivîsandinê dike. Herwiha dibe sedema hecma romanê ku rûpelên wan zêde bibin. Çimkî her çiqas berfirehîya wesfê di nivîsên vegêranê da zêde bin, hewqas jî nêzikî canê hunera klasîkî dibe û dibin mînakê ciwankarîya kevn. Lê divê em wê jî bibêjin: Ev wesfên dûr û dirêj hinek car xwendevanan bêzar jî dike. Digel wê da jî çiqasî hatina wesfê gelek caranan pêvajoya vegêranê radiwestîne bi wê bayîstê ku “me bibe nav bûyeran û sîma û berçavî yên karakteran bi me dide nasîn û herwiha dikare zanyarîyê di derbarê şûna jîyan û awayê jîyana wan bide me.”⁶⁵ Wate birgên wesfî tevgerê li ser kes û şûn û bûyerên di nav romanê dikan. Herwiha ji ber vê yeke nabe birgên wesfî jibîr bibin û ji nav nivîsên romanê bi şêweyekî hêsan werin derxistin. Çimkî hinek car derxistina wan pîrgirêkê ji bo têgehîştin, armanc û daxwazên romannivîs tînin holê.

Bi vê dîtîne ve em dikarin bi çend xalan ve giringîya wesfê di nav cûreya romanê da diyar bikin:

1- Kîten wesfî dibin sedema wê ku wêneyekî rasteqîneya jîyanê nîşan bide.

2- Hebûna wesfê di nav romanê da dibe temamkirê peykerê binyat û bilind yê teknîka vegêranê û wek Gerard Genette dibêje: “Wesf bê vegêranê diwartire ji vegêrana bê wesfê.”⁶⁶

3- Wesf di nav romanê da zemînesazî dike ku ji bo li dû birgên wesfî bûyerên nav romanê derkevine holê.

4- Wesf sedemeke serekî ye ta ku em wêneyê rûyê derveyî yê karakteran bibînin û derûn û niximandin û tevgerên karakteran têbigêhin. Her ji ber vê “Bê amadebûna wesfê çîrok û roman nayên nivîsandin çimkî çi tiştên şûn, qahreman û pêwîstîyên karakteran hene bi sedema wesfê ve di bîra xwendevanan da bi zindî dimînin. Bi tene wesf dikare vê erkê bi cî bîne.”⁶⁷

5- Wesf hunereke serekî ye ku çêja wêneyê dide xwendevanan bi taybetî di wan wesfên ku bi piranî erka xemlandinê dibînin.

⁶⁵ Necim Elwenî, *b.n.b.*, r. 184.

⁶⁶ Mecmu'e Muelif, *el- Fez'a el- Rîwaî, Mecmu'e Min el- Kitab*, Wer.: 'Ebdulrehîm 'Xezil, Dar El-Bîz'e, Mexrîb û Beyrut, Lubnan, 2002, r. 43.

⁶⁷ Mihemmed Ferîq Hesên, *Ezmûnî Çîroknûsîn, Weşanxaneya Silêmanî, Çapa Yekem, Silêmanî, 2012, r. 179.*

6- Bi sedema wesfê ve şîpa bilezî ya vegêranê sist dibe û hinek car nêzikî rawestanê jî dibe.

7- Tabloyên wesfê yên di nav romanê da di çêbûna wêneyên şûnê da beşdarîyê dikin. Çimkî “Wesf can dide bi şûnê û cîhekî bilind didê di nav pêkhatayên din yên vegêranê de.”⁶⁸ Bi vê jî şûn di erdnîgaryeka rût rizgar dibe.

2.3. Pêkhatayên Wesfê Di Romanê Da

Wesf wek huner û teknîkeke vegêranê bi heman cûreyên heman û tuxmê din yên romanê xwedî pêkhateyeke hûrgilî e. Wesf ji ber wê yekê bi çend awayî tê vegêran. Ev vegêranan jî her carê bi şewazekê binyata wesfê dirust dikin. Herwiha qanalên pêwendî yên wesfê ku li ser vê xêza giştî tene holê û ji “wesf, wesifker, wesfikirî” pêk tên ku her yek navgîneke di destê çîrokwendan da ye û hinek caran jî ev erka wesfê dikeve destê karakterên nav romanan.

Ji alîyekî din ve jî pêkhatayên wesfê li gor qonaxên bi dîroka romanê ve girêdayîne guhertinek berdewamî têda dîyare. Lê bi şeweyekî giştî wesfa karakteran bi rûyê derveyî û navekî û wesfa şûn û bûyeran ve binyat û pêkhatayên wesfê dirust dikin. Weke mînak wesfa karakter di romanên zarlêkirîda beşek pêkhatayên wesfê destnîşan dikin. Dema ku wesf bi piranî di çarçoveya wesfa xuyanîya derveyî bûn ku “kinc nîşaneyekê baş bû ji bo derxistina karakter û çîna wan û herwiha asta jîyana wan.”⁶⁹ Bi vê jî wesf bi piranî materyalî ne û di cîhana materyalî ya karakteran da rolê dibînin, lê ev xweza û pêkhataya wesfê li dû serhildana rêbaza pêla hişî guherîn bi ser da hat. Ku ev jî bûye sedem pêkhataya wesfan jî vê carê di dîtina wesfa nava karakteran da derkevin holê, ji ber vê yekê em dibînin ku ev qonaxa jî di behsa wesfa karakteran da bi piranî di wê armancê da bû ku çîroknivîs û romannivîs bi rêya “wesfê ve bervî hinava karakteran sist dibin ta di rê da şerpezeyî û nearamî û rewşên cuda yên derûnîya karakteran nîşan bidin. Wate pirsgirêk û hevrikî yên karakter ji wî qalibê teng derket ku wek di serî da dihate dîtin.”⁷⁰ Bi vê jî erka wesfê di vê qonaxê da di ramana rewşa derûnîya karakteran ve birgên xwe yên wesfî dihûnin ku dawîyê bi hevahengî digel wesfa şûn û wesfa bûyeran wek beşeke giring ya pêkhataya wesfê xwe nîşan dan. Herwiha eger romanên zarlêkirî bi rêya wê wêjeya ku wek “wêjeya

⁶⁸ Tanya Es'ed, *Bînay Şiwên Le Dû Nimûney Romanî Kurdî Da*, r. 213.

⁶⁹ Celal Enwer Seîd, *Teknîkî Gêranewe Le Romanî "Êwarey Perwane" y Bextiyar 'Elî*, Weşanxaneya Silêmanî, Çapa Yekem, 2009, r.134.

⁷⁰ Sirwe Tahir Elî, *Binyatî Hunerî Le Komelle Çîrokî "Helo" ya Rauf Bêgerd*, Nameya Master, Skolla Ziman, Fakulteya Zanistên Mirovayetî Zanîngeha Silêmanî, 2015, r.158.

tiştûmişt” nav lê bûye beşek ji pêkhateya wesfê binyatê deynin ew di romanên qonaxa pêla hişî da bi rêya wesfa xweyî û li ser zimanê çîrokkwendên romanên ve beşeke din ya pêkhateya wesfê tê diyarkirin. Di dawîyê da jî wesfên xuyanî û paşê jî bi wesfên nava karakteran ve peyker û pêkhateya wesfê dirust dikin ku ev hemû ji alîyê wesfîkirî ve tê vegêran. Dîsan di hinek rewşan da nivîskarê romanê bi xwe ye û hinek carê din jî çîrokkwendên romanê ne yan jî li ser zimanê karakteran bi xwe ve birgên wesfî derdikevin holê.

Herwiha wesfên karakter di bingehe da ku wek hêmaneke giring ya romanê tê dîtin, çend paragrafê wêneyên wesfî û parçeyê wesfa romanê ji xwe digire. Ev jî têgînê li wê dike ku bê hebûna wesfa karakter zehmete binyata nivîskara romanê ji dayik bibe herwek di derbarê girîngîya wê hêmanê da zimanewanê Emrîkî, Awram Noam Chomsky dibêje: “Em bi sedema xwendina romanên fêr dibin ewqas zanyarî têkevin deste me di derbarê kesayetîyê ve ku çawa raman û hestên wan dilivin û tevdigerin herwiha ji derûnzaniya xwezayî bêhtir van tiştan fêrî me dikin.”⁷¹ Ji ber vê yekê ji bîrkirina hêmana karakter û alîyên wesfa derveyî û navekîya binyata nivîsên romanê bervî hilweşandinê ve dibe. Bi vê jî wek nivîskareke ji wesf û hunera teknîkî bêpar lê tê nerîn ku helgirê tu wate û xuyanîyeke wêjeyî nîne.

Li alîyekî din ve jî wek beşeke nebîrî ya serekî yên pêkhateya romanê li wesfên karakteran were nêrîn, bêguman tu kêmasîya wesfa şûnê ji wesfa karakter tûneye. Çimkî şûn wek hêmaneke serekîya romanê “her ew rûber e ku karakter yan karakteran himbêz dike û têda tevdigerîn û tevî gel û cîhanê dibin. Pêwendîyê li tenîştê derdorê gire didin. Di peyîvin û di sergermîya livînbarê xwe danin.”⁷² Ji ber wê hemû tevger û livên karakter û bûyeran di nav qad û fezaya şûnê da rû didin. Bi vê jî şûn dibe neynîkek ta ku xwe têda bibinin. Herwiha wesfa şûnê jî wek seywanekê ye ku karakter û bûyeran di bin xwe da tevgerên wan bervî pêşketinê dibe, weke Rene Wellek û Austin Warren di derbarê wesfa şûnê da dibêjin: “Pêwîste wesfa şûnê bi şêweyekî xazeyî têgînê li karakter bike. Çimkî mala mirov dirêjkirîya mirov bi xwe ye wate eger wesfa mala xwe kir tê wê wateyê ku wesfa xwe kirîye.”⁷³ Kewate

⁷¹ 'Ebdulla Serac, *Berew Astaney Roman û Goşenîgakan*, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2007, r.10.

⁷² Mihemmed Ferîq Hesên, *Ezmûnê Çîrok Nûsîn*, r.178.

⁷³ Amîne Yusif, *Teqniyat el- Serd Fî el- Nezerîye Wel- Tetbîq*, Dar el- Hîwar lîl Neşir Wel- Tewzih, Surîye, 1997, r.104.

wesfên karakter bê hebûna erdnîgarîya şûnê ji dayik nabin. Ev girîngîya wesfa şûnê di binyata romanê û hemû ew hêmanên ku romanê li ser wan binyata datîne, derdixe holê ku di dawîyê da me digîne wê bawerîyê ku bê hebûna fezaya şûnê û rehend û alîyên wesfîkirîyan tevgerên bûyer û karakteran nikarin bervî pêşîyê ve biçin.

Herwiha şûn wek hêmaneke serekîya romanê zêdetir di şêweya wesfa rawestî da derdikeve holê. Di piranîya deman da bi şêweya wesfa dirêj xwe rê dide. Hemû ev ji ber wê oxirê bû ku wêneyê karakteran di nav fezaya şûnê da bi şêweyekî hûrgilî derkeve. Çimkî wesfa şûnê “wesfa karakteran e li alîyê aborî, civakî û selîqe û cîhanbînîyê ve ku têda dijîn,”⁷⁴ derdikeve. Herwiha bi rêya wesfa şûnê ve xwendevan nasberê wê dibin ku tevgerên karakteran, rewş û balkêşî û rehendên aborî, civakî û derûnî, rewşa darayî, asta rewşenbîrî û cîhanbînîya wan karakteran li hember hemû pîrsgirêk û astengîyan ji bo me derdixe. Çimkî ev hemû di piranîya demê da bi rêya wesfa şûnan ve ku karakter têda dijîn derdikevin ber çavan û eşkere dibin. Herwek Percy Lubbock di derbarê girîngîya şûnê da dibêje: “Balzac ê romannivîs li dûrî ew xanîyê ku têda dijî nikare karakter bifikire. Aşopkirina heybereke/î mirovî li ba Balzac ve wate aşopkirina beş, bajar yan koşeyê bajêr yan jî ew xanîyê dikeve hêla kolanê, ewqas odeyên raxistî û paşê ew jin û mêrê têda dijîn.”⁷⁵ Loma wesfa şûnan digel karakteran du zincîrê bi hev du ve girêdayî ne ku heryek ew ê din temam dike û di dawîyê da birgeke wesfî ji karakter û şûnan dirust dikin.

Herwiha bi sedema firehîya fezaya şûnê ve bi taybetî li hember piranîya cûreyên şûnê, wêneyê wesfî cuda pêşkeş dikin ku ev jî bi pê lîstîna romanûsên qonaxên cuda ji hev cudatir derdikevin. Weke mînak: Di romanên zarlêkirî da wesf rûberek berfireh ya nivîsandinê tijî dike “ku diçe nava hûrgilîyên wesfa şûnê û bi awayekî dirêjdadirî di wesfên şûnan da dike ku renge çend rûpelên romanên xwe ji bonê veqetînin û bi vê jî li ba xwendevanan wêneyekî dîtbarî yê şûna bûyeran ber çav dike.”⁷⁶ Loma hemû ew hûrgilî yên şûnê bê jêderxistin û bêbanzdan çend wêneyê wesfî yê bûyeran dikşîne. Ev jî wê rastîyê derdixe holê ku bûyer jî hêmaneke

⁷⁴ Rene Wellek û Austin Warren, *Nezerîye El- Edeb*, Wer.: Muhyeddîn Sibêhî, Weşanxaneya Xalid El- Tirabîşî, Çapa Yekem, Dîmeşq, 1972, r.288.

⁷⁵ Percy Lubbock, *Sine'e el- Rîwaye*, Wer.: 'Ebdulstar Cewad, Dar el- Reşîd el- Neşîr, Bexda, 1981, r.199.

⁷⁶ Karwan Mehdî 'Usman, *Teknîkî Wesf Le Romanekanî Bextiyar 'Elî*, r.30.

serekî ye binyata romanê pêk tîne. Bê hêbûna fezaya şûnê nikarin bi berdewamî bi xwe derkevin û xebatekê di navbera karakter û bûyeran da di bin sêvana şûnekê bigînin armanca xwe. Çimkî di bingehe da bûyerên nav romanê ku navgînên bi destê tevger, kar û bertekên karakteran e ku vegêr wan dike parçeyekî wesfê, hemû li şûnekê derdikevin holê ku dawîyê wesfa şûnê jî jê derdikeve û karakter bi drêjayî romanê bi awayekî bi cûreyeke jîngeha şûnê ve gire dide.

Li alîyekî din jî eger ew giringîya pir ya şûnê di binyata romanê da hebe û bi wê şewaza berfireh wesfa wê were kirin û wek beşeke girîng ya pêkhateya wesfê bête danîn, romannivîs nikare xwe ji vegêrana wesfên şûnê dûr bixe. Bêguman wesfa şûnê jî bi şeweyekî rût û bê hebûna pêwendîya karakter û bûyeran, xwendevanan nagihîne armanca mezîn ya wêjeyî. Belkî bi tenê di çarçoveyê estetîkîda dimîne ku ev jî hinek car alî û rehendên din yên romanê bi sedema vê wesfa estetîkî ve dibin qurbanî û nikarin bi dengê zelal têgîna xwe bi xwe bikin û armanc û erkên wêjeyî yên xwe di nava nivîsên romanê da cîbicî bikin. Lê eger ew şûn girêdayî guftar û reftarên karakteran bûn û bi hevdu re bûyerên nav romanê berrê pêş birin. Herwiha eger wesfa bûyeran girêdayî nav fezaya şûnê bûn vê carê dibe palpiştê temamkerê fezaya şûnê.

Wesfa bûyerê li ser binemaya hêmana bûyerê derdikeve holê ku “ji ew zincire guhertin bi ser rewîştî karakteran da tê û ji pêwendî û bandora li wan kirîye digel ew şûna têda tînin û diçin pêk tê.”⁷⁷ Wate eger rûdaw nebe wesf jî nabe lê ew bûyera ku di nav romanê da heye ji wê wêneya ew bûyera di nav rasteqîneyê da heye cudatir e. Digel ewa ku romannivîs hewlê dide wêneyekî rasteqîne yê bûyerên me nîşan bide bi taybetî di romanên zarlêkirîda ku di bin bandora rêbaza realîzmê da nivîsên xwe berdewam dikir. Lê ev nayê wê wateyê ku roman di hemû qonaxan da bi heman çêjê be bi taybetî di romanên nû da, dema tevî hest û hizir û xeyalên romannivîs dibin û di bin vê bandorê da rege çend bûyerên efsaneyî û fantezî biafirîne ku rege tu (hîç) wêneyekî wan di rasteqîneyê da tunebe. Ji ber vê yekê nivîskar di beşeke vegêrana bûyeran da radibe bûyersazîyê ji bo rûdawê dike ku ev jî di teknîkkirina hêmanên romanê da şîyan û jêhatîya nivîskar derdixe holê.

⁷⁷ Şukriye Resul, *Edebî Kurdî û Hunerekanîyê Edebî*, Weşanxaneya Xwendinî Balla, Hewlêr, 1989, r.151.

Bi wê sifata mirov bi berdewamî di nav fezaya bûyeran da dijî û rojane bûyer gelek dibin ku deste serekî yê di derketina wan bûyeran da mirov bi xwe ne. Ango karakter nivêda neş û nemakirina bûyerane û sedemeke serekî ye ji bo çêkirina birgên vegêranê. Digel wan da jî hinek raman hene ku bûyerê wek xala serekîya binyata romanê datîne ku li gorî wan bûyer sedeme ji bo tevger û lebatên hemû hêmanên din, weke Aristotelesê di derbarê giringîya bûyerê da dibêje: “Bûyer karaktere tîne holê, hebûna karakteran bê hebûna bûyeran tune ye, eger bûyereke me nebe rola kesayetîyan nabe, eger bûyereke me hebe şûn û dem jî tîne holê ji bo rûdana bûyeran û derketina kesayetîyan.”⁷⁸ Ev ramana Arîsto wê derdixîne ku dem û şûn jî di çarçoveya bûyeran da diçerixin. Bi vê jî bûyer dînemo û karpêkirê hemû hêmanên din yê nav romanê ye.

Wesfa bûyerê ku destkefteke bi destê romannivîs ve wêneyekî cuda di navbera nivîsên romanê da pê dibexşîne “bûyerên romanê gelek balkêştirin ji bûyerên rasteqîne, sedema vê jî ew e ku ew estetîkî û ciwankarîya ku romannivîs bi rêya aşopê ve di nav nivîsên xwe da tîne holê.”⁷⁹ Di vir da ew bûyera ku romannivîs dûbare diafirîne wiha li xwendevanan dike ku çêja wêjeyî ji nivîsan werbigrin ku hemû ev jî bi rêya wênegirtina wesfa bûyerê ve ji bo xwendevanan tîne guhastin.

Bi van dîtinan ve divê em bibêjin pêkhate û peykerê wesfê bi şêweyekî giştî ji wesfa karakter, şûn, bûyer û tiştên di nav şûnan pêk tîne ku di beşên din da em ê bale bikşîne ser ew pêkhate û binemayên wesfê û emê bi mînakên wan destnîşan bikin.

2.4. Erkên Wesfê Di Romanê Da

Wesf wek huner û materyaleke giring yê teknîka vegêranê xwedî çend erke di nav cûreya romanê da. Çimkî dema ku wesf wek hunerekê amadehîya wê hebe di nav birge û parçeyên vegêranê da bêguman xwedî erk jî dibe. Ev jî wê derdixe ku nabe wesf di nav binyata romanê da were jibîrkirin. Çimkî pêwendîya hemû pêkhateyên romanê “kes, şûn, bûyer, dem...hwd.” bi wesfê ve heye. Ji alîyekî din ve jî pêwendîya wesfê bi piranîya teknîkên din jî wek “diyalog, monolog,

⁷⁸ Herêma 'Usman, “Teknîk Le Sê Çîrokî Aramî Kakey Felah Da”, *Kovara Henar*, J. 44, Silêmanî, 2009, r.12.

⁷⁹ Senger Qadir, *Binyatî Gêranewe Le Dastanî “Mem û Zîn”î Ehmedî Xanî û Romanî “Şarî Mosîqare Sipîyekan” î Bextîyar ‘Elî Da*, Nameya Master, Kolêja Ziman, Zanîngeha Selaheddîn, 2007, Hewlêr, r.113.

dîmen...hwd.” ve heye. Wate wesf bi hemû ew bandorên xwe ve derdikeve û xwedî pêwendîyeke xurte digel pêkhatayên teknîkên din yên romanê, hemû ev tiştana wê ji bo me derdixe ku divê wesf xwedî komek erk be. Lê bi pê qonaxên dîrokî û pêşketinên avahîya cûreya romanê guherîn bi ser wan erkana da hatîye. Herwiha rol û erkên wesfê di dîtin û ramanên romannivîsên qonaxên cuda da û bi şêwaz û erkên cuda derketine. Weke mînak: Di romanên klasîkî da bi piranî xwedî erkên xemilandî bû bi taybetî li ba Balzac ê romannivîsê firensî yê sedsala nozdeyan ku erka wesfan li ba wî bi piranî di çarçoveya “binyata dekor û diyarîkirina çarçoveya bûyeran û wênekêşana fîzîkî ya karakteran bû.”⁸⁰ Wate bi şêweyekî giştî wesf di cîhana derveyî ya kesayetîyan dizîvirî, sedema bikaranîna van wesfana bi piranî bi armanca derxistina berçavkirina cihana derveyî ya karakteran bû. Weke Letîf Zeytûnî dibêje: “Mebest ji van wesfan ev bû ku wêneyeka ketwarîya (rasteqîn) tişt û karekter û şûnan pêşkêş bike, ji bo wê xwendevan wa raman bike ku van wêneyan rasteqînîn.”⁸¹

Di dawîya sedsala hîjde û nozdeyan da erka wesfê guherîn bi ser de hat. di vê qonaxê da erka birgên wesfî ew bû ku wêneyê derûnî yê karekteran nîşan bidin. Herwiha di vê qonaxê da “nîrx û giringîya wesfê ji tiştên wesfîkirî bervî lîva xweyî ya wesfê hatine guhestin û di nêrîneka peywendîdar bi tevgera vegêranê ve dihate dîtin. Bi wateyeka din wesf û vegêran tevî hevdu dibûn û wesf rêgir nedibûn di pêşveçûna herika vegêranê de.”⁸² Wate wesf rol û erkên nû didin karakterên nav romanên bi taybetî bi nîşandan û behskirina rûyê nava karakter û hemû ew pêwendîyên ku digel şûnan da hene. Ev xebat û tevgerên karakteran şêwaza wesfeke nû ye û erkeke nû di nava romanê da pêşkêş kir ku ji qonaxên pêş xwe cudatir bûn.

Bi van dîtinên rexnegir û lêkolerên ser bi warê rexneya roman bi şêweyekî giştî çend cûreyên erkên xwe bi pê qonaxên dîrokî yên avahîya romanê diyar kirine. Weke mînak Letîf Zeytûnî bi giştî pênc erk ji bo wesfê diyar kirîye û xwe di wan da dibîne ku; Erka “rasteqîn, me’rîfî, vegêranê, ciwankarî, ritmî.” Herwiha Necim Xalid Elwenî di teza xwe ya diktora ya bi navê “Bînay Kat Le Sê Nimûney Romanî Kurdî Da, Janî Gel, Şar û Raz,” da çend erkên wesfî li gorî berî û firehî û amadebûna

⁸⁰ Necim Elwenî, *Tîyorî Komelnasiy Roman*, r.199.

⁸¹ Letif Zeytunî, *Mu'cem Mustelehat Neqd el- Rîwaye*, Dar el- Nehir el- Neşir, Beyrut, 2002, r.172.

⁸² Se'îd Yeqtîn, *Te'hlîl el- Xîteb el- Rîwaye*, "Zemen, el- Sirid, el- Te'bîr", el- Teb'e Rabi'e, el-Merkez el- Seqafiye el- 'Erebîye, Dar el- Bîz'e, Mexrîb, 2005, r. 67.

birgên wesfî di nav romanên zarlêkirî û nû da çend erk ji bo wesfê diyar kirîye ku yên girîng ev in.

1- Di romanên zarlêkirî da romannivîs ji bo nêzîkkirina nivîsan bo rasteqîneyê xwe davetin oxira wesfên şûn û kesayetîyan.

2- Di romanên zarlêkirî da erka girîng ya wesfê xemilandina nivîsan û avakirina dekor û çarçoveyê bû ji bo jîngeha kesayetîyan.

3- Romannivîsên klasîkî ji wesfê sud wergirtine ji bo wê ku wêneyekî madî yê berçavkirî yê kesayetîyan têxîne ber çavê xwendevanan.

4- Wesf erkekî gîhandina komek wateyên felsefî û civakî di nav nivîsên klasîkî û nû da digire.

5- Wesf dikare awayekî bêhnvedanê bide destê xwendevanan. Bi taybetî li dû xwendina hinek bûyerên kelecânî.

6- Vegêran û wesf du pêvajoyên lihevçûn in, çimkî herdu jî bi hevdu re ji peyvan pêk tên bi yek erka nivîskar encamê didin.

7- Di wesfa rawestî da dema vegêranê hildigire ku di wesfa tevgerî berdewam dibe.

8- Wesfa bûyeran di romanê da bi taybetî di romanên zarlêkirî da dikevin dû rûdana wan bûyerana, ji bo ku wê hestê li ba xwendevanan dirust bike ku wan bûyerana di dema raborî da rû dane.⁸³

Di ser diyarkirina ev çend erkên wesfê ji aliyê “Necim Xalîd Elwenî”, lê lêkoler û rexnegirên warê romanê çar erkên giştî û bingeha wan ji bo wesfê diyarkirine. Di vir da em ê xal bi xal behsa wan bikin.

2.4.1. Erka Xemlandinê

Bi xwe di bingeha xwe da xeml yan estetîka xwezaya karekî piranîya nivîsên wêjeyê bû. Her ji ber wê ye em dibînin bi dirêjahîya dîroka wêjeyê nivîsên wêjeyî xwezayeke estetîkî û ciwanasî daye ber çêja xwendevanan ku xwendevan hest bi hişkî û kirêtiya nivîsên wêjeyî nekin. Her ji ber wê ye yek ji armanca wesfê û erka wê di nav nivîskar û birgên wesfî ji bo “rengkirina gotarên wêjeyî ne, ta ku xwendevan dilgîr bibin.”⁸⁴ Ev awayê ciwankariya birgên wesfî bi piranî di romanên

⁸³ Necim Elwenî, *Bînay Kat Le Sé Nimûney Romanî Kurdî “Janî Gel-, Şar, Raz”*, r.308-309.

⁸⁴ Muhsîn Ehmed 'Umer, *Ferhengî Zarawey Edebî*, Weşanxaneya Aras, Çapa Yekem, Berga Yekem, Hewlêr, 2005, r.37.

kevn yê zarlêkirî da tîn dîtin. Çimkî hem pêvajoya birgên wesfî dirêj bûn û hem jî destê romannivîs vala bû ku bi daxwaza xwe ve birgên wesfî rengdar bike û peyv û komên peyvên zêde bike. Herwiha bi rêya vê erkê ve “diyarîkirina çarçoveya bûyer û berçavkirina şêweya fîzîkî ya karakteran”⁸⁵ berhem dike.

2.4.2. Erka Raveyî

Ev erka gelek caran wek erka wateyî jî tê naskirin, armanca jî vê erka wesfê di nava romanê da nîşandan û derxistina hemû ew alîyên veşartî yê karakteran e ku xwedî dirêjahîyeke dîrokî, civakî û derûnî ye. Çimkî wesf bi rêya vê erka xwe ve rewşa karakteran ji bo me eşkere dike ku bi çî şewazî mu’amele, xebat û tevgerên xwe rê didin. Herwiha dibe sedema wê ku “wesfkirina jîngeha karakter û ew pêkhate û tiştên ku ji bo wan paşxanek hatîye dirustkirin”⁸⁶ têxine ber çavan. Herwiha ev erka wesfê “erka gihandina komek wateyên felsefî û civakî di nav nivîsên klasîkî û nû da digire.”⁸⁷ Wate pile, paye û pêwendîya civakî û asta rewşenbîrî û cîhanbînîya karakteran û asta lîngwîstîkê wan di vir da hemû pîrsgirêkên serdemê derdixin. Hemû ev jî bi rîya “komkirina zanyariyên pîr hûrgilî û veşartî û bandordar ve û di hevok û komê peyvên kurt û xest û bilez da di nav nivîsandinê da ye “ku karakterên nav nivîsandinê da bi awayekê têxe berçavê xwendevanan ku bikaribin hest bi gelek alîyên pêvajoya vegêranê bikin û bibinin.”⁸⁸ Wate di vê erka wesfê da xwendevan digêhêjin qotê têgeyîştinê bi zanyariyên derbarê hemû alîyên hûr û çewtîyên jîyana karakteran, her ji ber wê divê em wek “erka zanyarî gihandin” nav lê bikin ku Letîf Zeytûnî⁸⁹ wek “erka vegêranê” nav lê kiribû û dibêje armanca jî vê erka wesfê: “Bexşîn û pêşkeşkirina zanyariyên zêdetirîn di derbarê şûn û karakteran da ji bo xwendevanan e herwiha keş û hewayekê diafirîne ku alîkarîyê ji bo dirustbûna girêdana (pilot)”⁹⁰ dide. Kewate di encama vegêrana berdewam bi rêya wesfa zanyarî gihandinê ve binyata pilot çê dibe ku di çarçoveya bûyerê da dixebite û ji destpêk û qot û dawîyê pêk tê.

⁸⁵ Alan Robbe Grillet, *Ne’hu el- Rîwaye el- Cedîde*, Wer.: Mistefa Îbrahîm Mistefa, Dar el- Me’arîf, Misir, r.129.

⁸⁶ Selah Fezil, *Nezerîye Binaye Fî el- Neqd el- Edebî*, r.440.

⁸⁷ Necim Elwenî, *Tîyorî Komelnasiy Roman*, r. 309.

⁸⁸ Dîlan ‘Usman Ebdulkerîm, *Têm Le Kurte Çîrokî Kurdî Da Salanî 1991-2000*, Nameya Masterê, Fakulteya Zanistên Mirovayetî Skolla Ziman, Zanîngeha Silêmanî, 2014, r.158.

⁸⁹ Letîf Zeytûnî: Rexnegir û lêkolereka Lubnanîye û mamosteyê zanîngehêye û xwedanê pertûkeke girînge di warê zaraveya edebî û romanê ve ku binavên “Mu’cem el- Mustelehat Neqd el- Rîwaye wel Qîyem”.

⁹⁰ Letîf Zeytûnî, *Mu’cem eel- Mustelehat Neqd el- Rîwaye*, r.172.

2.4.3. Erka Xapîner

Ev erka wesfê bi piranî di romanên zarlêkirî û romanên wêjeya realîst da ber çavan dikeve. Çimkî birgên wesfî yên romanên zarlêkirî bi şewazekê pêkhatî ne ku erka qena'etkarîyê dide xwendevanan bi taybetî di “çewtandina xwendevanan bi wê ku ew cîhana ku dixwînin cîhaneke realîst û rasteqîne ye.”⁹¹ Wate herdem di wê xebatê da bûne ku wêneyekî rasteqîne ji bo xwendevanan dirust bikin ku ew hesta li ba xwendevanan dirust bibe ku birgên wesfî yên nav romanên beşeke nebiri ye wêneyekî rasteqîne yê jîyanê ne yan jî ji hinava jîyanê jidayik dibin. Her çiqas çêbûna wê hestê li ba xwendevanan bi hêsanî dirust nabe lê digel wê da jî jîrî û jêhatîya romannivîs wê derdixe holê ku heta çi radeyê dikare wêneyên xeyalî yên nav romanên xwe da di raman û hizra xwendevanan da bipeyitîne.

2.4.4. Erka Rêkxistinê

Armanc ji vê erka wesfê jî “bi pê ketin û rêzkirineke locîkî ya hêmanên wesfî ne. Weke mînak wesfa karakteran digel şûnan guncaw bin û wesfa wêneyan jî digel karakteran hevdem bin.”⁹² Wate bi şeweyekî giştî guncawin û lihevkerin û rêkxistinek di navbera karakter û şûn û demên di nav romanên da hebin, ji bo wê bûyer bi şeweyeke guncaw bi rêya wesfan ve gav bi gav derkevîne holê.

2.5. Cûreyên Wesfê Di Romanê Da

Diyarkirina cûreyên wesfê ne karekî hêsan e çimkî xwezaya wesfê bi awayekî ji çend cûreyên wesfê pirtir li xwe digire ku ev jî li gor sînor û berî û qebare û biçûkî û mezinahîya birgên wesfî û herwiha li ser binemaya wesfêkirî û wesfker û sistî û lezî ya birgên wesfî ji hev cuda ne.

Em di vir da cûreyên wesfê li ser binemaya hecma kurtî û dirêjî diyar dikin, paşê jî bi pê pêvajoya vegêranê ve balê dikşînin ser her du cûreyên wesfê ku wesfa rawestî û wesfa livdar.

⁹¹ Îbrahîm Cindarî, *el- Fez'a el- Rîwaye 'Inde Cibra Ibrahîm Cibra*, Dar el- Şi'on el- Seqafe el- Hame, Baxdad, 2001, r.182.

⁹² Karwan Mehdî 'Usman, *Teknîkî Wesf Le Romanekanî Bextîyar 'Elî Da*, r.23.

2.5.1. Cûreyên Wesfê Li Gorî Kurtî û Dirêjîya Birgên Wesfî

2.5.1.1. Wesfa Dirêj

Ev cûreya wesfê bi piranî di romanên zarlêkirî da bi ber çavan dikeve ku xwezaya wesfa romanên vê qonaxê bi awayekî dirêj bûn ku hûrî û çewtîyên ruxsara derveyî ya karakteran û herwiha wesfkirina şûnan bi çend paragrafa bûn. Weke mînak “Balzac”ê firensî di romana xwe ya bi navê “Eugenie Grandet” da bi pênçe rêzî wesfa holekê dike.”⁹³ Lêkolerên warê rexneya romanê gelek caran weke “wesfa lêkolînê” nav li vê dirêjahîya wesfê dikin. Çimkî hemû pêkhateyên bi wesfkirîyan ve girêdayî dixê ber çavan ev hemû jî bi armanca “Bexşîna têgeha rasteqîne bi nivîsandinê.”⁹⁴ ye wate ev wesfa wek wêneyekî rasteqîne xwe di nav romanê da rê didin û erka xapîner li ba xwendevanan da dirust dike. Ji ber wê divê em nav li wê cûreya wesfê bikin “Wesfa Balzac wek di romana Komîdyeya Mirovî da bi hûrgilî behsa karakter û şûnan kirîye.”⁹⁵ Ku hinek car heta radeya pêvajoya rawestina vegêranê jî ranaweste.

1.5.1.2. Wesfa Kurt

Ev cûreya wesfê bi piranî di çend birgên kurt da wesfa xwe rê dide ku bi tenê çend rûgeh û alîyên wesfkirîyan di xwe da werdigire di karakter û şûnan da û paşê dixê ber çavan. Wate bi şêweyekî gav bi gav naxebite dibe ku li gorî wesfkirîyan û pêvajoya sînora nivîsan hîlbijartinê li wesfan dike. Her ji ber vê ye beşeke gelek ya lêkoleran weke “wesfa hîlbijartin” nav lê dikin. Her wek romannivîs û çîroknivîsê rûsî Lew Tolstoy palpiştê vê wesfê ye û li dijî wesfa dûr û dirêj e ku Balzac li birgên wesfî pêştirî ya wan dikir, her wek li gor Tolstoy wiha ye ku: “Ew dûr û dirêjîya wesfê xeyalên xwendevanan dukuje.”⁹⁶

⁹³ Sîza Qasim, *Bîna El- Rîwaye*, r.80.

⁹⁴ Senger Qadir, *Binyatî Gêranewe Le Dastanî “Mem û Zîn”î Ehmedî Xanî û Romanî “Şarî Mosîqare Sipîyekan”î Bextîyar ‘Elî Da*, r.145.

⁹⁵ John Rikardo, *Qise El- Rîwaye El- Hedîse*, Wer.: Seba’h el- Cehim, Wezare el- Seqafe Wel- Îrşad, Dîmeşq, 1977, r.144.

⁹⁶ Sîza Qasim, *Bîna el- Rîwaye*, r.110.

2.5.2. Cûreyên Wesfê Li Gor Wesfkirîyan

2.5.2.1. Wesfa Derveyî

Armanc ji vê cûreya wesfê ewe ku hemû ew rûkar û xuyanî yên deranînên di xwe da digrin û wesfkirîyan da hene. Diyare ku ev xuyanî jî di wesfkirina rûxsara derveyî ya karakteran da xwe dibînin. Bi piranî ji “şêwe, reng, sîber, deng, bêhn, xwarin, sehek, liv û lebat û ziman”⁹⁷ pêk tê. Bi şêweyekî giştî laş û endamên mirovan dibin materyalên serhildan û derketina holê ya van cûreyên wesfan. Herwek Ahmed Rehmanî dibêje: “*Çîrokên nû di derxistin û eşkerekirina karakterên xwe da piştî xwe dispêrin du rêbazan*”⁹⁸ ku ev in.

1-Dahûrana (Şîkariya) Derûnî

Ev bi piranî wek pêvajoyeke şîrovekirina derûnî xebatê ji bo eşkerekirina rewşa hinava karakteran dike. Herwiha çawanîya mu’amele û tevgeran digel karakterên din û pêwendîya wan bi şûnan û ew bûyerên ku bandora wan bi ser tevger û gotinên karakteran dirust dikin bi rêya van wesfan tînin diyar kirin.

2-Piştspartin Bi Wesfa Derekî û Tevgerên Karakteran

Wate wesf bi tenê di çarçoveya rûxsar û xuyanî yên derveyî da dimînin. Bi tu awayî behsa raman û tevgerên karakteran nake.

2.5.2.2. Wesfa Navekî

Armanca ji vê cûreya wesfê nîşandan û derxistina rûyê nav yê wesfkirîyan e “bi taybetî wesfa rewîşt, hest û xwezaya jîyana navekî ya wesfkirîyan.”⁹⁹ Wate hemû tevger, reftar û guftar, rewş û hinava derûna karakteran nîşan dide. Herwiha bi rêya van wesfana ve xwendevan wê maskeyê ji ser hinav û derûniya wan hildide û bi awayekî naskirinekê ji raman û tevgerên karakteran werdigirin.

⁹⁷ Ebdulla Xemar, *Fen el- Kitabe, Teqniyat el- Wesf, Izdar Xas el- Enternêt*, Cezayîr, 2005, r.11

⁹⁸ Ehmed Rehmanî, *Nezerîyat Neqdiye We Tetbiqatîha*, Çapa Yekem, Mektebe Wehbe, Qahîre, 2004, r.38.

⁹⁹ Nebîl Eyyub, *El- Te'bîr Menhecîye We Teqniyate*, Çapa Sêyem, Dar el- Mektebe el- Ehlîye, 2001, r.175.

2.5.3. Cûreyên Wesfê Li Gor Wesfker

2.5.3.1. Wesfa Mijarî

Ev cûreyên wesfê bi piranî di romanên zarlêkirî û realîst da bi ber çavan dikevin, ku têda “bi bê tomarkirina alozî û hestan. Herwiha bê derxistina tu cûreyên tevgeran. Dibe ku behskirina wesfkirîyan bi şêweyekî rût û bêalîyan.”¹⁰⁰ Wate wesfê bê vegêran ji bo diyarkirina jînge û derxistina alîyê veşartî yên karakteran wesfên xwe bi berdewamî pê didin û herwiha “di çarçoveya vegêrana zarlêkirî ve wesfa pêkhate û hêmanên cuda yên wesfkirîyan dike ji bo têgehîştina şûn û karakterên di nav romanên da.”¹⁰¹ Ev hemû jî bi wê aramancê ye “xwendevan bi pêşbînî yên xwe nexapin, şax û baskan jê peyda nekin û heşkarîyê ne bi xerabî û ne jî bi çêyî bikar neynin.”¹⁰² Tenê wek erkekî zanyarî gîhand bi xwendevanan di wê derbarê da ku wesfa karakter û şûnan nas bikin. Herwiha em dikarin wek wesfa rasteqîne jî nav li vê cûreya wesfê bikin. Bi taybetî ji wesfa rasteqîne gîhandin bi nîvîsarê bê kêr û zêde wek ji wêneyên rasteqîne yên di xwezayê da hene û bi heman şêweyê jî ji nav birgên wesfî jî derkevin. Herwiha ji bilî vê jî gelek caran jî ji vî awayê wesfan ra dibejin “wesfa derekî” yan “wesfa rûxsarî”. Çimkî hewqasî bi şêweyekî hûrgilî behsa derveyî ya wesfkirîyan dike. Herwiha bi dîtina wesfkirina rûxsar û endamên laş û wesfkirina kincan yan jî wesfkirina xanî, kolan û kuçe û bajar û balexaneyan bin ku romannivîs pê zane û gelekî bi hûrgilî û hişyarî behsa hemû van wesfkirîyan dike.

2.5.3.2. Wesfa Xweyî

Ev wesfa gelek caran wek “wesfa derûnî” yan “wesfa navekî” jî tê bi navkirin ku bi piranî pêdagirî li ser derxistin û alî û rehendên kûr yên nava wesfkirîyan dike bi taybetî jî di derxistina alîyê veşartî yên karakteran li alîyê derûnî ve. Wate wek alîyekî giştî behsa tevger û reftar û gotinên wesfkirîyan dike. Ev şêweyên wesfê bi piranî di romanên “pêla hişî” da bi ber çavan dikevin “şûn dibin helgirê nixrê hestên bandordar û kûrahîya karakter û alîyê wan yê derûnî û tevgerên wan yê derekî ron dibin.”¹⁰³ Di vir da jî derdikeve ku ev wesfana bi berûvajî ya wesfên mijarî

¹⁰⁰ Nebîl Eyyub, *b.n.b.*, r.175.

¹⁰¹ Amîne Yusif, *Teqniyat el- Serd Fî el- Nezerîye Wel- Tetbîq*, r.96.

¹⁰² Azad Mihemmed Se'îd, *Kurtîle Çîrokî Kurdî Le Başûrî Kurdistan Da 1970 - 1979*, r.154.

¹⁰³ Îbrahîm Nemir Musa, “Cemalyat el- Teşkil el- Zemanî Wel- Mekanî el- Rîwaye”, *Mucele Fisul*, el-Muceled 12, J. 2, 1993, r.314.

danûsandinê digel karakter û şûnên nav romanên dike. Weke mînak eger wesfên mijarî pêdagirîyê li ser xuyanî û rûxsarê kiribe, wesfên xweyî jî pêdagirîyê li ser naverok û rewîşt û tevgerên karakteran dikan. Di vê cûreya wesfê da bi bikaranîna peyv û komên peyvên ve guherîn bi ser da tê. Çimkî wesf bi piranî bi arasteya watedarbûnê ve gava davêjin loma romannivîs gelek caran “naçarî wê dike ku çend peyvên bikar bîne ku gelek caran ev peyvên ji wateyên xwe ya ferhengî diçine derê û di nav nivîsaran da wateyên mecazî yê cûr bi cûr tînin holê.”¹⁰⁴ Her ji ber wê ye ev bikaranîna ziman bi rêya peyvên watedar ve, wesfa derûnî ya karakteran û çawayî danûsandina wan digel karakterên din û şûnên nav romanên tîne holê.

2.5.3.3. Wesfa Têramanî (Hizrî)

Armanç ji vê ewa yê wesfê “berdewam lênerîna wesfkirîyan e, tevlîbûn û niqumbûn di nav da û xebata digel da, pîrskirin di derbarê alîyên veşartî yê ceribandina ew ramanên ku dibetî ya wan heye îlhamê jê werbigre.”¹⁰⁵ Bi vê rêyê ve birgên wesfî bi piranî bandorê li ser xweza û binyata derûnîya karakteran dikan, lê ewên ku bi şêweyekî berçav diyar nabin di nav birgên wesfa têramanî da “şûna wesfkirî” ye. Çimkî romannivîs giringiyeke zêde bi wesfên şûnî nadin. Belkî zêdetir di çarçoveya nîşankirina bilez da di nav şûnan re derbas dike. Ji ber vê ye ev cûreyên wesfê bi piranî bi romanên rêbaza “pêla hişî” ve girêdayîne. Her ji ber vê ye jî dîtîna û ramanên vê rêbazê bi taybetî bi van cûreyên wesfê ve diyarkirina rewşa derûnîya karakteran e ku bi berawirdî ya wesfkirina şûnan.

2.5.4. Cûreyên Wesfê Li Gor Rîtma Pêvajoya Vegêranê

2.5.4.1. Wesfa Rawestî

Ev cûreyên wesfê dixebite ji bo rawestan û hêdîkirina lezbûna vegêrana nivîsan. Bi taybet jî pêvajoya vegêrana bûyeran. Loma dema ku romannivîs hest bi wê dike ku bûyer di pêvajoya vegêrana da bi lezê gava davêjin xwe davêje ber “herikandina dema vegêrana bûyeran rabigre, nahêle bûyer bi şêweyekî xwezayî bervî pêş li ser xêza vegêranê ve pêşbikeve.”¹⁰⁶ Wate di vê gavê da pêvajoya bûyeran

¹⁰⁴ Serkewt 'Umer, *Binyatî Hunerî Le Romanî Kurdî Rojhel-atî Kurdistan 1998- 2008*, Nameya Masterê, Kolêja Perwerde, Zanîngeha Koye, 2008, r.85.

¹⁰⁵ Nebîl Eyyub, *el- Te'bîr Menheciye Wel- Teqniyat*, r.176.

¹⁰⁶ Necim Elwenî, *Bînay Kat Le Sê Nimûney Romanî Kurdî Da*, r.201.

xav dike, li alîyê din jî wesf wek teknîkeke hunerî wesfa tiştên rawestî dike. Weke mînak: “Wesfa darekê yan xanîyekî dike ku di cîhê xwe da bê liv û lebat rawestya ye.”¹⁰⁷ Herwiha di rewşa rawestî da wesf ji nêzik ve wesfa wesfkirîyan dikan, wek çawa gelek caran wesfên rawestî dibin “hevterîbê wesfa nêzik bi şêweyekî kameraya romannivîs gelekî ji nêzikî ve bi firçeya peyvên wêneyekî zihnî wesfkirîyan dixê ber çavan. Herwiha dibe heyvanê dirustbûna wêneyê wesfî ku wesfkirîyan di rewşa rawestî da nîşan dide.”¹⁰⁸ Loma li ser binemaya nêzikî romannivîs wesfa kes û şûn û tiştên rawestyayî dike ku “hêmanên vegêranê têda tune ye yan jî wêneyekî rawestyayî temsîl dike û rê nade bi demê ku di nav birgên wesfî da derbas bibe.”¹⁰⁹ Ev wêneyên rawestyayî ji nêzik ve encamê dide ji ber vê jî em dikarin ji van cûreyên wesfan re bibêjin “wesfên nêzik”.

2.5.4.2. Wesfa Livdar (Bezok)

Ji wan awayên wesfan pêk tên ku hemû birgên wesfî di rewşa bezînê da xwe rê didin û pêvajoya bûyeran bi temamî ranawestînin. Belkî ev awayên wesfan “girêdayîyê vegêranê ye û wêneyê livdar jê peyda dibe û qadê ji demê re vedike ku di nav birgên wesfî ra derbas bibe.”¹¹⁰ Di vir da pêvajoya vegêrana bûyeran û dema vegêranê di pêşketîneke berdewam dane û di xwe da xavbûnê nabîne ku ji ber wê wêneyekî tevlihev ji wesf û vegêranê tîne holê. Wate ji alîyê romannivîs ve wesf û vegêran bi şêweyekî hevterîb li ser yek xetê digel hev gavê davêjin û her du teknîk bi hevdu re di hilbijartina wesfan da karakter, şûn û bûyeran peşkeş dikan. Weke mînak: “Wesfa cotkarekî di dema palîyê da yan wesfa firindeyekî/ê di dema firînê da.”¹¹¹ Di wesfkirineke bi vî awayî da pêwîstîya romannivîs bi hûrgilîyeke pir heye ku bikaribe wêneya wesfa cotkar û firinde bike. Herwiha cûre û şêwaza karkirina xwe ku di rewşeke livdar da ye peşkeş bike. Kewate ev awayê wesfê jêhatîbûn û jîrîya romannivîs di derbarê bikaranîna birgên wesfî da derdixe holê. Divê bi awayekî giran û xurt bi berawirdîya digel cûreyên din yê wesfê bête danîn. Herwiha hebûna van

¹⁰⁷ Azad Mihemmed Se'îd, *Kurtîle Çîrokî Kurdî Le Başûrî Kurdistan Da 1970- 1979*, r.154.

¹⁰⁸ Beyan Mecîd Se'îd, *Bunyadî Wesf Le Romanî “Şar” î Husên 'Arîf*, r.49.

¹⁰⁹ Şakir Sabîr, *El- Feza El- Rîwaye 'Indî Selîm Berekat*, Çapxaneya Rojhilat, Çapa Yekem, 2012, Hewlêr, r.128.

¹¹⁰ Şakir Sabîr, *b.n.b.*, r.128.

¹¹¹ Azad Mihemmed Se'îd, *Kurtîle Çîrokî Kurdî Le Başûrî Kurdistan Da 1970- 1979*, r. 155-156.

awayên wesfê di romanên nû da bi ber çavan dikevin bi taybetî di romanên “rêbaza pêla hişî” da wêneyên wan bi piranî di rewşên livdar da dihatin nîşankirin.

2.5.5. Cûreyên Wesfê Li Gor Pêwendîya Wan Digel Vegêranê

2.5.5.1. Wesfa Sade

Ev cûreya wesfê bi piranî di çarçoveya çend peyvên sade da tê pêşkeşkirin “ku bi tenê hinek pêkhatyên wesfên biçûk di xwe da digrin û bi piranî bervî jê pakbûna hûrgilî û dirêjkirinê ve diçe.”¹¹² Ev jî tê wateyê ku ev awayê wesfê balê nakşîne ser hûrgilîyên rûkar û pêvajoya cûr bi cûrên karakter û şûnan. Weke Mînak: Di behsa wesfkirina mêrekî bi tenê bi hevokekê wesf dike û dibêje: “mêrekî çeleng yan mêrekî lawaz.”¹¹³ Di ramanên me da jî bo vê cûreya wesfê bi tenê ev dîtina li ba xwendevanan çê dibe ku “mêrekî çeleng e” lê ev li gor behskirina hûrgilîyan e ku ruxsar, bejn û rengê çavê wî ne. Tu cûreyê zanyarî yên din jî bo wesfkirîyê wî nade destê xwendevanan. Çimkî xwezaya vê cûreya wesfê bi wê şêweyê ye ku wek di sera behsa karakter û şûnan dike û wesfeke sade û kurt jî bo wan dike. Ji ber vê yekê bi piranî ev wesfa sade digel wesfa kurt hevterîb dibin. Çimkî her du cûre jî li alîyê qebare ve di pêşkeşkirina birgên wesfê wan da xwedî binyateke hevşêwe ne. Di encama vê da jî gelek caran wek “wesfa kurt” yan “wesfa hîlbijartî” tê bi navkirin.

2.5.5.2. Wesfa Tevlihev

Ev cûreya wesfê bi hevok û komên peyvên aloz ve hatîye barkirin. Di piranîya demê da ev awayê wesfê bi rêya wesfa dirêj ve tê pêşkeşkirin. Ku wêneyekî wesfkirîyê kûr bi şêwazeke vegêraneke hûrgilî di nav romanên da derdikeve holê. Wate gav bi gav bi şêwazeke hestiyar xuyanî û rûkara wesfkirîyan û pêvajoyên navekî yên karakteran nîşan dide. Kewate ev cûreya wesfê di navbera wesfa rawestyayî û wesfa livdar da berdewamî vegêrana birgên wesfî dike ku têda pêvajoya dema vegêrana bûyeran ranaweste.¹¹⁴

¹¹² Ebdulletîf Mehfûz, *Wezîfe el- Wesf fî Rîwaye, Dar el- ‘Erebîye el- ‘Alim Neşrun*, Çapa Yekem, Beyrut, 2009, r.49.

¹¹³ Ebdulletîf Mehfûz *b.n.b.*, r.49.

¹¹⁴ Ebdulletîf Mehfûz, *Wezîfe el- Wesf fî Rîwaye*, r.49; Beyan Mecîd Se’îd, *Bunyadî Wesf Le Romanî “Şar”î Husên ‘Arîf*, r. 46.

3.5.5.3. Wesfa Axmeyî (Belavî)

Armanc ji vê cûreya wesfê ewe ku romannivîs “pêvajoya tişt û dîmen û tabloyan lihev dide û bi şêweyeke ku derfetê bidê û bibe tewereke (binbeş) serdest. Bi taybetî tewereya vegêranê biçe rewşa hêvî û daxwazan.”¹¹⁵ Wate di vir da di hemû birgên vegêranê da amadebûna wesfê heye ku romannivîs dixê rewşekê ku bi şêweyekî hûrgilî hemû hûrgilîyên di derbarê derûna karakteran û hizr û raman û zîhnên wan di çarçoveya birgên wesfî da pêşkeş bike û “pêkhateyên wesfî tevî pêkhateyên vegêranê bike.”¹¹⁶

Bi diyarkirina van cûreyên wesfî ku li jorê me ron kir, lê ji alîyê hinek rexnegir û lêkolerên warê rexneya romana çend awayên din yê wesfê hatine destnîşankirin. Weke mînak. “Ebdulla Xemar” du cûreyên din yên wesfê ji wesfa derekî cuda dike.

2.5.5.4. Wesfa Gav Bi Gav

Armanca ji vê cûreya wesfê ewe ku digel pêvajoya bûyerên nav romanê gava davêje û bi şêweyekî hevterîb pê bi pê digel dem û pêvajoya vegêranê ve bûyeran digîne hev. Wate wek yekeyeke ji hev neqetyayî wek parçeyekî bi vegêrana ve tê girêdan bi taybetî parçeyên wesfên bûyer û karakteran. Herwiha divê em bibêjin ev cûreyên wesfê bi berawirdî bi cûreyên din yên wesfê hewqas “wesfeke zindî û çalak e ne hişk û rawestîyayî ye. Çimkî pê bi pê gava davêje nav bûyerên romanê.”¹¹⁷ Li alîyekî din ev wesfikirina gav bi gavî dibe awayekî çêj jê wergirtina hunera wesfê. Çimkî bi şêweyekî berdewam digel her cûreyê tevgerîneke bûyer û karakteran bi şêwazekê ji birgên wesfa xwe ve bi bilindîya bûyer û karakterên nav romanê darve dike. Di encamê da jî xwendevan çêjeke estetîkî jê werdigire.

2.5.5.5. Wesfa Kemperî (Berawird)

Ev cûreya wesfê bi piranî di çarçoveya daneberheva wesfikirîyan da derdikeve ku têda “wesfa berawirdîyê di navbera du wesfikirîyanda dixê ber çavan.”¹¹⁸ Cudahî û taybetmendîyên ev wesfana ji wesfên din di wê da xwe dibîne ku romannivîs bi tenê

¹¹⁵ Ebdulletîf Mehîz, *Wezîfe el- Wesf fî Rîwaye*, r.54.

¹¹⁶ Mecmu'e Muelîf, *el- Fez'a el- Rîwaî*, Wer.: 'Ebdulrehîm Xezil, r. 45.

¹¹⁷ Karwan Mehdî 'Usman, *Teknîkî Wesf Le Romanekanî Bextiyar 'Elî*, r.25.

¹¹⁸ 'Ebdulla Xemar, *Fen el- Kitabe*, Teqnîyat el- Wesfa, r.153.

wesfa yek wesfkirî nake. Belkî di vir da pêwîstî bi du wesfkirîyan heye ta ku bi şêweyekî hûrgîl di encama van wesfkirinan da pêvajo û alîyên cuda û lihevçû û xalên erênî û nerênî yên wan têxe rû. Ji bo ku hest û lênerîna xwendevanan bi hêsanî birgên wesfî yên berawirdî bixwînin.

2.5.6. Cûreyên Wesfê Li Gor “Gerard Genette”

Di pêwendîya wesf bi asta vegêranê û asta çîrokê ve Gerard Genette dû cûreyê wesfê diyar dike ku ev yên li xwarê ne:

2.5.6.1. Wesfa Xemlîntî (Dekoratîf)

Ev cûreya wesfê bi piranî di romanên zarlêkirî da bi ber çavan dikevin, dema romannivîs wêneyê ruxsar û xuyanî ya karakteran nîşan dide yek caran bi sistî bervî hinav û derûnîya karakteran ve diçe. Bi vê rewşê jî birgên wesfî bi tenê li ser xebata alîyê ciwankarî û estetîkîya birgên wesfî û derxistina pêvajo û şîyanên zimanî yên romannivîs tên bikaranîn. “Bi wê ku bixwaze ev wesfana bikar bîne ji bo zengînkirina nirxa wateyî ya nivîsan.”¹¹⁹ Kewate birgên wesfî ji nirx û rêmanên civakî, dîrokî û derûnî betal dibin.

2.5.6.2. Wesfa Şênber

Gerard Genette, di behsa her du cûreyan da wiha dibêje: “Eger wesfa xemlîntî pêwendîya wê bi asta gotarê hebe wê demê pêwendîya wê bi asta çîrokê ve jî heye.”¹²⁰ Di vir da armanca ji pêwendîya wê bi asta çîrokê ve ewe ku romannivîs ev birgên wesfî bi xwe bikaranîye. Belkî bi rêya van wesfana ve komek erk di nav romanê da encam didin ku ji gihandina armancê û wateyekê ye ku ev jî bi berevajîya wesfa xemlîntî ye. Çimkî bi rêya vê wesfê ve romannivîs hemû alîyê veşartî yên karakteran dixê ber çavê xwendevanan û di encama derxistina rûyê nava karakteran jî pêwendîya rewşenbîrî, civakî, aborî ya karakteran ji alîyê xwendevanan ve tê naskirin. Wate em bi tu awayî nikarin ev kêteyên wek kêteyên wesfî tên naskirin di nav nivîsên romanê da ji bîr bikin. Çimkî bandorê li binyata nivîskara romanê dike û

¹¹⁹ Necim Elwenî, *Tîyorî Komel Nasîy Roman*, r.195.

¹²⁰ Roland Barthes, *Medxel- lîl Te’lîl el- Binyewî el- Qises*, Wer.: Menzîr ‘Eyaşî, Çapa Yekem, Merkez el- Nîma el- Hedârî el- Dîrase wel- Terceme wel- Neşîr, Heleb, Suryaya, 1993, r.50.

derxistina wan ji nav nivîsên romanê hildiweşîne ev jî vê ramanê dipeyîftîne ku “tu vegêraneke romanê bê wesfê nabe.”¹²¹

2.5.7.Çend Cûreyên Giştî Yên Wesfê

Di ser ev hemû cûreyên wesfan, çend awayê giştî yê wesfan hene. Em ê bi çend hevokên kurt behsa wan bikin.

2.5.7.1.Wesfa Rasteqîne

Pêwendîya wê bi rasteqînebûna nivîsandinê ve heye ku nivîskar bi şêweyekî rasteqîne wesfa karakter, şûn û tiştên rasteqîn dike. Loma divê ev cûreya wesfê hevterîbê wesfa derekî be bi taybetî jî di romanên realîstan da.¹²²

2.5.7.2.Wesfa Aşopî (Xeyalî)

Armanc ji vê cûreya wesfê ewe ku nivîskar bi şêweyekî xeyalî karakter û şûnan di nav birgên wesfî da pêşkeş dike. Wate di çarçoveya zîhna xwendevanan da nîne û xwendevan nikarin pê bervî wan şûnan bavêje, renga ku yek caran ev wesfa di çarçoveya utopîk (xeyalî) da were pêşkeşkirin.¹²³

2.5.7.3.Wesfa Derûnî

Di vê cûreya wesfê da romannivîs xwe davêje eşkerekirin û hildana rûyê nava karakteran ve û alîyê veşartî yê karakteran û awayê danûsandin û pêwendî û tevger û reftar û guftarên digel karakterên din. Ev awayê wesfê di her du rêbazên klasîkî û romanên pêla nû da bi ber çavan dikevin. Herwiha di hinek rewşan da divê hevterîbê wesfa navekî be.¹²⁴

2.5.7.4.Wesfa Dîrokî

Di vê cûreya wesfê da romannivîs xwe davêje ber wesfkirina karakter û şûnan herwiha wesfkirina hinek bûyerên dîrokî ku bi armanca nîşandan û vegêranê ve karakter û bûyerên mêtîyûî bîne bîra xwendevanan. Kewate di vir da wesf wek

¹²¹ Ebdulletîf Mehîz, *Wezîfe el- Wesf fî Rîwaye*, r.54.

¹²² Azad Mihemmed Se'îd, *Kurtîle Çîrokî Kurdî Le Başurî Kurdistan Da*, r.154.

¹²³ Azad Mihemmed Se'îd *b.n.b.*, r.154.

¹²⁴ Necim Elwenî, *Tîyorî Komel Nasîy Roman*, r.195.

navgînekê ji bo zanebûn û diyarkirina qonaxên dîrokî tê bikaranîn roleke dîrokî werdigire.¹²⁵

2.5.7.5. Wesfa Civakî

Di vê cûreya wesfê da romannivîs rewşa xwe ya balkêş dixê ser rewş û pêgeh û bîrdoza karakteran bi taybetî di pêwendîya wan ya digel kevneşopîyên civakî û cîhanbînî û bîrdoza karakteran ku hemû bi rêya birgên wesfî ji bo xwendevanan tê pêşkeşkirin.¹²⁶

2.6. Wesf Di Romanên Klasîk Da

Eger em bala xwe bidin dîroka rexneya romanî ya cîhanê em dibînin ku bi pê qonax û deman gelek guhertin bi ser pêvajoya romanî ya cîhanê da hatîye. Di her qonaxekê da hêman û teknîkên romanê ketine bin guherkarîya wê herikê ku bi giştî bi ser wêjeya cîhanî da hatîye. Herwiha di nav wan da jî herika guherkarîya romana cîhanî. Çimkî roman berhema pergala sermayedarî bû û wek cûreyeke hunera bilind li dû serhildana pergalên sermayedarî hatine nav cihana wêjeyê û paşê jî gav bi gav di nav wêjeya rojhelata navîn belav dibe û ta ku olanê di wêjeya kurdî da dide. Hunera wesfê jî wek yek ji huner û teknîkên vegêrana romanê ketîye bin wê guherkarîya ku bal kişandîye ser şewaza cûreya romanê, li alîyekî din hunera wesfê xwedî bandoreke mezin bû bi ser pêvajoya vegêrana romanê. Dîsan bi pê qonax û serdeman ve guherkarî bi ser vê wesfê da hatîye. Loma raman û dîtînen taybet yên romannivîsên cîhanî di seretayên romanên da bi huner û teknîkên nivîsandina romanên hebû. Bi taybetî jî di derbarê hunera wesfê û çawayî Bikaranîna wan di nav nivîsên romanê da. Bi wateyeke din wesf di romanên klasîkî yan jî zarlêkirî da xwedî kesayet û taybetmendîyeke cuda bû, wate şewaza pêşkeşkirin û darijtina hunera wesfê digel forma pêşkeşkirin û hunera wesfê di nav romanên nû da ji hevdu cuda bûn. Di vir da jî xuyaye ku nivîsên wêjeyî bi berdewamî di nûbûn û guherkarîyê da ye û dîtin û ramanên nivîskar û romannivîsên cîhanê di derbarê teknîk û hunera vê cureya wêjeyî herdem di pêşketinê da ye

¹²⁵ Necim Elwenî, *b.n.b.*, r.195.

¹²⁶ Necim Elwenî *b.n.b.*, r.195.

Di destpêka derketina wêjeya cihanî de hunera wesfê xwedîyê dengê mezî nebû. Belkî “ji bo demeke dirêj weke paşko û rolgêrek neserekî digel vegêranê da xwe rê da.”¹²⁷ Ev jî di demeke ku di derbarê vê da gelek raman hene ku dibêjin wesf û vegêran du daneyên ji hevdu neqetyayî ne. Çimkî “gelek caran vegêran û wesf tevî hevdu dibin ku dikarin wêneyên vegêranê ranewestînin û hemû tiştan di rewşeke lebatî da nîşan didin, lê wêneyê wesfa tiştan di rewşeke rawestî da nîşan didin.”¹²⁸ Wate yek bê ya/yê din nikarin xwe di nav nivîsên romanê da nîşan bidin yan jî nivîsên romanê bê herduyan ji dayik nabin. Weke mînak: Dema vegêr dest bi vegêrana bûyer û wesfa karakter û şûn û dema nav romanê dike divê di behskirina wan hemûyan da huner û teknîka wesfê bikar bîne. Eger na vegêrana wan tê girêdan û nikarin karakter û bûyeran li ser staja romanê binasînin. Di ser van hemû tiştan da jî bi pê qonaxên cuda ve guherkarî bi ser wesf û şewazên wesfê da hatiye. Bi taybetî di romanên klasîkî da hunera wesfê kêrman yan hindik bandora xwe li ser romanên cihanî da hebû ye.

Di romanên klasîkî da bi taybetî jî di serê sedsala nozdeyan da romannivîsan dixwest ji rêya hunera wesfê bi piranî wêneyên rasteqîne wek xwe veguhezîne nav nivîsên romanan. Wate bi piranî di çarçoveya wêneyekî realîstî da bizivire ji ber vê jî armanca wan ya serekî di hunera wesfê da “Bi armanca wênegirtineke dîtbarîya realîstî ve çêkirina dekor û berçavkirina fîzîka karakteran û dîyarkirina çarçoveya bûyeran bû.”¹²⁹ Ev gava jî bi piranî di romanê romannivîsên realîzmî da berbelav bû. Bi taybetî jî li dû serhildana rêbaza realîzmî da. Çimkî armanca wan ya serekî nîşandana rasteqîneyê wek xwe bû. Wate bawerîyeke wan ya temam bi wê hebû ku roman û berhemên wêjeyî divê mirêka civakê be û têgînê li xem û xewnên civakê bike. Her ji ber vê yekê ye sîdwergirtina ji wan ji hunera wesfê zêdetir di vê çarçoveyê da bû ku wesfa karakter û şûnan bi şeweyeke wiha ji nav nivîsên romanê were darijtin ku tu deme xwendevan dernexine holê ku wesfa karakter û bûyer û şûnên di nav romanan da dîr in ji wê rasteqînîya ku di nav civakê da bûna wê heye. Yan jî bi şeweyekî utopîk xistine rû. Belkî berhemên wan rasteqînîyan e ku ji jîngeha jînenîgarîya romannivîs serî hildide.

¹²⁷ Şuc’a Muslîm Dexîm el- ‘Anî, el- Bîna el- Fenî el- Rîwaye el- ‘Erebîye Fil ‘Îraq, Nameya Doktora, Kollêja Wêjeyê, Zanîngeha Bexdayê, 1987, r.237.

¹²⁸ Sîza Qasim, Bîna el- Rîwaye, r.113.

¹²⁹ Se’îd Yeqtîn, Te’hlîl el- Xîtab el- Rîwaye, “Zemin, el- Serd, el- Te’bîr”, r.67.

Ji alîyekî din ve di romamên klasîkî da “gelek caran romannivîs berî ku kesayetîyekê bhênte nav bûyeran di pêşî da wesfa xuyanîya wan kesayetîyan dike”¹³⁰ û berî ku xwendevan bi dû bersîvê wan pirsên li ser hêmanên kes û bûyer û şûn û demen di nav romanên da çê dibin amadekarîyek pêşwext ji bo xwendevanan dike. Belkî vegêr bi rêya hunera wesfê ve wan zanyarîyana dide me ku pêwendîya bi xuyanîya derveyî ya karakteran ve heye. Weke mînakê di romanên sed sala nozdehem da di wêjeya îngilîzî da ku wek “Serdema Vîktorya” nav lê hatibû kirin bi piranî cûreya wesfan digel hev û pêwendî û gengeşîya di navbera karakteran bi sedema wesfê ve çawa bû”¹³¹ pêk dihatin. Wate romannivîsên Vîktorya di wê xebatê da bûn ku xwendevanan bi rêya wesfên derveyî ya karakter û kincên karakteran û asta rewşenbîrî û rewşa aborîya karakteran ji bo xwendevanan eşkere bikin.

Taybetmendîyeke din ya wesfê di romanên klasîkî da dirêjgotin e. Dema ku romannivîs dixwast wesfa karakter û şûnên nav romana xwe bike bi çendîn rêz û rûpel ve behsa van şûn û karakteran kirîye. Carê jî wa hebû di behskirina odeyekê da çendîn rûpel tijî kirîye. Ev jî bûye sedema dirêjkirina romanê û bi rêya vê hunerê ve bervî sistî û xavbûnê ve diçe. Diyarê ev taybetmendîya wesfê di romanên klasîkî da bi piranî ji alîyê romannivîsên realîzmî ve hatîye pejirandin û bang ji bonê hatîye kirin. Herwiha armanca wan ji vê dirêjkirinê “zarlêkirina jîyana rasteqîne û bi emanetî veguhezandina wê ketwarê ji bo nav cîhana romanê”¹³² û amadekirina xwendevanan li alîyê derûnî ve ku ew wesfa berfireh ya di nav romanên da rû dide. Mîna keke zindî ya nav civakan e û her ji ber vê yekê jî romanên klasîkî xwedî wê ber û dirêjî ya berfireh ya wesfê bû. Herwiha ev ber û dirêjîya berfireh ya wesfê di romanên klasîkî da bê sedem nehatine holê. Belkî di gelek rewşan da romannivîsan dixwestin xwendevanan nasberî kesayetîyan û dîroka nasnameya şûnan bikin. Ev nasandina jî tenê bi rêya hunera wesfê ve têkirin. Weke mînak; Dema ku romannivîseke/kî serdemên kevnar wesfa bajarekî dike. Bi şêweyekî hûrgilî û berfireh hemû rû û alîyên vî bajarî ji bo xwendevanan eşkere dike. Ev jî dibe sedema wê ku hizir û ramana xwendevanan bervî xwe bikşîne û balkêşîya wan di derbarê

¹³⁰ Necim Elwenî, *Bînay Kat Le Sê Nimûney Romanî Kurdî Da*, r. 305.

¹³¹ Michael Irwin, *Picturing, Description and Illusion in the Nineteenth-Century Novel*, Routledge Library Editions, London And New York, p. 2.

¹³² Diyar Faîq Mecîd, *Bunyatî Wesf Le Romanî “Rêga”y Mihemmed Mewud Mem Da*, r.5.

şûnan da pirtir û hûrgilîtir bike. Ev şêwaza nîşandanê tenê di romanên klasîkî da bi ber çavan dikeve.

Herwiha taybetmendîyeke din ya hunera wesfê di romanên klasîkî da ew e ku ev hunera di piranîya deman da di çarçoveya rehendeke îstatîkî da bikar hatîye. Weke mînak: “Ew wesfên di romanên Balzac da hene ku wek “Wesfa Balzac” hatîye bi navkirin tijî ye ji tiştan ku komek wesfên hûrgilîtir têdaye û pêwendîya wan bi cîhana gelek madeyan ve heye. Mal, tişt û mişt, kinc. Bi kurtî hemû ew tiştên milkê kesan in.”¹³³ Bi piranî armanca ji ev wesfên hûrgilî û dirêj xemlandin û ciwankirina tiştan bû. Di piranîya deman da nivîskar û romannivîsan xwe avêtine ber bikaranîna wesfên dirêj û berfireh ji bo ku bikaribin şîyana hunerî ya bikaranîna ziman û rewanbêjîya xwe nîşan bidin, her çiqas li ba Jean-François Marmontel¹³⁴ “wesf yan wesfa dirêj bi piranî ji bo geştnameyan e dişibin romanan.”¹³⁵ Ev ramana Marmontel wê derdixe ku ew li dijî wesfa dirêj bû li ba romannivîsên klasîkî. Digel wê da jî rexnegirên sedsala nozdeyan jî wek astengîyeke wêjeyî temaşeyî vê dirêjgotin û dirêjkirina wesfê dikirin û li gor wan wa ye “ku pergala û sînorekî diyarkirî ji bo hemû tişt têkevîne ber dîtina nivîskaran tune.”¹³⁶ Wate her dema ku nivîskar û romanûs bixwaze bûyer, karakter û şûnên nav romana xwe têxe ber tîşka wesfêkirinê, ji bo wan derîyê wesfêkirinê bêsînor e û dikarin bi daxwaza xwe ve bi çendîn rûpelan û bêdawîtî ev wesfên xwe dabirêjin. Balzac, “Di romana Eugenie Grandet da ji pênçe risteyî zêdetir da wesfa holekê dike.”¹³⁷ Ev ji bilî wê ku di encama vê wesfa dûr û dirêj da berdewamî wesf li pêş hêmana bûyera nav roman û çîrokan tê û dem û bûyerên nav romanê radiwestîne û bi awayekî rihetbûnekê dide xwendevanan. Bi taybetî jî ew xwendevanên ku lez dikin ji zanîn û rewşa bûyer, dem û karakterên nav romanê û dixwazin zûtirîn demê da di derbarê naveroka romanê zanyarî têkeve destê wan. Lê ev wesfa bi wê wateyê nîne ku bêkêr e û tu encamê nade destê xwendevanan. Belkî di piranîya demê da aramgirtina xwendevanan li ser wesfên dûr û dirêj, asta rewşenbîrî û aborî û siyasî û paşxana pêzanîna karakteran

¹³³ Nathalie Sarraute, Alan Robbe Girlet, Lucien Goldmann, *Roman û Waqîh*, Wer.: Selah ‘Umer, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2008, r.35.

¹³⁴ Jean-François Marmontel: *Diramanivîs û rexnegîrêkî wêjeya Fransî bû*. Di sala 1723 li bajarê Parîsê ji dayîk bûye û di sala 1799 her li Parîsê koça dawî kirîye.

¹³⁵ Muhsîn Ehmed ‘Umer, *Ferhengî Edebî*, r.303.

¹³⁶ Muhsîn Ehmed ‘Umer, *b.n.b.*, r.303.

¹³⁷ Sîza Qasim, *Bîna El- Rîwaye*, r.80.

derdikeve. Herwiha ewa dike ku xwendevan baştir ji karakter û bûyerên nav romanên têbigêhin.

Ji ber wê wesf li ast û çarçoveya hêmana şûn û kesên nav romanê ve dixebite, pêwendîya tûnd û xurt ya digel ev her du hêmanan e. Loma di vir da wesf rastî du arasteyên pêşkeşkirina kesan werdigire ku ji pêşkeşkirina “rêya ragihandinê û rêya nimayîşkirinê” pêk tînin. Herwiha rêya ragihandinê bi piranî di romanên zarlêkirî da bi ber çavan dikeve. “Ev cûreya di pêşkeşkirina kesên çîrok da ji ragihandina kesan pêk tê ew jî yan bi sedema wesfkirina wan kesan ve ye yan jî bi sedema behskirina wan e ji aliyê çîroknivîs ve yan jî ji aliyê kesên din ve ye.”¹³⁸ Wate di romanên klasîkî da wesf tenê karakteran li aliyê derveyî pêşkeş dîkin. Wate erka biryardanê di wesfa şûn, kes û bûyeran da çîroknivîs yan romannivîse. Belkî destê wê yê serekî di darijtin û wesfkirina hêmanên nav romanên da heye. Bi wateyeke din di pêşkeşkirina wesfa karakteran da di romanên klasîkî da destê xwendevanan di binyat danîna vê cûreya wesfê da tune ye. Çimkî wesf bi şêweyekî darêjraw in ku divê xwendevan tenê digel pêvajoya wesfan da gavê bavêjin û wek paşkoyekê di xwendina roman û çîrokan da bimîne.

Herwiha taybetmendîyeke din ya wesfê di romanên zarlêkirî da dûbarekirin e. Wate romannivîs di piranîya demê da di wê xebatê da ye ku xwendevanan ji hemû birgên bi romanê ve girêdayî agahdar bike. Weke mînak: “Di romaneke 600 rûpelî eger ji komê beş pêkhatibe û komê karakterên serekî û neserekî têda hebin. Di beşa yekem da behsa karaktereke/î romanê dike, em yê xwendevan dema digêjin beşên dawîyê û wesfên karakteran di bîra me da namîne loma di vir da romannivîs bi teknîka dûbareyî wesfan dûbare dike.”¹³⁹ Ev bibîranîna romannivîs ji bo xwendevana bi piranî di romanên zarlêkirî da bi ber çavan dikeve. Herwiha jî rîya romannivîs derdixe ku rê nade raman û heşê xwendevanan li ser wesfa karakter û şûnên nav romanê ji ber çavan bikeve. Herwiha romannivîsên sedsala nozdeyan yê Serdema Vîktorya wek Charles Dickens û T. S. Elliot. “Bawerîya wan wa bû ku wesf dibin sedema wê ku xwendevan bi şêweyekî ji karakter û bûyeran têbigên.”¹⁴⁰ Her ji

¹³⁸ Perêz Sabîr, *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî*, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2001, r.186.

¹³⁹ Michael Irwin, *Picturing, Description and Illusion in the Nineteenth-Century Novel*, r.5.

¹⁴⁰ Michael Irwin, *b.n.b.*, r.5.

ber vê ye di romanên xwe da gelekî girîngî dane wesfê û berdewamî bi rêya wesfê ve karakter, şûn û bûyer birêve çûne ta ku hemû balkişandina xwendevanan li ser wesfan be.

Dikarîn taybetmendîyên wesfê di romanên klasîk da bi vê şêwaza xwarê ve di çend xalên kurt da behsa wan bikin.

1- Wesf wek binyat û hunerekê di romanên zarlêkirî da bi piranî di çarçoveya dirêjdadirî yê da bû. Bi taybetî li alîyê hecma rûpelan wate bi piranî romannivîsên vê qonaxê bi şêweyekî hûrgilî wesfên derbarê şûn, karakter û bûyerên nav romanên xwe nivîsandine.

2- Di romanên zarlêkirî da wesf bi piranî bi armanc û armanca estetîkî û xemlandina birgên wesfê da bikar hatine. Weke mînak; gelek caran romannivîsan şîyanên xwe yê hunerî bi taybetî ji alîyê ziman û lihevçûna karakteran bi rêya wesfê ve derbirîne. Kewate di vir da wesf di vê qonaxa romanê da bûye sekoya şanoyekê ku romannivîs şîyanên xwe yê hunerî li alîyê ziman û rewanbêjî û ciwankariyê ve pêşkeş bikin.

3- tekezkirina wesfê li ser karakterên nav romanên klasîkî di çarçoveya xuyanîya derveyî ya karakteran bû û girîngîya wan bi piranî li asta derveyî ya karakteran da bû. Kêmtirîn car xwe di wesfêkirina alîyê navîn û hinava karakteran da rê daye. Ev jî bi wateyê ye ku wesfên romannivîsên vê qonaxê bi piranî mijarî bûn, ku wesfên xweyî nebin û di xebata têgehîştina hinav û derûnîya karakteran da nebin.

4- Li ba romannivîsên zarlêkirî wesf bi piranî rasteqîne bûn û bi berdewamî xwestine ku xwendevan bawerîya xwe bi wê bînin ku ew ê di raman û heşê romannivîs da heye rast û realîst in, weke Sedelmeier ê lêkoler û rexnegir dibêje: “Hemû roman berî ku ji dayik bibin û bibin peyv û wesf di mêjîyê mirovan da darêjraw in.”¹⁴¹ Ev ramana wê ji bo me derdixe ku romannivîs di wê xebatê da ne di jîngeh û derdora jîyana xwe da yan jî ew tiştên di dîroka jîyana xwe da dîtine têxin nav nivîsên romanên. Dîsan ev dîtina jî wêneyekî rasteqîne bû ku romannivîsan bi rêya wesfên realîstî ve di nav birgên wesfan da darijtine. Wate wesf di çavê romannivîsên zarlêkirî da bi piranî di şêweya realîzm û rasteqîna da bû, dûr in ji wan wesfên ku ûtopya têda serdestin.

¹⁴¹ Stephen. A.Nimis Arethusa, *Memory and Description in the Ancient Novel*, Volume 31, Number 1, Winter 1998, London, r.107.

5- Taybetmendîyeke din ya wesfên romanên zarlêkirî ew e ku ew birgên wesfî dikevine bîra xwendevanan ku romannivîs bi dirêjayîya nivîsandina romana xwe da peşkeş kirine. Weke mînak: “Dema romannivîs di rûpêlên pêşîyê di nav romana xwe da behsa cihekî dike yan jî wesfa holekê dike, lê dema digêje navîn yan jî dawîyên romanê em dibînin romannivîs tîne bîra xwendevanan ku di destpêka romanê da cihek hebû. Di vir da wesf erk û bandora xwe rê dide ku erka bibîranîna xwendevanan têxe stûyê xwe.”¹⁴²

6- Pêvajoya dûbarekirinê wek taybetmendîyeke wesfê ye di romanên zarlêkirî da. Bi şêweyeke din em dikarin bibêjin romannivîsên bi ser vê qonaxê bi piranî pêvajoya dûbarekirinê di beşên cuda cuda yên nav romanên xwe da bikaranîne. Hemû ev bikaranîn jî bi rêya hunera wesfê ve hatine encam dan.

7- Di romanên zarlêkirî da wesf bi piranî wesfên realîstî bûn. Ev cûreya taybetmendîya wesfê di romanên zarlêkirî da bi piranî li dû serhildana rêbaza realîzmî bi ber çavan dikeve. Çimkî wesf û naveroka mijarên helbestvan û romannivîsên bi ser vê rêbazê berdewamî olandana rasteqîneyê bûn. Loma romannivîsên bi ser vê rêbazê bi piranî wesfên xwe di çarçoveya rasteqîneyê da honandibûn.

8- Di romanên zarlêkirî da wesf herdemê li pêş bûyeran tîne wate wesfa karakter, şûn û bûyeran dibin rêxweşker ji bo ku bûyerên serekî û neserekî yên nav romanê serî hildin.

9- Rola beşdarbûna xwendevanan di pêvajoya beşdarkirina wesfê da pêvajoyeke lawaz e, yan jî bi şêweyekî berfireh û çalak beşdarîya xwendevanan di wesfan da nayê dîtin. Belkî erka biryardanê li ser birgên wesfê romannivîs bi xwe ye. Bi wateyeke din raman û xwendina xwendevanan di çarçoveyeke diyarkirî da girê dide û rê nadin pêvajoya wêjeyî ku ji “nivîskar, nivîser û xwendevan” pêk tê bi şêweyekî hevahengî di navbera hersê qanalan da derbas bibe.

2.7. Wesf Di Romanên “Pêla Hîşî” Da

Weke me got roman bi wê sîfetê berhemeke wêjeyî ye û di çarçoveya formeke wêjeyî da pêşkeşî xwendevanan têkirin. Ev jî wê derdixe ku bi dirêjayî temenî heta vê gava em têda dijîn dibe têkeve ber herika guherkarîyan. Çimkî xwezaya wêjeyê bi wê awayî ye ku ji kesekê/î bo kesekê/î din û ji demekê bo demeke din herwiha ji

¹⁴² Michael Irwin, *Picturing, Description and Illusion in the Nineteenth-Century Novel*, r. 5.

berhemekê bo berhemeke din diguhere. Di encamê da roman jî wek cûreyeke wêjeyî ketîye nav çarçoveya ew pêşketin û guherkarîyên bi ser hêman û teknîkên romanê da hatine. Wesf jî yek ji wan hunerana bû ku li gor qonaxan ve ketîye guherkarî û nûbûnê. Ev jî bi kêr wergrçtina ji “pêla hişî” bû. Ev têgeha di bineretê da têgîneke taybet bi derûnasî bû ku cara yekem ji alîyê William James ve di pirtûka “Binemayên Psîkolojîyê” da di sala 1890 da bikar hatîye.¹⁴³ Paşê jî beşek ji romannivîsên sedsala bîstan ku pêkhatibûn ji James Joyce, Marcel Proust û Wirginia Woolf xwestin vê têgehê di berjewendîya wêjeyî da bikarbînin û forma cûreya romanê pê nû bikin ku wek bertekên li hember romanên zarlêkirî danûsand dikir. Herwiha şêwaz û pêşkeşkirina wesfan bi arasteyeke cuda bandor lê dikirin û wêneyekî wesfî yê cuda pêşkeşî xwendevanan dikir. Ev hemû jî wê derdixe ku pêşketina cûreya romanê bandora li ser hêman, teknîk û hunerên romanê da bi hebû ye.

Di romanên pêla hişî da wesf bi taybetî di behskirina wesfa karakter û şûnande bi şêweyekî cuda pêşkeşî xwendevanan hatiye kirin. “Ji wesfa hest û nest û raman û hinava mirovan bi rêya astengî û zimanekî neasayî û bikaranîna hêmayan pêk tên.”¹⁴⁴ Di vir da birgên wesfê arasteyeke navekî wergirt û dûr ket ji wê forma pêşkeşkirina ku wek “wesfa mijarî” yan “wesfa derekî” nav lê hatîye kirin ku bi piranî romannivîsên rêbaza zarlêkirî piştî xwe dispartinê. Bi taybetî dema behsa şêwaza wesfa karakteran dihat kirin bi piranî bervî xuyanî û dîmenên derveyî yê karakteran ve diçûn. Lê belê di romanên pêla hişî da wesf “sist dibin û nava tiştan û hinava wan nîşan dide.”¹⁴⁵ Ev jî wê diyar dike ku tevlîbûna digel rewş û bal û derûnasîya karakteran wek eşkerekirin û wêneyekî derûnî ya karakteran di nav birgên wesfî da têne dîtin ku di encamê da reftar û tevger û lênerîna karakteran ji bo me derdixe holê.

Herwiha romanên romannivîsên rêbaza pêla hişî sedemek bû ku hunera wesfê nêzikî teknîka vegêranê bibe ku gelek caran di romanên zarlêkirî da bi şêweyekî wiha jê dûr diket ku di gelek rewş da dihate kanîn ew birgên wesfî di nav avahîya

¹⁴³ M. H. Abrams, Malcolm Bradbury, Northrop Frye, *Roman Çi ye?*, Wer.: Cewad Mistefa, Weşanxaneya Mukiryanî, Çapa Yekem, 2008, Hewlêr, r.32.

¹⁴⁴ Mirjana Loncar, *Stream of consciousness Technique and Modern Novel*, Psychological and Methodological Perspectives on Language Learning, IOSR Journal of Research, Method in Education, 2013, India, p. 70.

¹⁴⁵ Perêz Sabîr, *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî*, r.258.

romanê da were ji bîr kirin û ji nav were derxistin. Lê birgên wesfî yên romanên pêla hişî “berfirehîya di navbera hunera vegêran û hunera wesfê kurt dike ku bi şêweyekî hevterîb (paralel) û nîvçe xuya û bi hevdu re girêdayî ve derdikevin. Bi awayekî em nikarin birgên wesfî bi şêweyekî serbixwe ji birgên vegêranê cuda û diyar bikin.”¹⁴⁶ Bi wê sîfetê ku romannivîs “Tu peyv, hevok, dîmen, komên peyvên û hêmayekê ji ber xwe da çê bike. Belkî wateya veşartîya nivîskar armancdar e.”¹⁴⁷ Ev jî bi wateyê ye ku her birgeke wesfî di van romanên romannivîsên vê rêbazê erkekî ravekarî digihîne. Weke Mînak: John Rikardo di diyarkirina yek ji erkên wesfê da dibêje: “Divê wesf xwe ji xwe da xwedî wateyekê be, bê wê ku pêwîste eşkerekirina wateyekê bike.”¹⁴⁸ Ev jî ji bo me wê derdixe ku bê sedem birgên wesfî yên van romanên ne hatine nivîsandin. Wek di hinek beşên birgên wesfî yên di romanên zarlêkirî da bi ber çavan diketin. Kewate hemû ew perde hildanên di derbarê derûn û hinava karakteran da hatine kirin bi wê armançê bû arasteya wesfan û herwiha fezaya şûnan bi şêwazekî peyambar bûn were pêşkeşkirin. Wate bi berevajîya erka xemlandinê danûsand digel birgên wesfê hatîye kirin. Bi piranî têkoşan dan ji wê formê derbas bibin ku di romanên Balzac da dihatin dîtin ku beşeke gelek ya birgên wesfî li ser binemaya xemlandinê binyat danî bûn.

Herwiha cîhana derveyî wek cîhaneke taybet û girîng di pêkhateya birgên wesfî yên romanên zarlêkirî da cihekî girîng û rûbereka fireh di nav romanê ji bo terxan dikre. Bi taybetî di pêşkeşkirina wesfeke dûr û dirêj û hûrgilî û çewtîya xuyanîya karakteran da. Lê li dû serhildana romanên pêla hişî da ew cîhana bi şêweyekî berçav hate ji bîr kirin. “Cîhana hinava mirovan bû ku bi şanoyeke mezin piştî xwe bispêre xwe û bi şêweyekî ji hev qetyayî ji cîhana derveyî.”¹⁴⁹ Ev jî wê rastîyê derdixîne ku ji alîyê alîgir û ew pêvajoya ku wesfa romanên zarlêkirî ret dikin ve girîngî û hêjayeke ewqas ya cîhana derveyî tunebû. Loma di vir da wesfa xweyî yan jî ya navekî dibe mînak hemû birgên wesfî yên vê qonaxa romanên. Herwiha di romanên pêla hişî da rola xwendevanan bi şêweyekî berçav tê dîtin. Wate eger romannivîsên zarlêkirî tu awayekî serbestî nedabin xwendevanan ku raman û aşopên

¹⁴⁶ 'Ebdulmîr Meter Fîlî el- Sa'dî, *el- Wesf Fî el- Rîwaye el- 'Îraqîye, Dîrase Neqdîye Fî Teqnîye Bîna El- Wesf 1937-1990*, Nameya Masterê, Kollêja Wêjeyê, Zanîngeha Bexdayê, 2000, r.19.

¹⁴⁷ Sabîr Reşîd, *Romanî Kurdî, Xwêndnewe û Pirsyar*, Weşanxaneya Aras, Berga Yekem, Çapa Yekem, 2007, Hewlêr, r.251.

¹⁴⁸ John Rikardo, *Qisa el- Rîwaye el- 'Hedîse*, Wer.: Sebah el- Cehîm, r.166.

¹⁴⁹ Alan Robbe Grillet, *Ne'hu el- Rîwaye el- Cedîde*, r.19-20.

xwe yê kûr li hember birgên wesfî îfade bikin. Ew di romanên pêla hişî da çeqa bîr û xeyalkirina birgên wesfî yê xwendevanan e. Bi taybetî dema “Romannivîs pîrsgirêka bidestana sîfetên karakterên xwe dixê stûyê xwendevanan ku bi rêya gotin, bersîv dayin û kar û bertekên xwe ve bidest dixê.”¹⁵⁰ Kewate di vir da valahîyek ji wesfê bo xwendevanan maye ku hewla bidestana zanyarî ji birgên wesfê bide. Ev jî bi berevajîya wêneyê wan birgên wesfî ne ku romanên zarlêkirî hêvî ji wan dikir. Dema bi rêya çîrokbêja/ê hemû tiştan ve form û qalibê taybet û amadekirî ji bo wesfê dihat kirin tu derfetek nedida xwendevanan ku hewla wê bidin hêza dîtînan xwe ji komek sîfetên karakteran destnîşan bikin û bibînin.

Herwiha wesf di romanên pêla hişî da bi piranî di çarçoveya zimanekî têkşikayî derdikeve ku bi avayekî xwendevan hest bi wê dike ku li aliyê astên ziman bi taybetî watenasî û hevoksazî ve bi şeweyekî din hatine pêşekşkirin û darijtin. Weke mînak: James Joyce di parçeyek wesfî ya romaneke xwe da behsa karakterekî bi navê “Stivn” da dibêje: “Dû wê şeva raborî tiştê ku ez ji xewê rakirim, heman xew bû yan jî na? Li bendê be, deriyê salonê veki, kolana sozanîyan di bîra te da be. Harûn Reşîd ez nêzikî te dibim. Vî mêr rê nîşanî min da, peyivî, ez netirsyam, ew petêxê ku li ba wî bû û di dev û çavê min da û kenîya, qremeke ku çêja fêkîya jê tê. Ev zagona wî ye, wiha got. Ji. Were. Xalîya sor raxe.”¹⁵¹ Di vir da em dibînin komek peyv û girê û komên peyvên li dû hev hatine ku xwedî tu binemayek sîntaksî yan sîmantîkî nînin. Loma zehmete xwendevan bikaribin wiha bi hêsanî lê binêrin û şîroveya wateyê wan bikin. Ev jî wê diyar dike ku romannivîs James Joyce xwestîye ku berçavkirina rewşa derûnî ya mêjiyê karaktere xwe bike ku çiqasî aloz e û di raman û hizra xwe da xwedî cîhaneke tevlihev e. Ev hemû derxirê wan rastîyan e ku romannivîs xwestîye bi rêya nîşandana rewşa hinava karakter ve wê cîhana cuda ya hinavê nîşanî xwendevanan bike. Di piranîya dema da ev nîşandana derûnî ji bo wê bû ku avayekî ji rasteqîneyê di zîhn û ramana xwendevanan da çê bike. Herwiha zehmete ev cûreyên birgên wesfî di nav binyata romanê da were ji bîr kirin û jê werin derxistin. Ji ber vê yekê ye Jacques Lacan di behsa giringîya ew birgên wesfî da dibêje: “Her nivîskarek wêjeyî bi taybetî jî cûreya romanê li derveyî

¹⁵⁰ 'Ednan Xalid, *el- Neqd el- Tetbîqî el- Te'hlîlî*, Çapa Yekem, Dar el- Şuûn el- Seqafe el- 'Ame, 1986, r.68-69.

¹⁵¹ Sukanya Saha, *Understanding The Stream Of Consciousness Text: A Linguistic Perspective*, International of Linguistics and Literature, 2016, India, r. 3.

pêvajoyên derûnî were girtin, ew ne huner e. Çimkî ew pêvajoyên derûnî wiha dikin ku nivîskar bi piranî bi şêweyê waq'î derkevin.”¹⁵²

Li gor van ramanan ve em dikarin bibêjin; giringtirîn erkên wesfê di romanên pêla hişî da ji wateyên xwarê pêk tên:

1- Rêbaza pêla hişî ji bo pêşkeşkirina wesfên xwe han dane aliyê hinava karakteran. Wate hêza birgên wesfî ji behsa derûnîya karakteran ve pêk hatibûn.

2- Wesf di romanên pêla hişî da erka wateyî yan ya şîroveyî dibîne ku ev jî bi berevajîya wesfa romanên zarlêkirîyan e ku bi piranî xwe bi erka xemlandinê ve girê didan. Loma gelek caran karîbûn bê wê ku bandor li binyata romanê nebe birgên wesfî jê derdixistin, lê jê derxistina birgên wesfî ji romanên pêla hişî da nivîskar rastî pirsgirêk û hilweşandina binyat dianî.

3- Wesf di romanên pêla hişî da dibe sedemek ji bo nêzîkbûna birgên wesfî û birgên vegêrane. Çimkî bi piranî tevlihev dibin bi taybetî jî di wê dema romannivîs “destnîşana karakterên romanê dike bi taybetî di ronkirina pêvajo û eşkerekirina ew razên veşartî yên derûna karakteran ku raman tê da heye.”¹⁵³ Wesfkirina cîhana nixumtîya hinava karakteran dixebite ku rewşên wan yên derûnî berçav bike.

4- Wesf di romanê pêla hişî da bi şêweya kurt dihate pêşkeşkirin ku bi şêweyekî giştî berevajîyê wesfên zarlêkirî ye ku bi piranî di rêya birgên dirêj ve dihatin pêşkeşkirin.

5- Di romanê pêla hişî da wesf bi zimanekî neasayî û bi peyrewkirna xalbandîyeka gêre û tevlihev ve dihatin pêşkeşkirin ku “nivîskaran han bi “kevane” û valahî û...peyvên netemam û... hecma tîpên çapê û...xwarbûna wan tîpana didan. Herwiha han ji bo balkişandina ramana xwendevanan jî didan.”¹⁵⁴ Loma ji ber bandora vî zimanê neasayî û xalbandîya tevlihev zimanê wesfan di çarçoveya sîmantîk û rêzbandîyên sîntaksî da gav neavêtine ku ew peyv û komên peyvên yên di birgên wesfî da bikar dihatin gêre û cuda bûn ku vê jî tîgîn li rewşa derûnîya hinava karakteran dike.

¹⁵² Mirjana Loncar, *Stream of consciousness Technique and Modern Novel*, Psychological and Methodological Perspectives on Language Learning, r. 70.

¹⁵³ Fatme ‘Îsa Casim, *Xayb Te'hme Ferman Rîwaye*, Dar el- Şuûn el- ‘Ame, Bexda, 2004, r.59.

¹⁵⁴ ‘Ebdulla Serac, *Berew Astaney Roman û Goşenîgakan*, r.21.

6- Beşdarî û rola xwendevan bi şeweyekî berçav di romanên pêla hişî da tê dîtin. “Ji bo şîrovekirin û xebata ji bo gihîştina rastîyan bi çawanî ya vebîrkirin û têgehîştina takekesîya xwe.”¹⁵⁵ Ku ev jî berevajîya rola xwendevan e di wesfên zarlêkirî da ku hemû sînor û pêvajoya vebîrkirina xwendevanan asteng û bend kirîye ji birgên wesfî.

7- Di romanên pêla hişî da wesf bi berevajîya wesfên zarlêkirî ne. Çimkî eger wesfên zarlêkirî ji kunenişîna (goşenêrîn) mijarî ve birgên xwe yên wesfî raçandî be, ew di romanên pêla hişî da bi piranî wesfên xweyî ne û ji kunenişîna hinava karakteran ve tîrêşkirin.

2.8. Wesf Di Romanên Nû Da

Dema ku em behsa romanên nû dikin ew forma nûjenî yê dihête bîra me ku ji hin romanusê wek “Nathalie Sarraute, Michel Butor, John Rîkardo, Claude Simon, Alan Robbe Grillet û Marguerite Duras” hat afrandin. Van nivîskar û romannivîsan di naverasta salên pînceyî yê sedsala bîstan li Fransa bergeke nû bexşandine bi romanê ku bi berevajîya rewî, dîtin û arasteyên rêbaza zarlêkirî û rêbaza pêla hişî gav davetin. Bi taybetî jî di pêşkeşkirina wesfan da. Çimkî eger wesf di nav rêbaza zarlêkirî da xwedî wêneyê wesfîkirî yê cîhana derveyî bin û herwiha di rêbaza pêla hişî da jî xwedî wêneyê wesfîkirî yê hundirî ya karakterên nav romanên bin. Ev pêşkeşkirina li ba rabêrên romanê nû bi wê arasteyî yê nû in. Belkî van romannivîsana xwe da xwe dextîrê pêşkeşkirineke ku “wêneyekî hûrgilî yê ketwarîya xwe nakşîne û heta radeyekê mij û mijxaleyî û şêlîya wan tê xuyakirin.”¹⁵⁶ Ev jî bandorê li ser şewaza pêşkeşkirina karakteran bi arasteyeke cuda çê dike. Wate eger pêşkeşkirina karakteran di romanên pêla hişî da bi şeweyeke giştî di xebata destnîşankirin û nîşandana rewşên navekîya karakteran bin, lê di romanên nû da ev pêşkeşkirina pîrsgirêkan ji bo xwendevanan çê dike ku nikarin bi hêsanî ji wesfên navekî yê karakteran û wesfên şûnan jî têbigên. Çimkî armanca serekî ya romannivîsên rêbaza nû ji mijarên olandana wêneyê ketwarî ve bi rêya wesfî karakter, tişt û şûnan cuda ne. Herwek Alan Robbe Grillet dibêje: “Caran wesf ji bo diyarkirina aliyê serekî yê dekorê bikar dihat, paşê jî ji bo ronkirina hewqas

¹⁵⁵ Diyar Faîq Mecîd, *Bunyatî Wesf Le Romanî “Rêga”y Mihemmed Mewlud Mem Da*, r.20.

¹⁵⁶ Diyar Faîq Mecîd, *b.n.b*, r.20.

hêmanên ku avayên wan yên girîng heye û têgînê li tiştan dikin, ku niha em wesfa hin vetîre û tiştên bêcan dikin. Ku tiştêkî eşkere nekin û têgînê li wateyekê nakin.”¹⁵⁷

Romannivîsên ser bi rêbaza romanên nû di mijarên amadebûna xwe da di nav pêvajoyên wesf û vegêranê da bi berevajîya romannivîsên zarlêkirî bi şêweke hevterfîb kêmtir dibin beşek ji arastekirina eşkerekirina wateya wesfan. Çimkî li gor wan wa ye eger “wesf yekser digel wateya xwe hat, ew tê bi wê wateya xwekuştî wesfê.”¹⁵⁸ Armanc ji vê xwekuştî wesfê jî ewe ku zimanê wesfên romannivîsên bi ser wê rêbazê di oxira lîstika bi peyvan bû. Şêlî bûn û nîşandana wate û xuyanîya giran ku xwendevan bi hêsanî nikarin wek wergêrekê/î têgehîştina xwe ji van birgên wesfî çê bikin. Ew wate û lîstika bi peyvan bi avayekî ji avayan berevajîya rêbaza pêla hişî bû. Çimkî eger romannivîsên pêla hişî birgên xwe yên wesfî ji navekî ve pêşkeş kiri bûn bêguman bi piranî armanca wan ew bû ku xwendevan ji wêneyên ketwarî ya hinavî û rewşên derûnîya karakteran têbigên. Lê li ba romannivîsên nû girîngîya vê avayê nêrînê hewqas tunebû. Çimkî ev cûreya wesfan roleke ravekarî û şîroveyi nabînin. Belkî bi piranî di çarçoveya erka xeyal yan jî ya firewateyi da derdikevin. Wek John Rikardo wek raberekî vê rêbazê pêdagirî li wê dike û dibêje: “Wesfên bi ser vê rêbazê wesfên afirîner in. Wate zehmete wiha bi hêsanî em bikaribin wateyeke diyarîkirî ji van nivîsên romanê hilibijêrin. Loma jî dibêje karekî asayî ye ev wesf xwedî erka firewateyi bin.”¹⁵⁹ Kewate eger wesf di romanên zarlêkirî da ji ber sedema astengî û bendên nivîskar ji bo wergir danîye xwedî rola diyarkirî ya xemlandî be. Herwiha di romanên pêla hişî da jî bi rêya derxistina rewşên hinava karakteran ve xwedî roleke ravekarî ya derûnî be. Dîsan ew di romanên nû da xwedî roleke xeyalî ye ku gelekî dijwarîyê ji bo xwendevanan çê dike ku ji birgên wesfî têbigên.

Dema ku guhertin bi ser şêwaza birgên wesfî yên romanên nû da hat û “bû beşek ji serkêşîya ku romannivîs têda radibe hûrkarî û tevlihevkirina wesfa şûnê bi

¹⁵⁷ Alan Robbe- Grillet, *Ne'hu el- Rîwaye el- Cedîde*, r.130.

¹⁵⁸ Qeys Kazim El- Cenabî, *Selasîye el- Rawiq, el- Rîwaye Wel- Bîna “Dîrase Fî el- Edeb el- Rîwaye ‘Îndî ‘Ebdulxaliq el- Rikabî”*, Dar el- Şuûn el- Seqafe el- ‘Ame, 2000, r.147.

¹⁵⁹ ‘Ebdulemîr Meter Fîlî el- Se’dî, *el- Wesf Fî el- Rîwaye el- ‘Îraqîye, Dîrase Neqdîye Fî Teqnîye Bîna El- Wesf 1937-1990*, r.50.

kirin û bûyeran dike. Ta ku romana wê/wî dibe çend tabloyên wesfa yekgirtî.”¹⁶⁰ Wate wesf di pêwendîya bi bûyer û şûnê ve wek du hêmanên serekî yê romanê di çarçoveya wesfa belav ve tene pêşkeşkirin ku ev jî zehmete ku xwendevan bi hêsanî bikaribin hemû wan parçeyên wesfî kom bikin û bikin wek wêneyekî û di aşop û hizra xwe da çê bikin. Lê dema ku em dinêrin em dibînin ku erka xwendevan di çarçoveya birgên wesfî da ji rêbaza zarlêkirî û rêbaza pêla hişî hêsantir e. Çimkî wesf bi şeweyên wesfa dirêj û kurt ya navekî ve xwedî wate ye û bi xuyanîyeke ron ve pêşkeşkirî ne. Loma xwedî wate û parçeyekî ji hev neqetyayî û hevbeş in ku di dawîyê da xwendevan bi hêsanî dikare ji hemû birgên wesfî têbigên. Lê di romanên nû da bi vê şeweya hêsan û komkirî ve nayên pêşkeşkirin. Belkî “Xwendina wan ne biryara dawî ye û wesf berdewam negirtî ne. Belkî komek egerî derdixê holê, hinek car jî dîmenek yan mijarek yan jî peyvekê wek zincîreyeke ji xeyalkirinê di derbarê mijara xwe di xwe da digire.”¹⁶¹ Ev jî xwendevan rûbirûyê berdewamî û temamkirina xwendina giştî ya birgên wesfê dike ku wek roleke divêtî bi serî da disepîne. Divê gav bi gav digel hemû birgên wesfî gavan bavêje ta ku digêje ew çewtîya xwe ya giştî ku di bin sîvana wesfî da kom dibin û jê ra têtgotin “Tabloya Yekgirtîya Wesfê”.

Di romanê romannivîsên rêbaza nû da rol û bandora nivîskar bi şeweyeke yekser nayê dîtin. Wate divê romannivîs dûr bikeve ji wî tiştî ku bi şeweyekî yekser dest ji karûbarê vegêrana romana xwe berde. Loma gelek caran bi rêya kunenişîna karakterên nav romana xwe ve vegêran, bûyer û wesfan digîne encamekê. Herwek Henry James dibêje: “Pêwîste li ser çîrokê xwe di derbarê xwe da bipeyive û nivîskar biryarê li ser nede.”¹⁶² Ev jî tê wê wateyê ku nivîskar bi xwe ve bûyeran negêrîne. Belkî bi rêya çîrokbêjeke/î nav romana xwe da ku gelek caran ku ev erka vegêranê bi wan tê bexşandin. Kewate di romanên bi ser vê qonaxê de romannivîs birgên wesfî pêşkeş nake. Belkî rê dide ku çîrokbêj vê pêvajoyê bigîne encamê.

Ji alîyên din ve di romanên vê rêbazê da merc nîne serhildana wesfan bi tenê bi rêya wesfa karakter û wêneyê ketwarî yên şûnên be. Belkî xasîyet û taybetmendîyên wan romanên di wê da derdikeve. Dema wesf “ji tiştêkî gelekî biçûk

¹⁶⁰ Heyam Şe'ban, *el- Serd el- Rîwaye Fî A'mal Îbrahîm Nasralla*, Dar el- Kendî el- Neşir Wel-Tewzî', Urdun, 2004, r. 200.

¹⁶¹ Diyar Faîq Mecîd, *Bunyatî Wesf Le Romanî “Rêga”y Mihemmed Mewlud Mem Da*, r.26.

¹⁶² Îbrahîm Cindarî, *El- Feza el- Rîwaye 'Îndî Cibra Îbrahîm Cibra*, r.143.

û serveyî derkevin holê, dema nivîskar ji xalek biçûk gav û binyat û şeweyên wesfa xwe destpêdike.”¹⁶³ Loma nivîskar di pêşkeşkirina birgên wesfî da tenê di xizmeta wêneyê wesfîrî yê karakteran da nîne, wek di piranîya birgên wesfî yên romanên zarlêkirî û romanên pêla hişî da bi ber çavan dikeve, lê di roamnên nû da guhertin bi ser dîtî û lîstî nivîskaran da hat. Dema ji biçûktrîn tiştên bînîrx dikarin wêneyekî wesfî çê bikin, paşê bi rêya vê wesfîrîya biçûk ve zemîneya derketinê ji bo bi dehan bûyerên heman cûre û rikberîya di navbera karakteran geş bikin. Herwek Alain Robbe-Grillet di mijara “tişt” da dibêje: “Xwezayî ye di jîyana min da, hem navgînên odeya min hem ew gotinên min dibihîstin û hem jî ew jina ez jê hez dikim û tevger û ham û şoken wê, hemû tişt in. Bi wateyeke giştîtir bi pê şîrovekirina ferhengê her tiştê/zîhna me karîwerê xwe bike tişt e.”¹⁶⁴ Armanca Robbe Grillet ew e di romanên wê serdemê da cudahî namîne ji bo pirsgerêka wesfîkirina derbareyê tiştên di navbera bîcan û bîcan da. Loma em dibînin merc nîne ku wesf tenê li ser xweyî ya karakteran be. Belkî karakter jî tişt e û divê em wek tiştên din lê binerin.

Di romanên rêbaza nû da wek du arasteyên cuda li hêmanên şûn û demê tê nêrîn, dema romannivîsên bi ser wê qonaxê “Ta radeyekê demên xwe wêda kirin û şûnên xwe jî li cî danîn. Çimkî şûn cîgirtir û bihêztir e.”¹⁶⁵ Armanca ji bîrîkirina demê ew e ku romanên bi ser wê qonaxê kêmîtir dikevin bin rewşa sistî û xavîya dema vegêranê. Çimkî ji şeweya birgên wesfa kurt û pirt û belav ve tene pêşkeşkin. Herwiha ji cîgîrkirina şûnê jî çend armancên wan hebûn ku bi berevajîya erka wesfa romanên zarlêkirî û pêla hişî ne, ku bi piranî di xebata xemlandin û derxistina rewşa derûnîya hinava karakteran da bûn. Lê wesfa şûnê di romanên rêbaza nû da bi piranî bi armanca çêkirina fezaya xeyalî û “Dûrxistina şûnê ji ketwarê û bexşîna sîmayê xwarafî bi şûnan.”¹⁶⁶ Bi vê jî şûn dibin sedema çêbûna wêneyekî neketwarî, herwek Nathalie Sarraute di derbarê roman û ketwarîya romanê da dibêje: “Veguhezîna ketwarê kare rojnamenûsan e. Bi belgeyan ve tîgînê lê dîkin, lê ketwarî li ba romannivîsan tiştêkî din e. Li hember wê nikare wê ketwarîyê ji şewê û qalibê

¹⁶³ Îbrahîm Cindarî, *b.n.b.*, r.180.

¹⁶⁴ Alan Robbe Grillet, *Çîrokî Niwê, Însanî Rêbazî Niwê*, Wer.: Husên Şêrbegî, Tîyorî Roman, r.58.

¹⁶⁵ ‘Ehtdal ‘Utman, *Te’hwîlet el- Qis Fî Edeb el- Timenînet Mucelle el- Eqlam*, J. 6, Reşeme1989, r.59.

¹⁶⁶ Ebu el- Husên Necefî, *Wezîfe Edebîyat, Mecmu'e Meqellat*, Entîşarat Nîlûfer, Çapa Sum, Tehran, 1389, r.91.

bikarbirî û nasyawî da bikarbîne. Belkî dixwaze şeweyeke nû bibexşînê.”¹⁶⁷ Bi vê jî ev wênegirtina ketwarê bi vî awayê reha ew wêne li dijî ramanên realîzmê bû ku ji wesfê xwe yê zarlêkirî da ew destnîşan dikirin. Her ji ber vê ye gelek ji romannivîsên bi ser wê rewte di pêvajoya navê karakterên xwe da peyv û komên peyvan yê xerîb û hinek car tenê bi yek fonem nav li karakterên xwe kirine. Weke mînak: “William Faulkner di romaneke xwe da navê “Yek” li karakterê xwe kiribû. Herwiha Franz Kafka jî bi heman şeweyî di romaneke xwe da di pêvajoya navlêkirina karakteran da tenê bi fonemekê wek “K” nav li karakterekî kiribû.”¹⁶⁸ Herwiha navlêkirina bi vî şeweyî di wêjeyên neteweyên din da jî olan daye. Weke mînak: Di wêjeya kurdî da Karwan Umer Kakesûr¹⁶⁹ di çîroka xwe ya bi navê “Koyley Pîtekan” (Koleyê Tîpan) da navê karakteran bi jimare rêz dike wek: Perîxan û Perîxana duyem, Cahîvan û Cahîvana duyem. Yan jî di komçîroka “Namekanî Jakon” (Nameyên Jakon) ya Cebat Cemal Xerîb¹⁷⁰ da kêmtirîn nav hene ji wan bêtir cînavk têda hene.”¹⁷¹ Ev pêvajoya navlêkirina karakteran bi fonem û tîpekê yan jî bi rêzkirina jimareyan, şanîya wê ye ku karakter xwedî tu raborî û jînenîgarîyekê nînin yan jî dikare wateya wê bide ku qahremanên çîrokê takekesên nenasyar û di civakê da ne kesên erkdar û girîng in. Yan jî navek tune hêjayî behsê be. Divê em vê jî bibêjin ew bûyer ku bi ser gelek kesan da hatîye û di nav çîrokê da bi rêve diçe ronayî li ser wê ye.”¹⁷² Wate ev nenasîya karakteran di romanên nû da bi berevajîya romanên rêbaza pêla hişî û rêbaza zarlêkirî ye, dema ku ew vedigerin ji bo raborîya karakteran di piranîya demê da rewş, jîyan û jînameya karakteran ji bo me di asta dîrokî, civakî û aborî da derdixin û diyar dikin. Lê bi şeweyekî giştî karakter di romanên nû da ne xwedîye tu nasnameyê ne. Loma dema xwendevan birgên wesfî yê karakteran dixwînin di derbarê wêneyên wesfîkirî yê karakteran da rastî mij û mijxale û şêlîbûnê tên.

Ji alîyekî din ve romannivîsên romanên nû ji bo ku xwe ji birgên wesfî yê dirêj biparêzin, xebitîne ku kêr ji hunerên din werbigirin ji bo ku bikaribin wêneyekî

¹⁶⁷ Mihemmed ‘Ezam, *Feza’ el- Nus el- Rîwaye*, r.64.

¹⁶⁸ Heme Mentik, *Hunerekanî Çîroknûsîn*, Weşanxaneya Taran, Çapa Yekem, Hewlêr, 2018, r.54.

¹⁶⁹ Karwan Umer Kakesûr: Romannivîs û rewşenbîrê navdarê Kurd e, di sala 1964ê li bajarê Hewlêrê ji dayîk bûye, niha jî li welatê Danîmarka rûdine.

¹⁷⁰ Cebat Cemal Xerîb: Romannivîs û çîroknivîsê Kurd e, di sala 1961ê li bajarê Qeladizê yê ser bi parêzgeha Silêmanî yê ji dayîk bûye, niha jî li bajarê Hewlêrê rûdine.

¹⁷¹ Heme Mentik, *Hunerekanî Çîroknûsîn*, r.54.

¹⁷² Mihemmed Ferîq Hesên, *Ezmûnî Çîroknûsîn*, r.140.

cuda yê romanên xwe nişan bidin. Weke mînak: Di behsa girngîya wêne di romanên da Andre Breton dibêje: “Wêne di romanên da ji bo wê bikar tê ta ji wesfa dût û dirêj em rizgar bibin. Hunermendan jî bi heman şeweyî ji bo berhemên xwe ji gelek şakarên wêjeyî sût wergirtine.”¹⁷³ Herwiha bikaranîna hunerên din bi heman awayê wêneyê di nav romanên vê qonaxê da giringî û taybetmendîyên xwe hebûne. Weke Mînak: Di bikaranîna “Parçeyekî muzîkê yan beşek sînemayî yan jî bikaranîna tabloyekê xwe ji bi dehan rûpel dût digire, rizgarî dibe ji dirêjgotinê.” Wate romannivîsên vê qonaxê bi hemû şeweyên xebitîn ku kêrê ji hemû hunerên din werbigrin ta ku binyata nivîsên romanê nekeve nav dirêjgotinê û xwendevan rastî bêhêvîtiya xwendinê nê. Loma di şewaza pêşkeşkirina birgên xwe yê wesfî da bi piranî wesfa kurt û berbelav bikaranîne.

Bi vê dîtîne ve li ber ronahî û bîr û ramanên rexnegir û lêkolerên rexneya romanê em dikarin erkên wesfê di rêbaza romanên nû da bi vê şeweya jêr ve kurt bikin.

1- Di romanên nû da wesf bi piranî bi şewaza kurt û berbelav hatine pêşkeşkirin ku ev jî bi berevajîya rêbaza zarlêkirî bû ku wan di wesfên xwe da li pêşkeşkirina birgên wesfî da giringî didan direjkirin û herwiha parçeyên wesfên yekgirtî jî bikaranîne.

2- Di romanên nû da ne merce hemû demê wesfê bi rêya pêşkeşkirina wesfên karakteran da be. Weke Alain Robbe-Grillet dibêje: “Her dema ku me pirtûkek nû derdixist yasayên kevn wek derdanserîyeke hesinî sererê li wan digirt û ji me ra digotin. We bi xwe kesayetî neafirandine. Herwiha we çîrokên rasteqîne jî nenivîsandine, hûn bi xwe çîrokan nabêjin, lê hûn çîrokên rasteqîne nanivîsin. We bi xwe rewişt û taybetmendîyên şûnan şîrove nekirine, hez û hestên mirovan çareser nakin, dîsa hûn çîrokên rasteqîne nanivîsin.”¹⁷⁴ Loma gelek caran em dibînin bûyer di wesfa tiştên biçûk û bêwate da derdikevin holê.

¹⁷³ Selah ‘Umer, *Roman Le Goşenîgay Ciyawazewe*, Weşanxaneya Mukiryanî, Çapa Yekem, Hewlêr, 2012, r.52.

¹⁷⁴ Alan Robbe-Grillet, *Çîrokî Niwê, Însanî Rêbazî Niwê, Tîyorî Roman*, Wer.: Husên Şêrbegî, r.55.

3- Di romanên nû da wesf di pêşkeşkirina erkên xwe da ji hevdu cuda ne. Bi piranî erkên xeyalî û afirînerî bi cî tînin ku ev jî bi berevajîya her du erkên xemlandî û erka şîrovekarîya derûnî ya romanên pêla hişî ne.

4- Wesfên romanên nû xwedî wateyeke diyarîkirî ne. Loma pirsgirêk û astengîyan ji bo xwendevanan tînin holê. Çimkî birgên wan yê wesfî bi şêweyekî yek li du yek da nayên. Belkî wêne û tabloya yekgirtî ya wesfê ta rêza dawî ya xwendina romana xwe diyar nabe, dîsan xwendevan hemû parçeyên wesfan kom dike û wate û xuyanîyek di mêjîyê wan da tene holê.

5- Wesfên romanên nû di piranîya demê da di kunenişîna karakteran da yan jî ya çîrokbêjan da tînin pêşkeşkirin, ji ber wê sedemê jî destê nivîskar di pevajoya vegêrana serpêhatî û bûyeran da bi lawazî tînin dîtin yan jî ji dûr ve temaşê dike.

6- Wesfa karakter di romanên nû da xwedî tu rehendeke dîrokî, nasnameyî û jînenîgarîyeke diyarîkirî nînin. Herwek Roland Barth dibêje: "Karakter ji bilî dirustbûyeke ji kaxezan tiştêkî din nîn in."¹⁷⁵ Bi vê jî nabin xwedî tu nasnameyê û wêneyekî rasteqîn.

Li jêr ronahîya dîtin û ramanên rexnegir û lêkolerên romanê da em dikarin xalên lihevçû û cuda yên her sê rêbazên romanên zarlêkirî, pêla hişî û romanên nû bi berçavîyeke rontir di vê xîşteya jêr da berawirdî bikin.

W. Di Romanên Klasîk Da	W. Di Romanên Pêla Hişî Da	W. Di Romanên Nû Da
Wesf bi piranî li ser rewîşt û xuyanîya karakteran raman û dîtinan çê dîkin.	Wesf bi piranî li ser derûn û hinava cîhana karakteran raman û dîtinan çê dîkin.	Wesf bi herdu rûyê karakteran ve ramanan çê dîkin hem ruxsar û xuyanî û hem jî hinav û derûnîya karakteran.
Pêşkeşkirina wesfan bi şêwaza wesfên dirêjkirinê û di gelek rûpelan da tînin dîtin.	Pêşkeşkirina wesfan bi piranî bi şêwaza wesfên kurt û aloz in.	Pêşkeşkirina wesfan bi piranî bi şêwaza wesfên berbelav in. Çimkî tevî parçe û birgên vegêranê dibin.

¹⁷⁵ Roland Barthes, *Medxel- el- Te'hlîl el- Benewîye Lil Qisas*, Wer.: Minzur 'Eyaş, r.72.

Di piranîya demê da em dikarin birgên wesfî bikar neynin. Çimkî bandorê li binyata nivîsandinê nakin.	Jêderxistina birgên wesfî pirsgirêkê ji bo binyata nivîsan çê dike û gelek caran nivîskar rastî hilweşandinê tê.	Bi heman avayê birgên wesfî yên romanên pêla hişî jê derxistina wan pirsgirêkê ji bo nivîsaran çê dike.
Nivîskar di wê xebatê da bûn bi rêya wesfa karakter û şûnan ve wêneyê ketwarî bikşînin, vî ya jî bi piranî di bin bandora rêbaza realîzmî da derket holê.	Nivîskarên bi ser vê rêbazê di wê xebatê da bûn bi rêya nîşandana hinava karakteran ve wêneyê ketwarî yê derûna karakteran bikşînin.	Li ba nivîskarên vê rêbazê hebûna ketwarê wek wateya rasteqîneyekê nîn e. Çimkî ew wêneyê ku kêrê jê werdigire tevî xeyalên nivîskar dibe ku hergîz wêneyê nas nake.
Dûrîneya navbera birga wesfî û birga vegêranê ji hevdu dûr in, Çimkî piranîya birgên wesfî bi şêwaza birgên rawestî ne.	Dûrîneya navbera birgên wesfî û bergên vegêranê tevîhev dibin ku ne hêsane xwendevan ji hevdu biqetînin.	Dûrîneya navbera birgên wesfî û birgên vegêraneyî tevî hevdu bûne. Loma ji hevdu qetandina wan karekî zehmet e.
Di piranîya demê da parçeyê wesfên yekgirtî nîşan didin. Wate di tabloyekê da xwe rê didin.	Parçeyên wesfê ne bi şêweya yek li dû yekî ne. Loma parçeyên wesfan bi avayê parçeyê qetyayî ne.	Bi heman şêweya parçeyên wesfa romanên pêla hişî bi şêwaza qet qetî ye ku bi hêsanî nagêjin hevdu.
Wesf bi piranî xwedî erka xemlandî û ciwankarî bûn	Wesf bi piranî xwedî erka şîrovekarîya derûnî ne.	Wesf bi piranî xwedî erka xeyalî û afirandinê ne.
Birgên wesfî ji kunenişîna mijarî ve derdikevin holê.	Wesf ji kunenişîna karakteran ve derdikevin holê.	Wesf bi rêya kunenişîna karakteran û li ser zimanê wan derdikevin holê.
Di vê rêbazê da rola xwendevanan lawaz e. Çimkî ji aliyê romannivîs ve tê asteng û bendkirin ku tu biryarekê nikare li ser nivîsan bide.	Di vê rêbazê da xwendevan di xwendina birgên wesfî da beşdarên serekî ne.	Her çiqas di vir da xwendevan beşdar in, lê rastî pirsgirêk û têgeyîştina wate û xuyanîyên nivîsandinê tên.
Gelekî girîngîya wesfa şûnê hebû, gelek caran	Di vê rêbazê da girîngîya şûnan bi ber çavan dikeve, lê	Nivîskarên vê rêbazê dem jê derxistin e û şûn têda hiştine.

çendîn rûpel ji xwe girtine.	bi tevgera karakter û bûyeran ve hatîye girêdan. Loma nabe were ji bîr kirin.	Çimkî li gor wan wiha bû ku şûn cîgir û bihêz e.
Raberên vê rêbazê Balzac û Gustave Flaubert ê Firensî ne.	Raberên vê rêbazê James Joyce, Marcel Proust û Virginia Woolf in.	Raberên vê rêbazê Alain Robbe-Grillet, Nathalie Sarraute, Michel Butor, John Ricardo, Claude Simon Marguerite Duras in.



3. PÊWENDÎYA WESFÊ BI HÊMANÊN VEGÊRANÊ DI ROMANÊN

JAN DOST DA

3.1. Pêwendîya Di Navbera Wesf û Vegêranê Da

Pêwendîyek bihêz ya wesfê bi vegêranê ve heye. Di piranîya demê da tevlihev dibin û bi hevdu re dibin xwedîyê binyatekê. Çimkî wesf wek hunereke bi ser vegêranê tê jimartin û rêyeke romannivîs ji bo pêvajoya vegêrana xwe bigîne serî û tevna pêvajoya vegêran û binyata nivîskara romana xwe pê temamtir bike. Lê di hinek rewş da ev birgên wesfî awayekî serbixweyî werdigirin û tevli "wêneyê vegêranî" nabin û bi taybetî tevli ew birgên wesfî yên ku bi piranî wêneyê karakter û şûnan dikşînin nabin. Bi armanca nîşandana wêneyekî rawestyayî yê fîzîkî û fotografi yê karakter, yan jî wêneyekî endazeyî ve şûnê bi me dide nasîn. Çimkî "wêneyê wesfî", wesfek rawestyayî ya neliv dike "wêneyekî vegêranî" wesfa kirdarekî yan jî ya karakterekê /karakterekî dike ku kirdarekî digîne serî."¹⁷⁶ Ango ew wêneyên wesfî yên neliv di nav binyata nivîskara romanê da roleke fotografi yan jî ravekirin û derxistina alîyê kesayetîya karakteran li xwe digrin. Herwiha li derveyî avahîya vegêranê da pêvajoya wesfkirinê digihêje serî. Bi vê jî "wesf dîmenê tişt û karakter û şûnan di demek rawestî da pêşkeş dike û bi vê jî rê li werara hawirkanîyan digire, ji bo demek diyarkirî gavên vegêranê radiwestîne."¹⁷⁷ Loma romannivîs ji bo ku beş û birgên din yên romana xwe tevli liv û kirdar û bûyerên wan bike wêneyekî hûrgilî yê karakter û şûnan bi awayekî wesfek rawestî da di hizra xwendevanan da derdixîne. Hemû ew tevli bûnên liv û lebat û kirdaran bandora xwe li gorî awayê kurt û dirêjîya wesfê li ser dema vegêrana bûyeran çê dike.

Bi dîtinek din ve jî dema ku romannivîs wêne û çarçoveyek diyarkirî ji bo karakter û şûnan amade dike û bi armanca honandina pêvajoya vegêranê erka encamdana kirdarekê/kirdarekî yan bi serîkirin bûyereke wan di nav şûn û demeke livdar û lebat ya qonaxên girêdayî hevdû dispêre. Çimkî "Vegêran li pê bihevratina dema bûyerê ve bi rê dikeve."¹⁷⁸ Di encama wê birêketin û li pê bihevrahatinê ve jî herikandina bizava bûyeran bileztir dibin û birgên "wêneyê wesfî" tevli "wêneyê

¹⁷⁶ Sîza Qasim, *Bîna el- Rîwaye*, r. 12.

¹⁷⁷ Necim Elwenî, *Sê Lêkolînewey Rexneyî Şîkarî Lebarey Romannî Kurdîyewe*, Weşanxaneya Aras, Çapa Yekem, Hewlêr, 2011, r. 99.

¹⁷⁸ Necim Elwenî, *Tîyoriy Komell Nasîy Roman*, r. 188.

vegêranê” dibin û bi vê jî pêvajoya vegêranê rêrewa xwe werdigire. Ji bilî vê dema vegêrana çîrokê dirêj nabe. Loma di vir da pêwendîya wesfê bi vegêrane ve bilindtirîn pileya têkçirjaw tomar dike. Herwiha baştirîn mînaka ev tevlibûna di navbera “wêneyê wesfî û wêneyê vegêranê” da bi piranî di cûreyên wesfê tevgerî yên karakter, şûn û bûyeran da derdikevin ku em dikarin ji wan wêne û birgên tevgerî ra bibêjin du rûyê perekî ne. Lihevçûna wan jî binyata romanê lawaz dike û wate û nirxên taybetî yên karakter û şûnan bêhêz dike û pirsgerêkê ji bo bingeha honandina nivîskarê romanê çê dike.

Wesfa karakter û şûnê di pêwendîya wan ya bi pêvajoya vegêranê da bi du arasteyên cuda ve gavê davêjin ku ji “arasteya wesfa rawestîya derveyî dema vegêranê” û “wesfa tevgerî ya tevli dema vegêranê” pêk tên. Bi wateyeke din ew wesfê ku wêneyê derekî yê karakteran digrin û herwiha şûnê wek alîyê aborî, siyasî, civakî û rewşenbîrî nîşan didin, yan “romannivîs bi rîya wan wesfana ve wêneyê şûnê yê jîyana wan dike nîşane ji bo cûreyên pîşe, reftar, tevger û hemû jîyana civakî ya karakterên xwe.”¹⁷⁹ Ev hemû li derveyî dema vegêranê encamê didin û wesfa rawestî ya sazîrî tîne holê dibin sedemek ji bo derxistin û eşkerekirina alîyên cûrbicûr yên karakteran. Herwiha wek palpişteki mezin ji bo beşên din derdikevin, ta ku xwendevan bi başî li xweza û kesayetîya karakteran têbigên. Hesta wê bike ku ev wênegirtina karakter û şûnê bawerîya xwendevanan zêdetir bi nivîsan bîne û wan nêzikî ketwarê dike û wiha nîşanî xwendevanan dike ku wêneyê karakter û şûnan heman wêneyê ketwarî ne yan jî her yek wêneyekî ji ketwarê hatine wergirtin. Ji alîyê romannivîsan ve ketine hundurê bergekî hunerî û honandina hunerî ji bo wan hatine çêkirin ta wek hêmaneke hunerî di nav binyata romanê da rol werbigirin. Di heman demê da her du hêman “karakter û şûn” dema ku tevli gava vegêranê dibin gava bûyerê bervî pêş dibin û dema nivîsandinê bileztir dikin, wê demê wesfê karakter û şûnan di avayê wesfeka rûtel da namînin. Dibe ku dibin hilgirê liv û tevgerê û bi pê xwezaya vegêranê ve danûsandinê dikin. Çimkî “Hemû pêvajoyên vegêranê ji wêneyê kirdar û bûyeran pêk tê, lê hemû pêvajoyên wesfî jî ji wêneyê karakter û tiştan pêk tê.”¹⁸⁰ Wate wesfê livdar yên karakter û şûnan beşekin ku di

¹⁷⁹ Necim Elwenî, *b.n.b.*, r. 189.

¹⁸⁰ Karwan Mehdî 'Usman, *Teknikî Wesf Le Romanekani Bextîyar 'Elî Da*, r. 28.

nav birgên vegêranê da ji hevdu naqetin û rola wan ya serekî û bandora wan li ser dema gotar û dema bervî pêşçûna bûyeran jî heye.

Gerard Genette dibêje: “Pêşbînîkirina wesfek temam tu hêmaneke vegêranê têda nebe, ji berevajîya wê hêsantir e. Wate vegerin bê wê em wesfê bikin.”¹⁸¹ Armanca ji gotina Genette ew e bê wê ku biçûktirîn dema vegêranê têda xuya nebe jî em dikarin çend birgên wesfa rawestî bînin holê. Di vir bi awayekî hûrgilî hest bi cudahiya di navbera wesf û vegêranê têkirin lê vegêre diware bikaribin bê wesfê pêvajoya vegêranê wê berdewam bike. Bi wateyeke din nikare wesfa livdar yê karakter, şûn û bûyeran ji bîr bike. Çimkî baştirîn mînakên wesfê ne û pêwendîya demî diyar dike herwiha vegêran xwe bi xwe. “Bêtir tekezê li ser her du dîmenê demî û dramayî ya çîrokê dike û bi hewqasî hêmanên hûr yê di nav şûnê da hene nakeve. Wate bi piranî hûrgilîya dema têdaye derdixe holê û girîngîyê dide derxistina bûyeran.”¹⁸² Wesfa livdar roleke girîng di van xebatan da dibîne.

Ji vir şûndeemê birgên wesfî yê livdar yê karakter, şûn û bûyeran di nav romanên Jan Dost da têxine rû ku pêwendîya bihêz ya di navbera wesf û vegêrane derdixe. Weke mînak: Di romana “Mijabad” da “Badîn” wek karakterekî serekî yê nav romana wî bi rîya cînavka kesê yekem yê axiver “Ez û min” da wesfa navekî û rewş û guherkarîyên derûnî dike ku bi dirêjîya romanê da rûbirû dibe. Dema Badînê karakter di yekem rêza destpêka romanê da bi alîyê wesfeka navekî perdeya li ser alîyên hinava xwe ya veşartî radike û dibêje: “*Ez Badîn im, bayekî dîn im. Canê min goleke kefze girtî ye. Arya sê kuçên koçeran e ku li pê xwe dihêlin. Dorpêçkiri me ez bi xewnan. Bi bîranînan û bi perçên dilekî şikestî. Xefkên demen salên temenê min yê mîna çivîkekî kor. Didin ber diranên xwe.*”¹⁸³ Di vir da Badîn dilodînî ya rewşa xwe ya derûnî ji bo me derdixe holê û sedema wê dînbûn û kunenişînîya xwe behs dike ji bo wê xewna bê encam ku di jiyana xwe da negihîştîyê. Bi vê wesfê ve jî pêvajoya vegêrana bûyeran bervî pêş çûye û bûye beşek ji wêneyê vegêranî. Wate wesfek livdar ya tevlihev hêmana demî pêkanîye yan jî di wesfeke din ya Badîn da vegêre ji kunenişîna mijarî pêşkeş kirîye û dibêje: “*Badîn êdî neditebîtî, nîvdînî bibû.*

¹⁸¹ Necim Elwenî, *Sê Lêkolînewey Rexneyî Şikarî Lebarey Romannî Kurdîyewe*, r. 101.

¹⁸² Arî 'Usman Xeyat, *Riwangey Rexne û Riwanîni Tîyorî*, Weşanxaneya Narîn, Çapa Yekem, 2019, Hewlêr, r. 62.

¹⁸³ Jan Dost, *Mijabad*, Weşanxaneya Avesta, Çapa Sêyem, Stenbol, 2015, r. 13.

Di kolanên bajêr da li dile xwe digerîya. Diçû ber derîyê dibistanan, Mizgefta Şêx Dewrêş, Taxa Şivanan, Qada Çarçira, Kuçeya Gulan, Taxa Ermenîyan û der û dorên wî bajarê ku ji mijeke tîr hatibû ristin.”¹⁸⁴ Di vir da jî vegêr bi rîya nîşandana liv û kirdarên wek “neditebitî”. Diçû, bervî bajêr û mizgeft û tax û kolanên bajêr û xwenegirtina li tu cîhekî bajêr. Ev hemû amaje ne ji bo derûna nearamîya Badîn. Herwiha ji bilî van bi nîvdînî wesfa wî dike. Herwiha ev birga tevî dema vegêrana bûyeran bûye û di nav dema vegêranê da encam daye. Bi vê jî birgeke wesfa livdar pêkanîye ku diware eger bibe ji vegêranê bête cudakirin.

Herwiha di romana “3 Gav û 3 Darek” da “Şêx Se’îd” wek karakterekî serekî yê romanê ku di hemû bûyerên romanê da pêwendî bi jîyana wî ve heye. Her ji gava ku ji dayika xwe dibe û heta dibine ber werîsê sêdarê. Loma piranîya deme dikeve jêr rewşa wesfîkirina ji aliyê karakter û vegêrê romanê. Lê ev nayê wê wateyê ku xwe ji wesfîkirinê dûr e yan jî wesfa rewş û derûn û hestên xwe nahînte zimên. Dibe ku di çendîn birgên wesfî da wesfa hinava xwe dike û dibêje: “*Çima ez dilerzim dema ku wê dibinim? Ma ev nişana çî ye? Dilê min tê çî ku ji lertzînê were hêrran û zimanê min li hev digere, wek ku sindifan dibe. Ez hewqasî ne şermokî bûm.*”¹⁸⁵ Di vir da bi rêya yekbêjîyê ve sîma, xuyanî û livên endamên bedena Şêx Se’îd û guherkarîyên ser rûyê Şêx Se’îd bi lertzîn û zimangerîna di nav devê wî da û şermkirina niha bi taybet ku dema evîndara xwe dibine. Şêx Se’îd dixwaze ew wêneyê nearamîya derûna xwe rê me bide ku ji ber dûrîya evîndara xwe tê da çê bûye. Loma em dibînin ew birgên wesfê tevî birgên vegêranê bûne û pêvajoya bûyeran û dema vegêrana bûyeran pêşve birine. Çimkî bi şêweyek ji aliyên wesfa livdar hatîye pêşkeşkirin. Di birgeke din ya wesfa livdar da di romana “Mîrname” da Omer Xeznedar bi vî şêweyî wesfa Ehmedê Xanî dike û dibêje: “*Ew gelekî zîrek bû. Di hefteyekê da dikarî bû sûrretên dirêj ezber bikirana. Ew ne weke hemsalên xwe bû, aram û alîkar bû, her dawîya derseke Qur’anê bi destê min digirt û ez di ber derîyê mizgeftê ra dibirim ez digîhandim devera ku min dixwest.*”¹⁸⁶ Her çiqas ew birga wesfî di destpêkê da wek wesfeke rawestî be jî bi taybetî aliyê jîrî û derûna alîkarîya Ehmedê Xanî nîşan dide. Wate xwe wek wêneyekî wesfî rê didin û li derveyî avahîya vegêranê encam daye.

¹⁸⁴ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 253.

¹⁸⁵ Jan Dost, *3 Gav û 3Darek*, Weşanxaneya Avesta, Çapa Sêyem, Stenbol, 2015, r. 80.

¹⁸⁶ Jan Dost, *Mîrname*, Weşanxaneya Avesta, Çapa Sêyem, Stenbol, 2015, r. 15.

Lê dema tevî kirdar, reftar û alîkarîya Ehmedê Xanê ji bo Omer Xeznedar dibe bi vê jî wesf wek arasteyekê wesfek livdar werdigire. Bi taybet kirdarên wek “gihandin, û birin” ku bi rîya livê ve xuya dibin, dûbare dem û pêvajoya bûyeran bervî pêş dibin û tevî wêneyê vegêranê dibin.

Herwiha di romana “Martînê Bextewer” da “Martîn” wek karakterekî serekî rola wî di wan bûyerên ku bi dirêjayî di romanê da rû didin heye. Loma di piranîya demê da bi xwe beşeke ji wan bûyerane. Wate ew bi xwe bi rîya kirde û tevgeran ve encamê dide. Yan jî wek govanekî bûyeran ji me re vedigêrîne. Loma gelek caran bi rîya cînavka axiver ya “min” da wesfa xwe ji bo me dike û hinek car jî wesfa karakterên nav romanê dike. Weke mînak: Di birgeke wesfî da ji cûreyek wesfa navekî rewş û ew tirs û wêrekîya xwe ji bo me vedigêre ku dû cenga berxwedêran rûbirû dibe. Demekê bervî odeyekê diçe ku xwe têda veşêre, wek dibêje: “*Ez ditirsîyam. Tirseke kerr û kwîr û lal konê xwe bi ser min da vegirt, min hema çî dît û da ber derî ku kesek nikare ji derve veke. Di odeyê ez çûm û hatim lê tirsî min ku hatibû nema çû. Her ku çû tirs zêdetir dibû û êdî ji tirseke kerr û lal bû yeke çavsor wî bi pençe û dev û diran ez dame ber neperûşk û gezan. Tirsê ez dixwarim, dilê min, cîgera min, mêjîyê min û hinava min û berî hemû tiştî zimanê min dixwar wê dêwa tirsê. Zimanê min wê demê şikest.*”¹⁸⁷ Di vir da jî Martîn gav bi gav bi rîya yekbêjîyê ve wesfa wê gavê ji bo me vedigêrîne ku li dû kuştina Alberto yê hevalê wî rûbirûyê tirsek mezin bûye. Loma yekser li dû kuştina hevalê xwe tirs kete dilê wî û bi naçarî bervî odeyekê çû û xwe têda melis kir. Herwiha ew birga wesfî bi awayekî wesfa derûnî ya livdar da hatîye pêşkeşkirin, xwe tevî vegêranê kirîye û dema vegêrana bûyerê nesekinandîye. Dibe ku di xebata bervî pêşçûna bûyeran da bû, ji bilî wê tevî kirdarên “çûn û hatin” ê bûye û ketîye rewşeke livdar.

Di birgeke din da di romana “Kobanî” da vegêr bi awayekî wesfek navekîya derûnî wesfa wê gavê dike ku “Eyşê” digel zarok û xezûrê xwe yê yextîyar koçber dibin û li wargehên Tirkiyê bicî dibin. Carekê kesekî bi navê “Ustaz Ehmed” diçe cihê ‘Eyşê lê dimîne û destdirêjîyê lê dike. Di encamê da tirs û nîgeranîyeke mezin di hinav û xuyanîya ‘Eyşê da çê dibe ku vegêr bi vî şeweyî wesfê dike û dibêje: “*Tirs wek cihokê qetranê herikî dile ‘Eyşê, li derve dinya tarî bibû. Dengê teqînan ji dûr*

¹⁸⁷ Jan Dost, *Martînê Bextewer*, Weşanxaneya Avesta, Çapa Duyem, Stenbol, 2012, r. 247.

dihat. Huve huva bayê kurr bû. Dîsa ustaz Ehmed rabû hişk bi herdu destê 'Eyşê girt û devê xwe anî nêzikî devê wê."¹⁸⁸ Di vir da vegêr tîrsa 'Eyşê li hemberî Ustaz Ehmed nişan dide. Bi sedema wê bûyerê ku bi awayekî tîrs ketîye dile 'Eyşê ku bi wê tîrsê 'Eyşê xwe diparêze Ustaz Ehmed dîsa destdirêjîyê lê neke. Ew birg jî bi heman awayê birgên din tevî vegêranê bûye û dema vegêrana bûyeran pê berdewam bûye. Bi vê ve jî wek wesfeke livdar derketîye.

Li alîyekî din ve jî eger wesfa livdar ya karakter rûyê pêwendîya di navbera wesf û vegêranê nişan bide. Bi heman şeweyî wesfa şûn û binyata şûnê jî her wek ji bo nişandana wê rûyê pêwendîya di navbera wesf û şûnê girîng e. Loma wesfa şûnê bi taybetî ew wesfên diçine xaneyê wesfa livdar û dibin wek beşek ji wêneyê vegêrê û rolê di bervî pêşçûna dema vegêrana bûyeran da digrin. Ji bilî vê ev cûreyên wesfê beşek alîyê civakî, ramyarî, aborî, dîrokî û rewşenbîrîya karakteran nişan didin û wêneyê rewşa kesayetîya karakter dide berçavên me. Weke mînak vegêr ji wesfa ew xana ku Martîn demekê têda jîyaye bi vî şeweyî wesfa wê odeyê dike û dibêje: *"Xana Hukîdun jî. Digel piçûkîya xwe û navê xwe yê dûrî bazirganîyê nîrxên bazirganan, cihek ji cihek bazirganîya şerq û xerbê bû. Li wir ez poşman bûm ku min perê xwe hemû bi barên kaxezan nedan û nehat ku li wê xanê tîcareta kaxezan nekir.*"¹⁸⁹ Ew birga wesfî alîyê aborîya wê xanê nişan dide. Di wê navberê da bi şeweya xwe ya hûrgilî û endazeyî ya li ser hûrûmûr û tiştên di wê şûnê da hene raweste û di çarçoveya wesfeke zarlêkirî da were pêşkeşkirin û tenê erka xemilandî bide binyata nivîsandinê. Belkî bi berevajî ve ew wesfa di çarçoveya wesfek nû û bi alîyê wesfeke livdar da hatibe pêşkeşkirin, her ji ber vê yekê şûna bûyerê bilezî di nav zîhna xwendevanan da derbas dibe û tevî vegêranê dibe û herikandina bûyerên wê pê tê berdewamkirin.

Di birgeke din ya wesfa şûnê da di romana "Mijabad" da karakterê serekî wek vegêrekî romanê gava jidayikbûna xwe vedigêre ku pêştir pîrika wî çawanîya jidayikbûna wî jê ra vegêrandîye. Paşê gelekî bilezî wesfa tiştên nav odeya ji dayik bûye dike û çend peyvan be der tîne, wek dibêje: *"Ez di odeyeke rût da ji dayik bûm bi dîwarê li ber sere min ve tene tivingek û Qur'anek daliqandî bûn.*"¹⁹⁰ Amadebûna

¹⁸⁸ Jan Dost, *Kobanî*, Weşanxaneya Dara, Çapa Yekem, Stenbol, 2017, r. 361-362.

¹⁸⁹ Jan Dost, *Martînê Bextewer*, r. 107.

¹⁹⁰ Jan Dost, *Mijabad*, r. 14.

tiştên nav şûnê wek tiving û Qur'an helgirê wate û xuyanîyên kûrin û rehendeke neteweyî û nîştîmanperwerîya Yûnis Amêdî bavê Badîn nîşan dide. Demekê ji Amêdîyê vediqete û beşdarê Şoreşa Şêx Mehmûdê Hefîd dibe li bajarê Silêmanî. Li alîyekî din jî hebûna Qur'anê di odê da têgînê li bawermendîya kurdan dike, ku piranîya kurdan peyrewkarê dînê îslamê ne. Lê kurd bi berdewamî li jêr surret û dînê îslamê ketine bin destê dagîrkeran. Loma behskirina hûrûmûrên di nav wê odeyê da bi wê lezbûnê ve dema vegêrana bûyeran bervî pêş birîye û wesfek livdar ya şûnê çê kirîye.

Di birgeke din ya wesfa şûnê da di romana “Kobanî” da Jan Dost wek dengekî vegêr ve beşek serpehatî û serborîyên jîyana xwe ya zarokatî û mezinbûna xwe ya li Kobanî vedibêje. Paşê jî ew cenga mezin ya rûniştvanên Kobanî rûbirû bûne û di encamê da jî bûye sedema koçkirina bi hezaran malbatan. Li alîyê din jî behsa wan kaviên bi ser xanî, mizgeft, kolan û balexaneyên bajarê Kobanî da hatîye dike. Weke Mînak: Jan wek dengekî vegêrê romana xwe wesfa ketin û xopanbûna beşeke pir ya xanîyên xwişk û bira û meriv û cîranên xwe dike û dibêje: *“Hewşên cîranên min, yên birayên min nemane, xanîyên wan hatine ‘erdê, şop ji wan re nemaye, erdhejeke mezin tenê dikare vê hunerê bine serê xanîyan. Korteke kûr li şûna mala xwişka min ku li başûrê mala me bû peyda bûye.”*¹⁹¹ Di vir da jî wesfkirina ew xopanbûn û kavilkarîya bi ser xanîyên ku di qonaxeke dîrokî da ku ew bajara rûbirûyê wê kavilkirina mezin bûye ev helgirê wateyeke mezin ya dîrokî ye. Loma divê em bibêjin wesfeke ketwarî ya şûnê ye. Bi piranî erka ronîkirin û zanyarîyê ye ji bo xwendevanan li ser wê zilma ku neteweya kurd bi berdewamî li ser axa xwe hêriş lê hatîyekirin. Ev birga wesfî ya şûnê tevlî vegêranê bûye û wateyek daye şûnan herwiha herika bûyeran pê berdewam kirîye, ku diware em bikaribin ji avahîya nivîsandinê derxin û ji bîr bikin.

Herwiha wesfa bûyerê jî ji yek ew birg û parçeyen wesfan tê pejirandin ku di piranîya demê da tevlî vegêranê dibin û wêneyekî vegêranî pêk tînin. Bi vê jî girîngî û nîrxê wesfa bûyerê derdixe holê, ku rîtma vegêrana bûyeran sist nake. Dibe ku bi berevajîyê ve bervî pêş dibe û pêvajoya bûyeran berdewam dibe. Bi şeweyekî giştî wesfa bûyerê di nav romanên Jan Dost da xwedîyê du rehend û kunenişîna vegêranê

¹⁹¹ Jan Dost, *Kobanî*, r. 304.

ne, ku “kunenîşîna xweyî” û “kunenîşîna mijarî”. Herwiha bi rîya “vegêra/vegêrê hemû tişt zan” ve tê vêgêrîn û beşa din jî bi rîya “heman tişt zan” û hinek car jî bi rîya “kêm tişt zan” tê vêgêrîn. Weke mînak: Di pêşkeşkirina bûyera “Reva Heme Ziravê Mihacir” da vegêr bi vî şêwazî bûyerê vedigêre û dibêje: “Çarîkek neçû trêneke din ji alîyê rojhilat ve hat. Berî bigihê rawestgehê hêdî meşîya. Heme Zirav bilez û bi tirs, ber trêna hêdî meşîya û Heme xwe avête vagonekê. Wî jî nizanîbû bê ew mêranî çawa wê şefeqê hate wî. Heme li ser kursîyekê rûnişt. Li rawestgehê trêna nêzikî deh deqeyan ma û paşê berdewam kir. Çarîkek neçû kontrolçiyê bilêtan derket. Heme Zirav xwe amadekir ku çîrokekê li hev bîne û bibêje ku, yan min bilêta xwe li mal ji bîr kirîye yan jî min ew winda kirîye. Lê li pey kontrolçî serbazakî tiving li mil jî hat. Êdî rewş xerab bû...hwd.”¹⁹² Di vê birga wesfî ya bûyerê da ku ji 30 rêzî bêtir ajotîye. Bi rîya vegêra/vegêrê hemû tişt zan bi bikaranîna cînavka kesê sêyem yê yekjimar yan jî nedîyar ve û li kunenîşîna mîcarî bûyeran pêşkeş dike. Herwiha agadarê hemû ew kirde û tevgeran e ku bûyera reva Heme Zirav bervî bakurê Sûrîyê encamê dide. Ev birga di alîyê wesfa livdar da ye û bi rîya kirdarên “hêdî ve meşîya, xwe avête vagonekê, li ser kursîyekê rûnişt, berdewam kir” tevî vegêranê bûne û dema vegêrana bûyeran pê berdewam bûye. Herwiha vegêr di beşa duyem ya vê birga wesfî da berdewamî dide vegêrîna bûyerê û dibêje: “Bê ku bala kesekî bikşîne ser xwe derî vekir. Li jêr piyên xwe nihêrî, ‘erda mişt sitirî dît. Mîna xefkên mirinê bû ew ‘erda tijî sitirî û kevir, lê wî guh li wê yekê nekir û xwe avêt.”¹⁹³ Di vir da jî vegêrana bûyerê berdewame bi rîya kirdara “xwe avêt” ve herikandina bûyeran berdewame, paşê vegêr berdewam dibe li vegêrana xweyî û dibêje: “Ew li ser wê axê qulibî. Kontrolçî û serbaz û kesên di trêna de lê ‘ecêb man. Serbazê tirk, piştî ku fêma kir xortek direve, berê lûleya tivinga xwe ber bi wî ve kir û gule bi ser wî da barandin...”¹⁹⁴ Bi heman şêweyî em dibînin herika bûyeran bervî pêş diçe û tevî dema vegêranê bûye, ta ku vegêr di beşa dawî ya vegêrandina bûyerê da behsa gava rizgarbûna Heme Zirav dike û dibêje: “Dema ku trêna nema xuya bû û ber bi îstasyona ‘Erebînarê ve çû, Heme Zirav jî di nav daran de winda bû. Li pişt xwe nihêrî û, tişteke nedît û nebihîst, ji ew tînya kûçikên gundan û xîstexîsta daran pêve tişteke wê berbangê nedihate bihîstin. Darên ku dikarin xîstexîst û diaxivin, ew ji ber

¹⁹² Jan Dost, b.n.b., r. 28.

¹⁹³ Jan Dost, b.n.b., r. 28.

¹⁹⁴ Jan Dost, b.n.b., r. 28.

çavan veşartî bûn.”¹⁹⁵ Di dawîya birga wesfî da herika bûyeran sist nebûye. Dibe ku bi şêweyekî zincîreyî ya ketwarî ve gav bi gav bûyer bervî pêş çûye. Bi vê jî hêmana demê gav bi gav digel werar û gav û kirdarên Heme Ziravê karakter çûne.

Di wesfeke din ya bûyerê da di romana “Mijabad” da dema ku Badîn ji girtîgehê azad dibe, vegêr ku Badîn bi xwe ye bi rîya bikaranîna cînavka “ez, min” ya kesê yekem yê vebêj ve yekser bûyeran bi rîya raman û hizr û derûna xwe ve ji xwendevanan re vedibêje. Bi awayekî beşeke fire ya romanê bi vê dîtîne ve pêşkeş dike, herwek di wesfa bûyera azadbûna xwe da dibêje: *“Hefteya din Cabirê ‘ereb hat û got:*

-Midûr te dixwaze dilê min lêxist û min ji xwe pirsî:

-Gelo xêr e!

Di cî de ez çûme odeya wî rûyê wî li ken bû, berî xwe da min û bi dilovanî got:

-Me tiştêk li ser te îspat nekir tu ji sûcê casûstîya elmanan bê gunehî, niha tu dikarî derkevî, pereyên te hene?

Erê ezbenî, min di xeratîyê da çend rojan kar kirîye. Nasnameya min û tiştên dane min û pend û şîret li min kirin...

Here, Xwedê bi te re be.”¹⁹⁶ Di vir da Badîn karaktere serekî ye. Di heman demê da vegêrê nava romanê ye. Bi rîya cînavka “ez, min” ya kesê yekem yê vebêj ve wesfa bûyerê ji me re dike ku bi awayekî xwendevan bi hêsanî hest bi liv û tevgera dema vegêranê dike ku ev jî bi rîya hevokê ve derdikeve wek kirdarên “di cî de ez çûm, niha tu dikarî derkevî, here Xwedê bi te re be.” Loma xwendevan bi rîya van kirdarana ve hest bi berdewamîya bervî pêşçûna pêvajoya vegêranan dike. Bi vê jî ev wesfa dibe wesfek livdar û tevlî wêneyê vegêranê dibe.

Bi vê dîtîne ve divê em bibêjin hemû ew birgên wesfî ya livdar yê karakter, şûn û bûyeran ku tevlî vegêranê dibin û wêneyê vegêranê pê berdewam dibin û binyata vegêranê bervî pêş dibin beşeke nebirî ye di hêmana demê da. Ji ber vê yekê jî baştirîn wêneyê pêwendîya wesfê bi vegêranê nîşan didin. Bi tu haweyî nabe binyata wêneyê wesfî û wêneyê vegêraneyî ji hevdu bête cudakirin

¹⁹⁵ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 29.

¹⁹⁶ Jan Dost, *Mijabad*, r.146.

3.2. Pêwendîya Di Navbera Wesf û Karakter Da

Karakter hêmaneke serekî ya romanê ye û rolek bandordar di binyata nivîskara romanê da dilîze. Herwiha pêwendîya karakter bi hemû hêmanên serekî yên romanê ve heye, ji bilî vê jî pêwendîyeke karakter ya dîrokî digel teknîka wesfê jî heye ku divê em bibêjin: “Pêwendîyên di navbera wesf û karakter û herwiha xwezaya karakter û mijara wesfê û xweyî ya wesfîkirî da pêwendîyeke bihêz û berçav e.”¹⁹⁷ Vê pêwendîya wesfê jî ji qonaxekê bervî qonaxeke din guherkarî li ser xwezaya wesfa karakter da anîye. Wate li gore qonaxan cûreyeke ji wênegirtina wesfa karakter ji alîyê romannivîsan ve hatîye pêşkeşkirin û paşê jî digel qonaxên girêdayî dîrokê ve ketine bin bandora ew guherkarîyên ku teknîka wesfê bi ser xwezaya karakter da anîye. Loma em dibînin romannivîsên zarlêkirî şewazeke sade yê wesfa karakter bikaranîne ku bi piranî wênekêşana derveyî ya karakter bû. Bi wateyeke din “Ji wesfa laş û kurteyek ji jîyana karakter pêk hatibû. Herwiha kinc jî nîşaneyek baş bû ji bo derxistina çîn û asta jîyana karakteran.”¹⁹⁸ Wate romannivîsan bi piranî helwestên xwe li ser wesfîkirina kinc û xuyanîya karakteran kirîye. Bi wê armancê ku weneyekî ketwarî yê karakteran bikşînin û awayekî qîmpêanînê li ba xwendevanan çê bikin. Ew karakteren wesfa wan tênekirin hevşeweyên karakterên ketwarî yê nava civakê ne. Çimkî ramana romannivîsên li ser rêbaza zarlêkirî wiha bû “Karakter wêneyê biçûkkirî yê cîhana ketwarîyê ye, li gorî wan wiha bû bi rîya wan ve rikberîya dîroknûsan dikin. Bi taybet di vegêrana ketwarîya karakteran ve li alîyê siyâsî, civakî, rewşenbîrî û aborîyê.”¹⁹⁹ Ev hemû li xwendevanan wiha dike ku wêneyekî amadekirî yê karakteran di hizra xwe da bipeyitînin.

Herwiha “di romanên realîzmî da her hûrgilîyên binyata karakteran berçav nakevin. Dibe ku pêwendîya wê bi jîyana wan ve heye, wek alîyê laş, kinc û ew xanîyê têda dijî bi rîya wesfê ve rê xwendevanan dide herwiha jîyana karakteran bi pê taybetmendîya karakteran ve tê behskirin ku karakter têda dijîn.”²⁰⁰ Wate wênekirina ketwarê û nîşandana jîngeha civakî ya karakteran karê pêştir yê

¹⁹⁷ Philip Hamon, *Fî el- Wesfî*, Wer.: Saad el- Tirîkî, r. 203.

¹⁹⁸ David Lodge, *el- Fen Riwaye*, Wer.: Mahir Betutî, Çapa Yekem, Meclîs el- ‘Ala el- Lisese, el- Meşrû’ el- Qewmî, Dîmeşq, 2002, r. 78-79.

¹⁹⁹ ‘EbdulmElîk Murtez, *Fî Nezerîye el- Riwaye*, *Be’ hse Fî Teqnîyet el- Serd*, r. 73.

²⁰⁰ Cewher Şêxanî, *Binyatî Karekter Le Romanekani Husên ‘Arif Da*, Weşanxaneya Rojhelat, Çapa Yekem, Hewlêr, 2014, r. 2.

romannivîsên rêbaza zarlêkirî bû. Bi berdewamî li ser wê radiwestîyan ku pêwîste wêje û berhemên wêjeyî olandana civakê bin û têgînê li jîyana ketwarî ya civaka mirovan bikin. Loma “Romannivîs têdikoşe ku morkeke realîzmî bide xwezaya nav nivîsan”²⁰¹ ku bi rîya karakteran ve vî rolî vedigêrîne. Lê piştî guherkarî û derketina “Rêbaza Pêla Hişî” li Fransa, xweza û pêşkeşkirina wesfa karakter bi arasteyeke din hate guherîn û wesf bi piranî bervî hinava karakteran û nîşandana alîyê wan yê veşartî ve sist bûn. Herwiha bi sedema perdehîlanîna li ser rehendên derûnîya karakteran jî binyata wesfên karakterî xurttir bûn. Ev jî wek berg û formeke nû romannivîsan di nav romanên xwe da girîngî danê. Wate dîtîna û ramanên cuda yê romannivîsên bi ser vê rêbazê jî ber şewaza pêşkeşkirina wesfa karakteran hebû. Çimkî li gorî wan wiha bû ku karakterên nav romanên heman ew kesên di nav jîngeha civakî da hene nînin. Dibe ku karakter di nav romanên da navgîneke û ji alîyê romannivîsan ve têne afirandin. Roland Barthes dibêje: “Karakter ji bilî bûnewerekî kaxezî ne tiştekî din e”²⁰² û bi rîya romannivîsan ve binyat, taybetmendî û rola wan tê diyarkirin. Loma divê em bibêjin: “Kesayetî di romanên da zîndewereke ji peyvan pêk hatîye û jîyana xwe jî tenê di rûyê rûpelan da derbas dike. Ji wê girîngtir jî divê em bibêjin bûnewerekî dahêndarê zimanî û xeyalî ye.”²⁰³ Wate dema ku romannivîs wan karakteran diafirîne merc nîne ku mînakên zindî yên rastîya civakê be. Loma romannivîsên rêbaza nû di afirandina karakterên xwe da bi berevajîya realîzmê li karakteran nihêrîne. Bi wateyeke din kêmtir ketine bin bandora raman û dîtîna zarlêkirîyan. Herwiha bi berdewamî dixebitîn ku hinek karakteran biafirînin ku hevşeweyê wan di ketwarê da hebin, lê romannivîsên nû bi rîya herika hişî ve awayekî ji wêneyê karakterên xwe bi şeweyekî pîralî pêşkeş kirine ku dikarin têgînê li hest, soz û rewşa derûnîya xwe bikin û hez û daxwaz û xeyalên xwe derxînin.

Herwiha amadekirina wêneyê karakter û pêşkeşkirina wan di nav nivîsên romanê da ji alîyê romannivîsan ve bi du şewaz û rê ve têne pêşkeşkirin. Ev jî ji bi rêya “ragihandin, nûçe” û rêya “nimayîşkirin, rêdan” pêk tên.

²⁰¹ Beyan Mecîd Se'îd, *Bunyatî Wesf Le Romanî “Şar” î Husên 'Arif*, r.110.

²⁰² Roland Barthes, *Medxel- el- Te'hlîl el- Benewîye Lil Qisas*, Wer.: Minzur 'Eyaş, r.72.

²⁰³ Arî 'Usman Xeyat, *Riwangey Rexne û Riwanî Tîyorî*, r. 20.

3.2.1.Rîya Ragihandinê

Di vê rêçikê da romannivîs di kunenişîna taybetî ya xwe ve wesfeke amadekirî û taybetmendîya karakteran ji me re dikşîne, ku bi tu şêweyî derfeta xwendevanan namîne şîroveyên taybet bi xwe li ser karakteran bike, ji ber wê ku romannivîs bi şêweyekî yekser “Wek govanakê li derve kesan dibîne û her li derve jî wan werdigirin û behsa bîr û bawer, soz û hest, êş û azar, hêvî û bendewarî û xewnên wan dike.”²⁰⁴ Di çarçoveya qalibekî amadekirî da pêşkeşî xwendevanan dike. Weke mînak dema romannivîs wesfa mîrekî dike û dibêje: “Mîrekî pîr yê xelfawe”²⁰⁵ di vê wesfê da romannivîs biryara dawî li ser wêneyê karakterê xwe daye ku tu derfet ji xwendevanan re nehiştîye li ser xweza û xuyanîyên fîzîkî û taybetmendîya karakteran bifikirin. Wate hergîz xwendevan nikare bi daxwaza xwe ve ew wêneyê ji bo wî karakterî hatîye kişandin bi wêneyekî din biguhere. Bi vê jî “Xwendevan bê westîn li xwezaya taybet ya karakterên xwe têdigê. Çimkî romannivîs bi şêwazeke ron wesfa kesayetîya karakterên xwe dike û yekser dest davêje nav pêvajoya wesfikirinê.”²⁰⁶ Di vir da romannivîs kunenişîna taybet bi xwe wek kunenişînek dîtina ji derve bikar tîne. Piştî xwe dispêre şêwaza vegêrana mijarî bi alîyê “Vegêrê hemû tiştan bi rîya cînavka kesa/kesê sêyem yê yekjimar “ew” yan jî cînavka nediyar ve.”²⁰⁷ Wesf û taybetmendî û xwezaya karakterên xwe ji me re vedigêrîne. Ev rîya wek kevntirîn rîya pêşkeşkirina karakteran tê jimartin ku romannivîsên ser rêbaza zarlêkirî ji bo pêşkeşkirina karakterên xwe peyrewa vê rêçikê kirine. Di serdema Aristoteles jî heman ev rêçika hatîye bikaranîn lê Aristoteles “Bi pesendî nedizanî kesan bi vê rêçikê ve bide pêşkeşkirin û li alîyê hunerê ve girîngiyeke kêr daye.”²⁰⁸ Çimkî ev rêçika ku romannivîs yan jî çîroknivîs serbest dike jî di wir da bi daxwaza xwe binyata wesfa karakteran dabirêjîne, lê li alîyekî din romannivîs xwendevanan rastî bêhêvîtiyê tîne û tu rolekê di beşdarbûn û şîrovekirina li ser bîr û bawerî û hizra karakteran da nade destê wan. “Di encamê da dibe sedema bêbeşkirina çîrokê di binemaya vedîtin û derencamdan û bandorkirina li hevdu ku yek ji girîngtirîn alîyên

²⁰⁴ Perêz Sabîr, *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî*, r. 187.

²⁰⁵ 'Ednan Xalid, *El- Neqd el- Tetbîqî el- Te'hlîl*, Çapa Yekem, Dar eş-Şuûn el- Seqafe el- 'Ame, 1986, r.68.

²⁰⁶ Dîyar Faîq Mecîd, *Bunyatî Wesf Le Romanî “Rêga”y Mihemmed Mewlud Mem Da*, r.54

²⁰⁷ Cewher Şêxanî, *Binyatî Karekter Le Romanekanî Husên 'Arîf Da*, r. 55.

²⁰⁸ Perêz Sabîr, *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî*, r.187; Aristotle, *Fen el- Şi'ir*, r. 44.

çîrokê pêk tîne.”²⁰⁹ Loma piştî ku guherkarîyên bi ser vê cûreya romanê da hat digel wê guherkarî bi ser şêwaza pêşkeşkirina karakteran da jî hat û rîya nimayîşkirin yan jî ya rêdana wan ji bo karakteran bikaranî.

Weke mînak: Jan Dost di romana “Martînê Bextewer” da di beşeke pêşkeşkirina karakterên nav romana xwe da rîya ragihandinê bikaranîye. Wate romannivîs bi kunenişîna xwe ve bi rîya vegêrhê hemû tiştan ve wesfa karakterê serekî Martîn dike û dibêje: “*Qiyafetê Martîn yê ewropîyan bû: Şerwallekî kurdî, qutkekî esfehanî, kurkekî sîmuran ku koçerên Qefqasyayê çêkiribûn bi ser wî şerwallê fire da berda bû û fêsa tîrkan li serî bû. Şallekî hevrişimê spî hema bê fesall li qirika xwe gerandibû. Hebanek li mil û çend tûrik pê ra. Tenê kosetîya wî nehatibû guhertin. Ew rûyê bê mû li halê xwe weke berîyeke bê baran mayî ma bû.*”²¹⁰ Di vir da ew wesfa vegêr ji bo Martîn kirîye bi şêweyekî yekser pêşkeş kirîye, çarçoveyeke diyarkirî ji karaktere xwe ra çêkirîye. Bi vê jî xwendevan ji beşdarîkirina ew wesfên ku vegêr kirine bê beş mane. Di mînakeke din da di romana “3 Gav û 3 Darek” da romannivîs bi heman hawayî bi rîya vegêrê hemû tiştan û bi bikaranîna cînavka kesê sêyem yê yekjimar wesfa Şêx Se’îd dike û dibêje: “*Bayekî hênîk dihat û xeftanê wî yê etles û bi zerekî hingivîn xêzkirî dide alî, çîmên wî yên mû spî û ziravik ên ku bayê wê şeva dereng ji bin xeftan ew didane xuyakirin, ew di ajotin qedereke kirêt, xwîna ku ji birînê jî dihatin, êdî bi ser şimikê da herrikî bû.*”²¹¹ Di vir da jî vegêr bi rîya ragihandinê ji bo pêşkeşkirina Şêx Se’îd bikaranîye.

3.2.2. Rîya Nimayîşkirinê

Di vê cûreya pêşkeşkirina karakter da, romannivîs bi berevajîya rîya ragihandinê. Bi şêweyekî yekser karakteran pêşkeş nake. Dibe ku romannivîs li ser zimanê karaktereke/karakterekî nav romanê da wêneyê karakteran ji me ra dikşîne û “Qadê dide kesan bîne pêşî û bi rîya helsûkeft, reftar, axaftin, pirsgirêk, tevger û pêwendîya wan kesana digel kesên din yan digel bûyeran da xwe pêşkeş bikin û yan jî ji alîyê keseke/kesekî din ve werin pêşkeşkirin.”²¹² Ji bo vê armancê jî xwe davêje ber cînavka kesa/kesê vebêj ji bo li ser zimanê wê pêvajoya wesfîkirina karakteran da

²⁰⁹ Jan Dost, *b.n.b.*, r.188.

²¹⁰ Jan Dost, *Martînê Bextewer*, r. 37.

²¹¹ Jan Dost, *3Gav û 3Darek*, r. 16.

²¹² Perêz Sabîr, *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî*, r.188.

encamê bide. Loma rola vê cînavka wiha li denge romannivîs dike bi dijwar were dîtîn û denge vegêra/vegêrê hemû tiştzan û hinek car jî kêmtir tiştzan bi ser binyata karakteran da serdest bibe. Bi wateyeke din romannivîs nikare bi daxwaza xwe dest li kar û rewşa pêvajoya wesfa karakter wer bide. Çimkî şêwaza wesfkirina romannivîs dibe wek şêwazeke xweyî û kunenişîna xweyî ya karakteran, şûna kunenişîna mijarî vedigêrîne. Di encamê da şêwaza pêşkeşkirina wan şêwazeke neyekser werdigire. Loma divê em bibêjin ew romannivîsên ku di romanên xwe da şêwaza firedengî bikartînin. Di çarçoveya rîya nimayîşkirinê ve beşek pir ya wesfa karakteran pêşkeş dikin. Loma “Di romanên rêbaza nû da nivîskar rîya nimayîşkirinê bi ser rîya nûçe yan jî ragihandinê da pesend dikin.”²¹³ Çimkî qadê didin ber xwendevanan ta ku şîroveyan li ser wêneyê karakteran bikin û dîtîn û ramanên xwe li hember karakteran nîşan bidin. Bi wateyeke din romannivîs serbestîyeke bi temamî dide destê xwendevanan ku wêneyê wesfan werdigirin yan jî ret dikin.

Weke mînak: Di romana “Mijabad” da Badînê karaktere serekî yê romanê di heman demê da lehengê nav romanê ye û bi rîya nimayîşkirin û bi bikaranîna cînavka kesê yekem yê yekhejmarê vebêj ve wesfa xwe dike, behsa beşek raborîya xwe dike û herwiha komek zanyarî di derbarê raborîya xwe dide me û dibêje: “*Sê sal berê ez Badîn kurê Ûnisê Amêdî, şervanek bûm ligel Mela Mistefa, dojehek bû ew şer, ji xwe di nav agir hesin sîqal dibin weke çawa ku dil devîneka xedar de teng dibin. Min digot:*

-*Emê karibin Bexdayê jî têxin zefta xwe.*”²¹⁴ Di vir da Badîn ji bilî armanca xwe xwendevanan nasber bike bi wê ku di raborîya xwe da çend salan şervan bû û di refê tevgera rizgarîxwaz ya kurdan da bû. Herwiha qahremanîya xwe nîşan dide ku digel Mela Mistefa beşdarî wan cengana kirîye. Loma em dibînin dengê Badîn nêziktirî xwendevanan e ji denge romannivîs yan jî ji yê vegêrê hemû tiştzan yê romanê. Herwiha kunenişîna xweyî ya Badîn ji kunenişîna mijarî serdestir e. Bi vê jî rîya nimayîşkirinê hatîye holê.

Di mînakeke din da kalikê Badîn ji kunenişîna xweyî ya xwe ve wêneyekî Badîn ji bo me dikşîne û wek dibêje: “*Bado ez dizanim tu çawa difikirî, xwîna te germe, ne ji ber xortanîyê, lê ji nezanîyê gelek hêvî li bal te hene, te xebata siyasî miyasî jî*

²¹³ Diyar Faîq Mecîd, *Bunyatî Wesf Le Romanî “Rêga”y Mihemmed Mewlud Mem Da*, r.55.

²¹⁴ Jan Dost, *Mijabad*, r. 35.

kirîye, tu ketî nav partîyan jî, lê hîç e, dem partîya mezine, kurê min. Bibe endamê partîya deme.”²¹⁵ Di vê rêdana ji alîyê kalikê Badînê karakter ve hatîye kirin da şêwaza nimayîşkirinê hatîye bikaranîn, qadek ji bo xwendevanan maye ku li ser tevger û raborîya karakter bihizirin. Wate xwendevan girêdayî wê çerçewa wesfîkirî nabe ku vegêr digîne serî.

Bi vê dîtîne ve rîya ragihandin û ya nimayîşkirinê du navgînin di destê romannivîsan de ku bi wan ve karakterên nav romanên xwe amade dikin û bi xwendevanan dide nasîn. Piralîtî û hostatîya romannivîs wiha dike her du rê tevlîhev bibin û di pêşkeşkirina karakteran da beşdarîyê bikin. Loma di romanên rêbaza nû da li gorî romanên zarlêkirî mînakên bi vî hawayî pir bi ber çavan dikevin. Çimkî romannivîsan bi piranî rêçika ragihandinê dipejirandin.

3.2.3. Wesfa Mijarî

Ev cûreya wesfê bi piranî di romanên zarlêkirî da dihat bikaranîn, lê ev nayê wê wateyê ku romanên rêbaza nû ji vê wesfê xalî ye. Loma li gor xwezaya bikaranînê wesf ji alîyê romannivîsan ve diguhere, yan jî şêwaz û taybetmendîya romannivîs derdixe holê ku çiqasî vê wesfê bikartîne. Di romanên Jan Dost da mînakên vê şêweyê gelekî bi ber çavan dikevin. Di vir da emê çend mînakan têxîne rû. Di romana Mijabad da Badînê karaktere serekî wesfeke derekî ya “Jale” ya evîndara xwe dike û dibêje: *“Ez li ber tu mirovî ewqasî sit û beçare nebûm, ew perî bû, horî bû, ferîşte bû, nizamî, lêvên wê qerf û tazî bû qerênfîlên sor dikirin, kene wê dîlana yasemîn bû, henasên wê gule sêv bûn û çavên wê... Ne... Xameya min li ber her du şaneyên hengiv lale, memikên wê...”*²¹⁶ Badîn bi rîya vê wesfê ve behsa xuyanî û rindikbûna Jale dike û di kunenişîna taybetî ya xwe da wesfê digîne serî. Di vê wesfê da dema vegêranê rawestî ye û tu alîyê bervî pêşçûnê têda tune. Di birgeke din da, Badîn wesfeke fîzîkî ya keça meta xwe dike û dibêje: *“Her ku dem diçû keça meta min ciwantir dibû, li dû tavên nêranîya min, du dobelan di sînga wê de hellpekîyan, çi germ û nerm bûn ew her du gîrên ji agir ku di berîya sînga wê da bûnçavên wê qerfê xwe bi bi şevên biharê dikirin.”*²¹⁷ Badînê vegêr bi heman alîyê wesfa Jale, wesfa xuyanî û alîyê fîzîkî û ciwanîya keça meta xwe dike û behsa dema

²¹⁵ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 96.

²¹⁶ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 44-45.

²¹⁷ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 36.

derbasbûna demeke pir û bi wê derbasbûna demê ve guherkarîya mezin ya ku bi ser laşê keça meta wî da hatîye dike. Loma dibêje roj bi roj mezinbûna wê rindikbûna zêdetir derdixist ber çavan. Herwiha bi kunenişîna xwe ve berawirdîya qonaxa zaroktî û mezinbûna wê ji me re ron dike. Di vir da jî dema vegêrana bûyeran rawestî ye. Bi vê jî wêneyê wesfeke rawestî hatîye kişandin, mînakê hevşeweyê vê cûreya wesfê di romana Mijabad da di rûpelên “16, 32, 45, 49, 61” da jî hene.

Herwiha di romana 3 Gav û 3 Darek da vegêr di wesfa Şêx Se’îd da dibêje: *“Bayekî hênîk dihat û xeftanê wî yê etles û bi zerekî hingivîn xêzkerî dide alî, çîmên wî yên mû spî û ziravik ên ku bayê wê şeva dereng ji bin xeftan ew didane xuyakirin, ew di ajotin qedereke kirêt, xwîna ku ji birînê jî dihatin, êdî bi ser şîmîkê da herrikî bû.”*²¹⁸ Di vê wesfêkirinê da çiqasî vegêr bi piranî alîyê fîzîkî û laşê Şêx Se’îd berçav dixwe, li pişt wê jî bi rîya komêk peyvên ku dibêje “ew diajotin qedereke kirêt” dixwaze wê peyamê bigihîne xwendevanan ku ew jî rewşa xirap ya laşê Şêx Se’îd e. Sedemeke serekî ye ku pêşeroja wî bervî çarenûseke nediyar dibe. Herwiha Di birgeke din ya wesfî da vegêr wesfeke fîzîkî û mijarî ya “Derwêş Xidirê Botî” karakter dike û dibêje: *“Derwêş bi şerwallekî botîyan, ji çûxê xetxetî yê qehweyî û spî, şûtîkekî sor li newqê gerrandî, kollosekî kovîkî û şîn û ku kefyêke zer lê gerrandî û şapîkekî tenik, li ber xumalîka avê ya di kulkekê di dor de, westîya bû û tasîka çinkoya spî û bi zincîrekê bi banê kulkê ve kutayî û kevîkên devê wê qeşartî. Di bine xumalîkê da dikir û av bi yek qurtê re berdide gewrîya xwe ya zuwa.”*²¹⁹ Di vê birga wesfî da jî vegêr bi şewaza wesfa zarlêkirî da wesfa kinc û şewaza rawestîne Derwêş û çawanîya av vexwarina wî dike. Ev birga jî bûye sedema wê ku dema vegerana bûyeran di çend gav ajoyekê da raweste ta ku vegêr wesfêkirinê bike û paşê jî dúbare dest bi vegerana bûyeran dike.

Di romana “Mîrname” da jî romannivîs binyata vegerana romana xwe bi ser çend karakteran ve dabeş kirîye û şewaza firedengî pejirandîye û erka vegerana romana xwe spartîye komêk karakter ku heryek ji wan beşek ji jîyana xwe digel karakterê serekî Ehmedê Xanî derbas kirine. Wate heryek ji wan karakteran li kunenişîna taybet bi xwe ve beşek ji wan serpehatî û bûyerana vedigêrînin. Bi vê jî vegêrê romanê dibe vegêrekî kêmtîştzan. Çimkî agahdarîyeke hemû yek ji wan

²¹⁸ Jan Dost, 3Gav û 3Darek, r. 16.

²¹⁹ Jan Dost, b.n.b., r. 57.

karakterana ji ew serborî û bûyerana tuneye ku bi dirêjayî ya romanê da duçarî karakterê serekî dibe. Weke mînak: Xalidê Çolaq bi zarê bavê Xanî ve wesfeke jîrî, hişmendî û girîngîdana Ehmedê Xanî bi Qur'an û jiberkirina suretên Qur'anê û fermûdeyên pêxember (s.x.l.) dike û dibêje: *“Wisa li Ehmedê nenhêre Xalid can, ew kurekî di ser xwe re ye û ji avê bêtir tî ye li me. Biçûke lê tu dibêjî qey wî zimanê tûtîyan xwarîye. Şevên wî bi xwendina qur'ana kerîm dibihûrin. Niha bi vî ji yê xwe cuza 'emme kuta kirîye û dest bi tebarekê dike. Deh 'hedîsên nebewî jî jiber kirine.”*²²⁰ Di vê birga wesfî da bavê Xanî alîyê jîrî û kesayetî û gerêdayîbûna dîndarî ya kurê xwe ji Xalid Çolaq re vedibêje. Bi vê jî wesf bûye wesfek mijarî ya rawestî. Çimkî di ajoyekê da dema vegêrana bûyeran rawestîya ye. Wate nebûye sedema çêbûna tu alîyê bûyeran yan jî bandorê li ser bûyerên nav romanê çê bike. Di mînakeke din da Buharî yê vegêr di wesfa Xanî da dibêje: *“Min ji mêj ew naskiribû. Min dizanî bû ku mirovekî têra xwe jî û zana û xwedan aqil û ferhenge.”*²²¹ Buharî yê vegêr di bin ew bandora jîrî, şîyan û hişmendîya Xanî ku navûdengê wî li Bazîd û derdora wê belav bibû wesfa Xanî kirîye û di kunenişîna taybet bi xwe ve wesf pêşkeş kirîye vê wesfê jî dema vegêranê rawestandîye.

Herwiha di romana Martînê Bextewer da romannivîs komek karakter bi şêwaza cuda pêşkeş kirîye, hinek li alîyê fîzîkî û derveyî, hinek jî li alîyê navekî têne wesfîkirin. Weke Mînak: Di wesfeke mijarî da vegêr bi vî şêweyî wesfa Gustavê karakter dike û dibêje: *“Gustav kesekî oldar e ji nimêjên li dêrê nedima. Kitêba pîroz hema hema ezber kiribû. Axaftinên wî jî hemû tijî mesel û qîssetên mesîh û peyrewên wî bûn. Nameyên Pawlosê ji şeniye Romayê û Efsûsê re jiber kiribûn. Ji xwîngermîya xwe û îmana xwe ya qewîn. Tev li serbazên Felldmareşal Ugen Von Savoyen bû û çûbû heta welatê Mecerîstanê û şerê tirkan kiribû.”*²²² Vegêr Xwedaperestî û pabendbûna Gustav li hemberî dînê mesîhîyet nîşan dide. Di heman demê da gernasî û qahremanîya Gustav li hemberî ew cengên ku serdemekê ewrûpîyan li dijî tirkan kiribû derdixe. Herwiha vegêr wesfeke mijarî ya rawestî pêşkeş kirîye. Bi vê jî dema vegêrana bûyeran bervî pêş nebirîye.

²²⁰ Jan Dost, *Mîrname*, r. 122.

²²¹ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 63.

²²² Jan Dost, *Martînê Bextewer*, r. 25.

Herwiha di romana Kobanî da romannivîs wesfeke xuyanî û kincên Hecî Mislim Heme Zirav dike û dibêje: *“Rîya wî dirêj bibû. ‘Egal û desmal danîbûn û li şûnê şewqeyek dabû serê xwe. Şewqeyê li serî û ew saqo û kiras û qayîşa di bin saqo de li newqê gerrandî û kurkê reşê bi ser da zêde balkêş bûn.”*²²³ Vê birga wesfî jî ji bo ajoyeke kurt dema vegêrana bûyeran ragirtîye. Herwiha di şewaza wesfek zarlêkirî da hatiye pêşkeşkirin. Di birgeke din ya wesfa karakter da vegêrê romanê wesfa “Îslimê” ya jina Hecî Mislim dike û dibêje: *“Digel ku ew yazde salî jî bû lê memikên wê êdî serkêşî dikirin, mîna du dobellanên piştî tavekê hilpekîyabûn, têr goşt, bejn dirêj, li hevhatî û xwînşêrîn bû.”*²²⁴ Bi heman şeweyê birgên wesfî yê din vegêr bi kunenişîna taybet ya xwe ve wesfeke fîzîkî pêşkeş kirîye û alîyê laşî yê Îslimê derxistîye û guherkarîyên endamên laşê wê nîşan daye. Wate ji bo ajoyeke kurt dest ji vegêrana bûyeran hilgirtîye û ta ku wesfkirina karakteran dîsa dest bi pêvajoya vegêranê kirîye û dema vegêrana bûyeran bervî pêş birîye.

3.2.4. Wesfa Xweyî

Di çîrok û romanên rêbaza nû da gelekî girîngî tê dayin vê cûreya wesfê, ku dibe sedema derxistin û nîşandana rehenda derûnî ya karakteran û tevger û reftarên karakteran vedugehizîne bi taybetî di wê rewşa necîgir ku karakter tê ra derbas dibin. Wate ber vî hinava karakteran diçin û raman û hizir û hestên meliskirîyên karakteran wêne dike. Di romana Mijabad da bi rîya wesfê ve Badînê karakterê serekî yê romanê di heman demê da vegêrê nava romanê ye. Bi rîya cînavka kesê yekem yê yekhejmarê vebêj ve wesfa rewşa derûnîya xwe dike li dû vê Jale heta demekê dûrî Badîn bû. Lê şevêkê ji nişkave derdikeve û li derîyê mala Badîn dixê. Badîn bi vî şeweyî behsa wê gavê dike û dibêje: *“Şevêkê, min destana Pîremêrd ya li ser “Donzde Siwarîyên Merîwan” dixwend. Dengê nermik ji derîyê min hat. Jale bû hestên min yê wê demê nayên ziman, weke zarokê ez girîyam. Ne girî bû ew, orîna berxekî bû ku ji dayika xwe diqete û ser jê dibe. Min ew himêz kir û serê xweyê şet li sînga wê danî, hêsirên min bi ser ala Îngîltre ya li ser gumlegê wê herikîn.”*²²⁵ Di vir da vegêr rewşa xwe ya bêtewş û necîgir ji xwendevanan re vedibêje, ku berî Jale bibîne rewşa wî ya derûnî asayî bû. Lê li dû hatina Jale guherkarî bi ser derûna Badîn

²²³ Jan Dost, *Kobanî*, r. 371.

²²⁴ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 49.

²²⁵ Jan Dost, *Mijabad*, r. 78.

de hatîye û rastî awayekî bêtewşîyê tê, ji ber vê yekê jî. Bi dilxweşî dest bi girî dike ku bi xwe jî li girîyê xwe ‘ecêbmayî dimîne.

Di cihekî din da Badîn wesfa Heme Resûl dike û dibêje: *“Heme Resûlê me li ser wê dîn û şeyda bibû. Bi çolê ket û bû sewdanîyê wê, naçar ew birin Tewrêzê û çend caran jî ew birin Nexweşxaneyê Tehranê, lê kî dikare derdê evînê derman bike! Weke dewrêşekî werd û zikrên Heme Resûl, wêlma bû.”*²²⁶ Di vir da bi komê peyvên wek “dînbûn û bi çolê ketin” ve em zanin ku vegêr wesfa necîgirîya rewşa derûnîya Heme Resûl dike, li alîyekî din jî derdê evîndarîyê wiha li Heme Resûl kirîye ku bi çolan ketîye û li dû evîndar û eşqa xwe da bigere.

Herwiha di wesfa Yaqûb da Badîn dibêje: *“Yaqûb nema êdî meyxaneyê xwe vedike, karê wî serxweşî û awarebûna li kolanên Mehabadê ye xewa li ber sîya darên çinarê û kelekê gora kalikê min e. Rewşa wî ya xerab dile min diguvêje, lê ez nikarim alîkarîya wî bikim, gelek caranan ez wî li ber gora kalikê xwe dibînim ketîye xew, naçar wî şiyar dikim û tînim mal.”*²²⁷ Di vir da Badîn li dû mirina kalikê Yaqûb rewş û alîyê derûnîya Yaqûbê hevalê xwe nîşanî xwendevanan dide. Bi taybetî li dû mirina kalikê Yaqûb ji carên bere bêtir serxweş dibû, nedixwest heş di serî da hebe, vê wesfê tenê rewşa derûnîya Yaqûb nîşan nedaye. Belkî rehendeke wateyî wergirtîye û roleke wateyî bi cî anîye. Çimkî soz, wefa û dostayetîya Yaqûb li hemberî hevalê wî nîşan dide, li alîyekî din ev wesfa tevlî vegêranê bûye û di xebata bervî pêşçûna bûyeran da bû.

Di romana 3 Gav û 3 Darek da Xalis bi rîya wesfkirina sîmaya derveyî ve perdeyê ji ser rewşa derûnîya Şêx Se’îd hildide û dibêje: *“Ji roja tu hatî ez rewşa te taqîb dikim, tu ne li ser hevî, ji xwe rûyê te yê zer û zerhimî, lihêfê ji ser dile te radike.”*²²⁸ Di vir da Xalisê vegêr bi rîya nîşandana xuyanîya zerbûyî ya Şêx Se’îd, nearamîya rewşa derûnîya wî nîşan dide, ku bi sedema evîndarbûna şêx digel keçek bi navê Perîxan, duçarî bûye. Herwiha Xalis bi rîya vê wesfê ve hem xuyanî û hem jî guherkarîyên navekî yên Şêx Se’îd wêne kirîye, çiqasî jî Şêx Se’îd nedixwest kes bi rewşa wî ya xirap ya derûnî zanibe. Lê bele Xalis dibêje çiqasî xwest hestê xwe yên navekî ji min veşêre lê nikarû bû. Ev wesfa jî ji cûreya wesfa livdar e. Çimkî

²²⁶ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 107.

²²⁷ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 206.

²²⁸ Jan Dost, *3Gav û 3Darek*, r. 85.

bandora serekîya rewşa xirap ya Şêx Se'îd li ser bûyera serekîya romanê heye. Bi vê jî her alîyê wesfê di xizmeta bûyera serekî da ne û dibin beşek ji dema vegêranê û bûyeran bervî pêş dibin.

Di cihekî din de Şêx Se'îd bi rîya monologê ve bi xwe ra dipeyive û rewşa xwe ya derûnî nîşan dide û dibêje: *“Çima ez dilerzim dema ku wê dibînim? Ma ev nişana çî ye? Dilê min tê çî ku ji lertzîne were hêrran û zimanê min li hev digere, weke ku sindifan dibe ez hewqasî ne şermokî bûm.*”²²⁹ Di vir da Şêx Se'îd bi rîya cînavka kesê yekem yê vebêj ve rewş û derûna xwe ya betewş dide ber çavên xwendevanan. Bi taybetî jî her dema rûbirûyê evîndara xwe Perîxan dibe ji şerm û tirs û kovanan tije dibe. Ev wesfa jî tevî vegêranê bûye û dema bûyeran bervî pêş birîye.

Herwiha di romana Martînê Bextewer da Martîn wesfeke derûnîya hevalê xwe Alberto dike, demekê Alberto bervî odeya Yawuz diçe û dibîne ku Yawuz li odeyê bi werisekî xwe bidarve kirîye û xwe xeniqandîye. Martîn dibêj: *“Alberto bi hêdîka derî dehf da û derbas bû. Bi derbas bûnê re mîna ku marek pê veda bi şûnde vegeirîya. Rûyê wî zer bibû û tirs jê diniquîtî. Tirs niqutî dilê min jî û bêy ku ez jê bipirsim, çî bûye, min bi herdu kêlekên derî girt û serê xwe dirêjî alî hundir kir.*”²³⁰ Di vir da Martîn bi rîya guherkarîyên sîmaya derveyî ya Alberto ve wek *“rûyê bibû û tirs jê diniquîtî”* perdeyê ji ser derûna necîgir ya Alberto hildide. Bi taybet li dû dîtina Yawuz xwe li odeyê darvekirîye rewşa derûnîya Alberto têk diçe û dû re ev tirs dikeve dile Martîn jî.

Di cihekî din da di romana Kobanî da vegêr di wesfa Eyşe da dibêje: *“Tirs wek cihokekê qetranê herikî dile ‘Eyşê, li derve dinya tarî bibû. Dengê teqînan ji dûr dihat. Huve huva bayê kurr bû. Dîsa ustaz Ehmed rabû hişk bi herdu destê ‘Eyşê girt û devê xwe anî nêzikî devê wê.*”²³¹ Di vir da vegêr bi kunenişîna xwe ve diçe nav hinava karakter û wesfa wê tirs û xemgîrîya kûr ya Eyşê ji me re dike, demekê ku Eyşê li cihê lê dimîne ji alîyê mamosta Ehmed Ezraq ve rûbirûyê destdirêjîya seksî dibe. Ev wesfa jî bi alîyê wesfa livdar ve hatîye pêşkeşkirin û pêvajoya vegêrana bûyeran ranegirtîye.

²²⁹ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 80.

²³⁰ Jan Dost, *Martînê Bextewer*, r. 205.

²³¹ Jan Dost, *Kobanî*, r. 361-362.

Bi vê dîtînê ve divê em bibêjin wesfa xweyî, navekî weke berawirdî ji wesfa mijarî kêmtir bikar hatîye. Wate piranîya birgên wesfî yên karakter di alîyê wesfa mijarî da ne û di çarçoveya wesfeke zarlêkirî da hatîye pêşkeşkirin. Tenê ew çend mînakên me behs kirîye û hinekê din nebe bi rîya pêla hişî ve hatine pêşkeşkirin û wesfa xweyî pêkanîne.

3.2.5. Wesfa Rawestî

Di vê cûreya wesfê da dema vegêrana bûyeran bi temamî radiwestin, ta ku vegêr wesfa karakteran dike.

Di romana Mîrname da di wesfa ew keça ku navê wê Şêrîn bû, mîr dibêje:
*“Min ew perîya Gurcî bi pênsed zêrî kirî bû, lê tenê awirek ji çavên wê ên mêşanî hêjayî hezar fîlorî ye. Fistiqên Şîrazê jî ne mîna devê wê yê biçûk û xuşkin. Mîjek ji leva wê ya jorîn ji toyê bi hingiv re têkell jî xweştir e. Kepu elmaseke giranbuha û hinarkên rûyê wê baxçeyekî qerenfîlane. Diran gewherên Sikenderî ne û enî sehîfeya pêşî ji Qur’aneke ku hîn çî melayî ew nexwendîye. Bisk û gês û ri’han û binefşin birû hîva yekşevî yan kevanê Rustemî ne û awir tîr û xedengên keman keşekî dil polane. Bejn minareye, take ri’hane, şîva bê tûk û kelam e, rimeke zirave elîfa ku bi deste Behzadê Neqqaş hatîye kişandin. Newqa wê ji ziravîyê çî kemer lê nayên bîstin. Hema ku xwe ditewîne ew deste xwe datînim ser dilê xwe ji tîrsa şikestina wê newqa zirav.”*²³²

Ev wesfa dirêj ya Şêrîn ketîye navbera:

* Fistiqên Şîrazê jî ne mîna devê wê yê biçûk û xuşkin.

* Newqa wê ji ziravîyê çî kemer lê nayên bîstin.

Wate ew rawestîna di navbera ev du komên peyvan da heye, bûye sedema wesfeke dirêj ji bo Şêrîn ya karakter were kirin, ew wesfkirina jî temamê endamên laşê wê girtiye. Bi vê jî ev wesfa dikeve çarçoveya wesfeke zarlêkirî. Herwiha ji bo ajoyeke pir dema vegêrana bûyeran rawestandîye. Li alîyekî din bikaranîna wesfeke wiha dirêj ya karakter ji alîyê romannivîs ve belkî ji ber wê be ciwankarîya ziman û bikaranîna şîyana xwe pê derxîne. Bi vê jî roleke rewanbêjî û xemlandinekê

²³² Jan Dost, *Mîrname*, r. 209.

dibexşîne nivîskara xwe. Her di wesfa Şêrîn da mîr wesfeke kurt ya rawestî dike û dibêje: “*ciwan, bejnzirav û dirêj, çav du golên xeternak û kûr.*”²³³ Ev wesfa weke berawirdîyê bi wesfa pêşî be kêmtir dema vegêranê ragirtîye.

Herwiha di romana Martînê Bextewer da jî komêk wesfên rawestî yên karakter hene. Di vir da em çend mînakên ji bo wan jî şîrove bikin. Weke Mînak: Di wesfa Gustav da vegêr dibêje: “*Ew Gustav Elbus bi xwe bû. Weke ku sal bi ser wî re derbas nebûbin, xuya dikir. Hîn bi wê rîya xwe ya sorikî û girover û biruyên sitûr û serê niv keçel û çavên hûrik û kortikî bû. Tenê çermê rûyê wî hinekî tarî û enîya wî sor û qemirî bibû. Hinekî cilê wî jî hatibûn guhertin. Bi ser pantelonekî xetxetî ve ku xetên wî sorê tarî û spî bûn, qutikekî keskê tarî û bişkokzêrrîn berda bû. Di bin qutik de jî gomlegekî zerî ku li ber sikura wî şallekî reş girê dabû.*”²³⁴ Ajoya rawestîna vê birga wesfî dû koma peyvan ya “xuya dikir” destpêdike û ta “reş girê dabû” berdewam bûye. Bi vê jî rawestîna gelekî ajotîye. Çimkî vegêr bi şeweyekî hûrgilî ve alîyê fîzîkî yê karakter û ew kincên li xwe kirîye nîşan dide. Loma dema vegêrana çîrokê dirêj bûye û hecma nivîskara romanê berfirehtir bûye, rêrewa vegêrana bûyeran sist bûye.

Herwiha di wesfa “Kewserê” da Martînê Bextewer dibêje: “*Kirasekî şalê Hindî yê şînê ezmanî û gulhur lê bû. Kirasekî fire bû ku deşt û newal evraz û nişuvên laşê wê veşartî bû. Desmaleke etlesê zerî sade reng jî porê wê nixumandibû. Lê tu tiştî nikarû bû awirê wan çavên dirrinde veşêre. Dilbijîna wan binixumîne.*”²³⁵ Vê wesfê jî ji bo ajoyekê dema vegêrana bûyeran ragirtîye. Bi berawirdîya wesfa pêşî ajoya rawestîna kêmtir e, ku rawestîna ji seretaya birgê ve destpêdike ta koma peyvan “sade reng jî porê wê nixumandibû” berdewam dibe. Lê paşê vegêr dest bi vegêrana xwe dike. Di wesfeke din ya Kewserê da Martînê Bextewer dibêje: “*Ku ew hinekî dûr ketin, bû fersend ku ji pişt ve bejna wê keçikê bibinim. Kirasê wê yê heta giwîzekên lingan dirêj, kevî û deşt û tixûb û newalên laşê wê resim dikir. Ey Xwedê ew çi bejnûbal bû! Wisa Xwedê ew ji kêfa xwe ra dirust kiribû! Ji wê bejnê jî ew*

²³³ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 210.

²³⁴ Jan Dost, *Martînê Bextewer*, r. 36-37.

²³⁵ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 127.

kulêmekên girover û ew qûna efsaneyi bû agirê ku perîk di hêlîna hişê min da kizirandin. Wê qûnê xwe ji xeyalê min nema berda.”²³⁶

Ev wesfa jî ketîye navbera:

* Bû fersend ku ji pişt ve.

* Wê qûnê xwe ji xeyalê min nema berda.

Lê cudahîya vê birga wesfê digel birga wesfî ya pêştir ya Kewserê ew e, rawestîna vê birgê cuda ye. Çimkî dû “bû fersend ku ji pişt ve” destpêdike ta ku koma peyvan “Ey Xwedê ew çi bejnûbal bû” dawî lê tê, paşê jî vegêran hinekî berdewam dibe, ta ku ji koma peyvan “ji wê bejnê jî ew kulêmekên “ wesf destpêdike. Wate şewaza vegêranê bi vê şeweyê ye: Vegêran, wesf, vegêran, wesf. Bi vê jî dema vegêranê bi yekcar ranewestîye, demekê rawestîye, paşê dûbare vegêranê destpêkirîye û berdewamî bi demê hatîye dayîn.

Di romana Kobanî da jî bi heman şeweya romana Mîrname û Martîne Bextewer, komêk wesfên rawestî yên karakter têda hene ku bandorê li ser sistbûna dema vegêrana pêvajoya bûyeran dikin. Weke mînak Jan wek dengê vegêrê romana xwe di wesfa çekdarekî DA’ÎŞ da dibêje: “*Ev cendek min ditirsîne. Serîyekî porr dirêjî gijî, rûyekî tarî û tehl, rîyeke reş û dirêj û toz girtî. Xwîn di guh û bêvil û çavan re derketî, kirasekî ji çûxekî qehwerengî, stûr û qut heta kabokan û şerwallekî kinik lê, cotê solan, pekyaye durrên termê da’êş; yekî ne.*”²³⁷

Ev wesfa jî ketîye navberan ev herdu komên peyvan:

* Ev cendek min ditirsîne.

* Pekiye durrên termê da’êş; yekî ne.

Di navbera ev herdu komên peyvan da wesfa rawestî hatîye pêşkeşkirin. Bi vê jî ji bo ajoyekê dema vegêranê rawestîye û tu bervîpêşçûnek têda tune.

Herwiha vegêr di wesfa wê keça navê wê Îslîm bû, ku paşê dilê Heme Ziravê Hecî Mislim dikevê, ji ber vê yekê jî guherkarîyên mezin di jîyana wî rû didin û

²³⁶ Jan Dost, *b.n.r.* 108.

²³⁷ Jan Dost, *Kobanî*, r. 45.

raman û xeyalên wî aloz dibin. Vegêr dibêje: *“Keçik xweşik bû. Lêv topikî, hinekî esmer lê çavên wê du baxên zeytûnan bûn. Rû girover û por kin, denge wê hingivekî mê bû û diniquî guhê mirovan.”*²³⁸ Di vir da wesfê bandoreke kêr li ser dema vegêranê çêkirîye. Çimkî rawestîna wê kêr ajotîye û ketîye navbera herdu komên peyvan *“keçik xweşik bû”* û *“denge wê hingivekî mê bû û diniquî guhê mirovan”* û paşê vegêranê rêrewa xwe wergirtîye û berdewam bûye. Yan jî di wesfa Demistura da Jan dibêje: *“Mirovekî porspî. Dirêj, zirav, qemî spî, qerewat zêrîn û deq şîn di qirika wî de, derbas bû û yek bi yek silav da me.”*²³⁹ Di vir da jî ji bo ajoyeke kêr dema vegêranê rawestîye, piştî wesfîkirina renga por, bejnûbal û ew kincên li xwe kirîye, dawî li wesfê tê û vegêran dúbare rêrewa xwe werdigire. Di birgeke din da di wesfa Ebû Ducane da Jan dibêje: *“Ebû Ducane kesekî rîreşê ser bi desmal bû kirasekî spî lê bû. Di bêrîkeka li ser sînga wî ya li hêla çepê serî sîwakekê mîna firçeyekê xuya dikir. Bêhna miske ya tûj jê difiriya. Destê xwe dirêj Ziyad kir û bi germî guvaşt.”*²⁴⁰ Vê wesfê jî alîyê fîzîkî û kincên karakter girtîye. Bi vê jî ji bo ajoyekê dema vegêranê ragirtîye.

3.2.6. Wesfa Livdar

Di vê cûreya wesfê da romannivîs wesfa karakteran di rewşa livdar da pêşkeş dike û kirdar, hizir, tevger û rewşa derûnî ya karakteran nîşan dide. Bi vê jî tenê di çarçoveya wesfeke fîzîkî da namîne. Dibe ku tevî dema vegêrana romanê dibe. Di romana Mijabad da, Badîn wek vegêrê nava romanê di kunenişîna xweyî da wesfa beşeke jîyana xwe ya raborî dike û dibêje: *“Ez li Silêmanîyê xerîb bûm, ji min nefret dikirin xelkê, zimanê min fêr nedikirin. Digotine min Badîno kirmanco, herkes li ser serê min bibû Mîr Mehemed Korê Rewandîzê, lê Heme Reşîd ne weke wan bû, me ji hev du fêr dikir, gelo ev xemgînê han kirîye? Min ji xwe dipirsî.”*²⁴¹ Di vê birga wesfî da Badîn perdê ji ser beşeke jîyana xwe ya raborî hildide. Bi vê jî wêneyê kesayetîya Badîn di zîhna xwendevanan da baştir dipeyite. Herwiha pêwendîya vê birga wesfî ya serekî bi bûyera serekî ya romanê ve heye, ji bilî wê ev birga wesfî tevî wateyê bûye û di şêweya rexneyeke civakî ya siyasî pêşkeşî civaka kurdî hatiye kirin, ku kurd wek neteweyeke mezin berdewamî di çarçoveyê teng ya deverparêzî

²³⁸ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 98.

²³⁹ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 316.

²⁴⁰ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 258.

²⁴¹ Jan Dost, *Mijabad*, r. 40.

da bîr kirîye. Loma rika takekesên kur di hemberî hevdu roj bi roj di zêdebûnê da ye, li alîyekî din berdewamîya vê wesfê digel pêvajoya bûyeran hebû. Bi vê jî xwe di alîyê wesfa livdar da rê dide.

Di birgeke din da Kalîkê Badîn wesfeke Badîn dike û dibêje: *“Bado ez dizanim tu çawa difikirî, xwîna te germe, ne ji ber xortanîyê, lê ji nezanîyê gelek hêvî li bal te hene, te xemayat siyasî miyasî jî kirîye, tu ketî nav partîyan jî.”*²⁴² Di vê wesfê da jî kalîkê Badîn komek zanyarî di derbarê tevger û xebatên wî yên siyasî da derxist. Bi vê jî wesfa wî di xizmeta dema vegêrana bûyeran ve bikaranîye. Çimkî di nîşandana hizir û tevgerên Badîn bandor li ser pêşveçûna bûyeran çêkirîye.

Herwiha Menaf di wesfkirina Badîn da dibêje: *“Badîn te têra xwe pêşmergetî kirîye, tu mirovekî cesûr û dilêrî, lê ji bîr neke tu rewşenbîrekî têra xwe heyî, niha komar muhtacî mêjî ye bêhtir ji tivingê.”*²⁴³ Di vê birgê da Menaf, wesfa raman, kirdar, tevger û alîyê zanebûn û jîrîya Badîn dike. Wate xwe ji wesfkirina binyata laş û xuyanîyen wî yên laşî dûr girtîye. Bi vê jî dema vegêrana bûyeran ranegirtîye. Dibe ku wek beşeke vegêranê hatiye bikaranîn. Herwiha ev wesfa tevlî wateyê bûye. Divê armanc handana civaka kurdî be ji bo fêrbûna zanist û zanînê jî. Ji bo wê ku karibin bi rîya vê zanînê ve li hemberî gelên deverên tirk, ereb û fars têkoşanê bikin. Bi hemû van sedemana ve ev wesfa bûye wesfeke livdar.

Herwiha di komek wesfên kurt da, dema vegêrana bûyeran ranewestîye. Dibe ku bûbe beşek ji binyata dema vegêranê. Weke Mînak: Nûreddîn Zaza di wesfa hevalê Ehmed da dibêje: *“Kurdekî netirs bû û tu kesî nikarû çavên wî bişkîne.”*²⁴⁴ Di vir da jî dirûva karakter nebûye sedema çêbûna birga wesfê. Dibe ku nîşandana sîfet û gernasî û qahremanîya Ehmed binyata wesfê pêkanîye. Bi vê jî ev wesfa dikeve xaneyê wesfa livdar, yan jî di wesfeke kurt ya Şêx Mehmûd da vegêr dibêje: *“Şêx Mehmûd berê xwe da Silêmanîyê, şêrek bû li şêrgeha xwe vegerîya.”*²⁴⁵ Di vê birgê da jî bi heman şeweya birga pêştir gernasî û qahremanîya karakter nîşan dide. Ev wesfa jî di xizmeta bervî pêşçûna bûyeran dabû. Bi vê jî diçe xaneyê wesfa livdar.

²⁴² Jan Dost, *b.n.b.*, r. 96.

²⁴³ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 158.

²⁴⁴ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 143.

²⁴⁵ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 77.

Herwiha Badîn di wesfa Ellsa da dibêje: *“Wek bahozeke Jale derbas bû, kirasekî sor û tenik ku bedena wê ya zelal hemû têra xuyabû û bi rûyekî sar mîna mirinê derbas bû.”*²⁴⁶ Her çiqas materyalên vê wesfê ji çarçoveya sîmaya derveyî ya kincên wesfîrî da pêkhatîye jî. Lê nebûye sedema rawestana dema vegêranê, tene ji bo ajoyeke kêrî vegêran sist kiriye, lê dawîyê dîsa gelekî bilezî tevî kirdar û vegêranê bûye. Wate xwendevan hest bi sistîya dema vegêranê bike. Loma ev jî diçe xaneyê wesfa livdar.

Di romana Mîrname da Recebê Terzî di wesfa Ehmedê Xanî da dibêje: *“Ew mirovekî gelekî korbokî bû, jar û ze’îf mîna ta û derzîyan bû. Zer û zerhimî û her û her mîna mûmekê dihelîya.”*²⁴⁷ Di vir da vegêr bi rîya wesfeke derekî da, perdeyê vedimale ji ser ew guherkarîyên li ser ser û sîmaya endamên laşê Xanî da hatîye. Wate guherkarîyên sîmaya derveyî ya Xanî û endamên laşê wî. Binyatên wesfa wî pêkanîne û bi vê jî ev wesf ji bo xwendevanan tenê wek bêhnvedanekê bikar nehatîye. Dibe ku pêwendîya wê bi bûyera serekî ya romanê heye. Herwiha pêşeroja jîyana Ehmedê Xanî wek karakterê serekî yê romana xwe ji bo xwendevanan ronî dike, hemû ev jî dibe sedema çêbûna wesfeke livdar.

Di birgeke din ya romana 3 Gav û 3 Darek da di wesfa Şêx Se’îd da Xalîd dibêje: *“Se’îd eger wiha biçe zore, tu roj bi roj ze’îf dibî, tu kulbûna çavan li alîyekî deyne, lê ev jariya te ne ‘elametê xêrê ye, tu bûyî mûyekî zirav, keko wele ez bi vî derdî dizanim, vegere Palloyê.”*²⁴⁸ Di vir da bi sedema necîgirîya rewşa derûnîya Şêx Se’îd û ew guherkarîyên di sîma û xuyanîya derveyî ya karakter da hatîye holê, wiha li Şêx kirîye ku rewşa wî bervî pêşerojê nedîyar biçe. Bi vê jî heme wesf digel vegêranê berdewam bûye, hem jî herika bûyeran pêşve çûye.

Di romana Martînê Bextewer da, Martîn bi rîya bikaranîna cînavka kesê yekem yê yekhejmar ve wesfa goftar, reftar, tevger û kirdarên xwe ji me ra dike û komêk zanyarîyên girîng li ser jîyana xwe ya taybet ji xwendevanan ra vedibêje. Weke mînak dibêje: *“Ez bibûm du mirov. Du kesên bi her awayî ji hev, derve û hundurê min ne wek hev bûn. Ji derve de, ez kesekî maqûl, xirîstiyaneke Xwedêperest, dîlnermekî ku xêran li her xizanî dike û napirse dînê wî çî ye. Ne dilbijokê jinan û*

²⁴⁶ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 139.

²⁴⁷ Jan Dost, *Mîrname*, r. 111.

²⁴⁸ Jan Dost, *3Gav û 3Darek*, r. 92.

hema nîv melayîket. Lê di hundurê xwe da, ew ew hundurê ku min bi sed û yek gaz çuxê îngilîzî yê reş ji xap û rîp û fen û finasan pêçabû, mirovekî din bûm, derewkar, ganbaz, kutanvan, çavlider û dilbijokê her karekî kire. Heramxur û faîzçî, zinêkar û bédîn, rû qedîfeyekî nerm ku ji pirça kêroşkê nermtir bû lê aster ji cawekî ji mûyê bizinan zivirtir bû."²⁴⁹ Di vê birga wesfî da Martîn perdeyê ji ser jîyana xwe ya taybet hildide, komek zanyarîyên taybet bi xwe ji xwendevanan ra eşkere dike. Herwiha divê em bibêjin, baştirîn mînaka wesfa Martîn e di nav romanê da ku kesayetîya Martîn bi şêweyekî hûr û vekirî eşkere dike û 'hez, hêvî, xeyalî (aşopî), tevger û xwezaya karê wî yê rojane nîşanî xwendevanan dike. Ev birga wesfî ji ber vê gelek zanyarîyan li ser kesayetîya wî dide destê me. Ev zanyarî wiha dikin ku kesayetîya Martîn di hizra xwendevanan da xurtir bibe. Herwiha roleke wateyî wergirtîye. Çimkî kesayetîya Martîn li du rûyê cuda nîşan dide, Martîn jî ji ber vê ducureyî yê xemxwer e. Loma hebûna van zanyarîyana wiha kirîye ev wesfa bi alîyê wesfeke dirêj derkeve. Lê nebûye sedema wê ku pêvajoya bûyeran rawestîne. Dibe ku alîkar bûye ji bo vegêrana bûyeran û girêdayî vegêrana bûyera serekî ya romanê dibe û digel rêveçûna vegêranê berdewam bûye. Bi vê jî diçe nava xaneya wesfa livdar.

Di romana Kobanî da jî Hecî Mislim bi rîya bikaranîna cînavka kesê yekem yê yekhejmarê vebêj ve wesfa rewşa jîyana xwe ya asê dike û berê xwe dide Xwedayê Mezin û dibêje: *"Ez ne barê tew îmtîhanê te me, ez nebarê van kul û derdanim. Ez qûlekî bêqewet im, bêtaqet im, li ber qeweta te ez tuneme, çîk herime, benî ademekî fiqare me. Ya Rebbî tu zanî min evqasî nimê seba te kir, çûme 'hecê, hatime mala te bûme mêvan. Mi ji qapîyan li qapîyê te xist. Li ber te gerrîyam, pere dane feqîr-fîqaran, quruşekî 'heram nekirîye bêrîya xwe.*"²⁵⁰ Di vê birga wesfî da Hecî Mislim bi şêweyek wesfî rewşa jîyan û ew nehametîyên bi serî da hatîye dike. Ji ber vê yekê jî em li xwezaya taybet ya karakter, bîrûbawerî, helsûkeft û nepenîyên jîyana Hecî Mislim têdigên û zanyarî di derbarê jîyana Hecî Mislim bidest dixînin. Herwiha derxistina hemû ev sîfetên Hecî Mislim bûye sedem ku wesf tevlî vegêranê bibe û bi hevdu re pêvajoya bûyeran bervî pêş bibin û wesfeke livdar ya karakter jê bînin holê.

²⁴⁹ Jan Dost, *Martînê Bextewer*, r. 157.

²⁵⁰ Jan Dost, *Kobanî*, r. 402.

Di vir da emê giringtirîn û diyartirîn ew bend û parçeyên wesfî yên bi alîyê wesfa mijarî, xweyî, rawestî û livdar da di nav pênc romanên da hatine pêşkeşkirin. Di xiştêya jêr da derxine holê.

J	Navê Romanê	Karaktera/ê Wesfîkirî	Rûpel	W. Mijarî, W. Xweyî, W. Rawestî, W. Livdar
1	Mijabad	Badîn	13	Xweyî, perde hilmalîn li ser rewşa derûnîya karakter
2	Mijabad	Badîn	14	Mijarî, rêdana zanyarîya di derbarê raborîya karakter
3	Mijabad	Yûnis Amêdî	16	Mijarî, sîmaya derveyî ya karakter
4	Mijabad	Badîn	28	Xweyî, perde hilmalîn li ser rewşa derûnîya karakter
5	Mijabad	Mujde û Badîn	32	Mijarî, sîmaya derveyî û tevlîbûna bi laşê karakter
6	Mijabad	Badîn	35	Mijarî, rêdana zanyarîya di derbarê raborîya karakter
7	Mijabad	Keça Meta Badîn	36	Mijarî + rawestî, sîmaya derveyî + binyata laşî
8	Mijabad	Yûnis Amêdî	39	Mijarî, rêdana kesayetîya karakter
9	Mijabad	Badîn	40	Livdar, rêdana zanyarîya di derbarê raborîya karakter
10	Mijabad	Jale	44	Mijarî + rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
11	Mijabad	Jale	45	Mijarî, sîmaya derveyî û tevlîbûna bi laşê karakter
12	Mijabad	Jale	51	Rawestî, sîmaya derveyî + binyata laşî
13	Mijabad	Nûbar	53	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
14	Mijabad	Mujde	61	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
15	Mijabad	Badîn û Dayika Wî	61	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter

16	Mijabad	Badîn	63	Mijarî, rêdana zanyarîya di derbarê raborîya karakter
17	Mijabad	Hadîle, dayika Jale	65	Rawestî, sîmaya derveyî + binyata laşî
18	Mijabad	Mujde	74	Mijarî, rêdana kesayetîya karakter
19	Mijabad	Şêx Me'hmûd	77	Livdar, rêdana kesayetîya karakter
20	Mijabad	Badîn	78	Xweyî, perde hilmalîn li ser rewşa derûnîya karakter
21	Mijabad	Badîn û Jale	79	Mijarî, sîmaya derveyî û tevlîbûna bi laşê karakter
22	Mijabad	Yaqûb	95	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
23	Mijabad	Badîn	96	Livdar, rêdana bîrûbawerî û raborîya karakter
24	Mijabad	Kalikê Badîn	100	Mijarî, rêdana bîrûbawerîya karakter
25	Mijabad	Heme Resûl û Wêlma	107	Mijarî, rêdana zanyarî û pîşeyê karakter
26	Mijabad	Heme Resûl	107	Xweyî, perde hilmalîn li ser rewşa derûnîya karakter + helsûkeft (tevger)
27	Mijabad	Mujde	111	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
28	Mijabad	Badîn	123	Mijarî, rêdana kesayetîya karakter
29	Mijabad	Dayika Badîn	137	Mijarî, rêdana kesayetîya karakter
30	Mijabad	Ellsa	139	Livdar, sîmaya derveyî ya karakter + kirdar
31	Mijabad	Ehmed	143	Livdar, rêdana kesayetîya karakter
32	Mijabad	Barzanî	150	Xweyî. Bi rîya sîmaya derveyî ve perde rakirina li ser derûnîya karakter
33	Mijabad	Badîn	158	Livdar, rêdana kesayetîya karakter
34	Mijabad	Amîral Axa	177	Mijarî, rêdana zanyarîya di derbarê raborîya karakter
35	Mijabad	Yaqûb	206	Xweyî. Bi rîya helsûkefta karakter ve rêdana rewşa wî ya derûnî

36	Mijabad	Badîn	228	Livdar. Bi rîya helsûkefta karakter ve rêdana rewşa wî ya derûnî
37	Mijabad	Badîn	235	Livdar. Bi rîya helsûkefta karakter ve rêdana rewşa wî ya derûnî
38	Mîrname	Du zîlam	19	Rawestî, sîmaya derveyî + binyata laşî
39	Mîrname	Ehmedê Xanî	22	Mijarî, bi rîya sîmaya derveyî ve perde rakirina li ser derûnîya karakter
40	Mîrname	Ehmedê Xanî	30	Mijarî, xwezaya taybetî ya karakter + reftarê karakter
41	Mîrname	‘Emerê Xeznedar	32	Mijarî, rêdana kesayetîya karakter
42	Mîrname	Ellahqulî	47	Mijarî, sîmaya derveyî ya karakter
43	Mîrname	‘Emerê Xeznedar	51	Mijarî, rêdana zanyarî di derbarê karakter
44	Mîrname	Ellahqulî	55	Mijarî, rêdana zanyarî di derbarê pêşeyê karakter
45	Mîrname	Ehmedê Xanî	63	Mijarî, rêdana kesayetîya karakter
46	Mîrname	Mîr û dar û desteya wî	85	Mijarî, rêdana reftar û danûsana karakteran
47	Mîrname	Şah ‘Ebbas	89	Mijarî, rêdana reftar û danûsana karakteran
48	Mîrname	Êmayê Boşnaq	100	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
49	Mîrname	Mistefa Paşa	106	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
50	Mîrname	Ehmedê Xanî	111	Livdar, sîmaya derveyî + binyata laşî
51	Mîrname	Ehmedê Xanî	122	Mijarî, rêdana kesayetîya karakter
52	Mîrname	Ehmedê Xanî	137	Livdar. Bi rîya sîmaya derveyî ve perde rakirina li ser derûnîya karakter
53	Mîrname	Ehmedê Xanî	144	Mijarî, rêdana kesayetîya karakter
54	Mîrname	Mirovê rû nixumtî	193	Mijarî, sîmaya derveyî + binyata laşî
55	Mîrname	Hosta Xelîl	198	Mijarî, rêdana zanyarî li ser xweza û pêşeyê karakter

56	Mîrname	Şêrîn	209	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
57	Mîrname	Ehmedê Xanî	210	Rawestî, sîmaya derveyî + binyata laşî
58	3 Gav û 3 Darek	Şêx Se'îd	16	Rawestî + livdar, sîmaya derveyî ya karakter
59	3 Gav û 3 Darek	Bavê Wanês	47	Mijarî, rêdana zanyarî li ser raborî û pîşeyê karakter
60	3 Gav û 3 Darek	Derwêş Xidirê Botî	57	Mijarî + rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
61	3 Gav û 3 Darek	Xalis	65	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter + zanayariya pîşeyê karakter
62	3 Gav û 3 Darek	Şêx Se'îd	80	Xweyî + livdar, guherkarîyên laşî yên karakter
63	3 Gav û 3 Darek	Şêx Se'îd	85	Xweyî + livdar, . Bi rîya sîmaya derveyî ve perde rakirina li ser derûnîya karakter
64	3 Gav û 3 Darek	Şêx Se'îd	91	Livdar, Perde rakirina li ser rewşa derûnîya karakter
65	3 Gav û 3 Darek	Şêx Se'îd	92	Livdar, sîmaya derveyî ya karakter + binyata laşî
66	3 Gav û 3 Darek	Derwêş Xidirê Botî	116	Mijarî + rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
67	3 Gav û 3 Darek	Hamêst	119	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter + binyata laşî
68	3 Gav û 3 Darek	Yûsif Zîya Beg	144	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
69	3 Gav û 3 Darek	Xalisê Bedlîsî	147	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
70	3 Gav û 3 Darek	Yûsif Zîya Beg	148	Mijarî, Perde rakirina li ser rewşa derûnîya karakter
71	3 Gav û 3 Darek	Fehmî Efendîyê Licî	182	Mijarî, rêdana kesayetîya karakter
72	3 Gav û 3 Darek	Qasim Beg	191	Livdar, kirdar û tevgerên karakter

73	Martînê Bextewer	Gustov	25	Mijarî, rêdana kesayetî û bîrûbawerîya karakter
74	Martînê Bextewer	Gustov	36	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
75	Martînê Bextewer	Martîn	37	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter + binyata laşî
76	Martînê Bextewer	Fernando	48-49	Mijarî, sîmaya derveyî ya karakter
77	Martînê Bextewer	Libertanegrâyê	78	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter + binyata laşî
78	Martînê Bextewer	Keçeke bi navê Ganîma	84	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter + binyata laşî
79	Martînê Bextewer	Kewser	108	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter + binyata laşî
80	Martînê Bextewer	Kewser	112	Rawestî + livdar, sîmaya derveyî ya Karakter + kirdarên karakter
81	Martînê Bextewer	Kewser	122- 123	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
82	Martînê Bextewer	Kewser	127	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
83	Martînê Bextewer	Xedîce	149- 150	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
84	Martînê Bextewer	Martîn	157	Livdar, Perde rakirina li ser bîr û bawerîya karakter
85	Martînê Bextewer	Alberto	205	Xweyî. Bi rîya sîmaya derveyî ve perde rakirina li ser derûnîya karakter
86	Martînê Bextewer	Martîn	247	Xweyî. Bi rîya kirdaran ve perde rakirina li ser derûnîya karakter
87	Kobanî	Çekdarekî DA'Îşî	45	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
88	Kobanî	Îslimê	49	Mijarî + rawestî, sîmaya derveyî ya karakter + binyata laşî

89	Kobanî	Welat	71	Mijarî, rêdana kesayetî û bîr û bawerîya karakter
90	Kobanî	Hemûd	94	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter + kirdar
91	Kobanî	Esûme	98	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
92	Kobanî	Zîyad Bîn Tacî	99	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
93	Kobanî	Jan	201	Xweyî, rewşa derûnîya karakter
94	Kobanî	Rewşen	256	Xweyî, rewşa derûnîya karakter
95	Kobanî	Zîyad Bîn Tacî	278	Mijarî, rêdana kesayetîya karakter
96	Kobanî	Demistura	316	Rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
97	Kobanî	Hecî Mislim	371	Mijarî + rawestî, sîmaya derveyî ya karakter
98	Kobanî	Hecî Mislim	402	Livdar, zanyarî di derbarê raborîya karakter + bîrûbawerîya karakter

Li jêr ronahîya vê xişteya serî da divê em taybetmendîya bikaranîna wesfa karakteran ji alîyê romannivîsan di çend xalan da kurt bikin.

1- Di giştîya birgên wesfî yê karakteran di nav her pênc romanda çil wesf bi alîyê wesfa mijarî ye, li hemberî wê da jî duwanzdeh wesf bi alîyê wesfa xweyî ye. Bi vê jî cudahî û girîngîdan bi wesfa mijarî li hemberî wesfa xweyî hînekê zêdeye. Amadebûna vê birga wesfî ya mijarî ya karakter wek yek ji taybetmendîyên wesfê di romanên zarlêkirî tê jimartin. Bi vê jî hevtayîya romanên li alîyê binyata karakteran ve bervî alîyê romanên zarlêkirî dibe.

2- Pêvajoya wesfa karakteran li alîyê wesfa rawestî da bi rêjeya cuda pêşkeş kirî ne. Weke Mînak: Vebêjên romanên sî û yek alîyê wesfa rawestî li alîyê sîma, xuyanî, kinc û binyata laşê karakteran pêşkeş kirîye. Ji bilî wê di hinek dem da xweyîya wesfên mijarî yeksanin bi wesfa rawestî. Çimkî ev wesfên mijarî bandorê li ser ayîndeya wan bûyerên bi ser karakteran da tîn çê nake. Loma ji bo ajoyekê diyarkirî dema vegêranê radiwestînin û wesfeke rawestî pêk tînin, li alîyekê din li hemberî wesfa rawestî da bist alîyê wesfa livdar di nav pênc romanên da bi ber çavan

dikeve. Ev jî tê wateyê teknîka wesfa karakteran di bin bandora wesfa zarlêkirî da binyatê datînin.

3- Pêvajoya wesfkirina karakteran li gor cûrê kunenişînan bi herdu arasteya kunenişîna navekî û kunenişîna derekî da hatine pêşkeşkirin. Weke Mînak: Di romanên Mijabad û Martînê Bextewer da Badîn û Martînê karakter, wek vegêrên nava romanên bi kunenişîna navekî ve wesfa xwe û karakterên din kirine. Lê di heman demê da di romanên 3 Gav û 3 Darek û Kobanî da dengê vegêrên nedîyar zale bi ser dengên din yê romanê da. Loma em dibînin beşeke pir ya wesfa karakteran bi dîtina kunenişîna derekî ve hatine pêşkeşkirin. Lê ew cihê destnîşankirin û li ser mijûlbûna kunenişîna romana Mîrname ye ku romannivîs bi berevajîya her çar romanên din bi şeweyekî cuda romana xwe honandiyê. Bi taybetî jî di peyrevkirina firedengî ya vegêr û dabeşkirina beşên romanê bi ser çendî karakter da ev berevajîya dîyer dibe. Herwiha vegêrana her beşekê û spartina wan bi karakteran ve bûye sedemek ji bo her karakterek bibe xwedîyê kunenişîna xwe ya taybet, ku di encamê da her karakterek bûye xwedîyê kunenişîneke kêmtîştan û bi vê jî wesfa karakteran bi dîtina kunenişîna kêmtîştan ve hatine pêşkeşkirin.

4- Di pêvajoya wesfkirina karakteran da hevdeh wesf bi alîyê wesfa derûnî ne, ku beşek ji wan bi rîya guherkarîyên ser ruxsara karakteran da hatine kişandin. Beşa din jî bi rîya hêlûkeft û kirdaran ve rewşa nearamîya karakteran derxistîye holê.

5- Di pêvajoya wesfkirina karakteran da romannivîs çil û heft car birga wesfa karakteran bi rîya sîmaya derveyî ya binyata laşê karakteran ve kişandîye, ku ev jî bandorê li ser dîtîna û raman û beşdarîkirina xwendevanan dike li hemberî birgên wesfî da. Di encamê da derfeta xeyalkirinê ji bo xwendevanan nehiştîye û ji beşdarîkirinê bêpar kirîye.

6- Di pêvajoya wesfkirina karakteran da li alîyê dema vegêranê da, wesfa karakteran ketîye nav her du dema raborî û dema nihaya vegêranê. Weke Mînak: Di romanên Mijabad û Martînê Bextewer da dema nihaya vegêranê zaltir e di berawirdî digel 3 Gav û 3 Darek û Kobanî da. Dibe ku ev jî ji ber kunenişîna vegêranê ye.

3.3. Pêwendîya Di Navbera Wesf û Şûndemê Da

Pêwendîya di navbera wesf û şûndemê pêwendîyeke bingehîn û dîrokî ye ji bo berçavkirina pêvajoya vegêrana romanê û girîngîdana vê pêwendîyê ye ji alîyê

nivîskaran ve bandora li ser vegêrana dema bûyerên romanê. Binyata şûnê û tevgerên karakteran çê dike.

Li alîyekî din jî têgeha şûndemê wek cotek ji hevdu neqetyayî di nava nivîsên wêjeyî da di piraniya demê da bi hevdu re tên û nivîskar dixin jêr wê rewşê ku divê şûn û dem bi hevdu re di nav nivîsên çîrok û romanê da nîşan bide.

Ev jî girîngîya di navbera şûn û demê diyar dike û wek Mikhail Bakhtin dibêje: “Chronotope yan şûndem” ji pêwendîya di navbera şûn û demê, ku bi şêweyekî hunermendane ji alîyê nivîskar ve hatîye dariştin. Herwiha bi wê şêwazê lê tê nêrîn ku xaleke bingeîn ya binyatanîna cûreyên nivîsên wêjeyî ne.”²⁵¹ Ev jî tê wateyê ku diware şûn dem di nav nivîsên wêjeyî da ji hevdu were cihêkirin. Bi taybetî jî di nav cûreya çîrok û romanê da. Çimkî dema ku romannivîs wesfa şûneke dîrokî dike di heman demê da behsa demeke dîrokî jî dike, yan jî di wesfîkirina şûna zaroktîya karakterekê/î da, jîngeh û şûna zaroktîya wan diyar dike. Di heman demê da serdema zaroktîya karakteran jî diyar dike. Loma li pal şûnê da dem jî ji bo xwendevanan eşkere dibe. Ev jî wê rastîyê derdixîne ku “Şûn û dem pêwendîyeke wan ya xurt bi hevdu re heye, ji hevdu nayên cihêkirin, hebûna şûnê bê demê tune ye. Di heman demê da jî dem jî bê şûn tunebû.”²⁵²

Herwiha rewş, tevger û rehendên cûr bi cûrên karakter dibe derîyekî girîng ji bo nişandan û derxistina pêgeh û girîngîya hêmana şûnê di nav nivîsên wêjeyî da. Bi taybet dema ku “kevneşopî, dîrok, çand, şaristanî û rewşenbîrîyê eşkere dîkin.”²⁵³ Loma nivîskar diware bikaribe girîngîya şûnê kêr bike û ji bîr bike, wek Gaston Bachelard dibêje: “Her karekî wêjeyî eger şûnê ji bîr bike û girîngîyê nedê, bêguman taybetmendî û xwerûyîya xwe ji dest dide.”²⁵⁴ Ev girîngî pêdana bi şûnê jî li gorî cûreyên din yê wêjeyê cuda ye. Weke mînak: Di nav çîrok û romanê da “Şûn dibe şanoya bûyeran û qada rikberîyan, ku temamê hestê xwendevanan dicoşîne. Herwiha bi rîya ew wesf û pesnên ku romannivîs li hemberî şûnan nîşan dide, xalek

²⁵¹ Mikhail Pushkin, *Critical Analysis Of Bakhtins Chronotope*, Humanitas, 2017, p. 437.

²⁵² Sebah Îsmail, *Çemk û Îstatîkay Şiwên Le Edeb Da*, Weşanxaneya Aras, Çapa Yekem, Hewlêr, 2009, r. 22-23.

²⁵³ Luqman Reuf, *Rehendekanî Şwênkat Le Deqe Wallakanî Şêrko Bêkes Da*, Weşanxaneya Silêmanî, Çapa Yekem, Silêmanî, 2012, r. 53.

²⁵⁴ Gaston Bachelard, *Cemalyat el- Mekan*, Wer.: Xalib Hilsa, Wezare el- Seqafe el- ‘Alem, Bexda, 1980, r. 6.

ciwankarîya nivîsandinêye ku romannivîs nişan dide.”²⁵⁵ Bi vê jî şûn wek ajoyeke serekî rola xwe di nav binyata şûnê da tîne cî ji bo komkirina karakter û bûyeran. Loma ji ber girîngîya wê hêmanê Hesên Behrawî dibêje: “Em nikarin di nav romanê da dest ji şûnê berdin. Çimkî xweza û hêmana şûnê di wê da ye têgeha hemecurîyê di xwe da bigre û di piranîya demê da jî armanca hemû karên xwe ye.”²⁵⁶

Girîngtirîn rê ji bo nîşandan û berçavkirina şûnê di nav romanê da, wesfkirina şûnê ye helbet armanca ji vê wesfkirina şûnê bi tenê wênegirtineke ketwarî ya şûnê nîne. Çimkî armanca romannivîs di wênegirtina şûnê da binyatdanîn û çêkirina wêneykî hunerî yê şûnê ye, herwek di derbareyê vê mijarê da George Henry Lewes dibêje: “Divê romannivîs ji wesfa ketwarî ya rûkeş dûr bikeve, pêwîste ketwarê bike mînakê ji bo wesfên xwe. Çimkî ketwar mînakê vala dike ji bo vedîtina heqîqeta navekî û derveyî.”²⁵⁷ Wate dîtîn û hizra romannivîs ji bo wesfa şûnê, guhertin bi ser erka şûnê da anîye û komek erkên nû xistiye sitûyê wê, wan jî erka ravekarî yan jî erka wateyî dan erdnîgarîya şûnê, li alîyekî din ev dîtînên cuda yên romannivîs ji bo şûnê. Bi rêya jêdereke hizir û xeyalîyeke wêjeyî ye. Çimkî hizir û dîtînên romannivîs hizreke dahênanerane ye û “Can dide şûnê û pêgeheke bilind didê di nav pêkhatayên din yên vegêranê da.”²⁵⁸ Bi vê jî şûn tevî wateyê dibin û wate jî xuyanîyên kûr di xwe da digrin. Herwiha roleke bandordar dibînin di arastekirina karakteran da bi şêweyekê ku “Têgînê li xweza, kirdar, rewîşt û hizra wan dike, li vir şûn dibe beşek ji pêkhateya giştî.”²⁵⁹ Binyata nivîsan vê jî ji bo wê pêwendîya girîng ya di navbera mirov û şûnê da vedigêrine, ku paşê romannivîs bi kêr jê kirina vê pêwendîyê ve awayekî ji wesfa şûnê berhemê tîne holê ku dibe ajoyeke serekî ji bo eşkerekirin û nîşandana wê jîngeha ku karakter têda dijî. Herwiha gelek caran “Şûn dikare wêneyê derûnî û ciwanînasî û asta civakî û regez û neteweya mirovan nîşan bide, materyalên nav şûnê jî komek nîrxên tevgerî û aborî rehendên dîrokî di xwe da digrin”²⁶⁰ Wate romannivîs ji bikaranîna wesfa şûnê da rê li ber xwendekaran vedike ji bo baştir

²⁵⁵ Karzan Muhsin Qadir, *Sîma Tazekanî Romanî Kurdî Le Nêwan Salanî 1991-2000*, Nameya Masterê, Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr, 2009, r. 57

²⁵⁶ Hesên Behrawî, *Bunye el- Şikil el- Rîwaye*, Merkez el- Seqafî el- Erebi Dar el- Beyza, Beyrut, 1990, r. 42.

²⁵⁷ Rachel- Webster, *Twêjînewey Tîyoriy Edebî*, Wer.: 'Ebdalxaliq Yaqubî, Weşanxaneya Mukiryanî, Çapa Yekem, Hewlêr, 2006, r. 79.

²⁵⁸ Îbrahîm Cindarî, *el- Feza el- Rîwaye 'Îndî Cibra Îbrahîm Cibra*, r. 156.

²⁵⁹ Tanya Es'ed, *Bînay Şwên Le Dû Nimûney Romanî Kurdî Da "Hêlane, Ejdiha"*, r. 213.

²⁶⁰ Necim Elwenî, *Tîyori Komellnasîy Roman*, r. 193.

nasberê jîyana taybet ya karakteran bibin û bi hêsanî zanyarîyên girîng di derbarê karakteran da bi dest bixin.

Herwiha wesfa şûnê bi pê qonaxên dîrokî yên romana cîhanî û dîtinên rêbazên wêjeyî ve bi arasteyên cuda di nav nivîsan da hatine bikaranîn. Weke mînak: Di romanên zarlêkirî da, "wesfa şûnê bêtir wênekêşana endazeyî ya şûnê bû û rola ciwankarî û xemlandinê di nav nivîsan da dilîze. Herwiha gelek rûpel di binyata romanê da dagîr dike û digel şûnên wesfîkirîyên din da fezaya giştî ya romanê pêk tînin."²⁶¹ Ev şewaza wesfê jî di bin bandora rêbaza realîzmê da pêş ketîye. Bi wê armanca wêneyekî ketwarî yê şûnê bikin binyat û nêzikî jîngeha ketwarî ya civakê bibin, ta ku awayekî bawerîyê li ba xwendevanan bîne holê ku ew şûna romannivîs wesfa wê dike wêneyekî jîyana ketwarî ye. Lê di romanên pêla hişî da guhertin bi ser binyata wesfa şûnê da hat, şewaza pêşkeşkirina şûnê formeke din wergirt, ku nîşandan û amajekirineke bilez bû bi şûnan, dîsan di hinek rewş da di çarçoveya wesfek kurt da tê pêşkeşkirin û hinek car jî tenê navê şûnan têne destnîşankirin. Lê bi şeweyekî giştî armanca romanên bi ser vê rêbazê ew bû ku hêmana şûnê wek feraxekê bixebite ku karakter û bûyeran di xwe da bigre, ji bo ku bi rîya wesfa şûnê ve pêwendî û taybetmendîyên karakter dîyar bike. Loma "Gelek caran amadebûna parçeyekî wesfa şûnê ji bo wê ye ku xwendevan ezmûna bûyeran bike û di nav wan da bijîn"²⁶² Bi vê ve hizra xwendevanan di nav fezaya şûnê da tevî bûyer û tevgerên karakter dibin, ku dîsa xwendevanan bervî cîhana hinava nivîsarê dibe. Herwiha bandor û olanê li ser rewşa derûnîya xwendevanan da çê dike.

Bi şeweyekî giştî li alîyê bikaranîn û bandora bi ser dema vegêranê, wesfa şûnê dibe du cûre:

3.3.1.Wesfa Rawestî

Ev cûreya wesfê di binyata nivîskara romanê da dema vegêranê radigire û bi tu haweyî bûyer bervî pêş naçin.

²⁶¹ Semîr Ehmed Îbrahîm, *Hunerekanî Gêrranewe Le Romanekanî Xusrew Caf Da*, Nameya Master, Kolêja Ziman, Zanîngeha Selaheddîn, 2015, r. 117.

²⁶² Bland, D. S, *Endangering the Readers Neck: Background Description in the Novel*. Criticism, vol.3. no.2. USA, 1961, r. 126.

Weke mînak: Di wesfa Bajarê Amêdî da, Badîn li dû biryardana veqetîna ji bajêr. Bi vî haweyî wesfa sîlav û şikeft û ciwanîya wê deverê dike û dibêje: *“Ew weke xewnekê ji ber çavê min winda dibû, bayê hênîk yê ku gelî û newal dilûrandin, tilûrên ku wê sibeha xemgîn helan dikirin, rûbarê serxweş, kene keça meta min li bin darên berruyan dem amin ew didiqdiqand, sîya zinarên efsaneyî, sulavê ku ji vegotina çîrokan têr nedibû, ew wêne û nîgarên li ser kevî û newalan, li devê şikeftan, heft bîrên kevnare, kuna berfê ku heta havînan berf têda nedihelîya, havîngeha mîrekên Behdînan, paytextak hebu bilind, darên spîndarê, behîv û gûzê, çîyayê Metîn, Garre, çêleka pîrika min, kitêbên ibranî, ‘erebî, suryanî, tirkî, kurmancî hemû li pêy min man.”*²⁶³ Di vê birga dirêj ya wesfa şûnê da, Badîn bi rîya kesê yekem yê yekhejmar ve û bi kunenişîna taybet bi xwe ve wesf pêşkeş kirîye, çiqasî bîranînen xwe tevlî şûnan kirîye jî, lê wesfa deverê bi giştî û xweza û bajarê Amêdîyê jî bi taybetî zale bi ser hest û bîranînen Badîn da. Bi vê jî xweza û ciwanîya bajarê Amêdîyê li ba Badîn bê wêneye, li alîyekî din ev wesfa şûnê di çarçoveya komek rêzên helbestan ve hatîye pêşkeşkirin, ku ev jî xurtbûna alîyê hunerî ya romannivîs diyar dike.

Di şûneke din ya romanê da ku piştî Barzanî û hevalên wî diçine devera Badînan, Badîn bi xwe jî bi wan re diçe, dema ku digêjin deverê Badîn destûrê ji Barzanî dixwaze ji bo çend demjimêran biçe Amêdîyê cem pîrika xwe ku çend sale ew nedibû, paşê dema ku nêzikî bajêr dibe bi vî cûreyî wesfa bajarê Amêdîyê dike û dibêje: *“Amêdîyê. Evîna yekem, dara tûyê, minareya mizgefta mezin, xirecira qeyserîyê, qubehan, keleha Aşeb, çiyayên Garre û Metîn, kolanên teng û buharên lezok! Careka dî ezê çavê xwe bi dîtina warê zarotî û ciwanîya xwe kil bikim.”*²⁶⁴ Ev wesfa jî amajeyê bi hinek şûnên nav bajarê Amêdîyê dike, vê jî wiha kirîye ji bo ajoyeke kurt dema vegêrana bûyeran raweste. Bi vê jî wesfeke rawestî pêkanîye. Herwiha di wesfa odeya xwe da, Badîn dibêje: *“Êvare...stêrk dilîzin, ez li ber pencereya xwe ya bi ser hewşê de vekirî rûniştîme, bayê ku weke dizan xwe li pencereye dide, perdeya etlesê şîn direqisîne, herdu enîşkên min, şopa xwe li ser maseya ji darê berruyan kolane. Di qunceki odeya min de, textê razana min e, palgehki ji perîkên deh dîkên qurre, Mujdeyê ew diyarî min kiribû, navê min û xwe li*

²⁶³ Jan Dost, *Mijabad*, r. 38.

²⁶⁴ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 148.

ser hêzarê spî bi tayên rengîn neqşandîye, doşeka min ji hirrîya deh berana ye, lihêfa min çewalek pembo têde ye. Di refîkekî de çend kitêban wek sêwîyan xwe dane rex hev.”²⁶⁵ Ev wesfa jî di kunenişîna Badîn xwe ve hatîye vegêran ku wesfeke rawestî ye. Çimkî amaje bi komek materyalên nava şûnê kirîye û tu awayekî livdar têda tune. Bi vê jî birga şûnê nebûye sedema wê ku pêvajoya vegêrana bûyeran pêşve biçe, lê dema ku vegêr wesfê dike dûbare pêvajoya vegêranê destpêdike.

Di wesfa bajarê Mehabad da jî Badîn dibêje: *“Di pencereya Rojilat da dêlîya tirî xuya dike, ronîya hîva çarde şevî. Bi ser de weke mûmeke helyayî herrikîye, dareke bi sawe şaxên wê razên efsaneyî di xwe de vedişêrin, darên Mehabadê hemî şîn hatine û kulîlkên wan teqyane, dara min tenê bi buharê nehesîyaye!”*²⁶⁶ Ev wesfa jî bi kunenişîna Badîn xwe ve hatîye pêşkeşkirin, ku wesfeke zarlêkirî ya rawestî ye, şêwaza birga wesfê bi tenê erka ciwankarî û xemlandinê daye nivîsandinê. Bi vê jî dema nivîskar romanên pê dirêj kirîye. Dibe ku romannivîs ev birga wesfê ji bo wê armancê bikaranîbe ku xwendevan dema romanê dixwînin hinekî bêhna xwe vedin. Bi vê jî dema xwendina romanê pê dirêj dibe. Loma dibe ku em wê ji nav nivîskara romanê derxin derve hem honandina bûyeran û hem jî binyata nivîsan wê ji bîra me here.

Herwiha di romana Mîrname da di wesfa bajarê Bazîd da Recebê Terzî dibêje: *“Bêhna Bazîdê di wê rojê da zora bêhna barûdê dibirin minareyên mizgeftên wê, qeyserya wê, kela wê, sûka wê, taxên wê, dar û ber, çem û newal û gul û kulîlk û sîya dîwarên di berê warên havînan de, Gilîdax û biharên wê yên wek perikên tawisan û zinge zinga zengilên beranên di pêşîya kerîyan de. Xirecira zarokan û xinge xinga bazin û xilxalên keçikan, teşîrêşên li ber tavka Adarê hirrîya pez dirêsin. Ew her kêlîkek biçûk û devereke hatin berçavên min.”*²⁶⁷ Ev wesfa jî wesfeke rawestî ye. Bi tenê erka xemilandin û ciwankarîya nivîsandinê nîşan dide, tevî livên karakteran nebûye. Çimkî di dema wesfê da dîmenê xwezaya biharê û havînê, Çiyayê Agirî, gul û gulzar, ciwanî û bazinê destê keçên bajarê Bazîdê dema vegêrana bûyeran rawestandîye û ta ku wesfkar dest ji wesfkirinê berdide, paşê dûbare vegêran berdewam dibe. Di heman demê da ev birga wesfî bi şêweyeke serbixwe di nav

²⁶⁵ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 81.

²⁶⁶ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 132.

²⁶⁷ Jan Dost, *Mîrname*, r. 109.

romanê da hatîye bi vê jî dibe ku ji binyata romanê were derve, bê wê ku tevna vegêranê ji hev bikeve yan jî bandorê li ser wateya giştîya romanê çê bike.

Herwiha vegêr di romana 3 Gav û 3 Darek da di wesfa wê mizgefta ku Xidirê Botî xwedaperistî têda dikiir. Bi rîya wê ve wesfa nava mizgeftê dike û dibêje: *“Her tişt li ber çavên wî bû, heta bi nivîsa li ser mîhrabê ku ayeteka Qur’anê û neqşên cilik û cêrraxên terîşyên li erda hêwana mizgeftê raxistî û cawê kesk yê ku derencên mînberê pê pê nixumandî û ruwên zerhimî yên wan feqeyên di wê kelkela germê de xwe avêtibûn ber stûnan û razabûn, dara hejîra ya di nivê hewşa mizgeftê de, ku şaxên wê yên reng çûyî û tozgirtî di bin hejîrên qelişî da. Dihatin ku werine xwarê. Dihatin ber her du çavên wî yên ku hîn şopa hêşiran bi temamî ji ser wan neçûbû.”*²⁶⁸ Di vê parçê da vegêr bi rîya kunenişîna mijarî ve wesfek rawestî pêşkeş kirîye, ku wesfa hundurê mizgeftê ye. Bi vê jî wêneyekî fotografî yê materyalên navekî di çarçoveya wesfeke zarlêkirî da dikîşîne. Di encamê da dema vegêrana bûyeran ji bo ajoyeke diyarkirî radigire û rûbera dema xwendina nivîsandinê firehtir dike.

Di şûneke din da vegêr di wesfeke roja sêşemî ya Mûşê da wesfa bihar û deşt û Çiyayê Şerefdîn dike û dibêje: *“Sêşemeke xweş bû, buharê têda konê xwe yê weke desmalka şêx, li deşta Mûşê vegirtibû û êdî berfa spî ya li çemên Çiyayê Şerefdînê, li ber awazên rojê yên zêrîn diheliya û dihate xwarê.”*²⁶⁹ Di vê wesfê da vegêr ji bo ajoyekê dema vegêrana bûyeran ragirtîye. Dibe ku ev rawestînên kurt ji bo wê be ku xwendevan bêhna xwe vedin, ta ku xwendevan bi hûrgilî digel pêvajoya bûyeran gava bavêjin. Li alîyekî din jî eger ev wesfa ji binyata nivîsandinê were derxistin, bandoreke ewqas xurt li ser tevna vegêranê nake. Bi vê jî wesfê tenê erkeke ciwankarî û xemilandî daye nivîsandinê.

Herwiha di romana Martînê Bextewer da jî bi wê şêweya romanê wek romana kesayetî tê jimartin, piranîya bûyerên romanê pêwendîya wan bi jîyana Martînê karakterê serekî û hinek kesayetîyên din ve heye, ku vegêr wan li pal karakterê serekî tîne ser şanoya bûyeran. Loma em dibînin bi şêweyekî bergehî wesfa şûnê nehatîye kirin. Dibe ku di çend mînakên da wesfa mal, ode, xanî û bajaran hatiye kirin,

²⁶⁸ Jan Dost, 3Gav û 3Darek, r. 62.

²⁶⁹ Jan Dost, b.n.b., r. 184.

herwek vegêr di wesfa xanek li Bazîdê da dibêje: *“Ew xana lanet lê barî ne mîna xanên Helebê mezin bû. Xanîyên xewê li jor û li binî jî axurên mehînan, dewar û hesp û deveyan û cihên mezin ji bo parastina pirtall û mal û barên bazirganan hebûn. Xaneka biçûk û du qatî bû. Li bilindîyeka mîna keleheka piçûk xuya dikir, hewşa wê gelekî piçûk bû. Ew qonaxa fersengekê yan jî derdora se’atekê bi meşê dûrî bajarokê Bazîdê bû. Li wir jî di guldankên qafîkî da laleyên rengareng penecereyên odeyan dixemilandin. Ez fikirîm ku ev lale qey guleke pîroze li van welatan. Ji ‘Ekkayê heta vî welatê kurmancan lale li her mal û qesr û xan û sûk û heta mizgeft û dêran jî hebûn.”*²⁷⁰ Ev birya wesfî bi şêweyekî serbxwe nehatîye û tevî dema vegêranê nebûye. Bi vê jî wesfek rawestî pêkanîye. Çimkî vegêr bi şêweyekî hûrgilî ve wesfa endazeyî ya wê xanê ji me ra dike, amajeya odeyan û tiştên di nav odeyan da dike. Herwiha cûreyê ew gulên ku di nav xanê da hebû jî nîşan dide. Wate bi şêweyekî giştî erka zanyarîdana bi xwendevanan bi cî dike.

Di şûneke din da demekê ku Seferşa êvarekê ji bo fîtarê Martîn û hevalên wî dawetî malê dike, dema ku Martîn û hevalên xwe dikevin hundur, Martîn bi vê şêwazê ve wesfa hundurê odê ji me ra behs dike û dibêje: *“Rojekê ber êvarê, Seferşa em hemû vexwendin odeya xwe ya mezin. Fitar jî amade kiribû. Li ber dîwarên hundur kulavên ji hîrrîya mîhan û di nîvê odeyê de xalîyên Esfahanî ku bi gulên rengîn û laleyan neqşandibûn, raxistîbûn. Çend palgehên bi hîrrîyê heşandî û ruwên wan ji etlesên kesk spartîbûn dîwaran û perdeyên ji dî bayê sorê tarrî bi ser pencereyan da hatibûn berdan û çend barên bi dîwaran ve li ser serê me ronîyeke xav û zerrik diherikandin ser rûyên me. Li dîwarê bakur jî hin xençer û şûr hatibûn hilawestin.”*²⁷¹ Ev wesfa dirêj jî bi heman şêweya wesfên pêştir wesfeke rawestî ye. Çimkî behsa komek tiştan dike ku di nav şûnê da hatine danîn û materyalên bêliv in. Herwiha wesf bi şêwaza dema raborî ve hatîye pêşkeşkirin vê jî bandor li ser dema rawestana vegêranê anîye holê. Loma dema vegêrana bûyeran ji bo ajoyekê rawestandîye ta ku vegêr dest ji wesfê berdide paşê dûbare pêvajoya vegerranê destpêdike.

Di romana Kobanî da jî vegêrê romanê û hinek car jî karakterên nav romanê bi kunenişîna xwe ve komek parçeyên wesfa şûnê kirine, ku beşeke wan parçeyên

²⁷⁰ Jan Dost, *Martînê Bextewer*, r. 194.

²⁷¹ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 215.

wesfan bi alîyê wesfa rawestî bi piranî wesfên bajarê Kobanê û xanîyên li wir hatine rûxandin û mizgeftên Kobanî ne. Weke mînak: Metîn di wesfa bajarê Kobanê da dibêje: *“Kobanî ne ew bajarê zêde xweşe heval yarî, ne çemek ne behrek ne lê heye, ne daristanên mezin lê hene, kaşekî sêwî, daristaneke biçûk û du kanîyên miçiqîne, lê dîsa jî bîrîya wî dikim heval.”*²⁷² Di vê wesfa kurt da Metîn xweşdivîya xwe ya li hemberî bajarê xwe tîne ziman û xwezaya erdnîgarîya Kobanê ji hevalê xwe re ron dike. Bi vê jî wesf ji bo ajoyeke kurt dema vegêranê ragirtîye û bi tenê erka ronkirinê û zanyarîyê di derbarê Kobanê da daye ber destê xwendevanan.

Di wesfeke din ya şûnê da Jan wek karakter û dengekî serekî yê romanê, beşeke gelek ya vegêrana romana xwe xistîye stûyê xwe. Wek di wesfa hewşa mala xwe da dibêje: *“Hewşa me qetek ji buhiştê bû. Di nivê hewşê de bîreke kul li dora wê tîtavik hatibû çandin. Ji bîrê bi şerqî de dêlîyeke tirî hebû, li bakurê dêlîyê dareke hinarê hebû bi qasî ku tê bîra min dîya min tim di sîya wê de rûdinişt. Wê Qur’an jî di bin sîya hinarê da dixwend. Ji min wa bû ku koka hinarê bi bihîstina xwendina dîya min ya Qur’anê avêt sîya hinarê re gul dide û meyweyan digire, carcaran jî wê sibehan piştî ku nan li tenûrê dixist xwe davêt sîya hinarê lingên xwe dirêj dikirin û difirkandin. Li alîyê başûr, dareke hejîrên mor yeka zeytûnan û yeka xoxan hebû. Li başûrê rojhelatê du darên senoberê ku her sal cotek qumrî dihatin. Hêlîna di nav şaxên yek ji wan de çêdikirin. Li rojhelatê jî dareke tûyên spî hebû ku havînan û zivistana dibû warê bi sedan beytik û çivîkan.”*²⁷³ Di vê wesfa dirêj da bi temamî dema vegêranê rawestîye. Çimkî vegêr tenê wesfa darên nav hewşê û bîranînên dayika xwe digel wan daran kirîye, hemû ev tişt wek materyalên bêliv tên jimartin. Bi wateyeke din ev wesfa wek parçeyeke serbixwe hatîye, ku tevî vegêranê nebûye û beşdarî li bervîpêşçûna bûyeran da nekirîye. Di heman demê da wesfê tenê hinek zanyarîyên lawaz daye destê xwendevanan.

3.3.2. Wesfa Livdar

Di vê cûreya wesfê da dema vegêranê digel wesfê berdewam dibe, herika bûyeran pêşve diçe. Bi vê sedemê ve jî rehend û alîyên cûr bi cûrên şûnê xuya dikin.

Weke mînak: Di romana Mijabad da Badîn wek berawirdîya bajarê Tewrêz û Mehabad da bi vê cûreyê wesfa wan dike û dibêje: *“Êvarê ez ji nexweşxaneyê*

²⁷² Jan Dost, *Kobanî*, r. 220.

²⁷³ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 300.

derketim û hinekî li navenda Tewrêzê geryam, tu dibêjî qey li bajarekî Rûsyayê yî! Piranîya xelkê bi rûsî diaxivin, nizamim rûs in yan na? Wêneyên Stalîn li her koşê û mehele û zikakê daliqandîne, nivîsên rûsî li ser dîwaran û alên sor û neqşên das û çekûçan li her deverê ne, Xwedê kir Mehabad ne wiha ye, wê bîna min qet lê derneketibûya. Lê bi rastî Tewrêz xweşe, paytexta Şah Îsmailê Sefewî ye, ku di Şerê Caldiranê da şikest, bajarê karxaneya mezin ya xaliçeyane, ku Elmanan ava kiribû û bi piranîya hirrîya wê ji bajarê Şinoyê dianîn, ew karxaneya ku Kerîmê Şikakî têda dixebitî dema ku zarok bû, berî ku rûs wê karxaneya herî mezin li Îranê bikin qîşleyek ji bo serbazê xwe. Bajarê şemendefêr û trêne ye jî, min stasyona trênan ku diçin Bako jî ziyaret kir, xwezî yek li Mehabadê jî hebûya wê gelek rehetî ji xelkê re peyda buya. Tewrêz bajarê her xweşîyê ye, min kitêbxaneya Siruşt jî, ya ku Pêşewa her cara tê Tewrêzê wê ziyaret dike û çend kitêban dikire dît, Tewrêzê, bajarê ku kalikê min nexweşxaneyekê wê de ji ber jana kezabê dinale.”²⁷⁴ Badîn bi kunenişîna taybet bi xwe ve berawirdîya navbera bajarê Tewrêz û Mehabadê kirîye. Herwiha bi rîya wesfê ve dîroka beşeke girîng ya veşartî yên bajarê Tewrêzê ji me re eşkere kirîye. Ev dîroka jî bi rîya wesfa nivîsen li ser dîwar û kuçe û dikanan derketîye. Herwiha belavbûna çakûç û dasê jî li hemû cihên vî bajarî alîkarin ji bo wê wesfa şûnê ku rehendeke dîrokî werbigre û têgînê li îdolojîya serdemek dîyarkirî ya gelê vî bajarî dike. Li alîyekî din wesfa bajarê Tewrêzê û girêdana wê bi dîroka kesayetîyekî diyarkirî yê wek Şah Îsmailê Sefewî, ku serdemekê şahê Sefewîyan bû li welatê Îranê, bûye sedema wê ku alîyên veşartî yên vî bajarî bi piranî xuya dibin. Ji ber van sedeman baladestîya hunerî ya romannivîs bi berçavan dikeve, ku komek zanyarîyên girîng di derbarê dîroka bajêr da li alîyekî û li alîyê din jî di derbarê karakteran ji bo xwendevanan ron dike. Di heman demê da wek qerf û rexneyekê arasteyî desthilatdarên Îranê dike ku di warê pêşketin û xizmetê da cudahîyê dixin nav bajarên Îranê. Bi vê jî wesfa şûnê tenê di çarçoveya wesfa endazeyî ya şûn û materyalên nav şûnê da nehatîye girêdan ta ku wesfeke rawestî bîne holê. Dibe ku wesf û vegêran tevlihev bûne û dema vegêranê ranewestîye û ji rêrewa xwe derneketîye bi vê jî wesfeke livdar ya şûnê pêkanîye.

Di romana Mîrname da Şengê di wesfa odeya xwe ya raketinê û Ellahqulî yê hevserê xwe da dibêje: “*Wê şevê vegeriya hucreya min ya ku bibû cihokek genî ji*

²⁷⁴ Jan Dost, *Mijabad*, r. 200-201.

girêz (lik) û xûn û avika nêranîya wî keftarê şêst salî. Cihokek ku barîna hêsirênmin û ava heft kanîyan jî nedişî wê gemarê bide alî.”²⁷⁵ Di vir da Şengê bi kunenişîna xweyî ve wesfeke livdar ya şûnê pêşkeş kirîye, ku derûnîya xwe ya wan gavên ku di vê odeyê da digel hevserê xwe derbas kirîye vedibêje. Loma wesfa odeya xwe wek şûneke kirêt, pîs û rikî vegêrandîye, ku paşê bi rîya vê wesfê ve di derbarê rewşa derûnîya Şengê xwendevan dibin xwedî komek zanyarî.

Di romana Martînê Bextewer da jî vegêr yan jî romannivîs di wesfa xanên Helebê da dibêje: “*Xanên wan welatan ne tenê cihekin ku rêwîyek yan bazirganek lê dilûse, ew bazarin jî. Kê çi mal anîbe. Dikare li wir bifroşe û çi bixwaze bikire. Tacîr bi xwe tîn xanan û malen xwe pêşkeş dîkin ji bo firotinê û bazarên germ di hundurê xanan de li dar dikevin û ew bazirgan li mal û pirtallê ku bikin jî digerin. Havînan, xanên Helebê dibin kunê moz û kewarên hingiv. Xirecîra çûn û hatina bazirganane. Ji deverên cîhanê hemû mal tê wan xanan.*”²⁷⁶ Di vir da jî wesf mijarîye û liv têda xuya dike û di xizmeta dema pêşdeçûna bûyeran da ye. Herwiha romannivîs xwe ji wesfa endazeyî ya wê xanê dîr xistîye. Dibe ku bi şêwaza wesfeke nû da pêşkeş kirîye. Li alîyekî din wêneyekî di derbare xirecîr û hengameya mêvan û bazirganên di nav xanan da nîşan daye. Wate wan xanan sîfeteke aborî wergirtine û bûne beşek ji şûnên pevguhertina ew kelûpelên bazirganên ji bo bazirganîyê digel xwe dianîn. Kewate ev parçeya wesfa şûnê erka ravekarî û ronîkirina sîfeta wan xanan derxistîye. Yan di parçeyeke din da vegêr di wesfa wê xana ku Martîn ji bo demekê têda jîyana xwe derbas kirîye dibêje: “*Xana Hukîdun jî. Digel piçûkîya xwe û navê xwe yê dîrî bazirganîyê nîrxên bazirganên, cihek ji cihên bazirganîya şerq û xerbê bû. Li wir ez poşman bûm ku min perê xwe hemû bi barên kaxezan nedan û nehat ku li wê xanê tîcareta kaxezan nekîr.*”²⁷⁷ Ew wêneyê wesfî alîyê borîya wê xanê nîşan dide, lê têda bi şêweyekî hûrgilî ve li ser kelûpel û tiştên hundurê xanê da hene ranaweste. Herwiha di çarçoveya wesfeke zarlêkirî da nehatîye pêşkeşkirin û tenê erka xemilandî daye binyata nivîsandinê. Dibe ku bi berevajîyê ve wesf di çarçoveya nû û bi alîyê wesfeke livdar da hatibe pêşkeşkirin. Her ji ber vê yekê şûn bilezî di nav

²⁷⁵ Jan Dost, *Mîrname*, r. 48.

²⁷⁶ Jan Dost, *Martînê Bextewer*, r.106.

²⁷⁷ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 107.

zîhna xwendevanan da derbas dibe û tevlî vegêranê dibe. Bi vê jî herika pêşdeçûna bûyeran berdewam dibe.

Herwiha di romana Kobanî da jî Jan beşek serpêhatî û serborîyên jîyana xwe ya zaroktî û mezinbûna xwe ya li Kobanî vedibêje. Paşê jî ew cenga mezin ya rûniştvanên Kobanî rûbirû bûne û di encamê da jî bûye sedema koçkirina bi hezaran malbat. Li alîyê din jî behsa wan kaviîlên bi ser xanî, mizgeft, kolan û balexaneyên bajarê Kobanî da hatîye dike. Weke mînak: Jan wek dengekî vegêrê romana xwe wesfa ketin û xopanbûna beşeke pir ya xaniyên xwişk û bira û meriv û cîranên xwe dike û dibêje: *“Hewşên cîranên min, yên birayên min nemane, xaniyên wan hatine ‘erdê, şop ji wan re nemaye, erdhejeke mezin tenê dikare vê hunerê bîne serê xaniyan. Korteke kûr li şûna mala xwişka min ku li başûrê mala me bû peyda bûye.”*²⁷⁸ Di vir da jî wesfkirina ew xopanbûn û kavilkariya bi ser xaniyên ku di qonaxeke dîrokî da ku ew bajara rûbirûyê wê kavilkirina mezin bûye ev helgirê wateyeke mezin ya dîrokî ye. Loma divê em bibêjin wesfeke ketwarî ya şûnê (rasteqîn şiwên) ye. Bi piranî erka ronîkirin û zanyariyê ye ji bo xwendevanan li ser wê zilma ku neteweya kurd bi berdewamî li ser axa xwe hêriş lê hatîyekirin. Ev birga wesfî ya şûnê tevlî vegêranê bûye û wateyek daye şûnan. Herwiha herika bûyeran pê berdewam kirîye, ku diware em bikaribin ji avahiya nivîsandinê derxin û ji bîr bikin.

Bi vê şeweyê em dikarin di vê xişteya jêr da wesfên şûnê li alîyê rawestî û livdarî ve di nav romanana da pêşçav bikin.

J	Navê Romanê	Karetktera/ ê Wesfker	Şûna Wesfkirî	Cûreya Wesfê	Rûpel
1	Mijabad	Badîn	Bajarê Amêdîyê	Rawestî	38
2	Mijabad	Badîn	Studyoya Nûbar	Rawestî	52
3	Mijabad	Badîn	Odeya Badîn	Rawestî	81
4	Mijabad	Badîn	Taxek	Rawestî	86
5	Mijabad	Badîn	Bajarê Mehabadê	Rawestî	132
6	Mijabad	Badîn	Bajarê Silêmanîyê	Rawestî	135
7	Mijabad	Badîn	Bajarê Amêdîyê	Rawestî	148

²⁷⁸ Jan Dost, *Kobanî*, r. 304.

8	Mijabad	Badîn	Baxçeyê Qazî	Rawestî	175
9	Mijabad	Badîn	Mal û Odeya Amîral Axa	Rawestî	176
10	Mijabad	Badîn	Xwezaya Bajarê Mehabadê	Rawestî	191
11	Mijabad	Jale	Bajarê Bexdayê	Livdar	69
12	Mijabad	Hejar	Xaka Amêdî û Mehabadê	Livdar	173
13	Mijabad	Badîn	Bajarê Tewrêzê	Livdar	201
14	Mîrname	Teymûrê Fasiq	Xwezaya Çîyayê Agirî	Rawestî	25
15	Mîrname	Emerê Xiznidar	Bajarê Bedlîsê	Rawestî	32
16	Mîrname	Emerê Xiznidar	Hemama Bajêr û Çîya û Baxên Bedlîsê	Rawestî	35
17	Mîrname	Emerê Xiznidar	Minare û Mizgeft û Ciwanîya Bedlîsê	Rawestî	53
18	Mîrname	Xanî û Recebê Terzî	Bajarê Stenbolê	Rawestî	98
19	Mîrname	Recebê Terzî	Kola û Mizgeftên Stenbolê	Rawestî	99
20	Mîrname	Recebê Terzî	Odeya Recebê Terzî	Rawestî	101
21	Mîrname	Recebê Terzî	Kuçe û Kolan û Minareya Bazîdê	Rawestî	109
22	Mîrname	Xalidê Colağ	Xwezaya Çîyayê Gilîdaxê	Rawestî	117
23	Mîrname	Mela Salihê Cizîrê	Xweza û Ciwanîya Cizîrê û Rûbara Dîcleyê	Rawestî	143
24	Mîrname	Mela Salihê Cizîrê	Dîmenê Rojhilhatina Bajarê Cizîrê	Rawestî	145
25	Mîrname	Şengê	Odeya Razanê Ya Şengê û Ellaqule	Livdar	48
26	3 Gav û 3 Darek	Vegêra nediyar	Ew Mizgefta Ku Xidirê Botî Têda Nimêj Dikir	Rawestî	62
27	3 Gav û 3 Darek	Vegêra	Xwezaya Zivistanê û Çemê	Rawestî	92

		nediyar	Mûrad û Çiyayê Şerefînê		
28	3 Gav û 3 Darek	Vegêra nediyar	Xwezaya Buharê û Deşt û Çiyayên Şerefîn	Rawestî	184
29	3 Gav û 3 Darek	-----	-----	Livdar	----
30	Martînê Bextewer	Vegêra nediyar	Odeya Martîn	Rawestî	48
31	Martînê Bextewer	Martîn	Hemama Helebê	Rawestî	66
32	Martînê Bextewer	Martîn	Xana Hukidun	Rawestî	100
33	Martînê Bextewer	Martîn	Mala Alberto	Rawestî	152
34	Martînê Bextewer	Martîn	Xwezaya Çiyayê Bazîdê	Rawestî	163
35	Martînê Bextewer	Martîn	Koşka Walîyê Helebê	Rawestî	173
36	Martînê Bextewer	Martîn	Hewşa Mala Alberto	Rawestî	185
37	Martînê Bextewer	Martîn	Xana Bazîdê	Rawestî	194
38	Martînê Bextewer	Gostav	Bajarê Bedlîsê	Rawestî	199
39	Martînê Bextewer	Martîn	Odeya Şeref Şah	Rawestî	215
40	Martînê Bextewer	Martîn	Eywana Xana Bedlîsê	Rawestî	253
41	Martînê Bextewer	Vegêra nediyar	Xanên Helebê	Livdar	106
42	Martînê Bextewer	Vegêra nediyar	Xana Hukidun	Livdar	107
43	Kobanî	Jan	Gund û Bax û Çiya û Bajarê Kobanê	Rawestî	79
44	Kobanî	Jan	Mizgeft û Dibistan û Kolan û Bajarê Kobanî Yê Hilweşîyayî	Rawestî	82
45	Kobanî	Vegêra nediyar	Mala Amedê Evîndarê Xedîce	Rawestî	115
46	Kobanî	Jan	Rezê Mala Jan	Rawestî	160
47	Kobanî	Jan	Xanîyê Mala Ap û Xwişk û Pismamên Jan	Rawestî	161
48	Kobanî	Metîn	Erdnîgarîya Kobanê	Rawestî	220

49	Kobanî	Vegêra nediyar	Odeya Mala Hecî Misli Hemezirav	Rawestî	293
50	Kobanî	Jan	Hewşa Mala Jan	Rawestî	300
51	Kobanî	Vegêra nediyar	Mala Hecî Mislim	Rawestî	387
52	Kobanî	Jan	Hewşa Mala Xwişk û Cîranên Jan	Livdar	304

3.4. Erkên Wesfa Şûnê Di Romanan Da

Di romanan da erkên wesfa şûnê wek erka xemlêner, erka raveyî û erka xapînerî tîn dîtin. Em jî daxwazî wan erkan bi awayekî sistematîk bînin ber çavên xwandewanan.

3.4.1. Erka Xemlêner

Armanca jî vê erka wesfê ewe ku romannivîs bi şêweyê hûrgilî ve wêneyekî fotografî û estetîkî ya şûnê jî me ra dikî. Ev wênekêşana jî bi piranî jî bo du armancê serekî yê di nav binyata romanê da tîn. Armanca yekem ewe ku romannivîs di hinek rewşan da awayekî bêhnvedanê dide xwendevanan jî bo ku dû temambûna wesfê bi şêweyê baştir bîr û hizra xwendevanan digel vegêrana romanan qut nebe û gav bi gav digel pêvajoya vegêranê berdewam bin. Ev armanca bi wê wêneya estetîkî cûreyek çêjê dide xwendevanan, ku ev rewşa bi piranî di romanên zarlêkirî da bi ber çavan dikeve. Armanca duyem jî ewe ku ev erka çawanî berçavkirina şîyanên ziman û honandina huneryane ya romannivîs di pêşkeşkirina wesfa şûnê da nîşan dide.

Di romana Mîrname da, komêk wesfên şûnê ya rawestî bi ber çavan dikevin ku peywira xemlêner dibînin. Weke mînak: Di wesfa çîya û rûbar û xwezaya rojhelatîna rojhilata bajarê Cizîrê da Mela Salihê Cizîrî dibêje: *“Me li rojhelat seyr dikir, stêrk mîna pêtiyên dawî di agirdanekê de vedimirîn û şefeqa serê çiyê weke perdeyê erxewanî hêdî hêdî xwe jî ber siwarê zêrîn yê ku bédeng hildikişîya çemê Cûdî. Dida alî, bayê hênîk û çîveçîva çûk û tilûrana, xişte xişta çilo û bergên daran û keleşêran tevlihev dibû jî nişkê ve tava rojê li serê Birca Belek ku hin dibêjinê Birca*

Şeref gerîya û paşê li ser rê sêsed û şêst û yek minaren bejnzirav alya, qubik ramûsan û daket di ava kevanê Dîjleyê de mîna toza zêr hate reşandin.”²⁷⁹ Di vê birga dirêj ya wesfî da, dîmenê rojhelhatina bajarê Cizîrê bi şêweyeke hûnerî hatîye kişandin. Bi vê jî wesf bi piranî estetîkîya şûnê û zimanê hunerî û hostatî û jêhatîbûna romannivîs derdixê holê. Herwiha wesfê bi tenê erka xemilandin û ciwankarîyê daye binyata nivîsandinê, ji ber wê yekê wesf dikeve xaneya wesfa zarlêkirîya rawestî, ku bi temamî dema vegêrana bûyeran ragirtîye û tu alîyê pêşdeçûnê di binyata vegêranê da rû nedaye.

Di birgeke din ya wesfa zivistan û xweza û çîyayê Agirî da vegêr dibêje: *“Zivistaneke sar bû, berf ku sal donzde meh li serê Gilîdaxê xuya dibûn êdî Bazîd jî spî kiribû. Wî mêvanê spî di her malê de ciyê xwe xweş kiribû û karê xwe û mana çend mehan kiribû.*”²⁸⁰ Ev birga wesfê jî bi şêwaza wesfa rawestî ye. Dibe ku ji ber wê sedemê be romannivîs ji bo gavekê ew û xwendevan bêhna xwe vedin ev wesfa xistibe nav nivîsandinê û ji bo ajoyeke kurt ji xestîya bûyeran dûr bixe. Renge paşê xwendevan bi şêweyeke hûrgilîtir digel dûbare vegêrana pêvajoya bûyerên nav romanê berdewam bin.

Di birgeke din ya şûnê da di romana 3 Gav û 3 Darek da vegêr di wesfa ew rê ya alîyê çemê Mûrad û xweza û çîyayê Şerefeddîn da dibêje: *“Rêya ku zivistana bûhurî bibû qetek qeşa, êdî parçeyek ji buhiştê bû. Ew û Çemê Mûradê bi hevra dimeşîyan, berê wî li Perîxanê bû û berê çem jî li Paloyê. Her du jî bi eşq û evin û bêrîkirin û dilgermî diçûn. Wî da ku xwe bighîne bakurî çem, bere xwe da semta Darahênê, Solxanê, da ku di ser Pira Evdirehman Paşa ra derbas bibe. Piştî qonaxekê nêzikî li pirê kir, êdî bêjînga rojê, ardê zêrrîn li her du rexên Çemê Mûradê diweşand. Çemê çîyayê Şerefeddînê weke kumê feqeyekî ku di ava zêr de bû xuya dibû. Zivistanê ku weke berfînê spî li serê wî hiştibû û çûbû asoyê li semta Paloyê weke çavên Perîxanê sayî bû, tenê ewrekî piçûk hatibû jibîrkirin. Sibeheke zelal, ronîdar weke evîna wî bû.*”²⁸¹ Ev birga jî li alîyê wesfê ve diçe xaneya wesfa xemlîner. Çimkî romannivîs bergeha çûyîna Şêx Se’îd dişibîne herikandina ava çem û paşê jî bi rîya komê hevokên ciwan yên helbestî ve xwezaya çîyayê Şerefeddîn û

²⁷⁹ Jan Dost, *Mîrname*, r. 145.

²⁸⁰ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 25.

²⁸¹ Jan Dost, *3 Gav û 3 Darek*, r. 92-93.

qote wê û pêçana wê ya ji berfê wesf kirîye û paşê jî qotê çîyê dişibîne kumê feqeyekî. Ev jî diçe xaneya bikaranîna hunera rewanbêjî ku ev jî taybetmendîyeke wesfê bû di romanên zarlêkirî da. Herwiha ev birga wesfî bi şeweyeke yekser bandor li ser pêvajoya bûyeran nekirîye bi vê jî diçe xaneya wesfa rawestî.

3.4.2. Erka Raveyî

Ev erka gelek caran wek “erka wateyî” jî tê navkirin. Di vê erka wesfê da romannivîs bi rîya wesfa şûnê ve wêneyê rewşa jîyana karakteran di nav romanê da nîşan dide. Herwiha ew materyal û tiştên wek navgînekê bi destê karakteran dibin wek hêma û amajeyek ji bo wê ye ku wêneyê kesayetîya karakter li alîyê civakî, derûnî, siyasî, rewşenbîrî û aborî ve rontir bin. Wate erdnîgarîya şûnê dibe wek derîyekî ji bo çûna nav wate û nepenîyên karakter li hemû rûyî da. Bi vê jî xwendevan bi rîya van ve bi hêsanî li rewşa jîyana karakteran têdigên. Weke mînak: Di romana Kobanî da vegêr di wesfa ew xanîyê ku Amedê evîndarê Xedîce ji bo demekê li bajarê Hemdanîyê kirê kiribû da dibêje: *“Amedê ku li Helebê diploma xwe amade dikir, xanîyek li taxa Hemdanîyê bi kirê ji xwe ra girtibû. Ew bi tena xwe têda hêwirî. Di wê mala bîst deqeyan dûrî zanîngehê de ji bilî kitêban tiştek nebû. Hin kopîyên tabloyên navdar bi dîwarên reng çûyî yên salonê ve ku odeya xewê bû jî, daliqandî bûn. Maseyeke ku kaxez û qellem û xwelîdankek tim tijî boçikên cixareyan li ser bûn di quncikekî salonê de bû. Pencereyên bê perde û dolabeke saca cilan û qereyoleyeke biçûk li quncikekî dinê salonê hebû ku bi zîqezîqa xwe ‘eşîrek ‘aciz dikir. Kitêb li ‘erdê bûn. Di dolaba cilan da bûn, li metbexê bûn. Di hemamê de jî du sê heb hebûn di bin text de çend karton romanên îngilîzî û ‘erebî û kurdî hebûn. Hindik mabû bêhna kaxezan û murekeba çapxaneyan ku ji kitêban difirya zora bêhna cixarên vemirî bibire.”*²⁸² Bi rîya vê birga wesfî ve vegêr bi kunenişîna mijarî ve û bi alîyê wesfa rawestî da bi bikaranîna cînavka kesê sêyem, yan jî nedîyar ve. Bi şewazeke zarlêkirî da wesfa hundurê xanî û çawanîya jîyana Amed di xênî da dike. Paşê jî bi rêya materyalên nav ve perdeyê ji ser beşeke girîng ya jîyana wî hildimale. Bi taybêtî jî hebûna ev hemû pirtûkan li kuçe û gurîbûna wan di xênî da. Bi şeweyekî neyekser wek hêmayeke bihêz tê danîn. Ev jî têngîhiştinê li ‘hez û xeyalî û çavdêrîya karakter dike. Bi wê ku karakter dibe xwedî hizreke ronî û beredayîyê fêrbûn û zanîne bûye. Bi berdewamî bi vê rêyê ve têkoşan kirîye ji bo ku asta xwe ya

²⁸² Jan Dost, *Kobanî*, r. 115.

rewşenbîrî pêş bixe. Wate di vir da alîyê hundurê şûnê bi tenê zanyarî di derbarê materyalên navî da daye me. Dibe ku bi rîya van materyal ve balê dikşîne ser alîyekî girîng yê jîyana karakter û dixe ber çavan. Bi vê jî şûn di nîşandana hizr û çavdêrîya “Amed” ê karakter da dibe helgirê wateyeke felsefeyeke kûr.

Di romana Mîrname da jî Şengê di wesfa odeya xwe û Xoce Ellaqulî da dibêje: *“Wê şeve vegeriya hucreyê min ya ku bibû cihokek genî ji girêz (lîk) û xûn û avika nêraniya wî keftarê şêst salî. Cihokek ku barîna hêsirênmin û ava heft kanîyan jî nedişt wê gemarê bide alî.”*²⁸³ Di vir da Şengê bi kunenişîna xweyî ve wesfeke livdar ya odeya xwe pêşkeş kirîye, odeya xwe wek şûneke kirêt, pîs û rikî vegêrandîye vê jî wek wan gavên ku di vê odeyê da digel hevserê xwe derbas kirîye vedibêje ku paşê bi rîya vê wesfê ve di derbarê rewşa derûniya Şengê xwendevan dibin xwedî komek zanyarî.

3.4.3. Erka Xapînerî

Di vê erka wesfî da romannivîs bi şêweyeke hûrgilî ve girîngîyê dide erdnîgarîya şûnê û materyalên nav şûnê da. Bi wê armanca ku wêneyekî ketwarî yê şûnê di hizra xwendevanan da çê bike. Bi wê jî wesfa xwe ya şûnê pêşkeş dike. Nêziktirîn wêneyên ketwarî yê şûn in. Ev jî bi piranî di romanên realîstî da dihatin pejirandin, romannivîs di berhemên xwe da wek endazeya şûnê girîngîyeke berçav him dida alîyê derve û hem jî li alîyê navekî dida avahîya şûnê.

Weke mînak: Di wesfa Studyoya Nubar da Badîn dibêje: *“Studyoya Nubar di Qeyseryê de, li pişt meydana hesinkaran e qarmeyeka re, zingarî li sere. Bi tîpên farisî û ermenî êkasê wan hatiye kolan. Di camekê da fotoyekî pêşewa bi rîya xweya sivik xuya dikir.”*²⁸⁴ Di vê birgê da Badînê vegêr bi kunenişîna xweyî û bi rîya dîtina xwe ve bi awayekî wesfeke rawestî. Di bin bandora rêbaza realîzmî bi şêweyeke hûrgilî cihê erdnîgarîya studyoyê û paşê jî nivîsên li ser studyoyê û daliqandina wêneyê “Pêşewa” ji bo xwendevanan ron dike. Herwiha xwendevan di dema xwendinê da hest bi rastgoyî ya avahîya şûnê dike û bal û hizra wan bervî wêneyekî ketwarî ya heman şûnê ve radikêşe.

²⁸³ Jan Dost, *Mîrname*, r.48.

²⁸⁴ Jan Dost, *Mijabad*, r. 52.

Yan jî di wesfa baxçeyê Qazî da Badîn dibêje: *“Baxçeyê Qazî buhişteke, her cure darên bilind û mezin têde hene, tu dibêjî ew konekî koçeran yê herî mezine û li rex sablaxê vegirtine. Di van rojên dojahîn de keç û xort û pîr û ciwan berê xwe didin vê baxçeyî û di sîya darên wî de civatan digerin, pir kes tên li wê derê navroja xwe jî dixun, goşt dibrêjin û dûyê cixarên wan tevî dûyê komira vêketî dibe. Govendên piçûk jî yek caran tên gerandin û dengê def û tar û tembûran weke pêlên sablaxê diherrike. Hin kes tên xewa xwe ya piştî nîvro li ber bayê hênîk û xişte xiştî çuqilyên daran û xuşexuşa pêlên nermikên sablaxê dikan. Min bi xwe çend caran xewa xwe li wir kir. Lê pêşî û kurmikan nedihîştin ez têra xwe bibim.”*²⁸⁵ Di vê birgê da jî Badînê vegêr bi kunenişîna xweyî û bi alîyê wesfeke rawestî da. Bi rîya dîtina xwe ve materyal û şewaz û cûreyê darên nav baxçe û liv û serdana gel ya nav baxçe wesf kirîye. Bi vê jî romannivîs li ser zarê Badîn wêneyekî ketwarî yê şûnê dide ber destê me. Bi awayekî dema ku xwendevan vê birga wesfî dixwînin, yekser xeyalên wan tevî wêneyekî nêzikî ketwarîyê dibin.

Herwiha di romana Kobanî da vegêr yan jî romannivîs di wesfa mala Hecî Mislim Heme Zirav ya ku hilweşayî da dibêje: *“Mala wan hatibû xwarê, derîyê mezinê hesin wekî xwe mabû. Lê pişt wî li alîyê hundir mişt komên betonê bûn ku rêya derenceyan xetibandibûn. Di nav betona li ser derî re hesîreya qehweyî û bêc ku wê nû kirî bû, hîn mîna berê pêçayîbû lê nêvî ketibû navbera banê odeya jêrîn û jorîn, ew her du banên ku mîna qabên pirtûkekê hatibûn ser hev. Êdî serbanê ku hatî xwarê jî ji wan ve xuya bû, palgehên qehweyî, perdeyên salonê, doşega keça wê Zozanê, piskilêta Sîyamend, cilikên terişî, xalîya nava salonê û sifincên ku ji mêvanan re dadanîn di nav tozê de û di bin girikên çimento de mabûn. Ne ode mabûn, ne metbex, ne salon û ne jî balkon, dîwarekî ku mirov piştî xwe bidê nemabû, banekî ku mirov di bin de bihêwire nexuyabû.”*²⁸⁶ Di vê wesfa şûnê da jî vegêr bi bikaranîna cînavka kesê sêyem yê yekhejmar û bi kunenişîna mijarî ve wesfa malê bi şeweyeke hûrgilî û di rewşeke rûxîyayî da kişandîye. Herwiha ev parçeyê wesfê bi alîyê wesfeke ketwarî ye û romannivîs wêneyê rewşa cenga Kobanê û malwêranî gelemper wê û hilweşandina beşeke gelek ya xanî û avahîyên bajêr kirîye heyvanê serhildana şûnê. Di heman demê da jî hilweşandina xaniyên Kobanî bûyereke serekî

²⁸⁵ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 175.

²⁸⁶ Jan Dost, *Kobanî*, r. 387.

ya romanê ye û divê wek wesfa bûyerê jî em li binêrin. Çimkî erdnîgarîya şûnê bûyera kavilkirinê di xwe da digire. Herwiha wênekîşandina materyal û alîyê navekî yê malê jî ji bo wê armancê ye ku li ba xwendevanan hesta rastgoyî ketwarî di derbarê nivîsên romanê da çê bibe. Ev şêwaza pêşkeşkirina wesfa şûnê, şêwazeke zarlêkirî ye ku bi piranî ji alîyê romannivîsên bi ser rêbaza realîzmê ve dihate pejirandin.

Di dawîyê da bi hemû van dîtinan ve divê em bi çend xalên jêr da girîngtirîn taybetmendîyên wesf û erkên wesfa şûnê di romanên Jan Dost da têxine rû.

1- Romannivîs di warê binyata wesfa şûnê da wek berawirdî digel wesfa karakter, kêmtir xebat li ser wesfa şûnê kirîye. Dibe ku zêdetir bal kişandibe ser wesfa karakter. Bi vê jî wesfa şûnê nebûye sedema wê ku beşeke pir ya berfirehîya romanê di xwe da negirtîye.

2- Romannivîs di warê bikaranîna şûnê di nav romanên xwe da. Bi piranî di wênekêşana şûnê da peyrewa rêbaza romanên zarlêkirî kirîye. Çimkî wesfa şûnan bi şêwazeke xeyalkirina ketwara şûnane û ji alîyê xwendevana ve hest bi wan têkîrin.

3- Romannivîs di hinek mînakên şûnê da, wesfa ciwanîya xweza û sîmaya erdnîgarîya beşek ji bajarên kurda kirîye. Bi awayekî dema ku ev wesfana tîn ber çavên xwendevanan, yekser dibin nasberê cihên van bajarên kurda.

4- Bi şêweyekî giştî wesfa şûnê di romanên Jan Dost da zêdetir wesfa şûnên erdnîgarîya bajarên wek; Bazîd, Bedlîs, Mehabad, û Amêdî... ye. Herwiha bi şêweyeke taybetî jî wesfa şûnan ji; Xanî, hemam, odeya karakteran, rez, baxçe, çîya û xwezaya ciwan ya beşek ji bajaran pêk tê.

5- Parçeyên wesfa şûnê di nav romanên da bûne sedema wê ku dema vegêranê sist bikin yan jî rawestînin. Loma piranîya ev parçeyên wesfan bi alîyê wesfa rawestî derketine, tenê ji bilî çend mînakên diyarkirî, parçeyên wesfa şûnê digel rêrewa vegêranê berdewam bûne û wesfa livdar ya şûnê pêkanîne.

6- Materyalên wesfkirîyan di nav şûnê di her pênc romanên da bi radeyeke kêrîmend (alî) û pêkhatîyên derûnîya karakteran derxistîye holê, ji bilî çend

mînakên diyarkirî alîyê derûnî, civakî, aborî û rewşenbîrîya karakteran xistîye ber çavan.

3.5. Pêwendîya Di Navbera Wesf û Bûyerê Da

Roman cûreyeke wêjeyî ye û ji komê hêman û teknîken cûrbicûrê ser bi vegêranê ve pêkhatîye, bûyer jî wek yek ji ew hêmanên girîng û pêkhênerên serekî yên romanê erk û beşdarîyeke wê ya serekî di binyat danîna nivîskara romanê da heye û wek “movikên piştê ku heryek ji hêmanên dem û şûn û karakteran”²⁸⁷ tên jimartin. Ji ber vê yekê ne asane romannivîs bê bûyerê bikaribe nivîskareke romanê bîne holê. Ev jî ji ber girîngîya bûyerê ye ku wiha kirîye hemû hêmanên din yên romanê xwe di navenda bûyerê da bibînin û dibe ku bikaribin di bin ronahîya hêmana bûyerê da rol û erka xwe di nav nivîskara romanê da bilîzin.

Li ser girîngî û nirxa bûyerê wek hêmaneke romanê, Aristoteles yekem kese ku li alîyê hunerê ve di derbarê bûyerê da şîrove kiribe û gotîye: “bûyer zarlêkirina kirdareke giran û ji xwe ve temamî pêgihîştî ku dirêjayîyeke we ya diyar heye. Dikare tiştêkî temam be digel wê da jî dirêjîyeke wiha nebe. Tiştên temam ewin ku sereta, naverast û dawîya wan hebin.”²⁸⁸ Bi vê jî Aristoteles bûyer li ser binemaya xêzeke rast rêz kirîye ku ji xaleke dîyarkirî da destpê dike ku wek “sereta” nav lê kirîye, armanca wî ji sereta derketin û çêbûna bûyerên cûrbicûr in ku paşê jî serbenda bûyerê pêş dixin û hecmên wan mezintir dibin û ta ku digêjin wê xala ku naverastê yan jî jê ra dibêjin “girêçin”. Di vir da bilindtirîn ast û xala bûyerê tê tomarkirin, paşê jî divê bûyer bervî vekêşan, sistbûn û hilvegerînê ve biçe, ta ku digêje xala dawîyê û bi vê jî di derbarê naveroka bûyeran da xwendevan bi hêsanî agahî û zanyariyê bidest dixin. Bêguman divê ev rêzkirina bûyerê bi pê rêxistineke demî ve çavkanîya xwe ji bûyereke ketwarî wergirtibe, ku di vir da armanc nîşandana dema ketwarî yan jî dîroka bûyerê be. Çimkî xwezaya wan bûyerana di rastîyê da hene ku romannivîs bi şêwaz û rêxistineke yek li dû yek di nav nivîskara romanê da bikar tînin wek “Hevşêweya bûyereke dîrokî ye ku ji xaleke demî destpê kirîye û di xaleke demî ya diyarkirî da dawî li wan tînin.”²⁸⁹ Ev şêwaza peyrevkirina bûyerê beşeke berfireh ya

²⁸⁷ Rêzan 'Usman, *Binyatî Corekanî Rûdaw Le Romanî Kurdî Başûrî Kurdistan Da Sallî 1985- 1990*, Weşanxaneya Akademîya Kurdî, Çapa Yekem, 2010, Hewlêr, r. 15.

²⁸⁸ Aristotle, *Hunerî Şî'ir*, Wer.: 'Ezîz Gerdî, Weşanxaneya Nîma, Çapa Duyem, Silêmanî, 2011, r. 33.

²⁸⁹ 'Ednan Xalid, *el- Neqd el- Tetbîqî el- Te'hlîlî*, r.79.

nivîsên romanên zarlêkirî di xwe da digrin. Bi taybet romannivîsên realîst di bikaranîna hêmanên din yên serekî yên wek karakter, şûn û demê da jî danûsandineke rasteqîne digel hêmanan da kirine. Loma wesfên xwe li jê ronahîya binema û prensîbên vê rêbazê da pêşkeş kirine û wesfa bûyeran jî di xebata rê û rêçikên rêbaza xwe da bikaranîne.

Piştî ew guherkarîyên di seretaya (despêka) sedsala bîstan da bi ser cûreya romanê da hat, hêman û teknîkên romanê jî ketine bin bandora wan guherkarîyan û bûyer jî wek hêmaneke serekî li derveyî guherkarîyan nema. Bi vê jî ew çarçoveya klasîkî derket ku romannivîsên realîst danûsandin digel wan da fikir. Herwiha ji wê xêza rast ya Arîsto behs kiribû derbas bû, ku xwe di têkşikandina rêxistina sereta, naverast û dawîyê da dibîne. Di encama têkşikandina vê rêzbandîyê da, guherkarî bi ser dema bûyeran da jî hat û ji dema ketwarîya dîrokî dûr ketine û dema xeyalîya bûyerê cihê wan girtîye. Di vê alîyê dema bûyerê da di pêşkeşkirina wesfa beşên bûyerê da pêwîstî bi hunerkarî û jêhatîyeke pir ya romannivîs heye. Çimkî divê çawanîya rêxistin û pêşkeşkirina wesfa bûyeran di her araste û beşekê da bin, paşê “Pêwendîya wan bi dîtin û ramana nivîskar ve heye. Çimkî her nivîskar bi awayekî ew rêkdixistin û nirx û girîngîya rêxistina bûyeran jî di wir da derdiket ku şîyana romannivîs derdixe holê. Çimkî hinek car romannivîs rûbîrûyê şikandina nivîsandina romana xwe dibe û nikare romana xwe temam bike.”²⁹⁰ Loma dema romannivîs bûyeran werdigire bi gorî şîyana xwe ya hunerî guherkarîyan bi ser da tîne û di çarçoveya formeke hunerî da wan pêşkeş dike. Li alîyê din jî dema bûyeran li gorî wesfikirina bûyeran ve di nav romanê da derdikevin. Çimkî dibe ku hinek car romannivîs di wesfikirina bûyeran da ji derveyî wê ji beşa sereta ve dest bi vegêrana bûyerên xwe bike, dîsa dibe di xala dawî da dest bi pêvajoya vegêrana bûyerê bike. Paşê jî ji şûnên din yên romanê ve beşên din yên bûyerê wesf dike, hinek car jî “Divê di navbera ew rêzên bûyerê da bi alîyê paş û pêşkirin dirêjî pêdan û xest kirinê ve montaj bêtekirin.”²⁹¹ Loma gelek caran dema bûyerê berevajî dibe û li gor rêxistina deme gavê navêje. Çimkî bûyer “Bi şêweyekî demkî (dîtbarî) û bê rêxistina demê têne holê. Bi vê jî tenê di dawîya xwendinê da nebe, zincîra dema bûyeran çê

²⁹⁰ Atsushi Ashida, Tomoko Kojiri, *Plot – Creation Support With Plot – Construction Model- For Writing Novels*, Journal Information and Telecommunication, UK, 2018, r. 2.

²⁹¹ 'Ebdulla Serrac, *Donaydon Yan Bedgoran*, Weşanxaneya Silêmanî, Çapa Yekem, Silêmanî, 2013, r. 113.

nabe.”²⁹² Ev jî bandorê li ser demê çê dike û ji dema derveyî ya fîzîkî ve bervî dema derûnîya navekî dibe ku di romanên nû da bi berçavan dikevin. Loma di vê qonaxê da “Çîroknivîs û romannivîsan çavên xwe ji wan salên dûr û dirêj yên cîhana ketwarî ra girtin û berê xwe dan wan çîrokên dirêjîya wan tenê xulekek yan du xulek bûn. Dixwestin kêrê ji wan gavan werbigrin ku hemû bûyeran di çarçoveya demên retbûyî da kom dikin.”²⁹³ Ev tîrkirina demê û wesfkirin û pêşkeşkirina bûyeran di vê çarçoveya demî ya kurt da bandorê li ser xwendevanan çê dike ku awayekî astengî tê pêşîya wan bi taybetî jî di xwendin û têgehîştina xwe li hemberî beş û parçeyên bûyerê da. Loma bihevgerêdana beşên bûyerên romanê di romanên nû da ji bo xwendevanan karekî hêsan nîne.

Di nav romanên Jan Dost da komek wesfên cûrbicûr yên bûyerê bi dîtîna cuda ve hatine pêşkeşkirin ku heryek xwedîyê naverokeke cuda ne. Bi giştî bûyerên nav her pênc romanên wî ji bûyerên civakî, aborî, dîrokî, ramyarî (sîyasî), dînî, û evîndarîyê pêk hatine. Herwiha digel komek bûyerên taybet bi xweyî ya karakteran.

Loma divê em di vir da girîngtirîna wan bûyerana di çarçoveya çend xîşteyan da bi şeweyê amarî têxin rû.

3.5.1. Cûreyên Bûyerên Bi Dîtîna Cuda

2.5.1.1. Bûyer Bi Dîtîna Civakî

J	Navê Romanan	Naverok û Mijaren Bûyerê	Rûpel
1	Mijabad	Çîroka nîşanî ya Hamêst.	18
2	Mijabad	Çîroka kuştina dayika Jale.	66
3	Mijabad	Çîroka revandina keçeke Herkî ji alîyê Kerîmê Şikakî ve.	178
4	Mîrname	Çîroka bi zor dana Şengê.	44
5	Mîrname	Çîroka dînbûna Brahîmê Zîlanî ji hesreta negihîştina Meryemê.	68
6	Mîrname	Çîroka dizîna Xibrayê ji alîyê Buharî ve.	69
7	Mîrname	Serjêkirina dayika Yawuz ji alîyê bavê wî ve.	193

²⁹² Sîza Qasim, *Bîna el- Rîwaye*, r. 31.

²⁹³ Sîza Qasim, *b.n.r.*, 72.

8	Mîrname	Çîroka kuştina bavê Yawuz ji alîyê wî ve.	196 -197
9	3 Gav û 3 Darek	-----	-----
10	Martînê Bextewer	Çîroka bezerkirina Kewserê ji alîyê Petro ve.	165
11	Kobanî	Çîroka xwe şewitandina Zergê ya jina Hecî Mislim	86
12	Kobanî	Çîroka destdirêjkirina ser ‘Eysê ji alîyê Mamosta Ehmedê Erzaqan û paşê jî xistina wî ya girtîgehê.	357- 363

2.5.1.2. Bûyer Bi Dîtina Dînî

J	Navê Romanan	Naverok û Mijaren Bûyerê	Rûpel
1	Mijabad	Çîroka falvekirina li ser jîyana Badîn.	42
2	Mijabad	Çîroka du’akirin li ser gora mirovên qenc.	127
3	Mîrname	Çîroka bûyera avisbûna jinan bi nivîştan ji alîyê Şêx Seyfedînê cube şîn.	133
4	Mîrname	Çîroka bûyera mirina xortekî û çareserkirina kesekî din bi dîtina dînî ve di bin deste Şêx Seyfedîne cube şîn.	140
5	3 Gav û 3 Darek	-----	-----
6	Martînê Bextewer	Çîroka pevçûna du koman li ser mijara destnimêjê.	135
7	Martînê Bextewer	Çîroka ragihandina musulmanbûna Martîn.	175
8	Martînê Bextewer	Çîroka hêrişkirina ser hevalên Martîn ji ber ku ew ne musulman bûn.	216-217
9	Martînê Bextewer	Çîroka destbirîna Êsibê Kildiz.	233-234
10	Kobanî	-----	-----

2.5.1.3. Bûyer Bi Dîtina Pirsgirêkên Ramyarî û Dîrokî

J	Navê Romanan	Naverok û Mijaren Bûyerê	Rûpel
1	Mijabad	Birîndarbûna Şêx Mehmed.	49
2	Mijabad	Cenga di navbera artêşa Êris û Osmanîyan.	55
3	Mijabad	Ketina bajarê Koln û serketina Îngiliz û Êrisan.	110

4	Mijabad	Serketina pêşmergeyan li hemberî artêşa Îranê.	119
5	Mijabad	Kuştina 21 leşker farisan ji alîyê pêşmergeyan.	121
6	Mijabad	Kuştina Mehmûd Xefuryan ji ber sîxurîyê.	133
7	Mijabad	Zindanîbûna Badîn.	136
8	Mijabad	Hatina artêşa Îranê ji bo Mehabadê.	152
9	Mijabad	Cenga pêşmerge li Çîyayê Pêrs li hemberî artêşa Îraqê	153
10	Mijabad	Derketina Barzanî ji Kurdistanê.	171
11	Mîrname	Kuştina Dostoyê Mam û Şêrko bi destê 'ecemekî.	92
12	Mîrname	Komkujîya peyayên mezin yên Mukiryan.	93
13	Mîrname	Cenga di navbera Osmanî û Fillehan.	107
14	Mîrname	Cenga Osmanî û 'Eceman.	118
15	Mîrname	Kuştina Mîr Êzdîn bi destê birayê wî ve.	149
16	3 Gav û 3 Darek	Çîroka dadgehîkirin û darvekirina Şêx Se'îdê Kal.	26 û 193 û 196 û 197
17	3 Gav û 3 Darek	Çîroka Peymana Sewrê û çarenûsîya neteweya Kurd.	128
18	3 Gav û 3 Darek	Çîroka Peymana Lozanê.	136
19	Martînê Bextewer	Çîroka cenga Osmanîyan û fillehan û kuştina sadrazamê paşayê Osmanîyan.	26
20	Kobanî	Kuştina Haçimê kurê xalê Hecî Mislim.	44
21	Kobanî	Çîroka xwenîşandana li dijî rejîma Be'sê.	62
22	Kobanî	Girtina Lewend û hevalên wî .	66
23	Kobanî	Kuştina Amed ji ber beşdarbûna xwenîşandanê.	118
24	Kobanî	Çûyina pêşmergeyan ji bo bajarê Kobanî.	243
25	Kobanî	Serjêkirina Rewşenê ji alîyê kesekî DA'ÎŞÎ ve.	275

2.5.1.4. Çîrokên Bûyerên Taybet Yên Girîng

J	Navê Romanan	Naverok û Mijaren Bûyerê	Rûpel
1	Mijabad	Mirina dayika Mujde ji ber rabûna lehîyê ve.	88
2	Mijabad	Mirina malbat û zarokên Kerîmê Şîkakî ji ber bombebarankirina bajarê Seblaxê.	90

3	Mijabad	Çîroka gihîştina hevdu ya Mujde û Badîn.	214
4	Mijabad	Çîroka mirina Emîral Axa.	220
5	Mîrname	Çîroka gava veşartina Ehmedê Xanî.	18 û piranîya rûpelan
6	Mîrname	Çîroka korbûna ‘Emerê Xeznedar.	34
7	Mîrname	Çîroka dizîna xibraya Ehmedê Xanî.	69
8	Mîrname	Çîroka guhertina rûnê çirayê bi jehrê li odeya Xanî da.	88
9	Mîrname	Şewitana dest û tillîyên Xanî.	127
10	Mîrname	Çîroka mirina Xanî.	170
11	3 Gav û 3 Darek	Çîroka mirina Xidirê Botî li ser qeşaya Çemê Mûradê.	68-69
12	3 Gav û 3 Darek	Çîroka xewirandina Şêx Se’îd.	74-75
13	3 Gav û 3 Darek	Çîroka ketina bîra avê ya Perîxanê.	105
14	Martînê Bextewer	Çîroka mirina dayika Martîn.	15
15	Martînê Bextewer	Çîroka mirina Hans.	41
16	Martînê Bextewer	Jêkirina tilîya Gostav ji alîyê meymûnekî ve.	71
17	Martînê Bextewer	Çîroka dizîna lînûska (defter) Martîn.	116
18	Martînê Bextewer	Çîroka mirina Fernando.	197
19	Martînê Bextewer	Çîroka xwekuştina Yawuz.	205
20	Martînê Bextewer	Çîroka qefilandina Mela Zahir di nav berfê da.	210
21	Martînê Bextewer	Çîroka rizgarbûna Martîn ji destê mucahîdan.	251
22	Kobanî	Çîroka çaremîn jin anîna Hecî Mislim.	53
23	Kobanî	Markirina ‘Eysê li Hemeyê Hecî Mislim.	102

24	Kobanî	Çîroka geştkirina Xedîce û mêrê wê Îbrahîm û kurê wan Dara li welatên Ewropa û paşê jî xeniqîna Dara û Îbrahîm di nav deryayê da.	128
25	Kobanî	Çîroka hewldana xwekuştina Ziyad.	209
26	Kobanî	Çîroka kuştina Hecî Mislim û Zozan û birîndar bûna Sîyamend û dayika wî.	408

Wesfa bûyerê di nav romanên Jan Dost da bi şêweyekî giştî bi dîtina kunenişîna Navekî û kunenişîna Derekî ve hatine pêşkeşkirin.

3.5.2. Wesfa Bûyerê Bi Dîtina Kunenişîna Navekî

Ew cûreyê wesfê ne ku romannivîs li ser zarê karaktereke/î di nav romana xwe da û bi kunenişîna xweyî ya karakterên xwe ve pêşkeş dike. Bi vê jî karakter wek vegêrra/ê romanê ye û berdewamî wek karaktere/ê serekî erka vegêrana romanê dikeve stûyê wan.

Weke mînak: Di romana Martînê Bextewr da Martîn wek karakter û vegêrekî serekî yê romanê di wesfa bûyera kuştina hevalê xwe Alberto da bi vê şêweyê wesfê dike û dibêje: *“Ez hîn di wan xeyalan da bûm min dît ku ew qîrya û bi latînî bang kir; Werin meydanê! Hinekî ma û seha bersivê kir. Lê tenê dengê wî lê vegerya kes derneket. Rabû bi dengê hîn bihêztir û tûjtir û bi ‘erebî qîrya; ‘Heyya uxruc ya mucahid. Uxrucnî kuntum reculun. Min di wê kêlîkê da dikarîbû zîpîkên xwîdana ku li ser ferşê enîya Alberto dixewinîn bijmartana, ez nizanim di wê qirr û qeşayê da ew çî xwêdan bû pêketibû! Rûyê wî zer, lêvên wî ziwa û çavên wî zeq li berfê dinêrîn û diçirûsîn. Bendewarîya me dirêj nekir ji derîyê ku serê Ehmuyê gawir jê pekyabû ber lingen me zîqîniyek hat. Dengê zîqîniya çil mêrî bû ku ji ser qullpîka xwe rabû derî vebû. Mucahid bi wî gewdeyê xwe yê mîna gergedanekî bi zor di derî re derket. Bi derketina wî ya di derî re tîr derbasî dile min bû. Mucahid ew giremêrê çavkildayî û rûtirş ku şaşıkeke ji etllesê sorê hindî li serê xwe pêçabû û şûrekî caferîyê tazî di dest de bi pêş de hat got: -Kî ye vê sibê gora xwe dikole? Ez gora te dikolim, tu kî yî? navê xwe hilde. Ez Alberto Da Silva me, ji Venedîkê.”*²⁹⁴ Di vir da Martîn bi kunenişîna xweyî ya xwe ve û bi bikaranîna cînavka kesê yekem yê yekjimarê bêjer

²⁹⁴ Jan Dost, *Martînê Bextewer*, r. 239.

yê “ez” ve. Bi alîyê wesfa zarlêkirî da wesfa gava serhildana bûyerê ji me ra dike. Herwiha di pêşkeşkirina beşên bûyerê da bi şêwaza peyrevkirina sereta, naverast û dawîyê danûsandin digel bûyerê kirîye. Weke Mînak: Di beşa sereta ya bûyerê da hinek wesfa hûrgilî ya binyata laşê her du karakteran diyar dike û guherkarîyên li ser rûyê Alberto nîşan dide. Dema ku dibêje: *“Min di wê kêlîkê da dikarîbû zîpîkên xwîdana ku li ser ferşê enîya Alberto duxuyan bijmartana”* yan *“lêvên wî ziwa û çavên wî zeq li berfê dinêrîn û diçirûsîn”* herwiha di derbarê binyata laşê mucahid de Martîn bi vî haweyî wesf kirîye: *“Mucahid bi wî gewdeyê xwe yê mîna gergedanekî bi zor di derî re derket.”* Di vir da em dibînin ku Martînê vegêr bi kurtî wesfeke fîzîkî ya her du karakteran ji me ra dike, paşê jî di beşa naverast ya bûyerê da vegêr dema vegêrana bûyerê berdewam dike û dibêje:

*“Alberto wekî pezkovîyekî xwe da ser mucahid û piştî wî sparte derabzînê. Bêhemdî me dengen aferînan ji me yên mesîhî derketin û xan hejandin. Me got ha Alberto dê aniha şûr bide ser zengeloka vî hirçê han û me xilas bike, lê dîtina me dît mucahid dehfek bi kulma destê xwe da sînga Alberto û ew avête ‘erdê û mîna deveyekî hêçbûyî bi ser de çû. Vê carê dengê Allahu Ekber an bilind bû. Çavên me li wî dîmenî bû.”*²⁹⁵ Di vê beşê da bûyer pêşve diçe û bi rîya komek kirdar ve pêvajoya bûyerê berdewam bûye. Bi vê jî bi alîyê wesfa livdar da derdikeve lê paşê vegêr pêvajoya bûyeran sist dike û komek zanyarî di derbarê xwe û Alberto û helsûkeftên alîyê kesayetîya Alberto dixwe rû û dibêje: *“Alberto hevalekî minî salan bû, dostekî qenc û sozdar û alîgir bû, hemrazê min bû ew û di wan neh salan da min kesekî mîna wî comerd û dilrast nas nekiribû...hwd.”*²⁹⁶ Martînê vegêr ev birga wesfê xistîye nav beşa bûyerê, ku ev jî bûye sedema wê ku pêvajoya bûyeran gaveke kurt raweste û dema xwendina romanê jî dirêj bibe, li alîyekî din jî li piştî vê wesfê Martîn dest ji vegêrana bûyeran ber dide û dibe ku bi rîya xwebêjîyê (monolog) ve bi xwe ra diaxive rexneyê derketina pevçûnekê dike ku li binemaya bîrdozîyê ye wek dibêje: *“Ji bo çi? Ji ber ku yekî rastîya yê din nedipejirand. Heryekî ji wan digot ez rastim. Heryekî ji wan xwe nêziktirî Xwedê didît. Xwe paktir didît û yê li pêşberî xwe netîşteke didît û loma jî dixwest wî tune bike”*²⁹⁷ Li dû vîya vegêr dûbare vedigere ser

²⁹⁵ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 240-241.

²⁹⁶ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 241.

²⁹⁷ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 241.

vegêrana bûyerê û beşa dawîya bûyerê di hevokekê da wesf dike û dibêje: *“Alberto hate kuştin... Çawa? Ne girînge. Hate kuştin û hew”*²⁹⁸ beşa dawîyê ya bûyerê bi şêweyekî huneryane hatîye wesfîkirin. Çimkî romannivîs ji dêla wê bi şêweyekî hûrgilî wesfa bûyerê bike. Belkî bi hevokeke kurt ve dawîyeke veşartî daye bûyerê.

Herwiha di romana Mijabad da Badînê karakterê serekî yê romanê di wesfa bûyera girtin û zindanîkirina xwe da dibêje: *“Ji nişkêve, nizamî ji ku hêzeka îraqî û îngilîzî kete pêşîya min, lûleyên neh malnişeran ez dorpêç kirim û ez ji desthilanînê ketim. Destê xwe bilind ke û raweste, tu bilivî, em te dikujin! Weke mişkê ku pisîkekê li ser serê xwe bibîne ez rawestyam, du serbazên reşîk berbî min ve hatin û bi çepilên min girtin û kelepçe kirin, sarbûna kelepçeyê li ser destê min evîna Jaleyê anî bîra min. Tu casûsê Almanya yî!?...hwd.”*²⁹⁹ Di vir da Badînê vegêrê bûyerê gava destpêk û derketina bûyerê bi kunenişîna xwe û bikaranîna cînavka kesê yekem “ez” ve pêşkeş dike, herwiha di beşa din ya bûyerê da vegêr dibêje: *“Kêfa wan serbazan bi neçîreke weke min re gelekî hat, wan bi rastî bawer dikir ku ez casûsim. Destgîrêdayî ez avêtim jîpeka leşkerî ku li wê nêzikê û berê min dane zîndanê.”*³⁰⁰ Bi heman şêweyê vegêr ji bo pêşkeşkirina wesfê kunenişîna navekî bikaranîye. Herwiha di vegêrana bûyerê da bi rîya kirdarên *“avêtim û berê min dane zîndanê”* da dema vegêranê bervî pêş çûye. Loma bûyer di alîyê wesfa livdar da derketîye.

Di vê xişteya jêr da em girîngtirîn ew bûyerên ku di kunenişîna navekî ya karakteran ve di her pênc roman da hatine pêşkeşkirin dixine rû.

J	Navê Romanê	Bûyera Wesfîkirî	Dema Wesfê Niha, raborî	W.Livdar /Rawestî	Rûpel
1	Mijabad	Bûyera derketina Jale ji Silêmanîyê	Ji nihaya vegêranê	Livdar	69
2	Mijabad	Mirina jin û her du zarokên Kerîmê Şîkakî	Piştî rûdanê	Livdar	90
3	Mijabad	Evîndarîya Badîn li hemberî Mujde	Ji nihaya vegêranê	Livdar	111-112

²⁹⁸ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 241.

²⁹⁹ Jan Dost, *Mijabad*, r. 136.

³⁰⁰ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 136.

4	Mijabad	Kuştina 21 leşkerên Şahê Îranê	Ji nihaya vegêranê	Livdar	121
5	Mijabad	Du'a kirina Mujde li ser gora mirovên qenc	Piştî rûdanê	Livdar	127
6	Mijabad	Girtin ûzindanîkirina Badîn	Ji nihaya vegêranê	Livdar	136
7	Mijabad	Azadkirina Badîn ji zindanê	Ji nihaya vegêranê	Livdar	146
8	Mijabad	Cenga di navbera Pêşmerge û artêşa Îraqê	Piştî rûdanê	Livdar	153
9	Mijabad	Derketina Barzanî ji Kurdistanê	Tevlîhevê nihaya vegêranê	Livdar	171
10	Mîrname	Korbûna 'Emerê Xiznedar	Piştî rûdanê	Livdar	34-35
11	Mîrname	Bi zorê dana Şengê	Piştî rûdanê	Livdar	44- 45
12	Mîrname	Dizîna xibraya (Xema) Ehmedê Xanî	Ji nihaya vegêranê	Livdar	69
13	Mîrname	Kuştina 'Ewllayê Merîwanî	Ji nihaya vegêranê	Livdar	120
14	Mîrname	Kuştina bavê Yawuz ji alîyê wî ve	Ji nihaya vegêranê	Livdar	196 -197
15	3 Gav û 3 Darek	-----	-----	-----	-----
16	Martînê Bextewer	Talankirina kelûpelên Martîn	Ji nihaya vegêranê	Livdar	62- 63
17	Martînê Bextewer	Qurtkirina tillîya Gustav	Ji nihaya vegêranê	Livdar	71
18	Martînê Bextewer	Dagîrkirina gundekî û kolekirina malbatekê	Tevlîhevê nihaya vegêranê	Livdar	77
19	Martînê	Zîyan lêketina barê	Ji nihaya	Livdar	82

	Bextewer	Alberto	vegêranê		
20	Martînê Bextewer	Dizîna lênûska Martîn	Ji nihaya vegêranê	Livdar	116
21	Martînê Bextewer	Pevçûna du koman digel hev	Tevlîhevê nihaya vegêranê	Livdar	135
22	Martînê Bextewer	Bezekirina Kewserê ji alîyê Peterê Venedikî ve	Piştî rûdanê	Livdar	166
23	Martînê Bextewer	Musilmanbûna Martîn	Ji nihaya vegêranê	Livdar	175-176
24	Martînê Bextewer	Pevçûna di navbera Ehmo û mucahîdekî	Ji nihaya vegêranê	Livdar	226
25	Martînê Bextewer	Destberrîna Êsibê Kildiz	Ji nihaya vegêranê	Livdar/ rawestî	233
26	Martînê Bextewer	Kuştina Alberto ji bi destê mucahîdekî ve	Tevlîhevê nihaya vegêranê	Livdar	239-241
27	Martînê Bextewer	Rizgarbûna Martîn ji xanîyê Bazîdê	Ji nihaya vegêranê	Livdar	251
28	Kobanî	Kuştina Amed li qada xwenîşanderan	Piştî rûdanê	Livdar	118-119
29	Kobanî	Xeniqîna Dara û Îbrahîm di nav deryayê da	Tevlîhevê nihaya vegêranê	Livdar	128-134

3.5.3.Wesfa Bûyerê Bi Dîtina Kunenişîna Derveyî

Ev wesfana bi rîya vegêra/ê tene pêşkeşkirin, hinek car ew vegêr karaktere/e serekî yê romanê ye û bi rîya cînavka “ew” ya kesa/ê sêyem ya/yê yekjimar ve bûyerê vedibêje, lê cudahiya van kunenişînan ji kunenişîna xweyî ewe ku di vir da karakterên vegêr yekser beşdarî wan bûyerên bi ser karakteran da tê nabe. Bi rîya bihîstin û dîtîne ve çî bi serê karakteran da hatibe vedibêje. Bi vê jî gelek caran divê vegêr hemû tiştan be, ji bilî wê rewşê ku dema nivîskar vegêreke/î nediyar

hildibejêre ku ji dengên karakterên nav romanê dûrin û bi bikaranîna cînavka kesa/kesê sêyem ya/yê yekjimar “ew” da wesfa bûyeran pêşkeş dike. Bi vê jî vegêr di piranîya demê da wek vegêra/vegêrê hemû tiştzan derdikeve.

Di nav romanên Jan Dost da beşek wesfên bûyeran li ser zarê karakterên nav romanê da bi bikaranîna cînavka “ew” ya kesa/kesê sêyem ya/yê yekjimar ve hatine pêşkeşkirin, ku karakterên vegêr her çi bi ber çavên wan ketibin yan jî ji aliyê karakterên din ve ji wan re hatibe behskirin ji xwendevanan re vedibêjin. Weke mînak: Di romana Mijabad da Jale wek dengê vegêra romanê di wesfa birîndarbûna Şêx Mehmûd da dibêje: *“Ev berdî qahremane, Şêx Mehmûd li ber wî birîndar bû. Dibêjin sê cixare ji titûna Koyê li dû hev kişandin ji ber jana birînê, lê cengawerekî jî axîna wî nebihîst.”*³⁰¹ Di vir da Jaleya vegêr bi dîtina kunenişîna derveyî ve û bi rîya bihîstinê ve bûyera birîndarbûna Şêx Mehmûd ji Badîn ra vedibêje. Bi taybetî jî dema bi rêya peyva “dibêjin” derbirînên xwe dixêrê. Ev jî têgihîstinê li wê dike ku vegêr tenê erka gihandina naveroka bûyerê dixêrê stuyê xwe. Bi vê jî wek vegêreke hemû tiştzan derdikeve û di heman demê da wesfa bûyerê bi aliyê wesfeke nû hatiye pêşkeşkirin. Di vir da vegêr kurteyek di derbarê kesayetî û xuyanîya Şêx da nexistîye rû. Bi çend rêzên kurt ve dest bi vegêrana bûyerê kirîye û naveroka bûyerê ji xwendevanan re veguhestîye, li aliyekî din jî wesf nebûye sedema rawestana dema bûyeran. Dibe ku wek beşeke serekî li bere û pêşvebirina dema vegêranê da rol lîstîye. Bi vê jî bi aliyê wesfa livdar derketîye.

Herwiha di romana 3 Gav û 3 Darek da romannivîs bi dîtina vegêra/vegêrê hemû tiştzan ve û bi bikaranîna cînavka “wê/wî” yê kesa/kesê sêyemê yekjimar ve bûyerên romanê pêşkeş dike, kewate vegêrên nediyar yên romanê, karakterên beşdarbûyî yên nav romanê nînin, ta ku di encama destdanî û danûsandin digel karakterên din da bûyeran araste bike. Dibe ku li derveyî romanê vegêrana xwe pêşkeş dike. Weke mînak dema Perîxana evîndara Şêx Se’îd dikeve hundurê bîrê vegêr bi vî cureyî wesfa bûyerê ji me ra dike û dibêje: *“Ji nişkave Se’îd bala xwe dayê ku dewl di bin giranîya avê da şemîtî bîrê. Perîxanê destê xwe yê çepê avête şerîte da ku ew bêtir neçe xwarê. Dewlê zora wê bir û bi xwe ra daxiste jêr. Weke yekê ku felç û pûç bûbe, wî li dîmen dinêrî, ji çavên xwe bawer nedikir, weke*

³⁰¹ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 49

xewnekê bû, her tişt bilez qewimî lê qîrrîna Perîxanê hişê wî anî serê wî û berbî bîrêve bazda.”³⁰² Di vir da vegêr bi dîtina kunenişîna derveyî û bi bikaranîna cînavkên “wê/wî” ve bûyerê pêşkeş dike. Herwiha em hest bi jîrîya vegêr dikin ku li ser tevgerên Perîxan û Şêx Se’îd hemû zanyarîyan vedibêje, lê vegêr bi tu şêweyî xwe beşdarî pêvajoya bûyeran nake, tenê erka vegêranê dilîze. Herwiha ev bûyera bûye sedema wê ku pêvajoya vegêrana romanê bervîpêş biçe. Bi taybetî jî bi rîya komek kirdarên wek “*şemitî bîrê, destê xwe yê çepê avête şerîte, berbî bîrê ve bazda*” ev hemû bûne sedem ku wesfa bûyerê bi alîyê wesfa livdar derkeve. Herwiha vegêr di vegêrana bûyerê da berdewam dibe û dibêje: “*Dengê wê, zinarên bêdengîya wê, kelkela nîvroyê qelişandin, dîwarê dilê wî jî qelişîn. Dîtina ku wî dît, ew li ber kevîyê bîrê rawestîyaye û bang li Perîxanê dike çelpeçelpa ku piştî gurmînîyê ji binê bîrê dihat nîşana saxbûna wê bû. Se’îd ji destihilanîn ketibû wî nema zanîbû çi bike. Bêhemdê xwe helkişîya ser kevîya bîrê û kire hawar, gazî li mirîdan kir û hat ku bi xwe dakeve binê bîrê. Lê mirîdên ku bi hawara wî ve hatibûn bi çepilên wî girtin û gotin tu dakeve ezbenî, tu dakeve!*”³⁰³ Di berdewamîya vegêranê da jî em dibînin vegêr bi heman şêweya destpêka bûyerê bi rîya cînavkên “wê/wî” û “ew” da pêvajoya wesfkirina xwe berdewam dike. Ev berdewambûna jî bi piranî xwe di wesfkirina kirdarên karakteran da dibîne. Paşê vegêr çend gavan dest ji vegêrana bûyeran dikêşîne, ta ku dawîyê bi rîya qetkirina bûyerê da beşa talî û ayîndeya jîyana Perîxanê ji xwendevanan ra ron dike û dibêje: “*Dema ku wê nîvroya dogehîn, mirîd û qerwaş û cîran bi gazîya wî ve hatin, ew hîn li ser kevîya bîrê bû û weke dînan bi du lêvên xwe yên ziwa bang dikir: -Hîn saxe hîn saxe! Du mirîdên bi herdu milên wî girtin û gotin: -Ezbenî tu were jêr, em dê dakevin bîrê. Ew ber bi jêr ve kişandin, mirîdekî ji herduyan, sola xwe ji pê kir û bi banga: -Ya Şahê Neqşebend! re. Dakete bîrê. Piştî demekê, mirîd gîha binê bîrê, Perîxanê bi şerîte ve girêda û bang kir: -Bilezînin hîn ruh têda heye û bû zîqe zîqa şerîte li ser bekereya hesinî, çavên wî her li devê bîra bi mirîdan dorpêçkirî bû û gewdeyê Perîxanî xuya bû. Dema mirîdan ew li rexê bîrê danîn, çavên xwe yên şîn û xwîn bi ser wan da herrikî bû. Bi zor vekirin û li wê nihêrî û bi dengê melul got:- Ezbenî ma te av vexwar?! û serê wê bi rexekî bû.*”³⁰⁴ Di vir da jî vegêr bi rîya helsûkefta dersiruştîya Şêx Se’îd xwe ve rewşa

³⁰² Jan Dost, 3Gav û 3Darek, r. 105

³⁰³ Jan Dost, b.n.b., r. 105

³⁰⁴ Jan Dost, b.n.b., r. 110

derûnîya Şêx Se'îd ji xwendevanan ra eşkere dike. Ev jî bi rîya hevokeke wek *"Weke dînan bi du lêvên xwe yên ziwa bang dikir."* Di heman demê da wesfa kirdarên wek *"Wî girtin, dakete bîrê ve girêda, bilezînin"* bûne sedemeke girîng ku vegêrana bûyeran berdewam bibe.

Romannivîs di romana Kobanî da li pêşkeşkirina wesfa bûyeran da bi berevajîya romanên Mijabad, Martînê Bextewer û Mîrname, danûsandin digel bûyeran û bikaranîna vebêjan û dengên romanê û çawanî bikaranîna kunenişîna romanê kirîye. Bi wateyeke din di romana Kobanî da vegêrên romanê bi şeweyeke giştî bi alîyê vegêrên hemû tiştzane, her çiqas di hinek beşên nav romanê da karakterekî bi navê Jan têda heye ew jî nivîskarê romanê bi xwe ye û li jêr navê Jan ê karakter da beşek ew bûyerên bi ser Kobanî da tên bi kunenişîna xweyî xwe ve vedibêje. Lê ew bûyerên ku ew vedibêje bandora yekser li ser karakter û bûyera serekî ya romanê nake. Loma ew beşa ku pêwendî bi xweyî ya jîyan û ayîndeya malbata Hecî Mislimê Heme Zirav ve heye, wek karakterên serekî yên nav romanê bi dîtina vegêrên nedîyar yên hemû tiştzan ve tene vêgêrran. Weke mînak: Di wesfa bûyera girtina Lewendê Hecî Mislimê Heme Zirav û hevalên wî da vegêr dibêje: *"Wan ji xwe re behsa xwenîşandanan û nelihevkinên partîyan û ciwanan û nakokîyên hevrêzîyan dikirin gava ku dîtin cîpek bilez hat, rê li wan girt û rawestiya. Her çar derîyên cîpê bi hevra vebûn û çar endamên îstîxbarata leşkerî jê daketin, berê keleşnikofên xwe dane sînga wan û bi peyva 'weqqîf' (raweste) re hemû rawestiyan."*³⁰⁵ Di vir da vegêr bi kunenişîna hemû tiştzan ve û bi bikaranîna cînavka "wan" ya kesên sêyem yên pirjimar ve wesfa destpêk û seretayîya bûyerê kirîye. Herwiha kirdarên di nav bûyerê wiha li xwezaya bûyerê kirîye ku dema bûyerê bervî pêş bibe. Herwiha vegêr di berdewamîya wesfkirina bûyerê da dibêje: *"Pêşî Lewend û Star û hevalên din, du şev li bajarê Minbicê di hepsa îstîxbarata leşkerî da derbas kirin. Du şevên ji lêdan bergerê... Geh li wan didan geh nav di wan dida. Geh bi daran li bine lingên wan dixistin û geh jî digotin wan- Xortno hûn kurdin ma çi yê we û wanên din! Çi yê we xelkê Der'a û 'Humus û 'Hemayê? Doza we ji wan cuda ye, guh li wan û sloganên wan nekin... Nekevin şopa wan... hwd."*³⁰⁶ Di vî parçeyî da jî wesf li ser zarê vegêrê hemû tiştzan ve berdewame û bi rîya kirdara karakteran ve

³⁰⁵ Jan Dost, *Kobanî*, r. 66

³⁰⁶ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 66

ketîye rû. Di heman demê da kirdar bûne sedema wê ku dema vegêrana romanê berdewam be.

Di beşa dawî ya bûyerê da vegêr dibêje: *“Lewend ji lêdana zêde û kêr xwarin û kêr xewîyê bibû weke darikekî. Gava piştî sê mehan bi tena tîşoretî gewr (spî) yê rizyayî û pantolonekî fire ku her carê jê dişemitî vegeriya malê. Rewşenê, ku ya pêşî bû derî jê ra vekir, gotê: -Tu kî yî? Çi dixwazî? Wî bi kêf got:- Rewşen te ez nasnekirim! Lê ez Lewend im Lewend!”*³⁰⁷ Di vir da jî vegêrên mijarî li ser vegêrana bûyerê da zal e (serdest), lê di vî parçeyî da vegêr wesfa xwe bi rîya dîmenê derekî û ew guherkarîyên laşî yên ku di encama kelepçekirinê da rûbirûyê Lewendê karakter bûye pêşkeş dike. Bi vê jî bûyerê pêşî wesfa kirdara karakteran nîşan daye û paşê jî bandora ku zindanê li ser Lewend kirîye bi rîya dîmenên fîzîkî ve nîşan dide.

Di vê xişteya jêr da em girîngtirîn ew bûyerên ku di kunenişîna derveyî ya karakteran ve di her pênc romanên da hatine pêşkeşkirin dixine rû.

J	Navê Romanê	Bûyera Wesfîkirî	Dema Wesfê Niha, Raborî	W.Livdar / Rawestî	Rûpel
1	Mijabad	Birîndarbûna Şêx Mehmûd	Piştî Rûdanê	Livdar	49
2	Mijabad	Cenga di navbera Artêşa Ûris û Osmanîyan	Ji nihaya vegêranê	Livdar	55
3	Mijabad	Bûyera kuştina Hadile Xanim	Ji nihaya vegêranê	Livdar	66
4	Mijabad	Mirina Heme Resûl	Piştî rûdanê	Livdar	107
5	Mijabad	Mirina Amîral Axa	Piştî rûdanê	Livdar	220
6	Mîrname	Gava veşartina Ehmedê Xanî	Ji nihaya vegêranê	Livdar	18
7	Mîrname	Kuştina Dostoy û Şêrko bi destê ‘ecemekî	Piştî rûdanê	Livdar	92
8	Mîrname	Çîroka çareserkirina zarokekî lal	Piştî rûdanê	Livdar	140

³⁰⁷ Jan Dost, *b.n.b.*, r. 66.

9	3 Gav û 3 Darek	Gava darvekirina Şêx Se'îd	Ji nihaya vegêranê	Livdar	26-27
10	3 Gav û 3 Darek	Qefilîna Xidirê Botî di Çemê Mûradê da	Piştî rûdanê	Livdar	68-69
11	3 Gav û 3 Darek	Ketina Perîxanê nav bîrê	Ji nihaya vegêranê	Livdar	105
12	3 Gav û 3 Darek	Çîroka mirina Êsif Zîyad Beg û Xalid Beg	Ji nihaya vegêranê	Livdar	185
13	Martînê Bextewer	Mirina dayika Martîn	Piştî rûdanê	Livdar	14-15
14	Martînê Bextewer	Mirina Hans	Piştî rûdanê	Livdar	41
15	Martînê Bextewer	Rizgarbûna Hewa ji destê Yenîçerîyekî Osmanî	Piştî rûdanê	Livdar	154
16	Kobanî	Reva Heme Zirav	Ji nihaya vegêranê	Livdar	28
17	Kobanî	Gava mirina Heme Zirav	Piştî rûdanê	Livdar	39
18	Kobanî	Xwenîşandana Gelê Kobanê li dijî rejîmê	Piştî rûdanê	Livdar	62
19	Kobanî	Xwe şewitandina Zergê ya jina Hecî Mislim	Piştî rûdanê	Livdar	86
20	Kobanî	Çîroka serjêkirina Baran	Ji nihaya vegêranê	Livdar	197
21	Kobanî	Çûyina pêşmergeyan ji bo bajarê Kobanî	Ji nihaya vegêranê	Livdar	243-244
22	Kobanî	Xwe teqandina Arîn di nav DA'Îşîyan	Piştî rûdanê	Livdar	259
23	Kobanî	Ketina seqîfa xanîyê Heme Zirav	Ji nihaya Vegêranê	Livdar	323
24	Kobanî	Zindanîkrina Ehmed Erzaq	Piştî rûdanê	Livdar	363

Bi van dîtinan em dikarin girîngtirîn sîma û taybetmendîyên wesf û bûyerê di nav romanên di van xalên jêr da ron bikin.

1- Pêvajoya pêşkeşkirina wesfa bûyeran bi şêweyekî giştî alîkarin ji bo wesfa bûyeran tevî wêneyê vegêranê bibin, bûyer jî diçine xaneya wesfa livdar, ku bi rîya hêlûkeft û kirdarên karakteran ve ketine rû. Herwiha romannivîs bi awayekî jêhatî ve beşek ji bûyeran bi dema nihaya vegêranê ve girêdaye. Bi vê jî hesta biserdarî û raborîya bûyeran kêmîr bi ser wesfa bûyeran da dîyare.

2- Vegêr di wesfêkirina karakterên beşdarbûyî yê nav romanên da, tenê ji bilî hinek wesfa bûyerên romana Mijabad û Martînê Bextewer da. Bi piranî alîyê kirdar û tevgerên karakterên nav bûyeran nîşan dide. Herwiha ev kirdar û tevgera karakteran bandorê li ser rewşa derûnîya karakteran çê dike. Bi vê jî wek wesfêkirinê derûnî xwe rê didin.

3- Her çiqas gelek bûyerên cûr bi cûr di nav her pênc romanên da xuya dibin, lê piranîya wan bûyeran dikevin xaneya bûyerên taybet bi karakteran ve beşeke din jî bi piranî bûyerên dîrokî û ramyarî di xwe da digrin.

4- Wesf li alîyê pêşkeşkirina beşên bûyeran da, ta radeyeke berfireh di alîyê wesfê zarlêkirî da hatine pêşkeşkirin. Wate romannivîs girêdayî rêzbandîya beşa sereta, navîn û dawî yê bû, lê tenê di çend mînakên da ev rêzbandîya têkşikandîye. Weke mînak: Di romana Mîrname û 3 Gav û 3 Darek da di bûyerê “Gava binaxkirina Ehmedê Xanî” û herwiha di bûyerê “ Bidarvekirina Şêx Se’îdê Pîran” da di beşa dawî da dest bi wesfê kirîye, paşê vegerîyaye ser beşên din.

5- Bi şêweyekî giştî arasteya wesfan di nav romanên da li alîyê kunenişînê ve dibin du cur:

1-Kunenişîna (Goşenêrîna) Navekî: Di vir da romannivîs li ser zarê karaktereke/î nav romanê ji kunenişîna xweyî ya karakter ve pêşkeş dike. Wek di romanên Mijabad, Martînê Bextewer û Mîrname da vê cûreyê kunenişînê bi awayekî serdest wesfa bûyeran kirîye. Bi vê jî dengê vebêja/ê nedîyar yê hemû tiştan di nav wan romanên da bi awayekî kêm tê bihîstin.

2- Kunenişîna (Goşenêrîna) Derveyî: Di vir da dengê vebêja/ê nediyarê romanê bi ser dengê karakteran da zal e. Bi vê jî wesfa bûyeran dikeve sitûyê vebêja/ê hemû tiştzan, wek wesfa bûyerên romana 3 Gav û 3 Darek û romana Kobanî da bi vê şêweyê hatine vegêran.

6- Di wesfa bûyeran da bi şêweyekî giştî dirêjgotin têda tune. Divê em bibêjin ji bilî çend mînakên, piranîya beşa bûyeran di navbera 8 û 16 rêz da ne, ku wesf bi piranî heta 30 rêzî dajon. Weke mînak di wesfa bûyera “Xeniqîna Dara û Îbrahîm di nav derya” da nêzikî 6 rûpel û nîv di xwe da girtîye, ku ji rûpela 128 destpêdike û heta rûpela 134 dawî lê tê, yan jî di wesfa bûyera “ Kuştina Alberto bi destê mucahîdekî” da di romana Martînê Bextewer da nêzikî 3 rûpel di xwe da girtîye.

7- Romannivîs di derbarê wesfa bûyeran li alîyê binyata zimanewanî, wate û armancê da, heta radeyeke berfireh xwe ji bikaranîna zimanekî deverî, aloz û hûrgilî dûr xistîye, tenê di romana Kobanî da ku di pêşekîya romanê da romannivîs dibêje: “Zimanê devera Kobanî ji bo nivîsandina vê romanê bikar hatîye. Bi vê jî bandora zimanê wê deverê li ser wesfa bûyeran da dîyar e, lê di hemû romanên din da romannivîs hewlê dide zimanekî yekgirtî bikar bîne. Bi vê jî xwendevan dikarin bi hêsanî ji peyama û armancên romannivîs têbigên.

ENCAM

Li piştî şîroveyeke berfireh ya naverok û bagrawind û kurtasîya romanên, Herwiha nîşandana hunera wesfê li alîyê teorîyê ve, paşê jî di encama destnîşankirina wesfa karakter, şûn û bûyerên di nav romanên Jan Dost da, em gihîştin evan encamên jêr ê.

Romanên Jan Dost wek fikra netewî, evîna welat, dîroka kurdan gelek mijar di nav xwe da dihevînin. Ji ber wê jî em dikarin bêjin dîroka kurdan bandora li ser ramana romannivîs çêkirîye.

Baştirîn mînakên nîşandana pêwendîya di navbera wesf û vegêranê û tevlîbûna wesfê bi vegêranê di nav romanên da bi wan birgên wesfê da dîyar dibin ku tevlî liv (tevger) û kirdarê karakteran bûne. Anko wesfa livdar û beşek jî ji wesfa xweyî baştirîn mînakên nîşandana vê tevlîhevîyê ne. Di romanên Jan Dost da gelek girîngî hatine dayîna wesfê. Bi taybetî jî wesfa karakter û li hemberî vê yekê jî kêmtir bal kişandîye ser wesfa şûnê. Bi vê jî şûn nebûye sedema wê ku beşeke pir ya berfirehiya romanê di xwe da bigre. Herwiha ev girîngîdana bi wesfa karakter ji romaneke bo romaneke din cuda ye. Weke mînak bilindtirîn rêjeya bikaranîna wesfa karakter di romana Mijabad da bi ber çavan dikeve, ku bi piranî bi alîyê wesfa zarlêkirî da hatine pêşkeşkirin.

Wesfa karakter piranî bi alîyê wesfa mijarî û rawestî da ne. Loma em dibînin romannivîs helsûkeft, bîrûbawerî, reftar û kirdarên karakteran xistîye ber çawan û bi vê jî wesfa mijarî pêkanîye. Di heman demê da jî bi kêr wergirtin ji sîma, xuyanî, kinc û binyata laşê karakteran ve xwestîye pirtirîn wesfa rawestî bê beşdarîkirin û xeyalkirina xwendevanan pêşkeş bike.

Beşeke pir ya wesfên derûnîyên karakteran, wesfa derveyî ne, ku bi rîya hestên wek “hêrsbûn, pêkenîn, girîn, çilmisîn, xwegirtin û xemxwerî” ya karakteran ve hatine nîşandan. Lê bele beşeke din ya wesfên derûnîyên karakteran bi rîya helsûkeft, liv û reftarên xerîb yê karakteran ve hatine nîşandan.

Pêvajoya wesfîkirina hêmanên karakter û şûn û bûyeran bi alîyê kunenişînan ve û di her du arasteyên kunenişîna navekî û kunenişîna derekî da hatine pêşkeşkirin. Wek romanên Mijabad û Martînê Bextewer ketine bin bandora kunenişîna navekî, lê

romanên wek 3 Gav û 3 Darek û Kobanî jî ketine bin bandora kunenişîna derekî ku dengê vegêrên nediyar zal e bi ser wesfan da.

Bi şêweyeke giştî wesfa şûnê di romanên Jan Dost da bi piranî wesfa cihên erdnîgarî ya bajarê kurdan yên wek Bazîd, Bedlîs, Mehabad, Amêdî û Kobanî ye. Bi şêweya taybet jî wesfa şûnan ji xanî, hemam, odeya karakteran, rez, baxçe, çiya û xwezaya ciwan û beşeke bajaran pêk tên.

Romannivîs di wesfîkirina şûnê da bi piranî peyrewa rêbaza romana zarlêkirî bikaraniye. Çimkî wesfa şûnan bi şewazekê ne ku xeyalkirina rasteqînîya şûnan ji alîyê xwendevanan ve hest pê têkin.

Parçeyên wesfên şûnê bi piranî bi alîyê wesfa rawestî da ne, ku bûne sedema sistbûn yan jî rawestandina dema vegêranê. Bi taybetî jî wesfa xwezaya şûnan ku ewqas rola wan li ser pêşvebirina bûyeran û kesayetîya karakteran da nebû. Bi vê jî tenê wek erkeke xemlîner rolê dilîzin.

Ji bilî çend mînakên diyarkirî yên ku alîyê derûnî, civakî, aborî û rewşenbîrîya karakteran xistine pêş çavan, materyalên wesfîkirîyên nav şûnê heta bi radeyeke kêr rehend û pêkhateya derûnîya karakteran derxistîye holê.

Wesfa bûyeran li alîyê pêşkeşkirina beşên bûyerê da, heta radeyeke berfireh bi alîyê wesfa zarlêkirî da hatine pêşkeşkirin. Wate romannivîs girêdayê rêzbendîya beşa sereta, naverast û dawî bû. Lê tenê ji bilî hinek mînakên nav romanên Mîrname û 3 Gav û 3 Darek da ev rêzbendîya têkşikandîye.

Bi şêweyeke giştî di wesfa bûyeran da dirêjgotinî nehatîye kirin. Divê em bibêjin ji bilî çend mînakên diyarkirî piranîya beşa bûyeran di navbera heşt û şanzdeh rêzan da ne û herwiha dirêjîya wesfan herî zêde heta sî rêzan e.

Romanên Jan Dost li pişt bûyerên taybet yên karakteran, gelek bûyerên din jî yên wek dîrokî û sîyasî jî di berfirehîya xwe da girtine.

Romannivîs di derbarê wesfa bûyeran da li alîyê binyata zimanewanî da wate armancê ve heta radeyeke berfireh xwe ji bikaranîna zimanekî deverî, aloz û çir dûr

xistîye, lê tenê di romana Kobanî da zimanê devera Kobanî ji bo nivîsandina romanê bikaranîye.

ÇAVKANÎ

Çavkanîyên Bi Zimanê Kurdî

Alan Robbe Grillet. (2011). *Çîrokî Niwê, Însanî Rêbazî Niwê, Tiyorî Roman* Wer.: Husên Şêrbegî, Weşanxaneya Rojhelat, Çapa Yekem, Hewlêr.

Arî Osman Xeyat. (2019). *Riwangey Rexne û Riwanîni Teorî* . Weşanxaneya Narîn, Çapa Yekem, Silêmanî.

Aristoteles. (2011). *Hunerî Şî'ir* Wer. 'Ezîz Gerdî, Weşanxaneya Nima. Çapa Duyem, Silêman.

Azad Mihemed Seîd. (2013). *Kurfîle Çîrokî Kurdî Le Başurî Kurdistan 1970 -1979* Weşanxaneya Şehab, Çapa Yekem, Hewlêr.

Beyan Mecîd Seîd, (2014). *Bunyadî Wesf Le Romanî “Şar”î Husên 'Arif*, Nameya Master, Kolêja Ziman, Zanîngeha Silêmanî, Silêmanî.

Celal Enwer Seîd, (2009). *Teknîkî Gêranewe Le Romanî “Êwarey Perwane” Ya Bextiyar 'Elî Da..* Weşanxaneya Silêmanî, Çapa Yekem, Silêmanî

Cewher Şêxanî, (2014). *Binyatî Karakter Le Romanekanî Husên 'Arif Da*, Weşanxaneya Rojhelat, Çapa Yekem, Hewlêr.

Dîlan‘Usman Ebdulkerîm, (2014). *Têm Le Kurteçîrokî Kurdî Da Salanî 1991-2000*, Nameya Master, Fakulteya Zanistên Mirovayetî Skulla Ziman, Zanîngeha Silêmanî, Silêmanî.

Diyar Faîq Mecîd,(2008). *Bunyatî Wesf Le Romanî Rêgay Mihemed Mewlud Mem Da*, Nameya Master, Kolêja Perwerdey Îbnî Ruşd, Zanîngeha Bexda, Bexda.

'Ebdulla Serrac,(2007). *Berew Astaney Roman û Koşenîgakan*, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî.

'Ebdulla Serrac,(2013). *Donaydon Yan Bedgoran*, Weşanxaneya Silêmanî, Çapa Yekem, Silêmanî.

'Eta Qeredaxî, (2017). *Gerran Le Nêwan Waqî' û Xeyal Da*, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî.

Gîw Mukiryanî,(2017). *Ferhengî Kurdistan*, Weşanxaneyê Rojilat, Çapa Duyem, Hewlêr.

Hejar Mukiryanî,(1369 Hetawî). *.Henbane Borîne, Ferhenga Kurdî-Kurdî-Farîsî*, Weşanxaneyê Siruş, Çapa Heştem, Tehran.

Heme Mentik,(2018). *Hunerekanî Çîroknûsîn*, Weşanxaneyê Taran, Çapa Yekem, Taran.

Herêman Osman, (2009). *Teknîk Le Sê Çîrokî Aramî Kakey Felah Da*, Kovara Henar, Jimare 44, Silêmanî.

Jan Dost, (2015). *3 Gav û 3 Darek*, Weşanxaneyê Avesta, Çapa Sêyem, Stenbol.

Jan Dost, (2012). *Dîwana Jan*, Weşanxaneyê Avestayê, Çapa Duyemîn, Stenbol.

Jan Dost, (2017). *Kobanî*, Weşanxaneyê Dara, Çapa Yekem, Stenbol.

Jan Dost, (2012). *Martînê Bextewer*, Weşanxaneyê Avestayê, Çapa Duyem, Stenbol.

Jan Dost, (2015). *Mijabad*, Weşanxaneyê Avestayê, Çapa Sêyem, Stenbol,

Jan Dost, (2015). *Mîrname*, Weşanxaneyê Avestayê, Çapa Sêyem, Stenbol.

Karwan Mehdî Osman, (2008). *Teknîkî Wesf Le Romanekanî Bextîyar 'Elî Da*, Nameya Masterê, Kolêja Ziman, Zanîngeha Koyê.

Karzan Muhsin Qadir, (2009). *Sîma Tazekanî Romanî Kurdî Le Nêwan Salanî 1991-2000*, Nameya Masterê, Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr.

Loqman Rauf, (2012). *Rehendekanî Şwênkat Le Deqe Wallakanî Şêrko Bêkes Da*, Weşanxaneyê Silêmanî, Çapa Yekem, Silêmanî.

M. H. Abrams, Malcolm Bradbury, Northrop Frier, (2008). *Roman Çî Ye*, Wer.: Cewad Mistefa, Weşanxaneyê Mukiryanî, Çapa Yekem, Hewlêr.

Mihemmed Ferîq Hesên, (2012). *Ezmûnî Çîroknûsîn*, Weşanxaneyê Silêmanî, Çapa Yekem, Silêmanî.

Muhsîn Ehmed 'Umer, (2012). *Ferhengî Edebî*, Weşanxaneyê Rexneyê Çawdêr, Çapa Yekem, Silêmanî.

Muhsîn Ehmed 'Umer, (2005). *Ferhengî Zaraway Edebî*, Weşanxaneyê Aras, Çapa Yekem, Berga Yekem, Hewlêr.

Nathalie Sarraute, Alan Robbe Girlet, Lucien Goldman, (2008). **Roman û Waqî'**, Wer.: Sellah 'Umer, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî.

Necim Elwenî, (2004). **Bînay Kat Le Sê Nimûney Romanî Kurdî Da, Janî Gel, Şar û Raz**, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî.

Necim Elwenî, (2011). **Sê Lêkolînewey Rexneyî Şikarî Lebarey Romanî Kurdîyewe**, Weşanxaneya Aras, Çapa Yekem, Hewlêr.

Necim Elwenî, (2017). **Teorî Komelnasiy Roman**, Weşanxaneya Zanîngeha Selaheddîn, Çapa Yekem, Hewlêr.

Perêz Sabîr, (2001). **Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî**, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî.

Perî Salih Muftî, (2013). **Gêranewe Le Çîrokekanî Ehmed Mihemed Îsmail Da**, Weşanxaneya Hacî Haşim, Hewlêr.

Rachel Webster, Wer. 'Ebdalxaliq Yaqubî, (2006). **Twêjînewey Teorîyiyî Edebî**, Weşanxaneya Mukiryanî, Çapa Yekem, Hewlêr.

Rêzan Osman, (2010). **Binyatî Curekanî Rûdaw Le Romanî Kurdî Başûrî Kurdistan Da Salî 1985- 1990**, Weşanxaneya Akademîya Kurdî, Çapa Yekem, Hewlêr.

Roland Barthes, (2007). **Çêjî Deq**, Wer.: Îsmail Zarî, Weşanxaneya Minare, Çapa. Yekem, Hewlêr.

Sabir Reşîd, (2007). **Romanî Kurdî, Xwêndnewe û Pirsyar**, Weşanxaneya Aras, Berga Yekem, Çapa Yekem, Hewlêr.

Sebah Îsmail, (2009). **Çemk û Îstatîkay Şiwên Le Edeb Da**, Weşanxaneya Aras, Çapa Yekem, Hewlêr.

Sellah 'Umer, (2012). **Roman Le Koşenîgay Ciyawazewe**, Weşanxaneya Mukiryanî, Çapa Yekem, Hewlêr.

Semîr Ehmed Îbrahîm, (2015). **Hunerekanî Gêranewe Le Romanekanî Xusrew Caf Da**, Nameya Master, Kolêja Ziman, Zanîngeha Selaheddîn.

Senger Qadir, (2007). **Binyatî Gêranewe Le Dastanî "Mem û Zîn"î Ehmedî Xanî û Romanî "Şarî Mosîqare Sipîyekan"î Bextîyar 'Elî Da**, Nameya Masterê, Kolêja Ziman, Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr.

Serkeft 'Umer. (2008). **Binyatî Hunerî Le Romanî Kurdî Rojhelatî Kurdistan 1998- 2008**, Nameya Masterê, Kolêja Perwerde, Zanîngeha Koye.

Sîrus Pirham û Diktor Mîtra, Wer.: Heme Kerîm 'Arif, (2000). *Karektersazîy Riyalîstî Le Romanû û Çîrokî Kurdî Da*, Kovara Raman, J.44, Hewlêr.

Sirwe Tahir Elî, (2015). *Binyatî Hunerî Le Komelle Çîrokî "Hello" Ya Rewuf Bêgerd*, Nameya Masterê, Skolla Ziman, Fakulteya Zanistên Mirovayetî Zanîngeha Silêmanî.

Şukriye Resul, (1989). *Edebî Kurdî û Hunerekanîy Edeb*, Weşanxaneya el Ta'lim el 'Elî, Hewlêr.

Tanya Es'ed, (2011). *Bînay Şiwên Le Dû Nimûney Romanî Kurdî Da*, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî.

Yıldırım, Kadri, (2015). *Kürt Tarihî ve Coğrafyası 1 - Rojava* (Dîrok û Erdnigarîya Kurda 1/Rojava), Stenbol.

Çavkanîyên Bi Zimanê 'Erebî

'Alame Îbnî Menzur, (2003). *Lîsan el- 'Ereb el- Muhît, el- Mucedel el-Tasî'h*, Dar el- Hedîs, Qahîre.

'Ebdulmelîk Murtaz, (1988). *Fîl- Nezerîye el- Rîwaye, Be'hs fîl- Teqnîyet el-Serd, el Me'rîfe 'Alem*, Kuwêt.

Alain Robbe Grillet, *Ne'hu el- Rîwaye el-Cedîde*, Wer.: Mistefa Îbrahîm Mistefa, Dar el- Me'arîf, Misir, Sal Nîye (Bîdun Sene).

Amîne Yusif, (1997). *Teqniyat el- Serd fîl- Nezerîye vel-Tetbîq*, Dar el-Hîwar lîl- Neşir vel- Tewzih, Surîye.

David Lodge, Wer.: Mahir Betutî, (2002). *El Fen Rîwaye*, Çapa Yekem, Meclîs el 'Ala el- Lisese, el- Meşrû' el- Qewmî, Dîmeşq.

'Ebdulemîr Meter Fîlî el- Se'dî, (2000). *El Wesf fîl Rîwaye el Îraqîye, Dîrase Neqdîye fîl- Teqnîye Bîna el- Wesf 1937-1990*, Nameya Master, Kolêja Wêjeyê, Zanîngeha Bexdayê.

'Ebdulla Xemar, (2005). *Fen el- Kitabe, Teqniyat el Wesf, Izdar Xas el- Enternêt*, al-Cezayîr.

Ebdullatîf Me'hfûz, (2009). *Wezîfe el- Wesf fîl Rîwaye*, Dar el- 'Erebîye el- 'Alim Neşrun, Çapa Yekem, Beyrut.

'Ebdulmalik Murtaz, (1993). *Elf el- Leyle wel- Leyle, Dîrase Sînema Ye Tefkîkiye el- Hîkaye e-l Hemal Bexdad, Dîwan el- Metbu'et el- Cema'îye*, Bexda.

Ebu el- Husên Necefî, (1389). *Wezîfe Edebîyat, Mecmu'e Meqallat*, Entîşarat Nîlufer, Çapa Sêyem, Tehran.

'Ednan Xalid, (1986). *el- Neqd el- Tetbîqî el- Te'hîlî*, Çapa Yekem, Dar el- Şuûn el- Seqafe el- 'Ame.

Ehmed Rehmanî, (2004). *Nezerîyat Neqdîye vel- Tetbîqatîha*, Çapa Yekem, Mektebe Wehbe, Qahîre.

Fatme 'Îsa Casim, (2004). *Xayb Te'hme Ferman Rîwaye*, Dar El Şuûn El 'Ame, Bexda.

Gaston Bachelard, (1980). *Cemalyat el- Mekan*, Wer.: Xalib Hilsa, Wezare el- Seqafe el- 'Alem, Bexda.

Hesen Behrawî, (1990). *Bunye el- Şikil el- Rîwaye*, Merkez el- Seqafî el- 'Erebî Dar el- Beyza, Beyrut.

Heyam Şe'ban, (2004). *el- Serd el- Rîwaye Fî A'mal Îbrahîm Nasralla*, Dar el- Kenedî el-Neşir vel- Tewzî', Urdun.

Îbrahîm Cindarî, (2001). *El Fez'a El Rîwaye 'Inde Cibra Îbrahîm Cibra*, Dar El Şi'on El Seqafe El 'Hame, Baxdad.

Îbrahîm Nemir Musa, (1993). *Cemalyat -el Teşkil -el Zemanî Vel- Mekanî el- Rîwaye*, Mucele Fisul, -el Muceld 12, J. 2.

Îdrîs el- Nequrî, (1986). *Ze'hek Kelbûka'*, Dar el- Şu'ûn el- Seqafiye el- 'Ame, Bexda.

Îhtidal 'Usman, (1989). *Te'hawulat el- Qisse fîl- Edeb el- Semanînat*, Mucelle el- Eqlam, J. 6, Reşeme.

John Rikardo, (1977). Wer.: Sebah el- Cehim, *Qiseye el- Rîwaye el- Hedîse*, Wezare el-Seqafe vel- Îrşad, Dîmeşq.

Latif Zeytunî, (2002). *Mu'cem Mustelehat Neqd el- Rîwaye*, Dar el-Nehir el- Neşîr, Beyrut.

Mecdî Wehbe û Kamîl el-Muhendis, (1979). *Mu'cem el- Îstilahat el- Edebîye fîl- Luxe vel- Edeb*, Mektebe Libnan, Beyrut.

Mecme' el-Luxe el-'Erebîye, Mu'cem el-Wasît, (2011). el-Teb' el-Xamîse, **Mektebe** el- Şiruq el- Dewlîye, Qahîre.

Mecmu'e Muelîf, (2002). *el-Fez'a el-Rîwaye, Mecmu'e Min el- Kitab*, Wer.: 'Ebdulrehîm Xezil, Dar el- Bîz'e, Mexrîb, Beyrut û Lubnan.

Mihemmed ‘Ezam, (2005). *Şîriye el- Xitab el- Serdî, Îttîhad el- Katib el- ‘Ereb*, Dîmeşq.

Nebîl Eyyub, (2001). *el-Te’bîr Menhecîye wel-Teqnîyate*, Çapa Sêyem, Dar el- Mektebe el- Ehlîye.

Percy Lubbock, (1981). Wer.: ‘Ebdulstar Cewad, *Sine’e el- Rîwaye*, Dar el- Reşîd el- Neşîr, Bexda.

Philippe Hamon, (2003). Wer.: Se’d el-Tirîkî, *Fîl-Wesfî*, Çapa Yekem, Metbe’e Sutûba, Tûnis.

Qeys Kazim el-Cenabî, (2000). *Selasîye el- Rawiq, el- Rîwaye wel-Bîna “Dîrase fîl -Edeb el- Rîwaye ‘Înde ‘Ebdulxaliq el- Rikabî”*, Dar el- Şuûn el- Seqafe el- ‘Ame.

Rene Wellek û Austin Warren, (1972). *Nezerîye el- Edeb*, Wer. Muhyeddîn Sibêhî, Metbe’e Xalid el- Tirabîşî, Çapa Yekem, Dîmeşq.

Roland Barthes, (1993). *Medxel lîl- Te’lîl el- Binyewî el- Qises*, Wer.: Munzir ‘Îyaşî, Çapa Yekem, *Merkez el- Nima el- ‘Hezarî el Dîrase wel- Terceme wel- Neşîrul- Heleb*, Surîye.

Se’îd Yeqtîn, (2005). *Te’hlîl el -Xîteb el-Rîwaye, “Zemen, el- Serd, el- Te’bîr” çapa Çarem*, el- Merkez el- Seqafîye el- ‘Erebîye, Dar el- Bîze, Mexrîb.

Sellah Fazil, (1987). *Nezerîye Bîna’îye fîl- Neqd el- Edebî*, Dar el-Şu’un el- Seqafîye el- ‘Ame, Çapa Sêyem, Bexda.

Sîza Qasim, (1985). *Bîna’ el- Rîwaye, Dîrasat Muqarene fîs-Selasîye Necîb Mehîûz*, Dar el- Tenwîr el-Teb’e wel- Neşîr, Beyrut.

Şakir Sabîr, (2012). *el-Feza’ el- Rîwaye ‘Inde Selîm Berekat*, Çapxana Rojhilat, Çapa Yekem, Hewlêr.

Şuc’a Muslîm Dexîm el-‘Anî, (1987). *el Bîna el Fenî el-Rîwaye el-‘Erebîye Fîl ‘Îraq*, Nameya Doktora, Kolêja Wêjeyê, Zanîngeha Bexdayê.

Çavkanîyên Bi Zimanê Îngilîzî

A.S. Hornby, (2000). *Oxford Advanced Learners Dictionary*, Intisharat Ziban Beyin Milal, Tehran.

Atsushi Ashida, Tomoko Kojiri, (2018). *Plot – Creation Support With Plot – Construction Model For Writing Novels*, Journal Information and Telecommunication, UK.

D. S. Bland, (1961). *Endangering The Readers Neck: Background Description In The Novel*, Criticism, Vol.3. No.2, USA.

Michael Irwin, *Picturing, Description And Lilusion in The Nineteenth-Century Novel*, Routledge Library Editions, London and New York.

Mikhail Pushkin, (2017). *Critical Analysis Of Bakhtin Chronotope*, Humanita.

Mirjana Loncar, (2013). *Stream Of Consciousness Technique And Modern Novel, Psychological and Methodological Perspectives On Language Learning*, Iosr Journal Of Research, Method in Education, India.

Stephen. A.Nimis Arethusa, (1998). *Memory And Description in The Ancient Novel*, Volume 31, Number1, London.

Sukanya Saha, (2016). *Understandang The Stream Of Consciousness Text: A Linguistic Perspectiv*, International of Linguistics and Literature, India.

Çavkanîyên Malperî

Jan Dost, “Muqaddîmetü’l Kîtâb-î Âdâtü’l-Ekrâd ve Teqâlîduhum lil-Melâ Mahmûd el-Bâyezîdî”, <http://www.medaratkurd.com/?p=60>, Ragîhandin: 28.05.2020.

Ehmed Mustefa, “Rojavayê Kurdistan û Dîroka Wê”, (Redaksiyon: Ebdurehîmê Mûşî), <https://kurdysyria.wordpress.com/>, Ragehandin:12.05.2020.

<https://ku.wikipedia.org/wiki/Kobanî>, Ragehandin:12.05.2020.

<https://www.rudaw.net/kurmanci>, Ragehandin:12.05.2020.

<https://www.rudaw.net/kurmanci/onair/tv/episodes/episode/features>, Ragehandin:12.05.2020.

JÎNENÎGARÎ

Di sala 1992 an da li “Taxa Zanko” ya bajarê Hewlêrê ji dayik bûye, qonaxa seretayî li “Dibistana Şaneder” û qonaxa navendî û amadehî jî li “Dibistana Hêmin” ya li bajarê Hewlêrê qedandîye. Paşê jî di sala 2010 an da di “Beşa Kurdî Ya Kolêja Ziman Ya Zanîngeha Selaheddîn” bûye xwendevan û di sala 2014 an da bi serkeftî xwendina xwe qedandîye. Paşê jî di sala 2015 an de weke harîkarê vekolerê (assistan resercher) di “Beşa Kurdîya Koleja Ziman” dest bi kar bûye. Ji bo xwandina lisansa bilind paşan meha îlonê ya sala 2018an bûye xwendevanê “Beşa Zimanê û Çanda Kurdî ya Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê.

